



K.T.

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ

ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ

ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê EDEBÎYATA KURDÎ

**BERAWIRDKIRINA LÊKERÊN KURMANCÎ Ê
YÊN ZAZAKÎ LI GOR TEORÎYÊN ROL Ê
REWŞÊ**

Amadekar

Fahri KARACA

TEZA DOKTORAYÊ

Şêwirmendên Tezê

Doç. Dr. Zafer AÇAR

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Bîngol-2025



T.C.
BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

KURMANCCA VE ZAZACA FİİLERİN ROL VE DURUM
TEORİLERİ AÇISINDAN KARŞILAŞTIRMASI

Hazırlayan
Fahri KARACA

DOKTORA TEZİ

Tez Danışmanları
Doç. Dr. Zafer AÇAR
Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Bingöl-2025

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım *Berawirdkirina Lêkerên Kurmancî û yê Zazakî li gor Teorîyên ROL û REWŞÊ* adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

04/09/2025

Fahri KARACA

TEZ ONAY SAYFASI

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Fahri KARACA tarafından hazırlanan **Berawirdkirina Lêkerên Kurmancî û yê Zazakî li gor Teorîyên ROL û REWŞê** başlıklı bu çalışma, 04.09.2025 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda *oybirliğiyle* başarılı bulunarak jürimiz tarafından *Kürt Dili ve Edebiyatı* Anabilim Dalı'nda Doktora tezi olarak kabul edilmiştir.

TEZ JÜRİSİ ÜYELERİ (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan	: Doç. Dr. Mehmet YONAT	İmza:
Danışman	: Doç. Dr. Zafer AÇAR	İmza:
Danışman	: Doç. Dr. Ahmet KIRKAN	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD	İmza:
Üye	: Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL	İmza:.....

NAVEROK

KURTE	VI
ÖZET	VIII
ABSTRACT	X
PÊŞGOTIN.....	XII
KURTEBÊJE	XIII
DESTPÊK.....	1
A. ARMANCA XEBATÊ.....	2
B. GIRINGÎYA XEBATÊ.....	2
C. ÇARÇOVE, SÎNOR Û RÊBAZA XEBATÊ	4
D. KURTEYA LÎTERATURÊ	6
E. KÊŞEYÊN XEBATÊ	8
BEŞA YEKEM	10
RÊZIMANA GERDÛNÎ	10
1.1. NIHÊRÎNEKA GIŞTÎ.....	10
1.1.1. Argumentên ji bo Rêzimana Gerdûnî	13
1.1.2. Têgeha Rêzimanê di Rêzimana Gerdûnî da	16
1.1.3. Sînorên Karkirina Rêzimana Gerdûnî	19
1.1.4. Qonaxên Rêzimana Gerdûnî	21
BEŞA DUYEM	32
BINYADA FRÊZÎ Û REWŞA RÊZIMANÎ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DA.....	32
2.1. BINYADA FRÊZÎ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DA.....	32
2.1.1. Cureyên Frêzan	43
2.1.1.1. Frêza Lêkerî.....	45
2.1.1.2. Frêza Rengdêrî.....	46
2.1.1.3. Frêza Daçekî	46

2.1.1.4. Frêza Îzafeyî	49
2.1.1.5. Frêza Navdêrî	54
2.1.1.6. Frêza Diyarkerî	55
2.1.1.7. Frêza DEMê.....	57
2.1.1.8. Frêza Temamkerî	59
2.2. REWŞA RÊZIMANÎ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DA.....	61
BEŞA SÊYEM.....	67
ROL Û LÊKERÊN KURMANCÎ Û YÊN ZAZAKÎ.....	67
3.1. TEORÎYA ROLÊ	67
3.1.1. Lêbarkirina ROLan	68
3.2. ROL DI LÊKERÊN KURMANCÎ Û YÊN ZAZAKÎ DA.....	81
3.2.1. Lêkerên Yek-ROLî	82
3.2.2. Lêkerên Du-ROLî	89
3.2.3. Lêkerên Sê-ROLî	100
3.2.4. ROL di Pêveberên Kompleks ên Kurmancî û yên Zazakî da ..	104
3.2.4.1. Pêveberên Kompleks	104
3.2.4.1.1. Pêveberên Kompleks di Kurmancî û Zazakî da.....	115
3.2.4.1.1.1. Cureyên Pêveberên Kompleks.....	116
3.2.4.1.1.2. Taybetmendiyên Sereke yên Pêveberên Kompleks .	123
3.2.4.2. Çarçoveya Teorîk.....	126
3.2.4.3. ROL di Pêveberên Kompleks ên Têper da	146
3.2.4.3.1. ROL di Pêveberên Kompleks ên N+LSyî da	146
3.2.4.3.2. ROL di Pêveberên Kompleks ên R+LSyî da	151
3.2.4.3.3. ROL di Pêveberên Kompleks ên D+LSyî da	151
3.2.4.3.4. ROL di Pêveberên Kompleks ên P+LSyî da.....	161
3.2.4.3.5. ROL di PKyên N+D+LSyî da	161
3.2.4.4. ROL di Pêveberên Kompleks ên Neakûzatîv da	162
3.2.4.5. ROL di PKyên Tebatî da.....	166
BEŞA ÇAREM.....	169
REWŞ Û LÊKERÊN KURMANCÎ Û YÊN ZAZAKÎ	169

4.1. TEORÎYA REWŞÊ	169
4.1.1. REWŞa Razber û Rewşa Morfolojîk	173
4.1.1.1. REWŞa Razber di Kurmancî û Zazakî da	176
4.1.2. REWŞa Binyadî û REWŞa Hundirîn	179
4.1.2.1. REWŞa Binyadî û REWŞa Hundirîn di Kurmancî û Zazakî da.....	180
4.1.3. Lêkerên ku REWŞê Bar Dikin û yên ku REWŞê Bar Nakin...	193
4.1.3.1. Lêkerên ku REWŞê Bar Dikin	193
4.1.3.2. Lêkerên ku REWŞê Bar Nakin.....	203
4.1.3.3. REWŞ di Pêveberên Kompleks ên Kurmancî û yên Zazakî da.....	214
4.1.3.4. Çarçoveya Teorîk.....	214
4.1.3.5. Pêveberên Kompleks ên ku REWŞê Bar Dikin.....	219
4.1.3.6. Pêveberên Kompleks ên ku REWŞê Bar Nakin.....	226
ENCAM	232
ÇAVKANÎ.....	239
PÊVEK	251

KURTE

Berawirdkirina Lêkerên Kurmancî û yên Zazakî li gor Teorîyên ROL û REWŞê

Kurmancî û zazakî ji aliyê koma zimanî, dîrokî û erdnigarîyê ve di nava têkilîyeka nêzîk da ne. Ev nêzîkîya zimanî, dîrokî û erdnigarîyê giringîya xebatên zimannasîya berawirdî yên li ser kurmancî û zazakî zêdetir dike. Li gel vê, xebatên di vî warî da ne zêde ne. Armanca bingeşîn a xebatê ew e ku avahîyên ku lêkerên kurmancî û yên zazakî pêk tînin di çarçoveya angaşt û pêşbînîyên teorîya ROLê û teorîya REWŞê da bi awayekî berawirdî vekole. Teorîya ROLê û ya REWŞê binteorîyên Teorîya Birêvebirin û Girêdanê (BG) ne, ku BG ji aliyê Noam Chomskyî ve di çarçoveya boçûna Rêzimana Gerdûnî da hatiye pêşkêşkirin. Her lêker xwedî naverokeka semantîk e. Lêker, li asta risteyî van taybetmendîyên xwe yên semantîk li argumentên xwe bar dike. Lêbarkirina van taybetmendîyên semantîk wek ROL (wekî KARA, MIJAR, HEDEF) tê zanîn. Argument û ROLên ku li van argumentan tên barkirin binyada ROLê ya lêkeran diyar dike. Di xebatê da lêkerên kurmancî û yên zazakî li gor hejmara ROLên ku bar dikin û cureya argumentên ku binkategorîze (subcategorize) dikin, hatine vekolandin. Hatîye dîtin ku lêkerên kurmancî û yên zazakî van her sê cure kategorîyên argumentan binkategorîze dikin: *Frêza diyarkerî* (FDI), *frêza daçekî* (FD) û *frêza temamkerî* (FTEM). Dîsa hatiye dîtin ku lêkerên kurmancî û yên zazakî li gor hejmara ROLên ku bar dikin sê cure ne: *lêkerên yek-ROLê*, *lêkerên du-ROLê* û *lêkerên sê-ROLê*. Pêveberên kompleks, avahîyên lêkerî ne. Pêveberên kompleks, di xebatê da di bin serenava lêkeran da, lê di bin binbeşeka serbixwe da ji aliyê ROLê ve hatine vekolandin. Pêveberên kompleks li gor cureya kategorîk a pêkhênên ne-lêkerî hatine senifandin û vekolandin. Ji aliyê din ve Teorîya REWŞê lêkeran ji aliyê hêza wan a lêbarkirina REWŞê û cureya vê REWŞê ve vedikole. Lêkerê an dikare REWŞê bar bike yan jî nikare REWŞê bar bike. Lewra lêker bi tenê REWŞekê bar dikin ku wê jî li temamkera (berkar) xwe ya ku binkategorîze dikin, bar dikin. Lê her lêkerekê ku temamkerekê binkategorîze dike, nikare REWŞê bar bike. Ji bo ku bikaribe REWŞê bar bike, li r-binyadê (s-structure) ev temamker divê ji pozîsyona xwe cih neguhêre bo pozîsyoneka din. Daneyên zimanî yên di xebatê da ji kurmancîya standard û zazakîya standard hatine hîlbijartin. Di xebatê da metoda çawanî (qualitative), berawirdî û sêwirkerî (descriptive) hatiye bikaranîn. Berawirdkirina avahîyên lêkerên kurmancî û yên zazakî di ser

dardiyagraman ra hatîye analîzkirin. Vê xebatê nîşan da ku em dikarin bi saya analîzên li gor teorîyên ROL û REWŞê hin alîyên sîntaktîk ên kurmacî û yê zazakî bi awayekeke zelaltir rave bikin. Wek encam, vê xebatê nîşan da ku lêkerên kurmacî û yê zazakî ji alîyê binyada ROLê û ji alîyê REWŞê ve xwedî gelek taybetmendîyên hevpar in. Xebat ne bi tenê ji bo vekolînên zimanî yê kurdî têkarîyê dike, di heman demê da derfetê dide ku angaşt û pêşbînîyên teorîya BGyê di çarçoveya ROL û REWŞê da li ser du zimanên di heman koma zimanî da cih digirin, bi awayekî berawirdî bî ceribandî.

Bêjeyên sereke: Rêzimana Gerdûnî, Teorîya Birêvebirin û Girêdanê, Teorîya ROLê, Teorîya REWŞê, lêker, kurmacî, zazakî, berawirdkirin.

ÖZET

Kurmancca ve Zazaca Fiillerin ROL ve DURUM Teorileri Açısından Karşılaştırması

Kurmancca ve Zazaca, dil grubu, tarihsel ve coğrafi açıdan yakın bir temas halindedir. Bu dilsel, tarihsel ve fiziksel yakınlık Kurmancca ve Zazaca üzerine karşılaştırmalı dilbilim çalışmalarının önemini arttırmaktadır. Buna rağmen bu alandaki çalışmalar fazla değildir. Bu çalışmanın temel amacı, Kurmancca ve Zazaca fiillerin oluşturduğu yapıların ROL Teorisi ve DURUM Teorisi'nin iddiaları ve öngörülerini çerçevesinde karşılaştırmalı bir şekilde incelenmesidir. ROL ve DURUM teorileri, Noam Chomsky tarafından Evrensel Dilbilgisi yaklaşımı çerçevesinde öne sürülen Yönetim ve Bağlama Teorisinin (YB) alt teorileridir. Her fiil semantik bir içeriğe sahiptir. Fiil, cümle düzeyinde bu semantik özelliklerini argümanlarına yükler. Bu semantik özelliklerin yüklenmesi ROL (EDEN, KONU, HEDEF gibi) olarak bilinmektedir. Fiillerin argümanları ve onlara yüklenen ROLLer fiillerin ROL yapısını belirler. Çalışmada Kurmancca ve Zazaca fiiller yükledikleri ROL sayısı ve yankategorileştirdikleri (subcategorize) argümanların türü açısından araştırılmıştır. Kurmancca ve Zazaca fiillerin şu üç tür argümanı yankategorileştirdikleri görülmüştür: *Gösterici öbeği (GÖ)*, *edat öbeği (EÖ)* ve *tamamlayıcı öbeği (TÖ)*. Yine Kurmancca ve Zazaca fiillerin yükledikleri ROL sayısı açısından üç grup olduğu görülmüştür: *bir ROLLü fiiller*, *iki ROLLü fiiller* ve *üç ROLLü fiiller*. Kompleks yüklemeler fiisel yapılardır. Kompleks yüklemeler, çalışmada fiil başlığı altında ama bağımsız bir alt başlık altında ROL açısından incelenmiştir. Kompleks yüklemeler, kendilerini oluşturan fiil olmayan kurucuların kategorik türü açısından sınıflandırılmış ve araştırılmıştır. Diğer taraftan, DURUM teorisi, fiilleri DURUM yükleme yeteneklerine ve bu DURUMun türüne göre araştırır. Bir fiil ya DURUM yükleyebilir ya da DURUM yükleyemez. Çünkü bir fiil sadece bir DURUM yükler ki bu DURUMu da yankategorileştirdiği tamamlayıcısına (nesne) yükler. Fakat bir tamamlayıcı yankategorileştiren her fiil DURUM yükleyemez. DURUM yükleyebilmesi için y-yapıda (s-structure) bu tamamlayıcının olduğu konumdan başka bir konuma taşınmaması gerekir. Çalışmadaki dilsel veriler standard Kurmancca ve standard Zazaca'dan seçilmiştir. Çalışmada nitel (qualitative), karşılaştırmalı ve betimsel (descriptive) bir metod benimsenmiş, kurmancca ve zazaca fiillerin oluşturduğu yapılar ağaç diyagramları üzerinden karşılaştırmalı olarak incelenmiştir. Bu çalışma,

ROL ve DURUM teorilerine gre yapılan analizlerin Kurmancca ve Zazaca'nın bazı szdizimsel ynlerini daha aık bir Őekilde aıklanabileceđini gstermiŐtir. Sonu olarak bu alıŐma Kurmanca ve Zazaca fiillerin ROL yapısı ve DURUM aısından bir ok ortak zelliđe sahip olduđunu gstermiŐtir. alıŐma sadece Krte dil araŐtırmalarına katkı yapmakla kalmıyor, aynı zamanda *YB*'nin iddialarının ve ngrlerinin ROL ve DURUM teorileri erevesinde aynı dil grubunda bulunan iki dil zerinde karŐılaŐtırmalı olarak sınanmasına da olanak tanıyor.

Anahtar kelimeler: Evrensel Dilbilgisi, Ynetim ve Bađlama Teorisi, ROL Teorisi, DURUM Teorisi, fiil, Kurmanca, Zazaca, karŐılaŐtırma.

ABSTRACT

A Comparison of Kurmanji and Zazaki Verbs in Terms of ROLE and CASE Theories

Kurmanji and Zazaki are in close contact in terms of language group, historical, and geographical. This linguistic, historical, and geographical closeness increases the importance of comparative linguistic studies on Kurmanji and Zazaki. Nevertheless, the studies in this field are not numerous. The main aim of this study is to comparatively examine the constructs formed by Kurmanji and Zazaki verbs within the framework of the claims and predictions of ROLE Theory and CASE Theory. ROLE and CASE theories are subtheories of the Government and Binding Theory (*GB*), proposed by Noam Chomsky within the framework of the Universal Grammar approach. Every verb possesses semantic content, which is assigned to its arguments at the sentence level. This assignment of semantic features is known as ROLE (such as AGENT, THEME, GOAL). The arguments selected by verbs and the ROLES assigned to them determine the ROLE structure of the verb. This study investigates Kurmanji and Zazaki verbs in terms of the number of ROLES they assign and the types of arguments they subcategorize. It has been observed that Kurmanji and Zazaki verbs subcategorize for the following three types of arguments: *Determiner phrase (DP)*, *prepositional phrase (PP)*, and *complementizer phrase (CP)*. It has also been observed that, in terms of the number of ROLES they assign, Kurmanji and Zazaki verbs fall into three groups: one-ROLE verbs, two-ROLES verbs and three-ROLES verbs. Complex predicates are verbal constructions. In this study, complex predicates are examined under the main heading of verbs but within an independent subheading, in terms of ROLE. These predicates are categorized based on the syntactic category of their non-verbal constituents. In addition, CASE Theory examines verbs in terms of their ability to assign CASE and the type of CASE assigned. A verb either assigns CASE or does not. Because a verb assigns only one CASE, and it assigns this CASE to the complement (object) it subcategorizes. However, not every verb that subcategorizes a complement can assign CASE. In order for a verb to assign CASE, the complement must not be moved from its original position to another position in the s-structure. The linguistic data in the study have been selected from standard Kurmanji and standard Zazaki. In the study, a qualitative, comparative, and descriptive

method has been adopted, and the constructs formed by Kurmanji and Zazaki verbs have been comparatively analyzed through tree diagrams. This study has shown that analyses conducted within the framework of ROLE and CASE theories can account for some syntactic aspects of Kurmanji and Zazaki more clearly. In conclusion, this study has shown that Kurmanji and Zazaki verbs share many common features with respect to ROLE structure and CASE. The study not only contributes to Kurdish language research but also allows for the comparative testing of the claims and predictions of *GB* within the framework of ROLE and CASE theories on two languages belonging to the same language group.

Keywords: Universal Grammar, Government and Binding Theory, ROLE Theory, CASE Theory, verb, Kurmanji, Zazaki, comparison.

PÊŞGOTIN

Gelek zehmet e ku xebatek bi tenê bi keda amadekarê/a wê temam bibe. Di her xebatê da kê m be zêde be, keda kesên din jî heye û ev ked bi qîmet e. Di prosesa çêkirina vê xebatê da min jî ji gelek kesan alîkarî wergirt. Helbet di serî da her du şêwirmedên min, Doç. Dr. Zafer Açar û Doç. Dr. Ahmet Kırgan, çî wextê min li derîyê wan da û min çî ji wan pirsî bi zanebûna xwe rê şanî min dan, pêşîya min ronî kirin. Mala wan ava be. İbrahim Bingölî hin beşên xebatê xwendin û bi saya hin rexneyên wî yê di cih da hin mijar zêdetir hatin zelalkirin. Hevala min Leyla Polatê gelek alîkarîya min kir, xebat xwend, pêşniyaz kirin, hin berhem ji bo min peyde kirin. Dîsa hevalên min Volkan Kormaz û Ahmet Seyarîyî xebat ji serî heta binî xwend, pêşniyaz û rexneyên di cih da kirin. Hin berhemên ku zehmet bû min bi dest bixista, hin hevalên qedirbilind ji bo min şandin. Ev xebat li ser kurmancî û zazakî hatîye çêkirin. Di prosesa xebatê da her cara ku min xwest ez bizanim hin risteyên ku ez li ser dixebitim di nav gel da çawa tên bikaranîn û çawa tên fêmkirin, min serî li kurmancîzar û zazakîzaran da. Wan jî bi dîlnizmî û dîlxweşî her carê bersivên pirsên min dan. Endamên jûrîya tezê, Doç. Dr. Mehmet Yonat, Dr. End. Hîn. Hemin Omar Ahmad û Dr. End. Hîn. Songül Gündoğdu Yücelê bi rexneyên xwe yê giring kirin ku kêmasîyên tezê kêmtir bin.

Spasîyeka mezin û jidil ji bo hemû kesên min bi nav kirin û yê min bi nav nekirin ku di prosesa xebatê da alîkarîya xwe ji min kê m nekirin. Bi saya wan, kêmasîyên xebatê gelek kêmtir bûn. Lê di xebatê da kêmasî dê dîsa hebin. Ev kêmasî yê min in. Hêvî ji vê xebatê ew e ku têkarîyê li qada zimannasîya kurdî bike û rê li ber xebatên dîtir veke.

Fahri KARACA

Bîngol – Mûş 2025

KURTEBÊJE

Agr.o	rêkeftina berkarî
Agr.s	rêkeftina bikerî
BG	Birêvebirin û Girêdan
bnr	binihêrin
BRP	Berpêbûnî
C	Cild (Berg)
Ç	çendîker
D	daçek/daçekî
DI	diyarker
DIY	diyar
D_{paş}	paşdaçek
Ed	edîtor
FD	frêza daçekî
FDEM	frêza DEMê
FDI	frêza diyarkerî
FDY	Frêza dîyatezî
FF	forma fonetîk
FÎ	frêza îzafeyî
FK	frêza kêşî
FL	frêza Lêkerî
FI	frêza lêkerî
FM	forma mantiqî
FN	frêza navdêrî
FR	frêza rengdêrî
FTEM	frêza temamkerî

FX	frêza Xê
FY	frêza Yyê
FZ	frêza Zyê
GXV	Grûba Xebate ya Vateyî
Î	îzafe
îng	îngilîzî
K1.P	kesê yekemîn ê pirjimar
K1.Y	kesê yekemîn ê yekjimar
K2.P	kesê duyemîn ê pirjimar
K2.Y	kesê duyemîn ê yekjimar
K3.	kesê sêyemîn
K3.P	kesê sêyemîn ê pirjimar
K3.Y	kesê sêyemîn ê yekjimar
krm	kurmancî
L	lêker/lêkerî
LS	lêkera sivik
N	Navdêr/Navdêrî
nîş	nîşanker
NT	nêtar
NZ	nêrza
P&P	Prensîp û Parametre
P.Z.	piştî zayînê
PAŞG	paşgir
PDB	Prensîpa Derdanê ya Berfirehkirî
PÊŞG	pêşgir
PK	pêvebera kompleks

PKV	Prensîpa Kategorîya Vala
prj	pirjimar
R	rengdêr/rengdêrî
r	rûpel
RB	rêkeftina berkarî
RG	Rêzimana Gerdûnî
rr	rûpel (pirjimar)
RS	riste
RVH	Rêzimana Veguherîner-Hilberîner
SDM	sedemî
tem	temamker
tr	tirkî
TS	Teorîya Standard
TSB	Teorîya Standard a Berfirehkirî
TWNG	TEWANG
v	vala
Wer	wergêr
X'	X bar
X''	x cot bar
XYNG	xuyang
yd	yên din
zz	zazakî

ji bo bîranîna Şêx Elîyê bavê min û ji bo diya min Şaybeyê...

DESTPÊK

Lêker, di zimannasîyê da wek hêmanên bingehîn ên risteyan tînin. Lêker, di risteyan da hebûna hejmar û cureya argumentan bîşnor dîkin. Hilbijartina argumentên wekî biker, berkar û yd. tîkildar e bi taybetmendiyên lêkeran ve. Ji ber vê, vekolîna tîkilîyên lêker-argumentan, ji bo fêmkirina sîntaksa di zimanekî da gaveka bingehîn e.

Teorîya Birêvebirin û Girêdanê (BG) ya Chomskyî, ji bo ravekirina tîkilîyên lêker-argumentan çarçoveyeka teorîk pêşkêş dike. Bi taybetî du binteorîyên BGYê, ji bo vekolîna tîkilîyên lêker-argumentan navgînên kêrhatî pêşkêş dîkin. Yek ji van binteorîyan teorîya ROLê ye. Teorîya ROLê, diyar dike ku her argument tenê bi tenê dikare ROLekê (wekî KARA, MIJAR, HEDEF û yd.) werbigire û her ROL bi tenê li argumentekê tê barkirin. Bi vî awayî, em dikarin di çarçoveya teorîya ROLê da tekiliya semantîk û sîntaktîk a lêker-argumentan li asta sîntaktîk vekolin. Binteorîya din ji teorîya REWŞê ye. Ev teorî, diyar dike ku ji bo ku *frêzeka diyarkerî* (determiner phrase) (FDI) bi awayekî morfolojîk xuya bike, divê REWŞ li wê hatibe barkirin. Li gel vê, di navbera ROL û REWŞê da jî tîkilîyek heye. Ji bo ku hêmanek bikaribe ROLê werbigire REWŞ divê li wê hatibe barkirin û ji bo ku REWŞê werbigire ROL divê li wê hatibe barkirin. Vekolîna hilbijartina argumentan a ji aliyê lêkeran ve û cureya ROL û REWŞên ku li van argumentan tînin barkirin ji bo analîzên sîntaktîk çarçoveyeka navendî çêdike.

Di vê xebatê da em lêkerên kurmançî û yê zazakî¹ bi awayekî berawirdî di çarçoveya teorîya ROL û REWŞê da vedikolin. Vekolîna lêkerên kurmançî û yê zazakî ya ji aliyê van teorîyan ve ji aliyên cuda giringîya wê heye. Pêşî, hem ji bo hevparî hem jî ji bo cudahiyan sîntaktîk ên di navbera kurmançî û zazakî da dê di çarçoveyeka teorîk da bînin analîzkirin ku li ser vê mijarê heta niha xebatên bi hûrgilî nehatine çêkirin. Dîsa ev xebat dê îmkane bide bi giştî angaşt û pêşbînîyên BGYê û bi

¹ Li ser "zazakî zaraveyekî kurdî ye yan na"yê hin nîqaş hene. Bêyî ku em vê mijarê nîqaş bikin, em qebûl dîkin ku zazakî zaraveyekî kurdî ye, lê yê ku zazakî cuda ji kurdî wek zimanekî serbixwe qebûl dîkin jî hene. Ji bo hin xebatên ku fikrên cuda yê li ser vê mijarê nîşan didin bnr. Haig & Öpengin, 2014; Şanlı, 2017, r. 8-10. Cardin ji bo zazakî navên wek *dimilî*, *kirdkî* û *kirmanckî* jî tînin bikaranîn, di vê xebatê da em navê *zazakîyê* tercîh dîkin.

taybetî angaşt û pêşbînîyên Teorîyên ROL û REWŞê di ser kurmancî û zazakî ra bên ceribandin.

A. ARMANCA XEBATÊ

Armanca bingeîn a vê xebatê ew e ku binyada argumentî, binyada ROLê û prosesa lêbarkirina REWŞê ya ji alîyê lêkerên kurmancî û yên zazakî ve bi awayekî berawirdî vekole. Di vê çarçoveyê da ev xebat li bersivên van pirsan digere:

- 1- Di kurmancî û zazakî da lêker kîjan cure argumentan werdigerin?
- 2- ROL, li van argumentan çawa tên barkirin?
- 3- Lêbarkirina REWŞê di kurmancî û zazakî da li gor kîjan mekanîzmaya pêk tê?
- 4- Angaşt û pêşbînîyên teorîya ROLê û ya REWŞê ji bo sîntaksa kurmancî û zazakî çiqas raveker in?
- 5- Bi angaşt û pêşbînîyên van teorîyan ve gelo em dikarin hin alîyên lêkerên kurmancî û yên zazakî zêdetir zelal bikin an na?
- 6- Gelo angaşt û pêşbînîyên yek ji van teorîyan li gel angaşt û pêşbînîyên teorîya din, ji bo lêkerên kurmancî û yên zazakî lihevkerî ne yan na?
- 7- Ji alîyê angaşt û pêşbînîyên van teorîyan ve di navbera lêkerên kurmancî û yên zazakî da hevparî û cudahî çi ne? Em dikarin van hevparî û cudahîyan di çarçoveya *BGyê* da çawa rave bikin?
- 8- Gelo ev teorî dikarin rê li ber analîzên nû yên ji bo sîntaksa kurmancî û ya zazakî vekin an na?

Bersivên van pirsan dê hem asta ravekerîya van teorîyan nîşan bide hem jî ji bo nihêrîneka nû ya ji bo binyada sîntaktîk a kurmancî û ya zazakî dê bingehekê dayîne.

B. GIRINGÎYA XEBATÊ

Di lîteraturê da hin xebatên ku ji hin alîyan ve kurmancî û zazakî berawird dîkin hene. Bo nimûne Verojî (2014) di xebata xwe da rêzimana kurmancî û ya zazakî bi niherîneka nerîtî ji alîyê diyalekt, alfabe, fonetîk û morfolojîyê ve bi awayekî berawirdî dane nasîn. Karacan û Kayayî (2015) kurmancî û zazakî ji alîyê fonetîk ve bi awayekî kurtasî berawird kirine. Bingölî (2016) kurmancî û zazakî ji alîyê têkilîya felsefeya

zimanî ve berawird kirine. Di xebatê da fikrên çandî yên ku li bin risteyên kurmançî û yên zazakî cih digirin, hatine vekolandin û berawirdkirin. Aslanoğullarıyî (2017) di gotara xwe da pirjimarîkirina navdêran a di kurmançî û zazakî berawird kiriye. Şanlıyî (2017) di teza xwe ya lîsansa bilind da devoka kurmançî ya Licê û devoka zazakî ya Hezanê ji alîyê hevparî û cudahîyên rêzimanî ve berawird kirine. Tayfun (Malmîsanîj) û Mosayî (2017) pêşgir, paşgir û navgirên di kurmançî û zazakî da berawird kirine. Kaplanî (2018) di teza xwe ya lîsansa bilind da lêkerên kurmançî ji alîyê dîyatezê (voice) ve vekolandine. Li gel ku xebat li ser lêkerên kurmançî hatiye amadekirin, di xebatê da lêkerên hin zaravayên din ên kurdî (wekî zazakî, soranî, goranî) û devokên cuda yên kurmançî jî ji alîyê dîyatezê ve hatine vekolandin. Yeşilkayayî (2019) di teza xwe ya lîsansa bilind da ji alîyê zayenda rêzimanî ve kurmançî û zazakî berawird kirine. Bingölî (2023) di gotara xwe da kurmançî û zazakî ji alîyê dîyatezê ve berawird kirine ku alîyekî vê xebatê têkildar e bi semantîkê û alîyekî din jî têkildar e bi sîntaksê ve. Subaşıyî (2023), di teza xwe ya lîsansa bilind da avahîya tebatî ya zaravayên kurdî vekolandiye. Xebat bi awayekî berawirdî nehatiye kirin, lê ji ber ku zimanê teze kurmançî ye, hevparî û cudahîyên avahîya tebatî ya kurmançî û zazakî bi nimûneyên tînin.

Ji alîyê din ve, hin xebatên ku li ser lêkerên kurmançî û yên zazakî hatine amadekirin jî hene. Bo nimûne Abiyî (2018) di teza xwe ya lîsansa bilind da gireyên ku lêker li gor dem û raweyan werdigirin ji bo kurmançîya jorîn û kurmançîya naverast vekolandine. Farqînîyî (2019) di xebatê da lêker ji alîyê binyadî û rastnivîsî ve vedikolandine, Di vê xebatê da nûjenîyek ew e ku hin cure lêker di bin navê *lêkerên veqetînbar* (wekî *lê kirin*, *jê hatin* û yd.) da hatine senifandin û taybetmendiyên wan hatine vekolandin. Demîrê (2015) lêkerên zazakî ji alîyê binyadî (wekî xwerû, dariştî û lêkdayî) û ji alîyê dem, rawe, kesî ve vekolandine. Kırkanî (2021c) di xebata xwe da lêkerên zazakî ji gelek alîyan (wekî binyad, rawe (mood), xuyang (aspect), ergatîvî) ve vekolandine û senifandine.

Her yek ji xebatên jorîn derheqê gelek alîyên kurmançî û yên zazakî da gelek zanyariyên girîng didin. Xebatên berawirdî yên di paragrafa yekem da (Bingöl (2016) ne tê da), di çarçoveya zimannasîya nerîtî da hatine çêkirin, rêbaza xebatan bi piranî pênasekirin, danasîn û senifandina mijarên xebatan e. Xebatên ku li ser lêkerên kurmançî û yên zazakî hatine çêkirin, lêker bi piranî ji alîyê binyadî ve (wekî xwerû,

dariştî, lêkdayî) vekolandine, gireyên ku li gor dem, rawe, kesî werdigirin hatine danasîn û senifandin, lê avahîyên ku lêker pêk tînin, ji alîyê sîntaktîk ve bi awayekî hûrgilî nehatine vekolandin. Bi taybetî di çarçoveya ergatîvî, avahîya tebatî û ya lebatî da hin alîyên sîntaktîk ên kurmançî û yên zazakî hatine destnîşankirin.

Li gel giringî û têkarîya van cure xebatan a li vekolînên zimanî yên kurdî, ji bo xebatên li ser sînaksê, di warê lîteratura zimannasîya kurdî da du valahîyên bingehîn derdikevin pêş. Yek ji wan kêmasîya vegirîyê ye; xebatên ku li ser lêkeran hatine çêkirin, têkilîyên lêker-argumentan di çarçoveyeka bisînor da kirine mijara xwe. Ya duyem kêmasîya berawirdkirinê ye. Avahîyên ku लेकरên kurmançî û yên zazakî çêdikin, hevparî û cudahîyên van avahîyan bi awayekî sistematîk nehatine berawirdkirin. Ev kêmasî hem fêmkirina binyada hundirîn a kurdî zehmet dike hem jî ji ber ku ev xebat di çarçoveya BGYê da nehatine çêkirin, testkirina vê teorîyê ya li ser daneyên kurdî bisînor dike. Ev xebat, hewl dide van valahîyan heta radeyekê dagire.

Bi qasî ku me dît, di warê zimannasîya kurmançî da teorîyên ku di çarçoveya boçûna RGYê da hatine pêşkêşkirin gelek kêmbûne mijara xebatan, lê ji bo zazakî em li rastî ti xebatekê nehatin. Lewma, em dikarin bêjin ji bo zimannasîya kurmançî û ya zazakî RG boçûneka zêde nas nine². Ev xebat, beşeka ji vê boçûnê dixê nav zimannasîya kurmançî û ya zazakî. Yek ji giringîya vê xebatê jî ev e. Dîsa di vê xebatê da hin angaştên nû hatine pêşkêşkirin ku ev angaşt ji ber angaşt û pêşbînîyên Teorîyên ROL û REWŞê derketine holê. Hin ji van angaştên nû, di warê wan nihêrîn û boçûnan da ne ku di xebatên cuda yên rêzimanî û zimannasîya kurmançî û ya zazakî da, gelek caran hatine dubarekirin. Ev xebat, bi çavekî rexneyî nêzîkî li van nihêrîn û boçûnan dike û ji bo wan, angaşt û raveyên nû pêşkêş dike. Lewma dibe ku li van angaştên nû yên vê xebatê rexne bîr girêdan û li wan bîr îtirazkirin. Lê her pêşketin bi hin nîqaş, rexne û îtirazan dest pê dike.

C. ÇARÇOVE, SÎNOR û RÊBAZA XEBATÊ

Wekî her ziman û zaravayî, kurmançî û zazakî jî xwedî devokan in. Di vê xebatê da em dê li ser kurmançîya standard û zazakîya standard kar bikin. Lê ji bo zazakî bi

² Di hin devokên kurmançî da *nîn* hem ji bo *tuneyê* hem jî ji bo neyînîyê tê bikaranîn. *Nîn* jî di hin devokên kurmançî da bi tenê ji bo neyînîyê tê bikaranîn. Di vê xebatê da *nîn* ne ji bo *tuneyê*, ji bo neyînîyê hatiye bikaranîn û ji *nînê* cuda ye.

giştî tê gotin ku (bnr. Bingöl, 2017, r. 90; Malmîsanij, 2021, r. 676; Kırkan, 2021a, r. 208) zazakî hêj negîhiştîye asteka standard. Her çiqas jî bo kurmancî jî em nikaribin behsa standardîzebûneka li asteka gelek bilind bikin jî, kurmancî li gor zazakî zêdetir nêzî asta standard bûye. Lewma, wextê em dibêjin kurmancî yan jî zazakîya standard, mebesta me ew kurmancî û zazakî ye ku kêr zêde ji alîyê xwîner û nivîskarên wî zaravayî ve tê bikaranîn, heta astekê li ser wî hatîye lihevkirin.

Ji ber vê, em dê hin binyadên ku di devokên cuda da tên bikaranîn li ber çavan negirin. Bo nimûne em dê bêjin *hez kirin* wek tamamker (complement) *frêzeka daçekî* (prepositional phrase) werdigire. Lewma di risteya *Dîlan ji hevala xwe hez dikeyê* da *ji hevala xwe* wek frêzeka daçekî, tamamkera *hez kirinê* ye, lê li hin herêman ew dikare risteyeka tamamker jî wek tamamker werbigire. Bo nimûne di *min hez kir biçim wê derê* da *biçim wê derê* wek tamamkera *hez kirinê* kar dike. Lewma em van binyadên alternatîf di çarçoveya xebata xwe da wek nerêzimanî qebûl bikin jî, ew di rastîya zimanê herêmî da nerêzimanî ninin. Bi tenê ew li derveyî sînorên mercên rêzimanîtiyê (grammaticality) yên ku xebata me diyar dike, dimînin. Dema em sînorên rêzimanîtiyê berfireh bikin, ev binyadên alternatîf jî dê di xebata me da wek rêzimanî bên kodkirin. Bo nimûne dema em bêjin *hez kirin* wek alternatîf hem dikare frêzeka daçekî hem jî risteyeka tamamker werbigire, wê demê di çarçoveyên sînorên xebata me da *min hez kir biçim wê derê* jî dê wek rêzimanî bê kodkirin. Lê xebata me li ser formên alternatîf ên rêzimanî yên devokên cuda kar nake. Li gel vê, li ber berfirehkirina mercên rêzimanîtiyê jî hin sînor hene, lewma ji bo her cure binyada zimanî (yên nerêzimanî) mercên rêzimanîtiyê nabe ku bên berfirehkirin.

Di xebatê da metoda çawanî (qualitative), berawirdî û sêwirkerî (descriptive) tê bikaranîn. Pêşî binyada argumentî û binyada ROLî ya lêkeran, têkiliya lêker û REWŞan, hêza lêbarkirina REWŞê ya lêkeran û lêbarkirina REWŞê ya ji alîyê lêkeran ve hatîye vekolandin, piştî avahiyên ku lêker pêk tînin, ji bo kurmancî û zazakî bi dardiagram ve bi awayekî berawirdî hatine analîzkirin.

Ji bilî beşa *Destpêkê*, ev xebat ji çar beş û beşa *Encamê* pêk tê: *Beşa Yekem* û *Beşa Duyem*, ji bo pêşamadekarîyê hatine bicihkirin. Di *Beşa Yekem* da *RG* bi nihêrîneka giştî tê danasîn, bingeha fikrî ya *RGyê* tê pêşkêşkirin. Fikra *RGyê* di qonaxên cuda da bi hin navgînên cuda hatîye pêşkêşkirin ku her yek ji van qonaxan wek teorîyek bi navekî cuda hatîye nasîn. Li gel vê, fikra bingehîn a *RGyê* di her

qonaxê da heman e. Di *Beşa Yekem* da bi kurtasî ev teorîyên ku di prosesa dîrokî ya *RGyê* da derketine holê, ya dawîn ne tê da (ku wek Mînimālîzm (Minimalism) tê zanîn), tèn danasîn. Ji bo ku em bikaribin têbigihin ku *RG* di kîjan çarçoveyê da nêzî zimanî dibe, me giringî da bi bicihkirina *Beşa Yekem. Beşa Duyem* ji du binbeşan pêk tê: Di binbeşa yekem da *binyada frêzî* (phrase structure) ya kurmancî û ya zazakî, cureyên sereke yên *frêzan* (phrase) ên di kurmancî û zazakî da bi awayekî kurt hatine pêşkêşkirin. Di binbeşa duyem da sîstema rewşa rêzimanî ya di kurmancî û zazakî da hatiye danasîn. Rewşa rêzimanî ya di vê binbeşê da, ji alîyê morfolojîk ve hatiye pêşkêşkirin. Lê Teorîya REWŞê her çiqas morfolojîyê li derve nehêle jî, ew rewşên rêzimanî di çarçoveya sîntaksê da vedikole. Zanyarîyên ku di *Beşa Duyem* da hatine pêşkêşkirin dê di beşên din da derkevin pêşîya me. *Beşa Sêyem* û *Beşa Çarem* beşên bingehîn ên vekolîna vê xebatê ne. Di *Beşa Sêyem* da lêkerên kurmancî û yên zazakî li gor angaştên teorîya ROLê hatine vekolandin. Ev vekolîn bi armanca berawirdkirina wan hatiye kirin. Dema cudahî hatibin dîtin, ew hatine nîşankirin. Di *Beşa Çarem* da jî lêkerên kurmancî û yên zazakî di çarçoveya teorîya REWŞê da hatine vekolandin. Dîsa dema cudahî hatibin dîtin, ev cudahî hatine diyarkirin. Di *Encamê* da, kurteyeka kurt a xebatê cih digire û encamên ku ji nîqaşên di xebatê da derketine holê, bi awayekî kurtasî tèn diyarkirin.

D. KURTEYA LÎTERATURÊ

Hin alîyên vê xebatê têkildar in bi semantîkê, li gel vê xebat di bingehê da xebateka sîntaksê ye. Di lîteratura zimannasîya kurmancî û ya zazakî da hin xebatên ku hin alîyên sîntaksa kurmancî û ya zazakî bi awayekî sîstematîktir vekolandine hene (bo nimûne ji bo kurmancî bnr. Bynon, 2017; Haig, 1998, 2004, 2011; Gündoğdu, 2018, 2023; Yonat & Aslanoğlu, 2023, ji bo zazakî bnr. Gündoğdu û yd., 2020, Gündoğdu & Bulan, 2023; Kırkan, 2021b; Arslan, 2021, 2022). Bi qasî ku me dît, sîntaksa kurmancî û ya zazakî bi taybetî û bi piranî di çarçoveya ergatîvî (bo nimûne ji bo kurmancî bnr. Bynon, 2017; Haig, 1998; Yonat & Aslanoğlu, 2023, ji bo zazakî bnr. Arslan, 2016; Kırkan, 2021b) û îzafeyê (bo nimûne ji bo kurmancî bnr. Haig, 2011; Gündoğdu, 2023; ji bo zazakî bnr. Gündoğdu û yd., 2020; Arslan, 2022; Gündoğdu & Bulan, 2023) da bi hûrgilîtîr hatiye vekolandin. Her yek ji van xebatan giringîya xwe heye û hin alîyên sînaktîk ên kurmancî û zazakî ronî dikin. Xebata me, di nav Rêzimana Hilberîner (Generative Grammar) da di çarçoveya teorîya *BGyê* hatiye

amadekirin. Di lîteraturê heyî da binyada argumentî, binyada ROLê ya lêkerên kurmancî û yê zazakî, dîsa di çarçoveya kurmancî û zazakî da têkilîya ROL û REWŞê bi awayekî berawirdî nehatîye vekolandin. Bi gotineka din, em li rastî xebateka ku sîstema lêkeran a van zaravayan bi pêşbînîyên teorîya BGyê ve bi hûrgilî vedikole û berawird dike, nehatin.

Li gel vê, me sê heb xebat dîtin ku kurmancî ji hin alîyan ve di çarçoveya BGyê da nirxandine, lê ji bo zazakî em li rastî ti xebatekê nehatin. Xebatên ji bo kurmancî li ser devoka behdînî hatine çêkirin. Yek ji van xebatan di warê REWŞê da, ya din di warê ROLê da, ya din jî di warê *cihguherînê* (move) da ye.

Xebata di warê REWŞê da ji alîyê Viyan Îbrahîm Elî Îboyê ve bi navê *Dox di Zimanê Kurdî da (Govera Behdînî)* (2008) wek tezeke lîsansa bilind hatîye çêkirin. Ev xebat, *REWŞên [Dox] razber* (abstract Case), hejmara REWŞan, hêmanên ku REWŞan bar dîkin û dîsa têkilîya cihguherîn û REWŞê vedikole. Xebat, bi giştî sîstema REWŞê ya di kurmancî da li gor BGyê vebikole jî li ser ROLê jî radiweste. Em REWŞ û ROLê têkildarî hevûdî, lê di binbeşên cuda da analîz dîkin. Di navbera hin angaşt û analîzên vê xebatê û xebata me da cudahî hene ku em dê di xebatê da wan diyar bikin.

Xebata duyem, a Sanya Cebaz Ebûzeîdê ye ku bi navê *Cihgihorîna Kerestan di Ristê da (Govera Behdînî)* (2019) hatîye weşandin. Ev xebat, di çarçoveya BGyê da sîntaks û morfosîntaksa (morphosyntax) kurmancî bi cihguherînê ve vedikole. Ji vî alîyê ve xebateka berfireh e. Di xebata me da jî cihguherîn cih digire, lê di sînorên risteyê da û bi taybetî dema têkildar be bi REWŞê ve hatîye nîqaşkirin.

Xebata sêyem dîsa ya Viyan Îbrahîm Elîyê ye ku bi navê *Rolên Watayî yê Argumentên Karî (Di Govera Behdînî da)yê* (2021) wek gotarek hatîye weşandin. Ev gotar, hejmara argumentên lêkeran, ROLên biker û temamkerên lêkeran û taybetmendîyên lêbarkirina van ROLan vedikole. Dîsa di gotarê da tê vekolandin gelo ROL girêdayî ye bi kargînên/erkên rêzimanê, bi REWŞê yan jî bi cihê argumentê ve? Li gel vê, tê vekolandin ku kîjan cure lêker kîjan ROLan bar dîkin. Di encama xebatê da hatîye diyarkirin ku ROLên di devoka behdînîyê da, têkildar in bi wateya lêker (an jî pêveberê) û cihê argumentan ve. Di vê xebatê da lêkerên kurmancî li gor *binyada argumentî* (argument structure) di bin sê koman da hatine vekolandin: *Lêkerên yek-argumentî*, *lêkerên du-argumentî* û *lêkerên sê argumentî*.

Di xebatê da bêyî amajepêkirinê, *pêveberên kompleks* (complex predicates) (*PK*) di bin navê "lêker"an da hatine vekolandin. Di xebata me da, li gel ku pêveberên kompleks di bin serenava lêkeran da hatine bicihkirin, lê ew di binbeşeka serbixwe da hatine vekolandin. Lewra di xebata me da, em *PK*yan wek lêkerên sade nanirxînin û ji ber vê em *binyada argumentî* û *binyada ROLî* (ROLE structure) ya pêveberên kompleks, bi hin alîyên din ên zimanî ve têkildar dikin. Dîsa ji alîyê senifandina hin lêkeran a li gor ROLê ve di navbera vê xebatê û xebata me da hin cudahî hene.

Xebata Îlyas Arslanî ya bi navê *The valency and semantic roles in Zaza Language* (Valens û rolên semantîk di zimanê zazakî da) (2018) li ser rolên semantîk ên di zazakî da kar dike. Lê ev xebat di çarçoveya teorîya ROLê ya *BGyê* da nehatîye amadekirin. Li gel vê, di mijara ROLan da hin angaştên ku di vê xebatê da hatine pêşkêşkirin, hatine nîqaşkirin.

Xebata Gündoğdu (2011) û ya Atlamazî (2012) di çarçoveya Bernameya Mînimālîst da sîntaksa kurmancî vedikolin. Dîsa xebata Çelik Dinçerê (2021) avahîya îzafeyê ya di zazakî da di çarçoveya Bernameya Mînimālîst da vedikole. Bernameya Mînimālîst, yek ji teorîyên *RGyê* ye, lê Bernameya Mînimālîst ji ber ku li derveyî sînorên xebata me ye, nêzîkahîyên teorîk ên xebatên navborî di xebatê da nehatine nîqaşkirin.

E. KÊŞEYÊN XEBATÊ

Wekî me li jor jî nîşan da, di warê *BGyê* da xebatên ku li ser kurmancî û zazakî hatine çêkirin ji bo kurmancî gelek kêr, ji bo zazakî qet tune ne. Ev wek mezintirîn kêşe derket pêşîya me. Lewra ji bo xebata me danîna çarçoveyeka teorîk a ji bo kurmancî û zazakî giring bû. Kêmasîya xebatan a di lîteratura kurmancî û zazakî da, danîna çarçoveyeka teorîk zehmettir kir. Ji ber vê, me jî bi piranî ji xebatên ku bi zimanê îngilîzî hatine amadekirin (çi li ser zimanê îngilîzî bin, çi li ser zimanên din bin) sûd wergirt. Di vî warî da me ji çend heb xebatên bi tirkî jî, ku li ser zimanê tirkî hatine amadekirin, sûd wergirt. Dîsa ne di çarçoveya *BGyê* da bin jî, me hin xebatên ku li ser kurmancî hatine amadekirin, vekolandin da ku em bikaribin diyar bikin gelo boçûn û analîzên ku di van xebatan da hatine pêşkêşkirin, em dikarin ji bo xebata xwe bi kar bînin an na. Van nîqaşan kir ku hin beşên xebatê dirêjtir bin.

Dîsa ji ber kêmbûna lîteratura kurmancî ya di qada *BGyê* da, di xebata me da gelek têgeh li gel pênasayên wan hatin bicihkirin ku vê jî kir ku hin mijar dirêjtir bin. Ji alîyê din ve kêmbûna xebatên di lîteraturê da bi xwe ra kêşeya diyarkirina kurmancîya têgehan jî anî. Ji ber vê, hin têgeh me wek pêşnîyazek bi cih kirin. Ji bo diyarkirina hin têgehên din jî me ji kesên din alîkarî wergirt. Bi îhtimaleka mezin gelek têgehên têkildar bi mijarên tezê ve, dê ji bo gelek xwînerên kurmancîyê nû bin.

BEŞA YEKEM

RÊZIMANA GERDÛNÎ

Di vê beşê da em dê bi awayekî giştî û kurtasî li boçûna Rêzimana Gerdûnî, li argumentên wê yên bingehîn, li têgehên wê yên sereke û li qonaxên wê yên dîrokî binihêrin. Zanyariyên di vê beşê da dê nîşan bidin ku ji bo *RGyê* ziman çi ye, *RG* çawa nêzîkî zimanî dibe, çarçove û sînoren *RGyê* çi ne û di prosesa dîrokî da guherînên çawa di analîzên wê yên derbarê zimanî da çêbûne.

1.1. NIHÊRÎNEKA GIŞTÎ

Zimanên cuda, ji aliyê binyadî ve xwedî taybetmendiyên hevpar bin jî gelek taybetmendiyên ku wan ji hevûdin cuda dikin jî hene. Li gor Chomskyî (2014, r. 20, 30) cudahiyan ku di navbera zimanan da tên dîtin, li asta rûser (surface) in, lê hemû ziman ji aliyê heman sîstema bi navê *fakulteya zimanî* (language faculty) (wek *şîyane* (competence) jî tê zanîn) ve tên dabînkirin. Ji ber vê jî cudahiyan wan, gelek rûser in û di rastîyê da ew hema hema yek in. Chomsky (2019, r. 81) weha dibêje:

Zimanên dinyayê ji gelek alîyan ve ji hevûdin cuda xuya ne; lê viyaye hemû ji heman qalibê hatibin rijandin, taybetmendiyên wan ji aliyê prensîpên (principles) sabît (fixed) ên *rêzimana gerdûnî* ve hatibin diyarkirin. Eger ne weha be, kîjan dibe bila bibe, ne pêkan bû zarokek zimanekî mirovî hîn bûya.

Tiştê ku zimanan dabîn dike di hemû mirovan da hevpar e, bi heman awayî kar dike ku jêdera vî tiştî jî mêjî ye. Ji ber vê, *RG* hewl dide karkirina beşa mêjîyî ya ku zimanan dabîn dike, diyar bike. Bi vî awayî binyada bingehîn û ya rasteqîn a hemû zimanan dê diyar bibe. Lewma esas ne gelek ziman, bi tenê yek ziman heye; *zimanê mirovî* (human language). Lê li vê derê helbet *RG* nabêje zimanên ji hevûdin cuda tune ne. Zimanên ji hevûdin cuda (wekî kurdî, îngilîzî, tirkî û yd.) hene, lê sîstema ku van hemû zimanên cuda dabîn dike, heman sîstema bingehîn e û cudahiyan wan wekî li jor hat gotin li asta rûser in.

Rêzimana Gerdûnî, wek boçûneka zimannasîyê cara pêşîn di salên 1950î da ji aliyê Noam Chomskyî ve hatiye pêşkêşkirin. Di çarçoveya vê boçûnê da hin teorî hatine çekirin. Yekem teorî, ji aliyê Chomskyî ve hatibe pêşkêşkirin jî bi demê ra kesên din jî li ser vê boçûnê xebat çekirine û ji ber xebatên dîtir ên Chomskyî û peyrewên wî

teorîyên dîtir derketine holê. Di her teorîyê da nêzîkahî û navgînên cuda hatibin pêşkêşkirin jî, fikr û angaştê bingehîn a di paragrafa jorîn da neguherîye. Her yek ji van teorîyan hewl daye angaştê bingehîn a *RGyê* formule bike. Lewma "Rêzimana Gerdûnî" navê giştî yê boçûnê be jî (wek *Rêzimana Hilberîner* (Generative Grammar) jî tê zanîn) di qonaxên cuda da, bi armanca formulîzekirina vê boçûnê teorîyên ku hatine pêşkêşkirin bi navên cuda hatine nasîn. Ev nav weha ne:

Rêzimana Veguherîner (Transformational Grammar)

Rêzimana Veguherîner-Hilberîner (Transformational-Generative Grammar)

Teorîya Standard (Standard Theory)

Teorîya Standard a Berfirehkirî (Extended Standard Theory)

Teorîya Standard a Berfirehkirî ya Nûkirî (Revised Extended Standard Theory)

Teorîya Birêvebirin û Girêdanê (Government and Binding Theory)

Teorîya Prensîp û Parametreyan (Principles and Parameters Theory) (*P&P*)
(ev navekî din ê *BGyê* ye)

Mînimālîzm (Minimalism)

Eger jêdera hemû zimanan yek be, li gel ku di navbera wan da cudahî tên dîtîn, divê hevparîyên wan zêdetir û bingehintir bin. *RG*, amaje bi van hevparîyên zimanan dike. Chomsky (2001, r. 187) *RGyê*, wek xebata vekolîna şert û mercên ku rêzimanên hemû zimanên mirovî divê bi cih bînin, şirove dike. Li vê derê şert û mercên ku Chomsky amaje pê dike em dikarin wek rêzikên (rule) (an jî prensîp) zimanî yên hevpar binirxînin ku di rêzimana her zimanekî da hene.

Wekî me got li gor *RGyê* jêdera zimanan mêtî ye. Chomsky (2019, r. 49) diyar dike ku mêtîyê mirovan ji *parçeyên* (component) cuda pêk tê ku ev parçe di nav hevkarîgerîyê da ne. Yek ji van parçeyan fakulteya zimanî ye. Chomsky *RGyê* wek karakterîzasyona vê fakulteyê qebûl dike. Fakulteya zimanî beşeka zikmakî (innate) ya mêtîyê mirovan e û wek *amûra wergirtina zimanî* (language acquisition device) kar dike. Bi gotineka din di wergirtina zimanî da ev amûr kar dike (bnr. 1986, r. 3). Ev taybetmendîyên hevpar ji ber ku genetîkî (genetically) ne, neguher in. Chomsky (2013, r. 36) vê rewşê bi nimûneyekê rave dike û weha dibêje:

...çawa ku eger em taybetmendîyên neguher ên wîçîna cureyeka çivîkan keşf bikin em dê maqûl bibînin ku ew ji alîyê genetîkî ve hatîye diyarkirin, bi heman awayî, hîpotezeka (ne rast be jî) ku angaşt bike taybetmendîyên neguher ên zimanê mirovî di rastîyê da taybetmendîyên mêjîyî nîşan didin, dê her carê maqûl be.

Eger bala me kişandibe amûra ku zimanî pêkan dike wek "amûr" a wergirtina zimanî, lê ne wek amûra *hînbûna* (learn) zimanî hatîye binavkirin. Lewra Chomsky (2014, r. 20) dibêje wergirtina zimanî ji hînbûnê wêdetir proseseka "bipêşketin"ê ye; ji ber vê jî bikaranîna têgeha hînbûnê xapîner e. Ji ber vê ye ku Chomsky (1980, r. 234) nabêje *hînbûna zimanî* lê dibêje *mezinbûna zimanî* (growth of language). *Zimanî* (anku fakulteya zimanî), Chomsky (2025, r. 25, 28) wek *organekî zimanî* (language organ) jî diwesfîne û dibêje ew bînsîstemeka binyadeka komplekstir e. Lewma jî dibêje wergirtina zimanî dişibe mezinbûna organan; zarok ji bo ku zimanekî werbigire tiştekî nake, ew tê serê wî/wê. Bi heman sedemê Chomsky (2021, rr. 70-71) weha dibêje:

...rêzimana gerdûnî taybetmendîyên neguher û yên ku meriv hîn nabe dihewîne. Em wan dizanin; lê em wan hîn nabin... Rêzimana gerdûnî... bi tenê ji bo wergirtina zimanî pêşmerc (precondition) e û sîstemeka prensîp û binyadan e ku her ziman bi awayekî mecbûrî rîayetî wê dike.

Di vê mijarê da Carnie jî dibêje çawa ku mirov meşê/meşînê hîn nabin û zarok xweber dimeşin, bi heman awayî mirov zimanî jî hîn nabin. Ew jî wekî meşînê, bi awayekî hundirîn di mirovan da jixwe heye (bnr. 2013, r. 19). Di vî warî da, *azmûngerîya zimanî* (linguistic experience), ji bo zarokek bikaribe bi axivê pêwîst e. Dema zarok risteyan dibihîze, organê zimanî yê wî/wê jî dest bi kar dike, anku ji bo zarokî/ê, mezinbûna zimanî dest pê dike. Helbet li vir mebest ji mezinbûnê, dibe ku ne mezinbûneka fîzîkî be, mebest jê gihîştina asta karkirinê, kamilbûna wê ye. Chomsky (2019, r. 197) vê rewşê weha rave dike:

Prosesên ku ji alîyê genetîkî ve hatine diyarkirin, ji bo ku bi awayê ku hatine bernamêkirin bi pêş bikevin, pêdivî bi têra xwe handerên (stimulus) derûdorî yên dewlemend hene.

Têgeha ku ji bo vê tê bikaranîn "destpêker" (trigger) e. Ev tê vê wateyê: Azmûngerî diyar nake mêjî dê çawa kar bike; lê wê dide destpêkirin, bi giştî dabîn dike ku ew bi awayê ku ji berê da hatîye

plansazîkirin kar bike. Ev piçek dişibe otomobîlê. Dema hûn bi kilîdî kontakê bigerînin (ba bidin), wekî otomobîlekê diçe, ne wekî balafirekê. Lewra wek otomobîlek hatiye çêkirin û bernamêkirin. Lê eger hûn kilîdî negerînin, hîç tiştek dê neqewime.

Hebûna fakulteya zimanî piştî xwe dide hin argumentan ku li jêr em dê bi kurtasî li hin ji van argumentan binihêrin, lê berîya wê em dê bi kurtasî li ser têgeha *zimanî* ya di *RGyê* da rawestin.

Di warê zimannasîya Chomskyî da du cure ziman hene. Yek ji wan, tîpa wî ya destpêkê bi awayê *ziman* hûrdek tê nivîsandin û ev *ziman*, amaje bi zimanên şênber ên wek kurdî, îngilîzî, tirkî û yd. dike; yê din tîpa wî ya destpêkê bi awayê *Ziman* girdek tê nivîsandin û beşeka mêtîyî pêk tîne û amaje bi behreya (ability) mirovan a ji bo axivtina zimanan dike. Lewma *ziman*, şênberbûna vê behreyê ye (bnr. Carnie, 2013, r. 5). Ji van *ziman*, wek *zimanê derveyîn* (d-*ziman*) (externalized language (e-language)), *Ziman* jî wek *zimanê hundirîn* (h-*ziman*) (internalized language (i-language)) jî tê zanîn. Cook û Newson (2007, r. 194) cudahîya van her du zimanan weha rave dikin: "Tiştê ku axiverên sirûştî dizanin û tiştê ku zarok hîn dibin h-*ziman* e. Tiştê ku zarok ji derûdora xwe dibihîzîn jî risteyên d-*zimanî* ne". Nexwe em dikarin bêjin ji ber ku ji van *Ziman* di mêtî da cih digire, *RG* li ser *Zimanî* kar dike û armanca wê diyarkirina taybetmendî û karkirina *Zimanî* ye. Lê ji bo ku bikaribe vî karî bike, gelek çaran serî li daneyên *zimanî* dide.

1.1.1. Argumentên ji bo Rêzimana Gerdûnî

Wekî me li jor dît, li gor *RGyê* bingeheka bîyolojîk a *zimanî* heye. Dîsa ji bo Chomskyî (1957, r. 13) *ziman*, komeka risteyan e ku hejmara risteyên *zimanên* mirovî bêsînor (infinitely) e. Eger wekî Chomsky dibêje hejmara risteyan bêsînor be, nexwe kesên ku zimanekî dizanin, nayê wê wateyê ku ew hemû risteyên mimkin ên wî *zimanî* di mêtîyê xwe da dihevin. Lewra em dikarin bi hêsanî bêjin risteyên ku axiverekî/a zimanekî bihîstine, ji aliyê hejmarê ve ji risteyên ku nebihîstine gelek kêmtir in. Jixwe ji aliyê hejmarê ve bêsînorîya risteyan jî vê piştrast dike. Lewra wekî Chomsky diyar dike mêtî bisînor e, lê hejmara derbirînên/îfadeyên ku her kesek bi kar tîne û fêhm dike bêsînor e (2014, r. 25). Li gel vê, her axiverê/a zimanekî bêtî ti astengîyan dikare risteyên ku berê qet çênakirine bêtî û risteyên ku berê qet nebihîstine, fêhm bike. Ji vir em dikarin bigihêjin vê: sîstemek heye ku çêkirin û fêmkirina van risteyan pêkan dike.

Lê em nikarin bêjin çêkirin û fêmkirina van risteyan piştî xwe dide azmûngerîyên zimanî yên ku axiver berê azmûn kirine. Lewra îhtimal heye ku cureyeka risteyan, axiverî/ê berê qet nebihîstibe, lê dîsa jî ew dikare wê çêbike yan jî dema bibihîze wê fêm bike. Vê, em dikarin wek nîşana hebûna sîstemeka zikmakî binirxînin ku ev sîstem, bêyî azmûngerîyê dikare çêkirin û fêmkirina risteyan pêkan bike.

Yek ji taybetmendîyên bîyolojîk ên zimanî ku di *RGyê* da derdikeve pêş *bêsînoriya ciyawaz* (discrete infinity) e. Di vê mijarê da Chomsky dibêje hin taybetmenîyên bingeîn ên zimanî di nav sîstemên bîyolojîk da bêhemta (unusual) ne, bi taybetî jî taybetmendîya *bêsînoriya ciyawaz* (2015, r. 154). Eger em rave bikin, *ciwayaza* di têgeha *bêsînoriya ciyawaz* da amaje bi yekeyên ciyawaz ên zimanî (wekî tîp, bêje û yd.) û *bêsînori* jî amaje bi bêhejmarîya risteyan dike. Bi vî awayî taybetmendîya *bêsînoriya ciyawaz* amaje bi wê dike ku di zimanan da bi hin hêmanên ku hejmara wan bisînor e (wekî tîp, bêje), bi awayekî bêdawî riste tên çêkirin.

Argumenteka din wek *argumenta kêmbûna handerê* (poverty-of-the-stimulus argument) tê zanîn. Li gor vê argumentê, zanyarîyên (knowledge) me yên zimanî tevlihev û razber in. Azmûngerîya zimanî kêm e, bo nimûne Chomsky (2010, r. 122) dibêje zarok ji bo ku zimanekî werbigirin xwedî daneyên zêde ninin, heta ev dane gelek bisînor in. Di heman çarçoveyê da Cook û Newson (2007, r. 56) diyar dikin ku daneyên ku di handerê da cih digirin, ji bo piştrastkirina zanyarîyên ku mêjî ji wan derdixe, kêmtir in. Lewra li gor Chomskyî zarok bi piranî *bendikên* (string)³ risteyên biqisûr û ji hev qutbûyî dibihîzin. Li gel vê, di demeka gelekî kurt da zanyarîyên gelek kompleks, ku pêkan nine ji van daneyên ku dibihîze bîr derxistin, bi dest dixin û di hundirîsazîkirin (internalization) û çêkirina rêzimana zimanê xwe da bi ser dikevin. Lewma ev zanyarîya hundirîsazkirî divê di qadeka gelek teng da cih bigire ku ji alîyê hin taybetmendîyên diyar ên bîyolojîk ve hatibe bisînorkirin (2002, r. 66). Bi kurtasî em dikarin bêjin ev argument angaşt dike ku zarokekî/a ku zimanî werdigire, piştî demekê dikare risteyên ku berê qet nebihîstine jî çêbike, ku ev zanyarîyên ku di van risteyan da kar dikin, ne mimkin e rasterast ji risteyên ku ji berê da bihîstine, bîr derxistin. Ji ber vê jî sîstemek divê hebe ku bikaribe van zanyarîyan dabîn bike, ku ev

³ Her derbirîneka zimanî bendikek e ku ji pêkhênên (constituent) derbirînê pêk tê. Bo nimûne *Dîlan+pirtûkê+dixwîne* bendikek e.

jî zanyarîyên RGYê ne. Ev zanyarî jî di mêjîyê her mirovî da zikmakî ne. Em li risteya jêrîn binihêrin:

(1) *Mamosteyê ji xwendekara xwe ra got dema tu çûyî malê, ji dayika xwe ra bêje pirtûka ku min îro navê wê ji te ra got, bila ji bo te bikire.*

Zarok dema dest bi wergirtina zimanî dikin risteyên kompleks ên bi vî rengî hilnaberînin, bi piranî risteyên hêsan û sade hildiberînin an jî risteyên ku ji derûdora xwe dibihîzin bi piranî ev qas ne kompleks in. Li gel vê, piştî demekê ew dikarin van cure risteyan hilberînin û fêm bikin. Angaşt *argumenta kêmûna handerê* ew e ku zarok, zanyarîyên ku di çekirina van cure risteyên (1)ê da tînin bikaranîn, nikare ji daneyên zimanî yê ku ji derûdora xwe dibihîze, rasterast bi dest bixe. Lewma tiştê ku dihêle zarok van cure risteyan hilberîne û fêm bike sîstema RGYê ye.

Argumenteka din wek *delîla neyînî* (negative evidence) tê zanîn. Li gor vê, binyadên nerêzimanî (ungrammatical structure), bêtî ku zarok wan bibihîzin an jî yek ji wan ra bêje, "ev cure binyad nerêzimanî ne", jixweber van binyadên nerêzimanî dikarin nas bikin (bnr. Haegeman & Guéron, 1999, r. 584). Bo nimûne her axiverê/a kurmancî dizane ku ji bo risteya *Dîlan pirtûkê dixwîneyê* eger bixwaze dikare bikerê (*Dîlan*) bi kar neyîne û binyada rêzimanî ya *Pirtûkê dixwîneyê* hilberîne. Li vir zanyarîya ku heye ev e: "Di kurmancî da, di hin rewşan da biker dibe ku bi awayekî aşkere (overt) neyê bikaranîn", lê niha em li binyadên jêrîn binihêrin:

(2) a. *Dîlanê pirtûk xwend*

b. **Pirtûk xwend*

(2a), rêzimanî ye. Eger zarokekî/a ku kurmancî werdigire zanyarîya ji bo risteya *Dîlan pirtûkê dixwîneyê*, anku zanyarîya "biker dibe ku bi awayekî aşkere neyê bikaranîn"ê, ji bo (2a)yê jî bi kar bîne, wê demê binyada nerêzimanî ya (2b)yê dê çêke ku zarok bi giştî vê şaşitîyê nakin. Bikin jî bi demê ra ev şaşitî bêtî ku ti kes şaşitîyên wan sererast bikin, kêmtir dibin û di encamê da şaşitîyên bi vî rengî êdî nakin. Nexwe sîstemek heye ku binyadên wekî (2b)yê wek nerêzimanî kod dike û nahêle zarok van risteyan hilberîne û dema wan bibihîze jî heman sîstem bi zarokî/ê (an jî bi axiverên kurmancî) dide zanîn ku ev binyad nerêzimanî ye. Wek nerêzimanî kodkirina vê binyadê, ji ber ku ji azmûngerîya zimanî nabe ku bê derxistin, nexwe sîstema ku vî karî pêk tîne, bi awayekî hundirîn dikare vî karî bike.

Argumenteka din jî wek *argumenta tîpolojîk* (typological argument) tê binavkirin. Wekî me li jor got, angaşt *RGyê* ew e ku di hemû zimanên mirovî da hevparîyên bingeîn hene. Carnie (2013, r. 26) dibêje bo nimûne hemû ziman xwedî biker û berkarê ne. Ev cure taybetmendîyên hevpar wek *gerdûnîyên Zimanî* (universals of Language) tên binavkirin. Carnie li heman derê diyar dike ku ev cure gerdûnîyên Zimanî hene, lewra hemû axiverên zimanên mirovî, ji bo çêkirina rêzimanên zimanên xwe heman materyalên zikmakî bi kar tînin. Tiştê ku Carnie li vir dibêje ev e: Eger di zimanan da hevparîyên bingeîn hebin, ev hevparî ji aliyê heman sîstemê ve tên hilberîn. Bi gotineka din ji ber ku sîstema ku di serê her mirovî da heye heman sîstem e, lewma rêzimanên ku ev sîstem çêdike, xwedî gerdûnîyên Zimanî ne. Heke ne wesa bûya bo nimûne di hin zimanan da mimkin bû ku biker an jî berkar tunebûya, lê bi qasî ku tê zanîn her ziman bi formên cuda be jî xwedî van hêmanan e.

1.1.2. Têgeha Rêzimanê di Rêzimana Gerdûnî da


Wekî ji agahîyên jorîn jî diyar dibe di *RGyê* da têgeha *rêzimanê*, bi wateya wê ya di rêzimana nerîtî da nayê bikaranîn. Lewma em dê niha li ser vê têgehê rawestin û bibînin ku di *RGyê* da ev têgeh çi îfade dike.

Li jor me behsa zanyariya zimanî kir. Ji bo *RGyê* rêziman, zanyariya zimanî ya di mêjîyê mirovan da rave dike (Cook & Newson, 2007, r. 7). Bi gotineka din zanyariya axiverekî/ê ya derheqê zimanekî da wek *rêziman* tê temsîlkirin (represented) (Haegeman & Guéron, 1999, r. 582). Nexwe li vir du cure rêziman hene: Rêzimana Gerdûnî û *rêzimana taybet* (particular grammar). Wekî hat dîtin rêzimana gerdûnî jixwe di mêjî da bi awayekî zikmakî heye. Rêzimanên taybet, wekî rêzimana kurdî, rêzimana îngilîzî û yd. in ku zanyariya van rêzimanên taybet, di çarçoveya zanyariyên *RGyê* da tê çêkirin. Lewma eger rêziman, a kurmancî be, dema em dibêjin rêzimana kurmancî mebest jê ew zanyarî ne ku çêkirin û fêmkirina risteyên kurmancî dabîn dikin. Dema em behsa Rêzimana Gerdûnî dikin, wê demê mebest jê ew zanyarî ne ku di çêkirina her rêzimana taybet da kar dikin. Bo nimûne wekî li jor jî hat nîşandan ji bo risteya *Dilan pirtûkê dixwîneyê* her axiverê/a kurmancî dizane ku eger bixwaze dikare bikerê bi awayekî aşkere bi kar neyîne. Ev taybetmendî bi tenê ji bo vê risteyê derbasdar nine, ji bo risteyên têper wextê ku dema risteyê ne-borî be yek dikare di kurmancî da bikerê bixe. Ev, wek zanyariyeka taybet a ji bo kurmancî di serê her axiverê/a kurmancî da heye, lê tiştê ku vê zanyariyê dabîn dike û derdixe asta

bikaranînê, *RG* ye. *RG*, vê zanyarîyê ji daneyên zimanî yê ku zarok dibihîze, anku bikaranînên zimanî yê di jiyana rasteqîn da, bi likarxistina sîstema xwe ve derdixe û dike beşeka rêzimana kurmancî.

Her yek ji *RG* û rêzimana taybet, *rewşeka wê beşa mêtîyî* ye ku zimanî pêkna dike. Chomsky (1980, r. 234) dibêje Rêzimana Gerdûnî sîstemeka genetîk e ku xwedî *rewşeka destpêkê* (initial state) ye. Bi azmûngerîya zimanî ve rewşa destpêkê ya *RGyê* bi awayê ku bikaribe rêzimanên taybet temsîl bike, tê sabîtîkirin. Anku rewşa destpêkê vediguhere *rewşeka sabît* (steady state). Chomsky (2010, r. 87) teorîya rewşa destpêkê ya fakulteya zimanî wek *Rêzimana Gerdûnî*, teorîya rewşa wê ya sabîtbûyî wek *rêzimana taybet*, her yek ji rewşan bixwe jî wek "zimanên hundirîn" (h-ziman), bi kurtasî wek "ziman" (wekî kurdî, îngilîzî, tirkî û yd.) bi nav dike. Cook û Newson (2007, r. 49) têkiliya *RG* û h-zimanê weha nîşan didin:

(3)




Ji bo şênberkirina mijarê, em bêjin bila zarokek ji dê û bavekî kurdên kurmanc hatibe dinyayê. Ev zarok wek nijad kurd be jî potansîyela wî/wê ya hînbûna her zimanî heye (ev di heman demê da nîşan dide ku *ziman* (bi tîpa piçûk) jî berê da di mêtî da cih nagirin). Tiştê ku vê potansîyelê dabîn dike, Rêzimana Gerdûnî ye. *RG* di destpêkê da jî alîyê daneyên zimanî ve hêj xav e. Bila vê rewşa xav *G* temsîl bike. Rêzimana Gerdûnî, teorîya *Gyê* ye. Ev zarok dema tê salên wergirtina zimanî, eger ji derûdora xwe risteyên kurmancî bibihîze, li ser van daneyên zimanî di sîstema Rêzimana Gerdûnî da (yan jî em bêjin amûra wergirtina zimanî) kar tê kirin û ev riste tînan analîzkirin. Dema amûra wergirtina zimanî bi tîra xwe li ser daneyên zimanî kar dike rewşa Rêzimana Gerdûnî ya destpêkê (*G*) *rewşeka* taybet werdigire. Di nimûneya me da ev rewş, ew rewş e ku li gor zanyarîyên risteyên rêzimanî yê kurmancî tê çekirin. Ev rewşa ku hatîye sabîtîkirin ji bo kurmancî wek *rêzimana kurmancî* tê kodîkirin. Em bêjin bila vê rewşê jî *K* temsîl bike. *K*, h-ziman e, teorîya *Kyê* jî rêzimana kurmancî ye. Niha êdî ev zarok di serê xwe da xwedî rewşa (an jî sîstem) *Kyê* ye. Anku ev zarok

xwedî rêzimana kurmancî ye. Lewma jî dikare bi kurmancî biaxive û wê fêm bike. Wek encam, rewşa Rêzimana Gerdûnî ji rewşa Gyê bû rewşa Kyê. Lê helbet ev nayê wê wateyê ku Kyê, *G* guherand. *G* dîsa li kar e, bi tenê rewşa aktîf a ku li ser Gyê kar dike *K* ye. Lewma jî em dibêjin li ser Gyê, *K* hat sabîtkirin. Heke na, eger Kyê bi temamî cihê Gyê bigirta û ew biguheranda wê demê mirov nikarîbûn ji bilî zimanekî, zimanekî din hîn bibûna, lê çawa ku tê zanîn mirovên pirzimanî gelek in. Li vir a giring ew e ku sîstema Kyê li gor sîstema Gyê kar dike. Nabe ku *K* sîstema Gyê bin pê bike. Esas ev encameka sirûştî ye jî. Lewra jixwe *K* li gor Gyê tê diyarkirin. Ji ber vê jî *G* Rêzimana Gerdûnî, *K* jî wek rêzimaneka taybet, rêzimana kurmancî ye.

Vê sîstemê em dikarin bi nîşandana Haegeman û Guéronê (1999, r. 584) ve bi awayê şematîk jî nîşan bidin:

(4)



Ji aliyê din ve, bi piranî, di lîteratura teorîyê da tê gotin riste tên *hilberîn* (generate). Têgeha *hilberînê* di teorîyê da cihekî giring werdigire. Di çarçoveya *RGyê* da her rêzimana zimanekî, *rêzimaneka hilberîner* e. Ji bo Chomskyî (1965, r. 8; 2001, r. 156) rêzimaneka hilberîner, sîstemeka rêzikan e ku deng û wateyê têkildar dike û ji bo risteyan, *şayesên binyadî* (structural description) hildiberîne. Her şayesa binyadî hêmaneka razber e ku "dengekî diyar" (particular sound), "wateyeka diyar" (particular meaning) û her cure taybetmendiyên teşeyî (formal) û têkilîyên hîyerarşîk ên pêkhênan (constituent) ku deng û wateyê têkildar dikin, diyar dike. Mijarê em dikarin bi nimûneya jêrîn zelaltir bikin:

(5) *Hûn dibêjin em biçin!*

Ev binyad di kurmancî da rêzimanî ye û du heb ji xwendinên wê yên pêkan weha ne:

(6) a. *Hûn dibêjin **hûn** (bixwe dê) biçin.*

b. *Hûn dibêjin bila ne **hûn** lê **em** biçin.*

Dema axiverek risteya (5)an hildiberîne, ji alîyê wateyî ve mebesta wî/wê ji (6)an kîjan be, rêziman divê bi awayê ku bikaribe vê wateyê nîşan bide, şayesên binyadî hilberîne. Heke na, di risteyê da dê xumamîyek çêbe. Rêziman, bo nimûne dikare bi îndeksê (index) ve van her du wateyan ji alîyê binyadî ve bi awayê jêrîn nîşan bide:

(7) a. *Hûn_i dibêjin em_i biçin!* (wateya di (6a)yê da)

b. *Hûn_i dibêjin em_j biçin!* (wateya di (6b)yê da)

Di (7a)yê da *hûn* û *em* hevîndeks (coindex) $[i,i]$ in ku ev tê wê wateyê ku *em* amaje bi *hûnê* dike, lewma jî *em* û *hûn* heman kes in. Di (7b)yê *hûn* û *em* bi îndeksên cuda $[i,j]$ hatine îndekskirin ku ev jî nîşan dide *em*, cuda ji *hûnê* amaje bi kesên din dike.

Bi vî awayî têgeha *hilberînê* amaje bi ravekirina binyadî ya bi awayekî aşkere û zelal a risteyê dike ku form û wateya wê têkildar dike. Chomsky (1986, r. 3) dibêje *hilberîn* ji *aşkereyê* (explicit) wêdetir tiştek nîne. Ji ber vê, ew (Chomsky, 2015, r. 148) dibêje rêzimaneka hilberîner, *rezimaneka aşkere* (explicit grammar) ye. Chomsky (bnr. 2001, r. 187) bi têgeha *hilberîn/rêzimana hilberînerê* ve dixwaze rêzimana ku ew pêşkêş dike, ji rêzimanên din ên wekî bi armanca perwerdehiyê hatine amadekirin, veqetîne.

Nexwe dema em dibêjin rêziman risteyan hildiberîne mebest jê ew e ku rêziman rave dike ku forma risteyan ji alîyê binyadî ve çawa pêk hatîye, bi gotineka din rêziman diyar dike ku pêkhênên risteyan, riste çawa pêk anîne (Radford, 1988, r. 123) ku bi vî awayî diyar dibe wateya di risteyê da çawa saz bûye. Wekî hat gotin, şayesên binyadî divê derheqê deng û têkilîyên pêkhênên risteyê da raveyan di xwe da bihewînin. Nexwe her şayesa binyadî bi awayekî razber deng, wate û sîntaksa risteya têkildar temsîl (representation) dike.

1.1.3. Sînorên Karkirina Rêzimana Gerdûnî

Wekî her teorîyeka zimannasîyê, sînorên karkirina zimannasîya *RGyê* jî diyar in û di çarçoveya van sînoran da ew li bersiva hin pirsan digere. Li gor Chomskyî teorîya zimannasîyê li ser axiver-guhdarê/a îdeal kar dike. Ev axiver-guhdarê/a îdeal ew kes e ku zimanê xwe bêyî kêmasî dizane û dema ku zanyarîya xwe ya derheqê zimanî da bi kar tîne, ti şaşitî û kêmasîyên rêzimanî yên wî/wê çênabin. Bo nimûne kêmasîyên hafizayî, nebûna li ser hişê xwe, bêbaldarî û şaşitî (yên tesadufî yan jî yên diyar) ku

têkilîya wan bi rêzimanê ve tune ye, di axiver-guhdarê/a îdeal da nayên dîtin (1965, r. 3). Nexwe em dikarin bêjin axiver-guhdarê/a îdeal derheqê sîstem û binyada zimanê xwe da xwedî zanyariyên bêkêmasî ye û dîsa dema ku van zanyariyên xwe bi kar tîne, ku encama van bilêvkirin, çêkirin an jî fêmkirina risteyên zimanî ye, her cure bikaranîna wî/wê ya zimanî bêyî kêmasî pêk tê. Van her du aliyên zanyariyên axiver-guhdarê îdeal, Chomsky (1965, r. 4) bi rêzê bi têgehên *şîyane* (competence) û *performansê* (performance) rave dike. Şîyane zanyariya axiver-guhdarî/ê ye derheqê zimanê xwe da û performans jî bikaranîna zimanî ye di rewşên şênber da. Lewma jî performans, nîşaneka şîyaneyê ye di axiver-guhdarê/a îdeal da. Lê wekî Uzun (2000, r. 4) dibêje, sirûştî ye ku axiverêkî/a îdeal tune be, ji ber vê jî ew wek îdeal tê binavkirin. Lewra bi gotina Chomskyî (1965, r. 4), dema axivtinek bê çavdêrîkirin dê bê dîtin ku di destpêkê da hin şaşîti tên kirin, ji aliyê rêzikên rêzimanî ve şikestinek çêdibe, di nav axivtinê da guhertin tên çêkirin û yd. Ji ber vê, Uzun (2000, r. 5) dibêje hemû axiverên zimanekî di kesekî/a îdeal da tên temsîlkirin. Ji vî aliyê ve eger risteyek bi qasî ku kes nikaribe li wê îtiraz bike rast be, malê zimanî be û bi awayekî zelal bê fêmkirin, wê demê ev tê wê wateyê ku ev riste axiverê/a îdeal çêkiriye.

Ji ber ku di jiyana rasteqîn da axiver-guhdarekî/a îdeal tune ye û ji ber ku di axivtineka rasteqîn da hin şaşîti tên kirin, nexwe performans nîşaneka şîyaneyê be jî ev ne nîşaneka rasterast e. Ji ber vê, Chomsky dibêje hem ji bo zimannasekî/ê hem jî ji bo zarokekî/a ku zimanî hîn dibe mesele, ji daneyên performansê derxistina rêzikên sîstemê ye ku axiver-guhdar wan di performansê xwe ya rasteqîn da bi kar tîne. Ji vî aliyê ve teorîya zimanî zihnî (mentalistic) ye. Lewra ew hewl dide rastîya zihnî ya ku di binê liv û tegveran da cih digire, keşf bike (1965, r. 4). Bi vî awayî diyar dibe ku zimannasîya di *RGyê* da di bingeha xwe da formulekirina karkirina beşeka mêjîyî ye; beşeka ku wergirtina zimanî dabîn dike.

Me li jor got şîyane zanyariyên axiver-guhdarî/ê ne derheqê zimanê xwe da. Ev zanyarî, derheqê wan hemû aliyên zimanî da ne ku ji bo diyarkirina rêzimanîtiya risteyekê hewce ne. Lewma şîyane hem têkildar e bi sîntaks, semantîk (semantic) û fonolojîyê (phonology), ku bi vî rengî risteyên rêzimanî û nerêzimanî dikare ji hevûdin veqetîne û hem jî têkildar e bi nasîna têkilîyên hêmanên risteyekê ve (Uzun, 2000, rr. 7-8). Bo nimûne zanyariyên ku dikin ku em binyada rêzimanî ya *Dîlan pirtûkê dixwîneyê* ji binyada nerêzimanî ya **Dîlan pirtûkê dixwînimê* veqetînin û em bizanin

binyada pêşîn dixwaze çî bêje yan jî em bizanibin risteyê li gor fonetîka kurmancî bi lêv bikin, têkildar in bi şîyaneya me ya zimanî ve. Ligel vê, di binyada **Dîlanê av şikestê* da zanyariyên me yên ku dikin ku em bizanibin bêjeya *avê* nabe ku wek berkara lêkera *şikestinê* bê bikaranîn, dîsa heman zanyariyên me yên şîyaneyê ne ku têkildar in bi semantîkê ve. Ji aliyê din ve bo nimûne, ne bi awayekî formal be jî zanyariyên me yên ku dikin ku em bizanibin *Dîlan* biker e, têkildar in bi zanyariyên şîyaneyê yên derheqê têkilîyên hêmanên risteyê da.

Dema em agahîyên jorîn binirxînin diyar dibe ku zimannasîya di *RGyê* da ji zimannasîya nerîtî gelek cuda ye. Zimannasîya nerîtî (yan jî em dikarin bêjin xebatên rêzimanê yên nerîtî) li ser risteyên li ber dest ên zimanekî kar dike. Lê zimannasîya di *BGyê* da dikeve dûv jêdera van risteyan ku ev jêder jî mêtî ye. Ji ber vê ye ku Chomsky (1986, r. 27) dibêje zimannasî, beşeka psîkolojîyê, dawîya dawîn jî beşeka bîyolojîyê ye. Wek encam, armanca bingehîn a *RGyê* em dikarin bi hevokên Chomskyî (2002, r. 66) bixwe bînin zimên: "divê bê ravekirin ku mirovekî/a ku xwedî daneyên gelek bîsînor e, çawa dikare sistemeka zimanî ya gelek dewlemend a bêhempa bi pêş ve bixe". Ji bo vê jî li gor wî (Chomsky, 2025, r. 107) karê zimannasekî/ê ew e ku diyar bike ka kîjan zanyarî dikin ku zarok zimanekî werbigire û ji prosesa zêdebûna van zanyariyan kîjan taybetmendîyên zikmakî yên mêtîyî berpirsyar in.

1.1.4. Qonaxên Rêzimana Gerdûnî

Li jêr em dê li ser danasîna teorîyên *RGyê* yên li gor qonaxan rawestînin. Lê em dê *Mînimālîzma* ku bi giştî wek teorîya dawîn a boçûna *RGyê* tê zanîn, nedin nasîn. Lewra vekolîna xebata me dê di çarçoveya *Teorîya Birêvebirin û Girêdanê* bê çekirin ku *Mînimālîzm* piştî *BGyê* hatîye pêşkêşkirin. Em dê bi kurtasî behsa *Rêzimana Veguherîner-Hilberîner, Teorîya Standard, Teorîya Standard a Berfirehkirî û Teorîya Birevebirin û Girêdanê* bikin.

Berhema sereke ya *Rêzimana Veguherîner-Hilberînerê (RVH)* wek berhema *Syntactic Structures* (Binyadên Sîntaktîk) (1957) tê qebûlkirin. Di xebata *Binyadên Sîntaktîkê* da Chomsky (1957, r. 5) armanca xwe wek “çekirina teorîyeka giştî ya formulîzekirî ya zimannasîya binyadî (a formalized general theory of linguistic structure) û diyarkirina bingehên teorîyeka weha” rave dike. *RVH* li ser sîntaksê hatîye avakirin. Di *Binyadên Sîntaktîkê* da bi awayekî giştî semantîk li derve hatîye hiştin,

fonemîk (phonemic) û *morfolojî* (morphology) jî di ravekirinên wî da cihekî piçûk werdigirin.

Di qonaxa *RVHyê* da Chomsky, rêzimanê wek komeka *rêzikan* (rule) qebûl dike. Hejmara van rêzikan bisînor e, lê ev rêzikên hejmara wan bisînor, risteyên ku hejmara wan bêsînor e hildiberînin (Koutsoudas, 1966, r. 1). Rêzikên rêzimanê di hilberîn û diyarkirina binyada risteyan da kar dikin. Rêzimana ku ji van rêzikan pêk tê wek makîneyekê risteyan hildiberîne, li gel vê nahêle binyadên nerêzimanî bên hilberîn. Ev rêzik, di bin sê beşan da hatine komkirin û her yek ji van beşan parçeyekî rêzimanê pêk tîne. Parçeyên ku rêzimanê pêk tînin weha ne: *Binyada Frêzî* (phrase structure), *Veguherîn* (transformation) û *Morfofonemîk* (morphophonemic). Rêzikên parçeyê binyada frêzî, prosesa hilberîna risteyekê, li gel hêmanên wê yên pêkhên, di çarçoveya binyada sîntaktîk da diyar dikin. Bi vî rengî di encamê da *risteyên binîn* (underlying sentence) yên zimanî tên hilberîn. Rêzikên veguherînê, ji *deranên* (output) beşa binyada frêzî, anku ji risteyên binîn ên ku ji aliyê *rêzikên binyada frêzî* (phrase structure rules) ve hatine hilberîn, risteyên din ên wekî neyînî, tebatî, pirsyarî û yd. hildiberînin. Parçeyê veguherînê di navbera binyada frêzî û morfofonemîk da cih digire û van her du beşan yeksan (mapped) dike. Rêzikên parçeyê morfofonemîk jî bilêvkirina risteyê diyar dikin. Ji van parçeyan, ê rêzikên binyada frêzî û yê veguherînê parçeyê *sîntaktîk* (syntactic) û parçeyê morfofonemîk jî parçeyê *fonolojîk* (phonological) a rêzimanê pêk tîne.

Bi awayekî kurtasî rêzikên binyada frêzî têkilîyên pêkhênên frêzekê sererast dikin. Rêzikên venivîsînê em dikarin bi awayê jêrîn nîşan bidin:

$$(8) FX \rightarrow Y Z^4$$

Ev rêzik, wek *rêzikên venivîsînê* (rewrite rules) tên binavkirin. Di rêzika (8)an da nîşandana bi awayê $FX \rightarrow Y Zy$ wek rêzikeka venivîsînê bi awayê “Xê wek $Y \hat{u} Z$ ji nû ve binivîsîne” tê xwendin (bnr. Chomsky, 1957, r. 26). Tîrê ($\rightarrow$) ku di rêzikê da heye jî em dikarin wek “ji vê pêk tê”yê şirove bikin (Cook & Newson, 2007, r. 30). Lewma jî (8) di heman demê da dibêje FX , ji $Y \hat{u} Zy$ pêk tê.

⁴ *Frêz* hêmanên ji bêjeyê mezintir in. Bo nimûne *pirtûka sor* frêzek e. Di (8)an da FX amaje bi *frêza Xêyê* dike. Her frêz xwedî sereyekê (head) ye. Di FX ê da, sereya frêzê X e. Em dê piştê li mijara frêz û binyada frêzî vegehin.

Rêzikên venivîsînê yên ku Chomsky (1957, r. 26) dide nasîn, ji bo kurmançî em dikarin weha li hev bînin:

- (9) a. $Riste \rightarrow FN + FL$
 b. $FN \rightarrow N$
 c. $FL \rightarrow FN + L$
 d. $N \rightarrow Dîlan, zarok, nan, pirtûk, kevir \text{ û } yd.$
 e. $L \rightarrow xwendin, şûştin, avêtin, çûn \text{ û } yd.$

Di (9)an da *Riste*, sembola destpêkê ya risteyê, her yek ji *FN* (frêza navdêrî (noun phrase)) û *FLyê* (frêza lêkerî (verb phrase)) bi rêzê frêz, *N* û *L* jî *kategorîyên ferhengî* (lexical category) ne. (9), dariştina risteyekê nîşan dide. Dariştina risteyê ji simbola *Risteyê* dest pê dike ku simbola *Risteyê* di destpêka hilberîna hemû risteyan da cih digire. *FNya* ku di (9b)yê da cih digire bi tenê ji *Nyekê* pêk tê. Berevajî vê, *FLya* di (9)an da ji *FNyek* û *Lyekê* pêk tê. Di vê rewşê da *FNya* ku di nav *FLyê* da cih digire berkara vê *Lyê* ye. Ev venivîsîna frêzan heta kategorîyên ferhengî yên wekî *N*, *L* dewam dike. Di gava dawîn da, rêzikên venivîsînê yên ku kategorîyên ferhengî bi bêjeyan (an jî bi hemanên ferhengî ve) ve têkildar dikin, tên sepandin. Bo nimûne di (9)an da rêzikên $N \rightarrow Dîlan, zarok, nan, pirtûk, kevir \text{ û } yd.$ û $L \rightarrow xwendin, şûştin, avêtin, çûn \text{ û } yd.$, kategorîyên ferhengî bi bêjeyan ve têkildar dikin. Piştî sepandina van rêzikên dawîn, êdî rêzikên venivîsînê nabe ku bên sepandin. Anku piştî ku bêje hatin bicihkirin prosesa dariştina risteyê ya li vê astê diqede. Ji bo risteya *Dîlanê pirtûk xwendê* rêzikên venivîsînê yên ku vê risteyê hildiberînin em dikarin bi awayê jêrîn diyar bikin:

- (10) a. $Riste \rightarrow FN + FL$
 b. $FN \rightarrow N$
 c. $FL \rightarrow FN + L$
 d. $N \rightarrow Dîlan, pirtûk$
 e. $L \rightarrow xwendin$

Di encama karkirina rêzikên binyada frêzî da risteyên erênî, xwerû û ragihandinî (declarative) tên hilberandin. Lê di zimanekî da gelek cure risteyên din jî hene. Di *RVHyê* da, risteyên ji xeynî risteyên erênî, xwerû û ragihandinî, risteyên din (wekî

kompleks, lêkdayî, tebatî, neyînî, pirsyarî û yd.) bi sepandina rêzikên veguherînê ve, ku ew jî rêzikên venivîsînê ne, tên dariştin. Em dikarin *veguherîna rêzimanî* (grammatical transformation) bi nimûneya veguherîna tebatîkirinê ve weha nîşan bidin:

$$(11) \textit{Dîlanê} + \textit{pirtûk} + \textit{xwend} \rightarrow \textit{pirtûk} + (\textit{ji alîyê Dîlanê ve}) + \textit{hat xwendin}$$

Rêzikên binyada frêzî bendîka binîn (underlying string) a *Dîlanê+pirtûk+xwendê* hildiberînin. Ji vê bendîkê em dikarin bi tenê forma erênî, xwerû û ragihandinî ya risteyê, ku *Dîlanê pirtûk xwend* e, hilberînin. Ji bo ku forma wê ya tebatî bê hilberendan em divê li ser vê bendîka binîn hin veguherînên rêzimanî bisepînin. Di rêzîka veguherînê ya (11)an da ji bo dariştana forma tebatî, *FN*ya berkari (*pirtûk*) divê di serê risteyê da bê bicihkirin, ji bo çêkirina forma tebatî ya lêkerê, lêkera *hatinê* divê li pêş lêkera bingehîn bê bicihkirin û lêkera bingehîn jî divê bi forma wê ya raderî ve bê guherandin. *FN*ya bikerî dibe ku di nav *FD*yekê (frêza daçekî) da, bi awayê *ji alîyê Dîlanê veyê* bi awayekî xwestekî bê bicihkirin, an jî neyê bicihkirin. Lewra bêyî wê jî binyad bi awayê *Pirtûk hat xwendinê* rêzimanî ye. Eger ev *FN*ya bikerî (*Dîlan*) dê neyê bicihkirin, wê demê divê ji bendîka binîn bê jêbirin.

Rêzikên morfofonemîk, li ser bendîkên morfeman tên sepandin û forma fonemîk a van bendîkên morfeman diyar dikin. Wekî li jor hat dîtin rêzikên binyada frêzî heta hêmanên ferhengî kar dikin û karkirina wan li vê astê diqede. Lewma li dawîya asta binyada frêzî, bendîkên hêmanên ferhengî yên ku tên hilberîn hêj forma xwe ya bilêvkirinê wernegirtine. Anku bendîkên hêmanên ferhengî yên ku ji alîyê rêzikên binyada frêzî ve tên hilberîn, li asteka razber in. Ji bo ku ev bendîkên razber derkevin asta şênber, anku ji bo ku di axivtineka rasteqîn da wek riste bên bikaranîn hewce ye ew bên bilêvkirin. Rêzikên ku bilêvkirina risteyan sererast dikin, rêzikên morfofonemîk in.

Rêzikên morfofonemîk, diyar dikin ku morfem (an jî rêzebendên (sequences) morfeman) di kîjan peywendê da çawa tên bilêvkirin (bnr. Chomskyî, 1957, r. 32). Bo nimûne lêkera *hatinê* di demên borî da wek /*hat*/ê tê bilêvkirin, lê heman lêker di demên ne-borî da wek /*tê*/ (an jî *dihê*) tê bilêvkirin. Bo nimûne rêzikên morfofonemîk dê di bendîka *Dîlan+ê+pirtûk+BORÎ+xwendinê* da *Dîlan+êyê* bi awayê /*Dîlanê*/, bendîka *pirtûkê* bi awayê /*pirtûk*/ê bendîka *BORÎ+xwendinê* bi awayê /*xwend*/ê veguherîne bendîka dengî ya /*Dîlanê pirtûk xwend*/ê.

Piştî ku *RVH* tê pêşkêşkirin, ji hin alîyan ve rexne li wê tên girêdan. Li ser vê, Chomsky jî di teorîya xwe da hin guherînan çêdike û modela rêzimana xwe ya nû di berhema *Aspects Of The Theory Of Syntax*ê (Rehendên Teorîya Sîntaksê) (1965) da pêşkêş dike. Lewma berhema sereke ya vê qonaxê berhema navborî ye. Chomsky (1976, r. 66) teorîya rêzimanê ya ku di vê qonaxê da tê pêşkêşkirin wek *Teorîya Standard (TS)* bi nav dike.

Yek ji rexneyên giring ên ku li *RVHyê* hatine girêdan di warê veguherînan da ye. Wekî li jor hat dîtin, veguherîn li ser binyadên binîn veguherînên binyadî yên wekî jêbirin, lêzêdekirin, cihguhertin û yd. pêk tînin. Lê di rexneyan da, bi gotina Uzunî (2000, r. 55) ve hatîye diyarkirin ku veguherîn divê *binyadparêz* (structure preserving) bin. Ev gotina Uzunî amaje bi wê dike ku veguherîn divê binyada binîn xera nekin. Ji aliyê din ve di *RVHyê* da veguherîn wateya risteyê jî diguherînin. Bo nimûne risteya neyînî ji risteya erênî tê hilberîn, lewma jî wateya risteya bingehîn diguhere. Lê bi diyarkirina Uzunî ve rexneyên li ser *RVHyê* diyar kirine ku veguherîn kiryarên binyadî ne û ji ber vê, li ser guherîna wateyê bandoreka wan divê tune be. Dîsa hatîye gotin ku veguherînên stîlistîk (stylistic) ne tê da, hemû veguherîn divê mecbûrî (obligatory) bin (bnr. 2000, r. 55). Ev rexne giring e, lewra ji ber van rexneyan, risteyên ku ji aliyê wateyî ve ji bo risteyên din dibûn jêder, ji holê rabûne, lewma her riste bûye xwedî tekane şiroveya xwe ya wateyî.

Di *TSyê* da hin têgehên *RVHyê* ji teorîyê hatine derxistin û hinekên nû jî lê hatine zêdekirin. Têgehên şîyane û performansê ku me berê behsa wan kiribû, di vê serdemê da derdikevin. Ji aliyê din ve *binyada kûr* (deep structure), *binyada rûser* (surface structure), *bingeh* (base), *ferheng* (lexicon) hin têgehên nû ne ku di *TSyê* da derdikevin pêş.

Wekî *RVHyê*, *TS* jî li ser sîntaksê hatîye amadekirin. Chomsky (1965) di danasîna berhemê da diyar dike ku di navenda xebata *Rehendên Teorîya Sîntaksê* da sîntaks heye; aliyên semantîk û fonolojîk ên binyada zimanî dema têkildar bin bi teorîya sîntaksê ve hatine nîqaşkirin. Li gel vê, di *TSyê* da ji boçûna berê cuda, em dikarin bêjin guherîna herî giring di warê têkiliya wate û rêzimanê da çêbûye. Di *RVHyê* da wate li derveyî rêzimanê hatibû hiştin, lê niha, di modela rêzimanê da beşeka ku wateya risteyan şirove dike jî li kar e. Li gel van guherînan, em dikarin bêjin

TS, dewama boçûna berê ye. Jixwe Chomsky (1965) bixwe jî dibêje armanca vê xebatê pêşxistin û ji nû ve formulekirina teorîya *Rêzimana Veguherîner-Hilberîner* ye.

Di *TSyê* da jî rêziman wekî di *RVHyê* da ji hin parçeyan pêk tê. Chomsky van parçeyan wiha diyar dike: *Parçeyê sîntaktîk* (syntactic component), *parçeyê semantîk* (semantic component) û *parçeyê fonolojîk* (phonological component). Parçeyê sîntaktîk komeka bêhejmar a hêmanên teşeyî yên razber diyar dike ku her yek ji wan, hemû zanyariyên ku têkildar in tekane şiroveya risteyekê ve, diyar dike. Li gor vê formulasyonê, li vê derê riste wek bendikeka *teşedanan* (formative) tê qebûlkirin, ne ku wek bendikeka dangan. Parçeyê semantîk, wateya risteyekê şirove dike, anku binyadeka ku ji aliyê parçeyê sîntaktîk ve hatiye dariştin bi şiroveyeka wateyî ya diyar (certain) ve têkildar dike. Her cure zanyariyên ku di şirovekirina wateyî da tîrîkî bikanî jî aliyê parçeyê sîntaktîk ve tîrîkî pêşkêşkirin (presented). Ji aliyê din ve parçeyê fonolojîk, forma dengî ya risteyeka ku ji aliyê rêzikên sîntaktîk ve hatiye hilberîn, diyar dike. Bi gotineka din parçeyê fonetîk, binyadeka ku ji aliyê parçeyê sîntaktîk ve hatiye dariştin bi sînyaleka ku bi dengî tê temsîlkirin, têkildar dike. Parçeyê sîntaktîk beşa hilberîner a rêzimanê ye, lê parçeyên semantîk û fonolojîk wek *şiroveker* (interpretive) kar dikin. Parçeyên semantîk û fonolojîk wan zanyariyan bi kar tînin ku ji aliyê parçeyê sîntaktîk ve derheqê teşedanan, taybetmendiyên van teşedanan ên sirûştî û tîkîlîya di navbera wan da hatine hilberîn. Lewma jî di hilberîna binyada risteyê da peywireka wan tune ye. Parçeyê sîntaktîk ji bo her risteyê binyadeka kûr û binyadeka rûser hildiberîne. Binyada kûr şiroveya wateyî ya risteyê, binyada rûser jî şiroveya fonetîk a risteyê diyar dike. Binyada kûr ji aliyê parçeyê semantîk ve û binyada rûser ji aliyê parçeyê fonolojîk ve tê şirovekirin (1965, rr. 16, 75, 141). Ji aliyê din ve parçeyê sîntaktîk ji du beşan pêk tê: *Beşa bingehe* û *beşa veguherîne*. Bingehe ji binbeşên bi navên parçeyê *kategorîk* (categorical) û *yê ferhengê* pêk tê. Parçeyê kategorîk dîsa ji rêzikên venivîsînê pêk tê ku tîkîlîyên rêzimanê û di binyada kûr da rêza hêmanên risteyê diyar dike. Ev beşa rêzikên venivîsînê, bi awayekî giştî wekî rêzikên frêza binyadî yên *RVHyê* kar dike. Veguherîn binyadên rûser hildiberîne. Bi gotineka din binyadên kûr vedigerîne binyadên rûser (bnr. Chomsky, 1965, rr. 17, 120). Wekî xuya dike, di *TSyê* da rêziman piçek din formeka tekûz werdigire. Her yek ji van guherînan ji bo çêbûna teorîyên paşîn gav bi gav zemînekê çêdike.

Xebata bingeîn a qonaxa sêyem, ku wek *Teorîya Standard a Berfirehkirî* (*TSB*) tê zanîn, *Studies on Semantics in Generative Grammar* (Xebatên li ser Semantîkê di Rêzimana Hilberîner da) (1972)⁵ e. Chomsky (1976, r. 5) *TSByê*, wek revîzyoneka *Teorîya Standart* pêşkêş dike û wek *Teorîya Standard a Berfirehkirî* bi nav dike. Chomsky (1976, r. 136) dibêje “li gor nihêrîna min Teorîya Standart kêr e û divê bê guhertin. Delîlên ku niha hene, bi min wesa didin xuyakirin ku ev teorî divê wek Teorîya Standard a Berfirehkirî bê guhertin”. Di *TSByê* da nûjenîya herî giring em dikarin bîjin di warê bandora binyada rûser a li ser diyarkirina wateya risteyê da çêbûye. Heta Chomsky (2002, r. 151) dibêje vekolînên têkildarî rola binyada rûser a li ser wateyê, rê li ber derketina Teorîya Standard a Berfirehkirî vekirîye. Wekî li jor hat gotin, di *TSyê* da şiroveya wateyî ya risteyekê ji aliyê binyada kûr ve tê diyarkirin. Lewma bandora binyada rûser, ku bi sepandina veguherînên rêzimanî ji binyada kûr tê çêkirin, li ser diyarkirina wateya risteyê tune ye, lê di *TSByê* da tê qebûlkirin ku di hin rewşan da şiroveya wateyî ji binyada kûr wêdetir rasterast têkildar e bi binyada rûser ve (bnr. Chomsky, 1976, r. 88). Anku di boçûna *TSByê* da, şiroveya wateyî li gor her du binyada kûr û ya rûser tê diyarkirin. Sedema vê jî ew e ku hin zanyarîyên ku li binyada rûser ji bo diyarkirina wateyê ten bikaranîn li binyada kûr nayên temsîlkirin.

(12) a. *Dîlanê PIRTÛK xwend?*

b. *DÎLANÊ pirtûk xwend?*

Binyadên kûr ên her du risteyên (12)an bi heman awayî ne, lê hêmana kirpandî bi xwe ra cuhdahîya wateyê jî tîne. Wextê wekî di (12a)yê da, kirpandin li ser *pirtûkê* be ew amaje bi *Dîlanê tişteke xwendê* dike. Lê eger em kirpandinê bînin ser hêmana *Dîlanê* û risteya (12b)yê çêbe wê demê ew amaje bi *Kesekê pirtûk xwendê* dike. Vê rewşê em dikarin ji bersivên pêkan ên van risteyan jî derxin. Bo nimûne ji bo risteya (12a)yê em dikarin bersiva *Na, Dîlanê HELBESTEK xwendê* bidin (lê em nikarin bersiva *Na, AZADÎ pirtûk xwendê* bidin) û ji bo risteya (12b)yê jî *Na, AZADÎ pirtûk xwendê* bidin (lê em nikarin bersiva *Na, Dîlanê HELBESTEK xwendê* bidin). Binyadên kûr ên van her du risteyan heman bin jî wekî xuya dike hin zanyarîyên ku li ser wateyê bandorê çêdikin, li binyada kûr nayên temsîlkirin.

⁵ Di vê xebatê da çapa wê ya 1976an hatiye bikaranîn.

Heta qonaxa *TSByê*, rêziman ji hin rêzikan pêk dihat. Di *Teorîya Birêvebirin û Girêdanê* da ev boçûn hatiye terikandin û li şûna rêzikan, rêziman di çarçoveya têgehên *prensîp û parametreyan* (parameter) da hatiye çêkirin.

Bingeha wê çend sal berê hatibe danîn jî qonaxa *BGyê* bi xebata *Lectures on Government and Binding: The Pisa Lectures* (Dersên li ser Birêvebirin û Girêdanê: Dersên Pisayê) dest pê dike ku di sala 1981ê da hatiye weşandin⁶. Ji ber ku têgehên *birevebirin* (government) û *girêdanê* (binding) di teorîyê da rolên krîtîk bi cih tînin ev boçûna nû wek *Teorîya Birêvebirin-Girêdanê* (Government-Binding (*GB*) Theory) tê binavkirin (Chomsky, 1982, r. 3). Berîya ku em derbasî danasîna *BGyê* bibin pêşî em dê bi kurtasî li ser têgehên *prensîp û parametreyê* rawestin.

Wekî me berê jî gotibû, ji bo *RGyê*, hemû ziman di bingehê da yek in. Di *BGyê* yekbûna zimanan bi *prensîpan* ve tê ravekirin. *Prensîp ew mercên rêzimanîtiyê* (conditions on grammaticality) ne ku ji bo hemû avahiyên (construction) hemû zimanan derbasdar in (Cook & Newson, 2007, r. 35). *Prensîp* di zimanên cuda da dibe ku formên cuda werbigirin. Her yek ji van formên cuda yên *prensîpê*, *parametre* ne (Crystal, 2008, r. 386). Bi kurtasî *parametreyek*, *rêyek* e ji bo pêkhatina *prensîpa* ku *parametre têkildarê wê ye*. Bo nimûne eger em bêjin "di her *risteyekê* da *biker heye*", ev dibe *prensîp*, lê em dizanin ku di her zimanî da *bikera risteyê* her carê ne *pêwîst* e bi awayekî *aşkere pêk bê*. Wekî me berê nîşan dabû di *kurmançî* da, di demên ne-borî da *biker*, dibe ku bi awayekî *aşkere pêk neyê*. Di *risteya Pirtûkê dixwîn-eyê* da *-eya* li ser lêkerê amaje bi *bikerê* (kesê sêyem ê yekhejmar) dike. Wextê lêker *têper* be, ji ber ku di demên ne-borî da *biker* dibe ku bi awayekî *aşkere pêk neyê* (ji bo lêkerên *têneper* hem di demên borî hem jî yên ne-borî da *çêdibe biker* bi awayekî *aşkere pêk neyê*), eger em bêjin "di *kurmançî* da *biker*, di demên ne-borî da dibe ku bi awayekî *vekirî pêk neyê*", ev dibe *parametre*. Ev *parametre nabêje* di *risteyê* da *biker tune ye*, bi tenê yek ji rêyên *pêkhatina wê diyar dike*. Wekî tê dîtin, *parametre*, *prensîpê* ji holê ranake, lê yek ji formên *pêkhatina wê ye*.

Derdikeve ku *prensîp taybetmendiyên rêzimanî yên hevpar ên hemû zimanan* diyar dikin ku bi vî rengî *Rêzimana Gerdûnî* pêk tînin. Wekî hatibû dîtin *RG* di serê her *mirovî/ê* da bi heman awayî hebû. Lewma Chomsky (1988, r. 15) dibêje *prensîp*

⁶ Di vê xebatê da çapa wê ya 1988an hatiye bikaranîn.

fakulteya zimanî karakterîze dikin. Ji alîyê din ve parametre taybet in ji bo zimanên cuda. Ji bo Chomskyî (1988, r. 31) rêzimana zimanekî taybet ji diyarkirina nirxên (value) *RGyê* wêdetir tiştekî din nine. Anku her rêzimaneka taybet, li ser *RGyê* diyarkirina hin parametreyan e. Chomskyî (2025, r. 30), têkilîya prensîp û parametreyan bi nimûneyekê weha rave dike:

Rewşa destpêkê ya fakulteya zimanî, em dikarin wek toreka (network) sabît a girêdayî bi şalterekê ve bifikirin; tor ji prensîpên zimanî pêk tê, şalter jî ew vebijark in ku bi azmûngerîyê ve tînin diyarkirin. Dema şalter bi şiklekî diyar bê eyarkirin, zimanê swahîlî (swahili), dema bi şiklekî din bê eyarkirin zimanê japonî derdikeve holê. Her zimanê pêkan ên mirovî, bi eyarkirineka diyar a şalteran ve, eger em bi têgehên teknîkî bêjin, bi eyarkirina parametreyan ve tê diyarkirin.

Di *BGyê* da binyadên kûr wek *k-binyad* (d-structure) û binyadên rûser jî wek *r-binyad* (s-structure) ji nû ve tînin pêşkêşkirin. Lê ev guherîn bi tenê ji alîyê binavkirinê ve pêk nehatine. Taybetmendîyên van her du temsîlan jî guherîne. *K-binyad* taybetmendîyên ferhengî yê pêkhênên risteyê diyar dike û *têkilîyên argumentên bingeîn* (the basic argument relations) ên di risteyê da temsîl dike. Ji vî alîyê ve *k-binyad*, *binyada argumentî* û *têkilîyên tematîk* (thematic relations) ên risteyê pêşkêş dike (Haegeman, 1994, rr. 304, 434). Ev giring e, lewra di boçûna berê da binyadên kûr tîkilîyên rêzimanî yê pêkhênên risteyê temsîl dikirin. Wekî em dê li jêr bibînin hin tîkilîyên rêzimanî yê ku li *k-binyadê* rasterast nayên temsîl kirin, li *r-binyadê* cih digirin. *K-binyad* jî vî alîyê ve jî ji binyada kûr vediqete. Ji alîyê din ve, bi gotina Haegemanê (1994, r. 304) ve *r-binyad*, tîkildar e bi taybetmendîyên rûser ên risteyê ve. Rêzkirina hêmanên risteyê yê di bendika rûser da û *rewşa* (case) rêzimanî ya wan li *r-binyadê* tê diyarkirin. Chomsky dibêje "R-binyad ji binyada rûser a berê razbertir e" (1988, r. 18). Wekî *k-binyadê*, *r-binyad* jî li gel hin prensîp û parametreyan di nav tîkilîyan da ye, lê ew, wekî berê ne temsîleka dawîn e. Piştî wê, temsîlên *forma fonetîk* (phonetic form) (*FF*) û *forma mantîqî* (logical form) (*FM*) cih digirin (Uzun, 2000, r. 93). *R-binyad* jî bo *FF* û *FM* yê dibe *ketan* (input). Chomsky (1988, r. 5), parçeyên rêzimanekê yê di *BGyê* da weha nîşan dide:

(13) a. ferheng

b. sîntaks

(i) parçeyê kategorîk

(ii) parçeyê veguherînê

c. parçeyê FFyê

d. parçeyê FMyê

Ferheng, binyada morfo-fonetîk a razber û taybetmendîyên kategorîk û pêwendî jî di nav da, taybetmendîyên sîntaktîk ên her yekeya ferhengî rave dike. Rêzikên parçeyê kategorîk hin cureyên teorîya *X-barê* (*X-bar*)⁷ dabîn dikin. Sîstemên (13a) û (13bi)ê, *bingehê* pêk tînin. Rêzikên *bingehê* k-binyadan hildiberînin. K-binyad, li binyadên ku ji alîyê (13bi)ê ve hatine hilberîn, bi lêzêdekirina hêmanên ferhengî ve çêdibin. K-binyad ji alîyê rêzika *α-cihguherînê* (move-α) ve bi r-binyadan ve tîn yeksankirin (mapped). Di vê kiryarê da *şopên* (trace) ku bi *pêşaneyên* (antecedent) xwe hevîndeks in, tîn hiştin. Ev rêzik (*α-cihguherîn*) parçeyê veguherînê yê (13bii)yan pêk tîne û dibe ku di nav parçeyên *FF* û *FMyê* da jî kar bike. Bi vî rengî, sîntaks, r-binyadan hildiberîne ku ev r-binyad ji alîyê parçeyên (13c) û (13d)yê ve bi rêzê ji bo temsîlên *FFyê* û *FMyê tîn* şandin (assigned) (Chomsky, 1988, r. 5). *BG*, bi tenê ji teorîyeka yekgirtî pêk nayê, ji binteorîyan pêk tê ku rêziman renekî modulî werdigire. Chomsky (1982, r. 6) van binteorîyan weha rêz dike:

(14) a. *Teorîya X-Barê* (X-Bar Theory)

b. *Teorîya Sînorkêş* (Bounding Theory)

c. *Teorîya Birêvebirinê* (Government Theory)

d. *Teorîya ROLê* (Role Theory)⁸

e. *Teorîya Girêdanê* (Binding Theory)

f. *Teorîya REWŞê* (Case Theory)


g. *Teorîya Kontrolê* (Control Theory)

⁷ Karkirina Teorîya *X-barê* ji bo niha em dikarin wek rêzikên binyada frêzî ya boçûna berê bifikirin. Em dê piştre li ser vê teorîyê rawestin.

⁸ Wek *θ-Teorî* (θ-Theory) yan jî *Teta Teorî* (Theta Theory) jî tê zanîn.

Her yek ji van binteorîyan li gel hin ji beşên jorîn ên (13)an di nav têkilîyan da ye. Ev binteorî û têkilîya wan a li gel parçeyên di (13)an da, di Uzunî (2000, r. 96) da weha hatine nîşandan (li şemaya jêrîn cihguherîn jî wek binteorîyek hatîye bicihkirin):

(15)



Her binteorî hin alîyên rêzimanê sererast dike û hemû li gel hevûdin dixebitin. Li vê derê em dê li ser hûngilîyên BGyê ranewestin. Her du beşên dawîn ên xebata me dê bi rêzê di çarçoveya teorîya ROLê û teorîya REWŞê da bên çêkirin. Ji ber vê, teorîyên ROL û REWŞê em dê li wir bidin nasîn. Li gel vê, li cihên hewce em dê serî li binteorîyên mayîn jî bidin, ji wan sûd werbigirin.

BEŞA DUYEM

BINYADA FRÊZÎ Û REWŞA RÊZIMANÎ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DA

Ev beş, ji du binbeşan pêk tê. Di binbeşa yekem da em dê binyada frêzî ya di kurmancî û zazakî da bidin nasîn ku binyada frêzî dê di beşên paşîn da her carê derkeve pêşîya me. Di binbeşa duyem da jî em dê rewşa rêzimanî ya di kurmancî û zazakî da pêşkêş bikin ku di nîqaşên beşên paşîn da ji bo ravekirin û nîqaşa di hin mijaran da hewcedarîya me dê bi wê hebe.

2.1. BINYADA FRÊZÎ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DA

Di vê binbeşê da em dê hin aliyên binyada frêzî ya kurmancî û zazakî di çarçoveya BGyê da pêşkêş bikin. Lê berîya wê em dê bi kurtasî behsa têgeha *frêzê* bikin.

Eger em hûrgilîyan ji bo niha li aliyekî dayînin û bi awayekî giştî bêjin, têgeha frêzê amaje bi hemanên ji bêjeyê mezintir dike. Bo nimûne bêjeya *zarok* û *porxelekê* dibin yek û frêza *zarokê porxelekê* pêk tînin. Riste ji bêjeyan pêk bên jî wekî Haegeman (1994, r. 34) diyar dike, bêje bixwe *pêkhênên rasterast* (immediate constituents) ên risteyê ninin, lê pêkhênên *dawîn* (terminal) ên risteyê ne. Ji bo dîtina vê, em li risteya jêrîn binihêrin:

(1) *Zarokê porxelek pirtûka sor dixwîne*

Risteya jorîn ji bêjeyên *zarok*, *porxelek*, *pirtûk*, *sor* û *xwendinê* pêk hatiye. Her risteya ku pêvebera wê (em dê têgeha pêveberê piştî bi awayekî cuda binirxînin) lêkerekî têper e, herî kêr xwedî biker û berkarekê ye. Bi gotineka din binyada zimanî ya ku em jê ra dibêjin riste, ji van hemanên wekî biker, berkar, pêveberê pêk tê. Di (1)ê da biker *zarokê porxelek*, berkar *pirtûka sor* û peveber *dixwîne* ye. Lewma em nikarin bêjin di (1)ê da biker bi serê xwe *zarok*, berkar jî *pirtûk* e. Ji ber vê me got bêje pêkhênên risteyan bin jî pêkhênên rasterast ên risteyê ninin. Wekî xuya dike, pêkhênên rasterast ên risteyê frêz in.

Frêz, di rêzimana nerîtî da ji bo "ravek"ê jî tê bikaranîn. Lê em divê diyar bikin ku frêz her carê berginda "ravek" a di rêzimana nerîtî da nine. Wekî Akgül (2024, r. 4) jî diyar dike her ravek frêz be jî her frêz ne ravek e. Têgeha ravekê ji bo avahiyên bi

îzafeyê (îzafe di rêzimana nerîtî ya kurmancî da wek *veqetandek* jî tê binavkirin) çêkirî tê bikaranîn ku herî kêr ji du bêjeyan pêk tê. Lê di frêzê da ne pêwîst e avahîya îzafeyê hebe.

Lewma frêz, wekî ravekan ne pêwîst e ji yekê zêdetir bêjeyan bigire nava xwe. Wek nimûne em dikarin li şûna risteya (1)ê, risteya jêrîn jî çêkin.

(2) *Zarok pirtûkê dixwîne.*

Di (2)yan da biker *zarok*, berkar *pirtûk* e. Eger pêkhênên rasterast ên risteyê frêz in, wê demê di (2)yan da jî biker û berkar frêzek in, lê berevajî (1)ê frêzên biker û berkarî yên di (2)yan da bi tenê ji bêjeyekê pêk hatine: *zarok* û *pirtûk*. Sedema vê zelal e, lewra em dikarin di (2)yan da biker û berkarê bi hin hêmanên din ve berfireh bikin ku (1) bi vî awayî pêk hatiye. Di (1)ê da *porxelek* li *zarokî*, *sor* jî li *pirtûkê* zêde bûye. Nexwe diyar dibe ku bêje berfireh nabin, lê frêz rê didin berfirehkirinê.


Her frêz xwedî *sereyekê* (head) ye. Ji bo ku em diyar bikin di frêzekê da kîjan hêman sere ye, yek ji wan rêyan ew e ku em dikarin lê binihêrin tunebûna kîjan hêmanê binyadê nerêzimanî dike. Bo nimûne di frêza *zarokê porxelekê* da eger bêjeya *porxelekê* tune be, binyad bi awayê *Zarok pirtûka sor dixwîneyê* rêzimanî ye, lê berevajî vê, dema em bêjeya *zarokê* ji frêzê derxînin, binyada **porxelek pirtûka sor dixwîneyê* pêk tê ku di kurmancî da nerêzimanî ye⁹. Di frêza *pirtûka sorê* da jî hêmana ku nabe ku em derxin, navdêra *pirtûkê* ye. Nexwe di van nimûneyan da bi rêzê *zarok* û *pirtûk* sere ne. Frêz nabe ku bêtir sere bê çêkirin, lewra sere navenda frêzê pêk tînin. Ji ber vê frêz *navenavendî* (endocentric) ye. Ev jî nîşan dide ku di frêzekê da sere, pêkhêna *mecbûrî* ye.

Sere taybetmendîya xwe dide hemû frêzê. Bo nimûne di frêza *zarokê porxelekê* da, *zarok* navdêr, *porxelek* rengdêr e, ji ber ku sereya wê (*zarok*) navdêr e, frêz jî dibe xwedî taybetmendîyên navdêrî. Ji ber vê, her frêz li gor kategoriya ferhengî ya sereya xwe tê binavkirin. Bo nimûne kategoriya ferhengî ya *zarokê* navdêr (*N*) e, lewma jî frêza *zarokê porxelekê*, *frêzeka navdêrî* (*FN*) ye. Hin cureyên din ên frêzan bi awayê *frêza lêkerî* (*FL*), *frêza rengdêrî* (adjective phrase) (*FR*), *frêza (pêş)daçekî* (prepositional phrase) (*FD*) û yd. in. Hin ji van binavkirinan, dibe ku berevajî

⁹ Li vê derê em qebûl dikin *porxelek* ne wek navdêr, wek rengdêr hatiye bikaranîn. Nerêzimanî ji ber vê pêk tê. Eger *porxelek* wek navdêr bê bikaranîn binyadê rêzimanî be.

"ravek"ên di rêzimana nerîtî da xuya bikin. Di rêzimana nerîtî da wekî Akgül (2024, r. 4) jî diyar dike senifandina ravekan li gor ravekerê (modîfîyeker (modifier)) hatiye çêkirin, lê frêz li gor sereyê tîn binavkirin û senifandin. Bo nimûne di rêzimana nerîtî da *zarokê porxelekê* ji ber ku raveker (*porxelek*) rengdêrek e, ew wek "raveka rengdêrî", lê di warê frêzên da ji ber ku *zarok* sere û navdêr e, ew wek "frêza navdêrî" tê binavkirin û senifandin.

Frêz, qada herî mezin e ku sereyek taybetmendiyên xwe li wê dide der. Ev qada herî mezin wek *mezintirîn derdan* (maximal projection) tê binavkirin. Bo nimûne *FNya zarokê porxelekê*, *mezintirîn derdana Nya zarokê ye*. Vê rewşê em dikarin bi awayê jêrîn jî nîşan bidin. Di (3)yan da frêza *Xê (FX)* *mezintirîn derdana sereya Xê ye*.



Ji aliyê din ve her sere argumentên (anku pêgirêdayî) xwe hildibijêre. Sere argumentên xwe bi du awayan hildibêjêrin: *Hilbijartina kategorîk* (k-hilbijartin) (categorical selection (c-selection)) û *hilbijartina semantîk* (s-hilbijartin) (semantic selection (s-selection)).

Bi k-hilbijartinê, sere diyar dike ku kîjan cure kategorîya frêzî dikare li gel wê xuya bike. Bo nimûne wek kategorîyeka ferhengî, lêkera *xwendinê* wek argument ji bo pozîsyona xwe ya temamkerî *FNyekê* k-hildibêjire. K-hilbijartin, hem ji aliyê sereyên ferhengî hem jî ji aliyê sereyên kargînî/fonksîyonel¹⁰ ve tê pêkanîn.

S-hilbijartin, têkildar e bi semantîka sereyê ve. Uzun diyar dike ku s-hilbijartin ji aliyê kategorîyên ferhengî ve tê pêkanîn. Kategorîyên ferhengî ji ber ku xwedî naverokeka semantîk in, vê taybetmendîya xwe bi rêya s-hilbijartinê li binyada


¹⁰ Ji aliyê kategorîyên xwe ve sere di bin du cureyan da tîn komkirin: *Kategorîyên ferhengî* (lexical category) û *kategorîyên kargînî* (functional categories). Kategorîyên ferhengî li ser diyarkirina naveroka risteyê bandora wan heye, lê ya kategorîyên kargînî tune ye (Haegeman & Guéron, 1999, r. 138). Kategorîyên wekî navdêr, lêker, rengdêr ji ber ku li ser wateyê bandorê çêdikin, wek sereyên ferhengî kar dikin. Ji aliyê din ve, wekî em dê bibînin, sereyên wekî *DEM*, *TEM*, îzafê ji ber ku li ser wateyê bandorê çênakin wek sereyên kargînî kar dikin. Ji vî aliyê ve derdanên sereyên ferhengî *derdanên ferhengî* (lexical projections), yên sereyên kargînî jî *derdanên kargînî* (functional projections) ne (Haegeman, 1994, r. 116).

sîntaktîk didin der (2000, r. 152). Bo nimûne me got lêkera *xwendinê* ji bo pozîsyona xwe ya temamkerî *FNyekê* k-hilbijêre, lê s-hilbijartin diyar dike ku ev *FN* divê xwedî taybetmendîya *[+xwendinî]* yê be. Anku *FNyeka* ku dikare li pozîsyona temamkerî ya lêkera *xwendinê* cih bigire divê amaje bi tiştê *xwendinî* bike. Lewma jî her cure *FN* nabe ku li vê pozîsyonê bi cih bibe. Eger lêker bi tenê k-hilbijartinê bike, wê demê hilberîna binyadên bi awayê **Dilanê kevir xwendê* jî mimkin e ku eger em wateya mecazî nehesibînin, ev binyad nerêzimanî ye. Nexwe em dikarin bêjin, pêkhatina taybetmendîya *[+xwendinî]* yê bi *FNyekê* çêdibe. Lewra bi tenê *FNyek* dikare xwedî vê taybetmendîyê be. *FL* yan jî *FDyek* nabe ku xwedî taybetmendîya *[+xwendinî]* yê be. Ji ber vê ye ku Haegeman (1994, r. 70) dibêje k-hilbijartin, s-hilbijartinê dişopîne. Ev gotina Haegemanê nîşan dike ku tiştê ku sînorên k-hilbijartinê diyar dike, s-hilbijartin e.

Niha em dikarin vegerin têgeha binyada frêzî. Binyada frêzî, têkilîyên pêkhênên yekeyeka zimanî nîşan dide. Bi gotineka din binyada frêzî diyar dike ku di yekeyeka zimanî da kîjan hêman çawa li gel hevûdin yekeyeka mezintir çêdikin û di navbera wan da têkilîyeka çawa heye. Bo nimûne me ji bo *FNya zarokê porxelekê* got ev frêz ji *Nya zarok* û *R(engdêr)ya porxelekê* pêk hatîye. Lê di vê frêzê da hêmaneka din jî heye: îzafeya *eyê*. Nexwe ev frêz ji sê pêkhênan pêk tê ku em dikarin bi awayê jêrîn nîşan bidin.


$$(4) \text{zarokê porxelek} \rightarrow \text{zarok} + \hat{e} + \text{porxelek}$$

Heman têkilîyan, em dikarin bi dardîagramê jî nîşan bidin ku ev cure nîşandan, binyada frêzî ya wê bi awayekî zelaltir nîşan dide (di dardîagraman da dema em nexwazin binyada frêzekê bi awayekî vekirî nîşan bidin, em wê di bin sêgoşeyê da bi cih dikin).




Dardîagrama (5)an nîşan dide ku îzafeya *eyê û FRya porxelekê bûne yek û Frêza Îzafeyî (FÎ) ya ê porxelekê pêk anîne*. Ev *FÎ* bi sereya *zarokê ve bûye yek û di encamê da FNya zarokê porxelekê pêk hatîye*.

Lêker, sereyên frêzên lêkerî ne. Frêza lêkerî, di risteyekê da, ji hemû hêmanên ji xeynî frêza bikerî pêk tê. Bo nimûne di risteya *Zarokê porxelek pirtûka sor dixwîneyê* da frêza bikerî *zarokê porxelek* e, lewma jî *FL pirtûka sor dixwîne* ye. Vê *FLyê* em dikarin bi dardîagramê weha nîşan bidin:



Çawa ku em dikarin binyada frêzî bi dardîagramê nîşan bidin, em dikarin wê bi goşebendan jî nîşan bidin. Li jêr, em dê binyada frêzî ya *FLya pirtûka sor dixwîneyê* bi goşebendan nîşan bidin. Lê ji bo ku nîşandana bi goşebendan zelaltir bê dîtin, em dê pêşî wê bi dardîagramê, bi awayekî vekirî nîşan bidin.




(8) $[_{FL} [_{FN} [_{N} pirtûk] [_{FÎ} [_{Î} a] [_{FR} [_{R} sor]]]] [_{L} dixwîne]]$

Di nîşandana bi goşebendan da, her pêkhên li gor cureya kategoriya xwe heta asta bêjeyî (yan jî dawîn) gav bi gav bi goşebendan ji hevûdin tê veqetandin. Bo nimûne di (8)an da goşebendên herî derveyîn sînoren *FLyê* diyar dikin. "FL"ya ku piştî

goşebenda destpêkê hatîye nivîsandin diyar dike ku ev frêz kîjan cure frêz e û sînorên wê ji ku dest pê dikin. Goşebenda ku vê goşebenda destpêkê digire, li aliyê herî rastê sînorên vê pêkhênê diyar dike (Ev sînor stûrnivîsî hatine diyarkirin) Wekî di dardîagrama (7)an da xuya dike, di gava pêşîn da *FL* li *FN* û *Lyê* veqetîyaye. Lewma jî di (8)an da sînorên *FN* û *Lyê* jî bi awayê $[_{FN} [_{N} pirtûk] [_{FÎ} [_{Î} a] [_{FR} [_{R} sor]]]]$ û $[_{L} dixwîne]$ yê ji hevûdin hatine veqetandin. *FN* jî di (7)an da li *N* û *FÎ* yê veqetîyaye. Di (8)an da ev her du beş bi goşebendan bi awayê $[_{N} pirtûk]$ û $[_{FÎ} [_{Î} a] [_{FR} [_{R} sor]]]$ ê hatine veqetandin. *FÎ* jî wekî di (7)an da xuya dike, wek *Î* û *FR* hatîye veqetandin ku ev her du beşên wê, di (8)an da bi awayê $[_{Î} a]$ û $[_{FR} [_{R} sor]]$ ê hatine nîşandan. *FR* bi tenê pêkhênêkê (*sor*) dihevine, li gel vê hem sînora frêza wê (*FR*) hem jî ya sereyê, bi awayê $[_{FR} [_{R} sor]]$ ê ji hevûdin hatine veqetandin.

Di zimanan da pêgirêdayîyên sereyê dikarin li aliyê rastê yan jî çepê sereyê cih bigirin. Ziman jî vî aliyê ve bi giştî du kom in: *sere-pêş* (head-first) û *sere-paş* (head-last). Ev her du, bi rêzê wek *sere-çep* (head-left) û *sere-rast* (head-right) jî tên binavkirin. Di lîteraturê da, bi giştî ziman di bin van her du koman da hatibin dabeşkirin jî, zimanên ku her du taybetmenîyan jî dihevinin hene. Wekî Gündoğdu (2011, rr. 38-39) jî dibêje, kurmancî hem taybetmendîyên bêjêrêzîya sere-çep hem jî yên sere-rast nîşan dide. Dîsa wekî Gündoğdu nîşan dide, di kurmancî da, dema daçeka sere bazinedaçek (circumposition) be, temamker di navberê da dimîne. Li jêr pozîsyona sereyan a di kurmancî da hatîye nîşandan.




Têkilîyên hîyerarşik (hierarchical) yên di navbera pêkhênên frêzê da meriv dikare bi hin têgehên merivatîyê rave bike: Movika (node) ku movikên din şax dide *movika dayik* (mother node), movikên ku ji heman movika dayik şax dane jî *movikên xwişk* (sister node) in. Bo nimûne di (9a)yê da, movika *FNya zarokê porxelekê* movika dayik, movikên *Nya zarok* û movika *FÎya ê porxelekê* jî movikên xwişk in. Helbet ev movikên xwişk jî *keçên* (daughter) movika dayik in.

Me got em dê binyada frêzî ya di kurmancî û zazakî da, di çarçoveya *BGYê* da pêşkêş bikin. Di *BGYê* da teorîya ku binyada frêzan sererast dike Teorîya *X-barê* ye (Chomsky, 2015, r. 48). Mebest ji binyada frêzan peyvîrîyê frêzan û binyada hîyerarşik a di frêzan da ye. Peyvîrîzê û binyada hîyerarşik a frêzan bi awayekî azad pêk nayê. Bi raveya Bakerî (1988, r. 35) ve, teorîya *X-barê nîşankerên frêzê* (phrase markers) (anku binyadên frêzî) yên ku mimkin e pêk bên, bisînor dike; ev teorî esas li ser *k-binyadê* kar dike, teorî li *k-binyadê* diyar dike ku hêmanên ferhengî çawa tînin bal hev û frêzan pêk tînin.

Wekî me dît, her frêz xwedî sereyekê ye û ji ber vê jî me got her frêz navenavendî ye. Dîsa me dît ku her sere dibe ku bi hin pêgirêdayîyan ve bê modîfîyekirin (modification) ku sere van pêgirêdayîyan hildibijere. Teorîya *X-barê* qebûl dike ku pêgirêdayîyên sereyekê xwedî heman taybetmendîyan ninin û ev pêgirêdayî li gor taybetmendîyên xwe sê cure ne: *nîşanker* (specifier), *temamker* (complement) û *zêdek* (adjunct). Chomsky (2015, r. 48) diyar dike ku teorîya *X-barê*, rêza di navbera sere û van her sê pêgirêdayîyan da diyar dike. Ji alîyê din ve, li gor teorîya *X-barê*, riste jî tê da, wekî Radford (1988, r. 547) jî wek mercek diyar dike, hemû temsîlên sîntaktîk navenavendî ne. Lewma teorîya *X-barê* angaşt dike ku her cure frêz xwedî heman binyada frêzî ye. Di vê çarçoveyê da Chomsky (2010, r. 123) dibêje ev teorî nîşan dide ku binyadên frêzan bi qasî ku xuya dikin ne tevlihev in; lewra di vê teorîyê da qalibeka giştî heye ku ji bo hemû binyadên frêzî raveker e. Bi gotina Haegemanê teorîya *X-barê*, taybetmendîyên hevpar ên di binyada risteyê da û pêkhênên sîntaktîk ên wekî *FN*, *FL* û yd. diyar dike. Ji vî alîyê ve teorî, hem li ser pêkhênên frêzî yên wekî *FN*, *FL* û yd. hem jî li ser risteyê kar dike (1994, rr. 83, 104-105). *Bara* ku di navê teorîyê da heye tê wateya *xêzê* û amaje bi wê dike ku frêz gav bi gav çêdibe. Her gavek di çêbûna frêzê da bi xêzekê tê nîşandan lewma jî teorî wek *X-barê* tê binavkirin (Arı Özdemir, 2020, r. 121). Ev xêz, li ser sereyê tê nîşandan. Bo nimûne ji bo sereya *Xê*, her yek ji

X' (wek "X bar" (X bar) tê xwendin) û X'' ê (wek "X cot bar" (X double bar)¹¹ tê xwendin) asteka frêzê nîşan didin. Xa ku di navê teorîyê da heye amaje bi kategoriya sereyê dike. X dibe ku navdêr (N), lêker (L), îzafe ($\hat{I}$), rengdêr (R), daçek (D) û yd. be.

Di navbera sere û temamkerê (*tem*) da têkilîya xwedîtiyê heye yan jî ew pêgirêdayîya mecbûrî ya sereyê ye. Chomsky (2015, r. 31) diyar dike ku temamker xwişkên sereyê ne. Nîşanker (*nîş*), sereyê nîşan dîkin, nasyariya navdêran diyar dîkin. Chomsky dibêje nîşanker diyarker (determiner) in (1976, r. 52). Ji alîyê din ve zêdek, derheqê sereyê da agahîyên zêdetir didin (wekî cih, jêder û yd.) yan jî wê diwesfinin. Zêdek hêmanên *xwestekî* (optional) ne. Anku hebûn an tunebûna wan li ser rêzimanîtiya binyadeka zimanî bandorê çênake. Nîşanker û temamker li gor cureya frêzê dibe ku hêmanên mecbûrî yan jî xwestekî bin¹². Her sê nîşanker, zêdek û temamker di dardîagrama jêrîn da hatine nîşandan.



Wekî berê jî hatibû dîtin hemû frêz di bingeha xwe da *derdaneka* (projection) sereyekê ne. Derdan ew bendika hêmanan e ku kategoriya wê û sereya ku li vê bendikê serekîyê dike, heman e (bo nimûne N , N' , N'' , FN û yd.) (Carnie, 2013, r. 199). Di derdana sereyekê da, em dikarin binyada hîyerarşîk bi nimûneya (10)an ve weha rave bikin: Ji alîyê hîyerarşîk ve sere li asta sifirê ye (di (10)an da bi *Nyê* hatîye nîşandan

¹¹ X' û X'' , bi rêzê bi awayê $\bar{X}$ û $\bar{\bar{X}}$ ê jî tên nîşandan.

¹² Sînorên di navbera temamker û zêdekan da ne zêde zelal in. Bi gotineka din, temamker bi qasî ku xuya dîkin dibe ku hêmanên mecbûrî nebin û zêdek jî bi qasî ku xuya dîkin dibe ku ne xwestekî bin. Anku hin hêmanên ku wek zêdek tên şirovekirin dibe ku bi awayekî mecbûrî di risteyê da hebin. Ji bo agahîyên zêdetir bnr. Gündoğdu, 2018, rr. 6-31.

ku di hin xebatan da bi awayê N^0 ê jî tê nîşandan). Dema temamker li sereyê zêde dibe frêz gavek berfireh dibe û asta *derdana navîn* (intermediate projection) çêdibe (di (10)an da bi N' yê hatiye nîşandan). Dema zêdek li frêzê zêde bibe frêz berfireh bibe jî ev berfirehbûnê binyadî nine, lewma jî frêz dîsa li asta navîn (N') dimîne. Nîşanker jî herî der ve li frêzê zêde dibe û ji aliyê binyadî ve frêzê gaveka din berfireh dike ku *mezintirîn derdan* çêdibe (di (10)an da bi N'' yê hatiye nîşandan). Ji ber ku zêdek di berfirehbûna frêzê da gaveka binyadî pêk nayîne, asta *derdana navîn* xwedî taybetmendiyeka xwedubareker (recursive) e. Ji ber vê, sereyek dikare bi awayekî bêdawî zêdekan werbigire. Bo nimûne her carê bi lêzêdekirina zêdekekê ve, em dikarin bi rêzê frêzên wekî *pirtûkên xwendekarî [yên sor]*, *pirtûkên xwendekarî [yên sor] [ên li ser maseyê]*, *pirtûkên xwendekarî [yên sor] [ên li ser maseyê] [yên li dibistanê]* yê çêkin ku ji aliyê teorîk ve em dikarin vê kiryarê bi awayekî bêdawî bidomînin.

Di (10)an da têkilîyên hîyerarşîk ên di navbera *pirtûka* sere û nîşanker, temamker, zêdeka wê da em dikarin bi awayê jêrîn pênase bikin:

- (11) a. *Nîşanker* xwişka N' yê û keça N'' yê ye
 b. *Zêdek* hem xwişk hem jî keça N' yê ye
 c. *Temamker*, xwişka N yê û keça N' yê ye

Di frêzekê da, wekî di zêdekan da hat dîtin, meriv dikare ji yekê zêdetir pêgirêdayîyan bi kar bîne. Di vê rewşê da, di navbera heman cure pêgirêdayîyan da ji aliyê stûnî (vertical) ve hîyerarşîyek tune ye. Bi amajepêkirina Yonatî (2021, r. 343) ve, pêkhênên li heman astê bi gihanekan ve li frêzê tîn zêdekirin û bi hev ve tîn girêdan. Bo nimûne di kurmancî da ji yekê zêdetir temamker an jî nîşanker bi gihaneka *ûyê* bi hev ve tîn girêdan. Dîsa heman cure zêdek bi gihaneka *ûyê* bi hev ve tîn girêdan, ên cureyên cuda wek frêzên îzafeyî, piştî hevûdin tîn bicihkirin.

- (12) a. *pirtûka keçik û lawikî*
 b. *ev û ew pirtûk*
 c. *pirtûka sor û zer*
 d. *pirtûka sor a li ser maseyê*


Di (12a)yê da her du temamkerên (*a*) *keçik* û *lawikî* bi gihaneka *ûyê* bi hev ve hatine girêdan, di (12b)yê da nîşankerên *ev* û *ewê* bi *ûyê* ve hatine girêdan. Dîsa di

(12c)yê da zêdeka (a) sor û zêdeka zerê bi gihaneka ûyê bi hev ve hatine girêdan. Di (12d)yê da du heb zêdek hene. Yek frêza îzafeyî (a sor) ye ya din frêza îzafeyî (a li ser maseyê) ye. Ev her du ji aliyê cureyê ve (ya rasttir ji aliyê cureya tamamkerên xwe ve) cuda ne. Di ya yekem da tamamker rengdêrî ye (sor), di ya duyem da daçekî (li ser maseyê) ye û wekî xuya dike bêyî gihaneka ûyê rasterast piştî hevûdin cih digirin.

Eger pêgirêdayîyên heman astê bi hev ve neyên girêdan, bi awayê ku li jêr xuya dike, binyadên nerêzimanî dê pêk bên:


- (13) a. *pirtûka keçik lawikî
 b. *ev ew pirtûk
 c. *pirtûka sor zer
 d. *pirtûka sor li ser maseyê

Me got her cure frêz xwedî heman binyada frêzî ye. Li vê derê mebest ji hemantîya binyada frêzî, k-binyad e. Ji ber ku zêdek hêmanên xwestekî ne, li k-binyada frêzan cih nagirin. Dîsa me dîtibû di zimanan da sere dikare li pêş an jî li paş nîşanker an jî tamamkerên xwe cih bigire. Ji ber vê dardîagrama jêrîn binyada frêzî (ya k-binyadê) ya hemû zimanan nîşan dide.




Eger em ji bo frêzên ku sereya wan piştî nîş û temê cih digire binyadeka giştî saz bikin, dê bi awayê jêrîn be:

(15)




Di frêzekê da ji ber ku pozîsyonên temamkerî û nîşankerî binyadî ne, di zimanan da dagirtina pozîsyona wan ne mecbûrî be jî, anku ev pozîsyon vala be jî di binyada frêzî da cih digirin. Bo nimûne di *FLya* kurmancî da pozîsyona nîşankerî vala ye¹³, lê di binyada frêzî da wekî di dardiagrama jêrîn a (16)an da xuya dike cihê vê pozîsyonê heye.

(16)



Eger sereya *FLyê* lêkerekî têneper be, bi tenê dikare bi awayekî xwestekî zêdekê werbigire, lewma jî pozîsyonên nîşankerî û temamkerî dê vala bin.

¹³ Ev boçûn piştre guherîye û hin vekoleran gotiye ku li k-binyadê li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê*, *FNya* bikerî cih digire, lê li asta r-binyadê ew cih diguhere bo pozîsyona bikerî. Lewma pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* li her asta sîntaktîk dibe ku ne vala be. Em dê piştre li ser vê mijarê rawestin.




2.1.1. Cureyên Frêzan


Cureyên frêzan ên ku em dê di vê binbeşê da bidin nasîn, hemû cureyên frêzên ku di kurmancî û zazakî da hene, nîşan nade. Cureyên frêzên ku em dê li vê derê pêşkêş bikin, cureyên sereke ne û gelek ji wan dê gelek caran di beşên paşîn ên xebatê da derkevin pêşberî me. Frêzên ku em dê bidin nasîn ev in: *Frêza Lêkerî*, *Frêza Rengdêrî*, *Frêza Daçekî*, *Frêza Îzafeyî*, *Frêza Navdêrî*, *Frêza Diyarkerî*, *Frêza DEMê (FDEM)* û *Frêza Temamkerî (FTEM)*.

Wekî me li jor nîşan da pozîsyonên nîşankerî û temamkerî li gor cureya frêzê dibe ku dagirtî yan jî vala bin. Li gel vê, di hin cure frêzan da sere jî her carê ne mecbûrî ye bi awayekî aşkere pêk bê. Lê ji ber ku sere rêvebir (governor) e, pozîsyona sereyê vala be jî, dê di dardîagraman da bê nîşandan. Lê heta ne hewce be pozîsyonên nîşankerî û temamkerî yên frêzê dê ji bo sadekirina dardîagraman, neyên nîşandan. Bo nimûne di *FLyên* teneper da pozîsyona temamkerî dagirtî nine, lewma di dardîagramê da ev pozîsyon dê neyê nîşandan. Dîsa heta ne hewce be, ji ber ku pozîsyonên *nîş* û *temê* jixwe diyar in, dê ji vê şûn da bi awayê *nîş*, *tem* wek pêvdanik (label) di dardîagraman da neyên nîşankirin. Lewra wekî me dîtibû *nîş*, keça X'' ê û xwişka X' ye, *tem* xwişka X ê (an jî X^0) ye.

Di vê xebatê da em li ser k-binyad û r-binyadan radiwestin. K-binyad têkildar e bi têkilîyên tematîk, r-binyad jî zêdetir têkildar e bi têkilîyên rêzimanî. Li jêr, (18) bi awayekî giştî k-binyada *risteya (RS) Dîlanê pirtûk xwendê* nîşan dide.



Wekî me ditibû, di *BGYê* da navgîna ku k-binyadê bi r-binyadê ve têkildar dike, veguherîn e ku veguherîn di bin navê α -cihguherînê da hatibûn komkirin. Bi gotina Chomskyî (1982, r. 15) ve α -cihguherîn bi kurtasî dibêje "kategorîyekê cih biguhere bo cihekî". Lewma tekane rêzika veguherînan α -cihguherîn e. α amaje bi hêmana ku dê cih biguhere, dike. Bo nimûne α dibe ku *FN*, sereyek û yd. be. Bi kurtasî r-binyad bi cihguherîna hin hêmanên k-binyadê ve pêk tê. R-binyada risteya nimûne ya jorîn, bi cihguherîna *Dîlanê* ve pêk tê ku ev cihguherîn li jêr hatîye nîşandan.




Wekî em dê li jêr bibînin k-binyada (18)an û r-binyada (19)an ya risteyê rasterast li gor *X*-barê nehatine amadekirin, lê ji bo niha, ew ji bo armancên me tiştên hewce nîşan didin. Li k-binyada (18)an, pozîsyoneka *v*(ala) heye, *Dîlan* li r-binyadê cih diguhere bo vê pozîsyona vala û li şûna xwe şopekê dihêle (di (19)an da *ş*). Chomsky (1980, r. 146) diyar dike ku şopa ku piştî cihguherînê dimîne, ji aliyê fonolojîk ve vala ye. *Dîlan* û şopa wê wekî xuya dike bi *[i,i]*yê hevîndeke in. Bi vî rengî di navbera

hêmana cihguherî û şopa wê da têkilîyek çêdibe. Ev têkilî wek *zincîr* (chain) tê binavkirin. Chomsky (1986, r. 95) *zincîrê* wek *raborîya cihguherînê* (history of movement) rave dike. Anku *zincîr* nîşan dide ku kîjan cihguherîn pêk hatine. Di nimûneya me da bi saya vê *zincîrê* em fêhm dikin ku pozîsyona resen a *Dîlanê* kîjan e. Di *zincîrekê* da hêmana cihguherî wek *sereya zincîrê*, şop jî wek *pêyê* (foot) *zincîrê* tê binavkirin (Haegeman, 1994, r. 310). *Zincîrekê* em dikarin bi awayê $\langle FX_i, \varphi_i \rangle$ nîşan bidin. Li vê derê *FX* amaje bi her cure frêza cihguherî dike.


2.1.1.1. Frêza Lêkerî

Her lêker xwedî argumenteka bikerî ye, lê hebûna *temamkerê* li gor têperîya lêkerê diguhere. Lêkerên têper herî kêmtamamkerêkê werdigirin, lê yên têneper *temamkerêkê* wernagirin¹⁴. Di *FLyan* da argumenta bikerî li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* (*[nîş, FL]*), *temamker* (ku hebe), li pozîsyona *temamkerî* (*[tem, FL]*) bi cih dibe. Ev pozîsyon, pozîsyonên hilberîna van hêmanan in, bi gotineka din pozîsyonên wan ên li k-binyadê ne. Li r-binyadê dibe ku ev argument cih biguherin bo pozîsyonên din. K-binyada giştî ya *FLya* lêkera têper û ya têneper di kurmancî û zazakî da em dikarin bi awayê jêrîn nîşan bidin (di (20)î da *FX* bikerê, *FY* *temamkerê* nîşan dide):



Li jêr ji bo kurmancî û zazakî nimûneyên *FLyan* hatine nîşandan. Nimûneyên zazakî li bin bergindên wan ên kurmancî hatine bicihkirin (Ji vê şûn da heta pêdivî bi bicihkirina cuda tune be, nimûneyên zazakî dê li bin bergindên wan ên kurmancî bên bicihkirin)


¹⁴ Em dê piştî bibînin hin cure lêkerên ku di rêzimana nerîtî da wek lêkerên têneper tên senifandin, di xebata me da, di bin komeka bi navê lêkerên *neakûzatîv* (unaccusative) da tên senifandin. Ev cure lêker xwedî bikereka rasteqîn nînin, *temamkera* wan wek biker kar dike.



Temamkera hemû lêkeran ne hewce ye wek *FN* pêk bê. Em dê di beşên têkildar da bibînin, hin cure lêker frêzên cureyên cuda jî (*FD*, *FTEM*) werdigirin.

2.1.1.2. Frêza Rengdêrî

Rengdêr pêgirêdayîyan werdigirin, lê ev pêgirêdayî ne hêmanên mecbûrî ne. Pêgirêdayîyên rengdêran li pêş rengdêra sere, li pozîsyona nîşankerî bi cih dibin. Li jêr (22) binyada giştî ya *FRyê* ya di kurmancî û zazakî da nîşan dide.



Rengdêra *sorê* dikare hokera *gelekê* (zz. *zaf*) bistîne û *FRya* *gelek sorê* (zz. *zaf sûr*) pêk bîne. Ji aliyê din ve di kurmancî û zazakî da hin cure *FR* berîya navdêrê jî dikarin cih bigirin. Bo nimûne di *Ap(ê) Ehmedî* (zz. *Ap(o)/Ded Ehmed*) da *ap* (zz. *ap/ded*) rengdêr in. Lê ev cudahiya pozîsyona rengdêran a li gor sereyê ji aliyê xebata me ve cudahiyan pêk nayîne. Bicîhbûna wê ya li aliyê rastê yan jî çepê sereyê ne giring e. Lewra di her du rewşan da jî *FR* li heman pozîsyona sîntaktîk (pozîsyona zêdekê) bi cih dibe.

2.1.1.3. Frêza Daçekî

Di kurmancî da daçek ji aliyê binyadî ve bi awayekî giştî du kom in: Daçekên xwerû (wekî *bi*, *di*, *ji*, *li*, *di..da*, *ji...ra*) û daçekên lêkdayî (wekî *li ber*, *li ser*, *ji ber*).



Daçekên xwerû jî sê cure ne: pêşdaçek (preposition) (*bi, di, ji, li* û yd.), paşdaçek (postposition) (*...de, ...re, ...ve*) û bazinedaçek (*bi...da, bi...ve, di...da*) (bnr. Bedirxan & Lescot, 2018, rr. 242-243; Tan, 2015, rr. 191-192; Baran, 2018, rr. 115-129). Li vê derê em dê li ser binyada frêzî ya daçekên xwerû rawestin. Tiştê ku daçekên xwerû ji hevûdin cuda dike, alîyê pozîsyona wan e li gor temamkera wan. Daçekên ku li pêş temamkerên xwe cih digirin, pêşdaçek, ên ku piştî temamkerê cih digirin paşdaçek, ên ku temamkerê digirin nav xwe jî bazinedaçek in. Di nimûneya *li malê* da *li* pêşdaçek, di nimûneya *mal dayê* da, *da* paşdaçek, di nimûneya *di malê dayê di...da* bazinedaçek e, *mal* jî temamkera van daçekan e. Di kurmancî da, wekî Akgül jî dibêje daçek her carê wek temamker hêmaneka navdêrî werdigire (2024, r. 84). Temamkera daçekê, hêmaneka mecbûrî ye, lewma divê pêk bê.

Di zazakî da jî wekî di kurmancî da heman cureyên pêşdaçek, paşdaçek û bazinedaçekan hene. Tabloya jêrîn hin ji van cure daçekan, ku li gel nimûneyên wan ên zazakî ji xebata Kırkanî (2021a, rr. 211-215) hatine wergirtin, li gel bergindên wan ên kurmancî nîşan dide.

Cure	Daçek	Wate	Kurmancî	Nimûne	
				Zazakî	Kurmancî
Pêşdaçek	be/ve	berê xwe dan	bi/bo	Ez şona be/ve Dersim	Ez diçim (bo) Dêrsimê
	bê	rewşa tunebûnê	bê/bêyî	Bê şima ez keye ra nêvejîyêna	Bê/bêyî we ez ji malê dernakevim.
	bi	pev re bûn, amûr	bi	Mi no kitab bi peranê xo herîna	Min ev pirtûk bi pereyên xwe kirî
Paşdaçek	de	bûn, man	de/da	Ewro keyneke keye de ya	Îroj keçik mal da ye
	rê	berê xwe dan	ji..ra (bazinedaçek)/ji bo (pêşdaçek)	Dersa min siba înan rê ya	Dersa min sibê ji wan ra ye
	ra	rewşa derketinê	ji (pêşdaçek)	Ti kitaban ey ra gêne	Tu pirtûkan ji wî distînî
Bazinedaçek	bi.. (y)a	pev re bûn	bi...ra	Ewro wa o zî bi ma ya bêro	Îroj bila ew ji bi me ra bê

	bi...ra	pev re bûn	bi...ra	Ez şamî bi nanî ra wena	Ez şîvê bi nanî/nên ra dixwim
--	---------	------------	---------	--	---

Helbet hin ji van daçekên zazakî wateyên dîtir ên di tabloyê da çêdikin, lê ji ber ku mijara me rasterast têkildar nine bi alîyê semantîk ên daçekan ve, li vir em li ser vê mijarê ranawestîn¹⁵. Ji alîyê din ve, wekî ji tabloyê diyar dibe hin daçekên ku di zazakî da wek paşdaçek kar dikin, di kurmancî da wek pêşdaçek kar dikin (bo nimûne *raya zazakî û jiya kurmancî*). Ev cudahî di binyada frêzî da tekildar e bi pozîsyona sereyê ve ku li jêr di dardîagramên (25)an da hatîye nîşandan. Dardîagramên (24)an binyada *FDyên* ku pozîsyona sereya wan heman e, nîşan dide.





¹⁵ Di warê daçekên di zazakî da ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Kaçan, 2018.

2.1.1.4. Frêza Îzafeyî

Wekî me berê jî nîşan dabû îzafe pêgirêdayîyan/modîffiyekeran bi navdêra sere ve girê dide. Em divê bêjin pêgirêdayîyên ku li vir behsa wan tê kirin, paş-modîffiyeker (post-modifier) in. Lewma *avahîya îzafeyê* (ezafe construction), taybetmendîyeka wan zimanan e ku bêjerêzîya *FN*ya wan sere-pêş e (bo nimûne farisî, zaravayên kurdî, hewramî (Hawrami), zazakî (Zazaki), kirmaşanî (Kermanian) û yd.) (Samvelian, 2008, r. 342). Yonat jî dibêje avahîya îzafeyê, yek ji taybetmendîyên bingehîn ên kurmancî ye (2020a, r. 53). Di avahîya îzafeyê da, îzafe sereyeka kargînî ye. Di kurmancî da hêmana îzafeyê li gor zayend û jimarê sê cure ye: *ê/î* (nêrza-yekjimar), *a/e* (mêza-yekjimar), *ên* (nêtar-pirjimar). Li ser guherîna forma îzafeyê ya nêrza-yekjimar (wekî *ê* → *î*) û mêza-yekjimar (wekî *a* → *e*) diyartîya (definiteness) navdêrê bandorker e. Tabloya jêrîn formên îzafeyê yên di kurmancî da li gel nimûneyên wan nîşan dide. Diyartî di kurmancî da bi gireya sifirê, nediyartî bi gireya *-ekê* (yekjimar) û *-in* (pirjimar) tê kodkirin.

Zayend-jimar	Îzafe		Diyar	Nediyar
	Diyar	Nediyar		
Nêrza-yekjimar	ê	î	<i>heval-ê min</i>	<i>heval-ek-î min</i>
Mêza-yekjimar	a	a/e	<i>heval-a min</i>	<i>heval-ek-a/e min</i>
Nêtar-pirjimar	ên		<i>heval-ên min</i>	<i>heval-in-ên min</i>

Îzafe her carê temamkerekê dixwaze, lewma nabe bi serê xwe bê bikaranîn. Haig nîşan dide ku di kurmancî da îzafe pêgirêdayîyên kategorîyên cuda bi navdêra sere ve têkildar dike (wekî navdêr, rengdêr, frêza daçekî, risteya pêwendîyê (relative clause)) (bnr. 2011, rr. 365-367). Ev pêgirêdayî di xebata me da temamkerên îzafeyê ne. Lewma îzafe dikare *FN*, *FD*, *FR*, an jî *FTEM*ekê wek temamker werbigire (wekî di (27)an da). Binyada giştî ya frêza îzafeyî di kurmancî da bi awayê (26)an e.



Di zazakî da jî wekî di kurmancî da îzafê li gor jimar û zayendê sê cure ye. Grûba Xebate ya Vateyîyê (ji vê şunda *GXV*) cureyên îzafeyê wiha diyar dike: *ê* (nêrza-yekjimar), *a* (mêza-yekjimar), *ê/i* (nêtar-pirjimar) (2005, rr. 44-45). Li gel vê, cuda ji kurmancî, di zazakî da, di hin rewşan da wekî Larson û Yamakido (2008, r. 2008), Gündüz (2013, r. 69) û Arslan (2022, r. 408) nîşan didin, hêmana îzafeyê ya ku nêrza-yekjimarîyê kod dike, dema modîfîyekera navdêrê rengdêr be dibe *o*¹⁶. Bo nimûne:

(28)

a. *kitab-ê mi* / krm. *pirtûk-a min*

b. *kitab-o sûr* / krm. *pirtûk-a sor*

Wekî di kurmancî da, di zazakî da jî nediyarî bi hin gireyên diyar ve pêk tê. *GXV* diyar dike ku forma nediyarîyê ya yekjimarîyê bi gireya *-êk/êd/êndê* pêk tê. Ji alîyê din ve li ser forma îzafeya nêrza-yekjimar bandora diyartîya sereyê jî heye. Di rewşa diyar da, ev îzafê di forma *êyê* da ye, lê dema nediyarî hebe ew dibe *o/e* (bnr. 2005, r. 46). Di vê xebatê da em dê gireya nediyarîyê wek *-êk*, forma îzafeyê ya ji bo nêrza-yekjimarê, ji bo rewşa nediyar wek *o* bi kar bînin. Tabloya jêrîn cureyên îzafeyê yên di zazakî da nîşan dide.

¹⁶ Todd (2008, rr. 91-93) û Werner (2012) forma *oyê* ya îzafeyê wek *frêza sêwirker* (descriptive ezafê), îzafeya *êyê*, ya nêrza-yekjimarê, wek *îzafeya xwedîtîyê* (genitive ezafê) bi nav dikin û her duyan cuda dinirxînin. L. Paul (bnr. 2009, r. 563) û Gündoğdu û Bulan (2023) sedema forma *ê* û *oyê* ya îzafeyê bi rewşa rêzimanî ya frêza navdêrî têkildar dikin. Li gor wan eger *FN* di rewşa *XWERÛ* (DIRECT) da be îzafê wek *o*, eger di rewşa *TEWANGê* (OBLIQUE) da be wek *ê* pêk tê.

Zayend-jimar	Îzafe		Diyar	Nediyar
	Diyar	Nediyar		
Nêrza-yekjimar	ê/o	o	<i>embaz-ê mi</i> (krm. <i>heval-ê min</i>)	<i>embaz-êk-o mi</i> (krm. <i>heval-ek-î min</i>)
Mêza-yekjimar	a	a	<i>embaz-a mi</i> (krm. <i>heval-a min</i>)	<i>embaz-êk-a min</i> (krm. <i>heval-ek-a min</i>)
Nêtar-pirjimar	ê		<i>embaz-ê mi</i> (krm. <i>heval-ên min</i>)	

Di kurmancî da îzafe her carê kes û jimarê jî kod dike. Lê di zazakî da îzafeya nêtar-pirjimar (*ê*) jimarê her carê kod nake. Bo nimûne dema *FN*ya pirjimar di *REWŞa TEWANGê* da be, îzafe piştî gireya pirjimarîyê cih digire. Di nimûneya jêrîn da îzafe (*ê*) piştî gireya pirjimarîyê (*-anê*)¹⁷ cih digire. Lê wekî di berginda wê ya kurmancî da xuya dike îzafe (*ên*) di heman demê da jimarê jî kod dike.

(29) *Embaz-an-ê mi kitab wend / krm. Heval-ên min pirtûk xwend*

Di zazakî da îzafe, heman kategorîyên temamker ên îzafeya kurmancî werdigire. Lê wekî Gündoğdu û Bulan (2023) jî diyar dikin, dema temamkera îzafeyê *FD*yek be, bi piranî li pêş wê pêwendîkera (relativizer) *-k/kî/keyê* cih digire. Di zazakîya standard da *ke* zêdetir tê bikaranîn. Em dê jî di vê xebatê da *keyê* tercîh bikin.

Di gelek xebatên rêzimana nerîfî ya kurmancî da îzafe cih digire. Lê îzafe bi piranî wek gireyek tê nirxandin û wek *veqetandek* tê binavkirin (bnr. Bedirxan, 2010; Açar, 2014; Tan, 2015; Baran, 2018; Ocek 2019; Bakır, 2020). Ji alîyê din ve di gelek

¹⁷ Lezgîn (2015, r. 88) dibêje di zazakî da du cure gireyên pirjimarîyê hene: Di rewşa *XWERÛ* da *-î*, di rewşa *TEWANGê* da *-an* tê bikaranîn. Li gor vê, dema *FN* di rewşa *XWERÛ* da be *-îyê*, dema di rewşa *TEWANGê* da be *-anê* distîne. Bo nimûne *embaz-î kitab-an wanenê* (krm. *heval pirtûk-an dixwînin*). Di vê risteyê da *embaz* ('heval') di rewşa *XWERÛ*, *kitab* di rewşa *TEWANGê* da ye. Lê Todd (2008, r. 40) fikreka din pêşkêş dike. Ew diyar dike ku em nikarin bêjin *-î* jî bo rewşa *XWERÛ* û *-an* jî bo rewşa *TEWANGê* gireyên pirjimarîyê ne. Li gor wî, du heb gireyên pirjimarîyê tune ne. Ew dibêje *-î* gireya pirjimarî ya sade ye, *-an* jî morfemeka portmantoyî (portmanteau) ya *TEWANG* û pirjimarîyê ye. Ji vî alîyê ve *-ana* zazakî û *-ana* kurmancî heman karî dikin ku her du jî hem *TEWANG* hem jî pirjimarîyê nîşan didin.

xebatên rêzimana kurmancî da îzafeya ku li pêş wê navdêrek tune ye, wek cihnav hatîye qebûlîkirin. (bnr. Bedirxan, 2010, rr. 75-77; Tan, 2015, r. 95; Bülbül, 2016, r. 29; Baran, 2018, r. 96; Bakır, 2020, rr. 98-99). Li gor vê boçûnê, bo nimûne di *pirtûk-a keçikê* da, dema *pirtûk* bikeve û *a keçikê* bimîne, *a* şûna *pirtûkê* werdigire.

Taybetmendîya sereka ya cihnavan ew e ku şûna *FNyan* werdigirin an jî berevajî wê, meriv dikare li şûna cihnavan *FNyan* bi cih bike. Lewma eger îzafeya cihnav be, li şûna wê jî em divê bikaribin *FNyekê*, bi cih bikin. Dema em di *a keçikê* da li şûna *ayê FNya pirtûkê* bi cih bikin, binyada **pirtûk keçikêyê* pêk tê, ne *pirtûka keçikê*, ku ya pêşîn di kurmancî da nerêzimanî ye. Lê bo nimûne di *pirtûka wêyê* da *wê* cihnav e û em dikarin li şûna *wêyê FNya keçikê* bi cih bikin ku bi vî rengî binyada *pirtûka keçikê* ya rêzimanî pêk tê. Nexwe diyar dibe ku îzafeya ne cihnav e.

Di hin xebatan da jî hatîye angaştîkirin ku di kurmancî da du cure îzafeyên hene. Haig (2011, r. 367) li ser şopa MacKenzieyî (1961, r. 66) jî bo îzafeyên ku bêyî navdêrekê, bi serê xwe tên bikaranîn (wekî nîmûneyên di paragrafa jorîn da) dibêje ew xwedî peywireka nîşanderî (demonstrative) yan jî anaforîk (anaphoric) in û wan wek *îzafeya nîşander/anaforîk* (demonstrative/anaphoric ezafeyê) bi nav dike. Di hin xebatên (bnr. Gündoğdu, 2023; Gündoğdu û yd., 2024) din da jî heman tişt hatîye angaştîkirin. Li gor vê boçûnê, du cureyên îzafeyê wiha ne: *îzafeya girêdar* (linking ezafeyê) (îzafeya ku piştî navdêrê cih digire) û *îzafeya anaforîk* (an jî ya *nîşander*) (bêyî navdêr e). Haig li heman derê dibêje berevajî îzafeya girêdar, îzafeya anaforîk li derveyî frêza ku pêşaneya wê tê da xuya dike, bi cih dibe. Dîsa dibêje her çiqas nîqaş li ser hebin jî esas ev îzafeya sereka cihnavî (pronominal) ya frêza xwe ye. Anku diyar dibe ku li gor vê nihêrînê jî îzafeya ku bi serê xwe tê bikaranîn, cihnav(î) ye. Em li nîmûneyên jêrîn ên Haigî (2011, r. 368) binihêrin.

(30)

a. *şev-ên zivistanê dirêj in, yê havînê kurt in*

b. *Yê Soro / yê min / yê te*

Eger em li gor boçûna paragrafa jorîn bêjin em divê bêjin îzafeya *(y)ênê* ya di (30a)yê da, li derveyî frêza sereka ku ew amaje pê dike (*şev*) cih digire û di (30b)yê da jî îzafeya *(y)êyê* wek cihnav kar dike.

Lê ev mijar her carê bi vî awayî nehatîye qebûlîkirin. Aslan van cure *Fîyên* bêyî navdêrek wek *kêmravek* bi nav dike, îzafeyê wek cihnav qebûl nake û ew diyar dike ku di van binyadan da raveber (di xebata me da navdêra sere) nayê gotin (2018, rr. 58, 113-114, 157). Em jî li gel vê fikre ne. Bi ya me jî ev rewş jî ber sedemên pragmatîk pêk tê. Lewra ev cure avahî di nav konteksteka diyar da tîrîkî bîkaranîn û berîya çêkirina risteyê, navdêra ku *Fî* temamkera wê ye, di axivtina pêşîn da tê diyarkirin. Bo nimûne dema kesek risteya "Min pirtûka te dît"ê bêje û piştî bixwaze bizanibe kesê/a li hember wî/wê "pirtûk" a wî/wê dîtîye yan na, dibe ku risteyeka wekî "Te ya min dît?" bêje. Ji ber *prensîba ekonomîya di zimanî da* (the economy principle in language)¹⁸ *pirtûk* carek din nayê dubarekirin. Wek encam, bi ya me ev cure avahî li k-binyadê wiha ne: *X-Fî*. *X* dibe ku her cure navdêreka guncav be ku ji avahîyê tê xistin (bo nimûne: *pirtûk-a te, dar-a li gund* û yd.). Ji ber vê, dema axiver *Xê* binav neke jî esas ew li k-binyadê tê hilberîn.

Di nimûneya (30a)yê da jî bi ya me kiryarêka jêbirinê pêk tê; berîya her tiştî di (30a)yê da du heb riste hene (*şevên zivistanê dirêj in* û *yên havînê kurt in*). Ji ber ku di risteya yekem da *şev* hatîye bîkaranîn, di ya duyem da ew tê xistin. Lewma tiştên ku me di paragrafa jorîn da gotin, ji bo van cure nimûneyan jî derbasdar in. Em forma temam a (30a)yê weha diyar dikin:

(31) *şevî-ên zivistan-ê dirêj in, şevî-ên havînê kurt in*

Wekî hevîndeksîya *[i,i]*yê nîşan dide, esas *(y)êna* di risteya duyem da (*(y)ên havînê kurt in*) refere bi *şeva* pêşîn (*şev-ên zivistan-ê dirêj in*) nake. Ew piştî sereya xwe tê. Lê ji ber ku her du *şev* hevîndeks in, a duyem tê jêbirin. Divê em bêjin hemanbûna *şevan* nayê wê wateyê ku di nimûneyê da bi tenê yek *şev* heye. Du heb *şev* hene, lê ji ber ku ev her du *şev* amaje bi heman tiştî dikin, yek tê jêbirin. Eger ev ji ber sîntaksê pêk bihata û îzafeya duyem anaforîk bûya, hewce bû me nikarîbûya navdêreka din li pêş wê bicih bikira, lê em dikarin binyadeka wekî ya jêrîn çêkin:

(32) *şevî-ên zivistanê dirêj in, rojî-ên havînê dirêj in*

¹⁸ Mirov dema diaxivin gelek caran hewl didin bi vegotinên herî kurt û zelal fikrên xwe derbirînin. Ev dike ku axaftin bi serfikirina enerjîyeka kêmtir û di wextekî kurttir da pêk bê. Ev rewş, wek *prensîba ekonomîya di zimanî da* tê zanîn. Di çarçoveya vê *prensîbê* da bo nimûne hin bêje tîrîkî kirin, hin bêjeyên ku berê behsa wan hatîye kirin an jî tîrîkî texmînîkirin nayên gotin û yd.

Di risteya (32)yan (ya rast di "risteyên" (32)yan da) da *şev* û *roj* hevîndeke ninin, lewma jî jêbirina *rojê* pêkan nine, dema ev bê jêbirin binyada *?şev-ên zivistanê dirêj in, ên havînê dirêj inê* (?a li serê binyadê, ji bo rewşa xumamîyê bê nîşankirin, hatîye bikaranîn) dê pêk bê ku ji aliyê wateyî ve xumam e; wateya wê û ya (32)yan ne yek e. Ji ber vê, dema her du navdêrên sere ne heman bin, jêbirin pêkan nine. Wek encam bi ya me di kurmancî da îzafeyeka bi nav û cureya îzafeya nîşander an jî ya anaforîk tune ye. Hew îzafeyek heye ku ew jî pêgirêdayîyan bi navdêra sere ve girêdide. (Ji bo delîleka din a ji bo angaşt tunebûna îzafeya anaforîk ku têkildar e bi ROLê bnr. perawêza 43yan).

2.1.1.5. Frêza Navdêrî

Di kurmancî da pêgirêdayî/modîfîyekerên navdêran dikarin li pêş an jî piştî navdêra sere cih bigirin. Lê wekî Bilbil (2017, r. 20) jî diyar dike di kurmancî da modîfîyekerên piştî sereyê zêdetir tîn bikaranîn û zêdetir kompleks in. Heman tişt ji bo zazakî jî derbasdar e. Di nimûneyên *çend pirtûk* (zz. *çend kitab-î*), *hemû zarokê* (zz. *heme qeçek-î*) da bi rêzê *çend* û *hemû* (zz. *heme*) pêşmodîfîyeker in (di nimûneyên zazakî da -îya li ser *FN*yan pirjimarîyê nîşan dide). Ji ber ku pêşmodîfîyeker bêyî îzafeyê li navdêra sere ve tîn girêdan, di xebata me da hebûn an tunebûna wan guherînên giring pêk nayîne. Ji ber vê em dê li vir li ser pêşmodîfîkeran ranewestin. Lê pašmodîfîyeker ku bi îzafeyê li sereyê tîn zêdekirin, dê di xebatê da di nîqaşên cuda da derkevin pêşberî me. Ji ber ku pašmodîfîyeker bi îzafeyê li navdêra sere tîn zêdekirin, binyadeka wekî **pirtûk sor* (zz. **kitab sûr*) nerêzimanî ye. Binyada rêzimanî bi awayê *pirtûk-a sor* (zz. *kitab-o sûr*) tê çekirin. Bi vî awayî diyar dibe ku di kurmancî û zazakî da piştî navdêran bi tenê *FÎ* dikarin bi cih bibin¹⁹.

Me got di frêzan da temamker û zêdek hene (niha em nîşankeran li derveyî nîqaşê dihêlin) û dîsa me got di hin cure frêzan da temamker her carê ne hêmana pêwist e. Dema mijar *FN* bin, mecbûrîtiya temamkeran li gor cureya *Nyê* diguhere.


(33) a. *Pirtûk baş e*

¹⁹ Bilbil (2017, r. 28) di nimûneyên wekî *heval hemû nexweş inê* da *hemûyê* wek modîfîyekerêka piştî navdêrê nîşan dide ku bi vî rengî berevajî gotina me, *hemû* bêyî îzafeyê li navdêrê hatîye zêdekirin. Ebûzeîd (bnr. 2019, rr. 84-85) bi nimûneya *ew hemû dizaninê* nîşan dide ku riste di bingehe da bi awayê *Hemû ew dizaninê* ye, lê ew cih diguhere bo berîya *hemûyê* û risteya *Ew hemû dizaninê* pêk tê. Di vê mijarê da em jî qebûl dikin di van cure nimûneyan da cihguherîn pêk tê.

b. ?*Xwendin baş e*

Rêzimanîya (33a)yê û xumamîya (33b)yê bi cureya navdêran ve têkildar xuya ye. Di (33b)yê navdêra *xwendinê* lêkernavek (derived nominal) e. Lewma çawa ku dema ew di risteyekê da wek sereya *FL*yekê kar dike, eger argumentên wê kêm bin nerêzimanî pêk tê, li vir jî kêşe ji ber heman sedemê pêk tê. *Xwendin* lêkereka têper e, divê xwedî temamkerekê be, ji ber vê, di (33b)yê da jî ev temamker divê pêk bê. Bo nimûne em dikarin binyadê bi awayê *xwendina pirtûkan baş eyê* rêzimanî bikin. Lê heman kêmasî ji bo (33a)yê tune ye. Nexwe ji aliyê temamkerê ve em dikarin *FN*yan bikin du kom: *FNyên ku temamkerekê dixwazin* û *FNyên ku temamkerekê naxwazin*.


Navdêrên rehî (simple) temamkeran naxwazin, lê ew nayê wê wateyê ku ew temamkeran wernagirin. Wekî me dîtibû frêza ku li gel navdêra sere têkilîya xwedîtiyê çêdike, temamker e. Binyada frêzî ya her du cure *FN*yan ji bo kurmancî û zazakî li jêr hatîye nîşandan. Li jêr di (34a)yê da, *FÎ* (*Î''*) di nav kevanekê da hatîye nîşandan, ev xwestekîtiya wê, di (34b)yê da bêyî kevanek hatîye nîşandan ku ev jî mecbûrîtiya *FÎ*yê nîşan dide.




2.1.1.6. Frêza Diyarkerî

Li jor me nîşan da ku diyarker, li pozîsyona nîşankerî ya *FN*yê cih digirin. Pêgirêdayîyên sereyan ne bêjeyî ne, frêzî ne, lê wekî Cook û Newson (2007, r. 105) dibêjin diyarker ne frêzî, lê bêje ne. Cara pêşîn Abneyî (bnr. 1987, rr. 265-297) li gor hin çavdêriyên zimanî pêşniyaz kiriye ku diyarker di bingeha xwe da sereyên kargînî ne û *FN* jî wek temamkera diyarkerê qebûl kiriye. Ev pêşniyaz bi awayekî giştî hatîye qebûlkin. Em dê jî ji vê şûn da *FN*yan wek temamkerên diyarkeran nîşan bidin. Di


binyada frêzî da pozîsyonên ku heta niha ji alîyê *FN*yan ve dihatin dagirtin, dê ji vê şûn da ji alîyê frêzên diyarkerî (*FDI*) ve bên dagirtin, lê *FN* dîsa wekî her frêzê xwedî binyadeka hîyerarşik a hundirîn e. Binyada frêzî ya *FDI*yê (*DI'*) bi awayê jêrîn e:



Sereya *FDI*yê diyarker (determiner) in. Di kurmancî da hin hêmanên ku wek diyarker kar dikin, nîşander (demonstrative) (wekî *ev/vê*, *ew/wê/wî*, *van/wan*), diyarkerên ne-refereyî (non-referential) (wekî *her*, *ti*, *filan* û yd.) (bnr. Bilbil, 2017, rr. 26-27), hin cure cihnavên kesane (*em*, *hûn*) (bnr. Akgül, 2024, r. 70) (wekî ***em*** *xwendekar baş in*, ***hûn*** *xwendekar baş in*) ne. Di zazakî da jî nîşander (wekî *no* (nêrza) / *na* (mêza) / *nê* (pirjimar) ('ev/ev/van'), *o* (nêrza) / *a* (mêza) / *ê* (pirjimar) ('ew/wê/wan')), diyarkerên ne-refereyî (wekî *her* ('her'), *tay* ('hin'), *filan* ('filan')), cihnavên kesane (wekî *ma* ('em') *şima* ('hûn')) wek diyarker kar dikin. Binyada *FDI*yê di kurmancî û zazakî da bi heman awayî ye û bi nimûneyên jêrîn hatîye nîşandan.



Diyarker ne pêşmodîfîyeker in, Cook û Newson (2007, r. 107) nîşan didin ku dema pêşmodîfîyeker bên bikaranîn ew li pozîsyona nîşankerî ya *FN*yê bi cih dibin. Bo nimûne di *FDI*ya *ev gelek mirovên başê* (zz. *nê zaf merdimê baş-î*) da frêza hokerî (*H'*) ya *gelekê* pêşmodîfîyeker e û li pozîsyona [*nîş*, *FN*]yê bi cih dibe.




2.1.1.7. Frêza DEMê

Wekî me li jor diyar kiribû, li gor *X*-barê riste jî tê da her cure frêz xwedî heman binyada frêzî ye. Ji ber vê, riste jî xwedî sereyekê ye û riste derdaneka vê sereyê ye. Chomsky (1986, rr. 160-161; 1988, r. 52) diyar dike ku di risteyekê da, sereyeka bi navê *DEMê*²⁰ heye ku *DEM* an *demdar* (finite) (xwedî taybetmendîya [+*dem*]ê ye) an jî *nedemdar* (infinite) (xwedî taybetmendîya [-*dem*]ê ye) e. Derdana navîn a *DEMê* (*DEM'*) ji *DEMa* sere û *FLya* temamkera wê pêk tê.

Wekî me berê dîtibû, bikera *FDEMê*, li k-binyadê li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih digire, lê li r-binyadê cih diguhêre bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê* ([*nîş*, *FDEM*]). Di bin *DEMê* da li k-binyadê hêmanên wekî *Dem*, *Rawe* û *Kesê* cih digirin (wekî di (38)an da).


²⁰ Berîya qebûlkirina *DEMê*, hatîye qebûlkirin ku sereya risteyê *K*(êş) (*INFL*(ection)) e. Anku her riste wek derdaneka *Kyê* hatîye qebûlkirin lewma jî riste wek *frêza kêşî* (*FK*) hatîye qebûlkirin. Di bin *FKyê* da hêmanên din ên wekî *rawe*, *xuyang*, *dem* (tense), *rêkeftin* (agreement), *jimar* (count), *pirsyarî* (interrogation) hatine bicihkirin, lê piştî demekê ev boçûn hatîye terikandin û hatîye qebûlkirin ku sereya risteyê *DEM* e. Lewma di hin xebatên berîya qebûlkirina *DEMê* da, li gor boçûna berê sereya risteyê wek *K* hatîye nîşandan. Di vê xebatê da dema amaje bi wan xebatan bê kirin an jî ji wan nimûne bîn wergirtin li şûna *Kya* wan, *DEM* dê bê bikaranîn.

(38)



Hin ji van hêmanên li bin *DEM*ê, di risteyê da li ser lêkerê xuya ne. Bo nimûne *Dilan dê pirtûkê bi-xwîn-eyê* (zz. *Dilane do kitabî bi-wan-o*). Ji bo ku ev pêk bê, lêker (an jî ev hêman) divê cih biguhere û bi van gireyan ve bizeliqe. Jixwe di bin movikekê da bicihkirina ji duduyan zêdetir movikên din, li gel taybetmendîya *du-şaxîti* (binary branching) ya X-barê li hev nake. Lewra wekî me dît, her movik dikare herî zêde du movikan şax bide. Ji ber vê, em dikarin her yek ji movikên bin *DEM*ê wek frêzeka serbixwe (wekî *frêza raweyê*, *frêza rêkeftinê* (ji bo gireya *kesê*), *frêza xuyangê* û yd.) bi cih bikin. Di vê rewşê da dema hewce be lêker dê cih biguhere û bi wan ve bizeliqe. Divê bê gotin, ji bo risteyê çêkirina binyadeka frêzî ya bi vî rengî, ji ya me zêdetir raveker û hurgilîtir be jî ev mijar rasterast têkildar bi mijara me ve nine û ji bo armancên xebata me guherînên giring pêk nayîne. Ji ber vê, li gel ku em hebûna frêzên serbixwe yên wekî *Rawe*, *Rêkeftin*, *Xuyangê* qebûl dikin, em dê wan di binyada frêzî ya risteyê da nîşan nedin. Ji aliyê din ve ji bo sadekirina dardîagraman, em dê li k-binyadê wekî li r-binyadê, lêkerê, ku hebin li gel gireyên wê binivîsînin. Dîsa em dê r-binyada *FDEM*ê, wekî nimûneya di (39)an da nîşan bidin. Di nimûneya jêrîn da *DEM* bi *dêyê* (zz. *do*) dagirtî ye. Di demên borî da ev movik bi piranî bi hêmanên razber ên wekî *BORÎ*, *NIHA* yan jî bi nîşana *Î* dagirtî ye. Ji ber ku dagirtina vê movikê rasterast bi mijara me ve têkildar nine, heta bi awayekî aşkere dagirtî nebe em dê movika *DEM*ê vala bihêlin.


(39)



2.1.1.8. Frêza Temamkerî


Li jor *FDEM* wek risteyek xuya bike jî, ew jî wek temamkera *TEM*(amker)ê (COMP(lementizer)) pêk tê. Chomsky dibêje risteyeka temam ji alîyê *TEM*ê ve tê birêvebirin, lewma jî *FTEM*ek e (2015, r. 49). *TEM* di kurmancî da bi piranî bi hêmanên wekî *ku*, *da*, *da ku*, *gelo*, *ji boyê* pêk tê. Di zazakî da jî bi hêmanên wekî *ke* ('ku'), *gelo* ('gelo'), *sebayê* ('seba/ji bo') pêk tê. Binyada frêzî ya *FTEM*ê weha ye:

(40)



Di kurmancî û zazakî da *TEM* dibe ku bi awayekî aşkere pêk bê yan jî vala be. Di kurmancî da ev li gor cureya *TEM*ê diguhere. Bo nimûne dema *TEM ku* be, dibe ku neyê bikaranîn, lê dema *TEM gelo* be, tunebûna wê nebe sedema nerêzimanîyê jî ew gelek caran bi awayekî aşkere pêk tê. Di zazakî da jî bi heman awayî *ke* dibe ku bê bikaranîn an jî neyê bikaranîn. Li jêr r-binyada *FTEMa Gelo zarok pirtûkan dixwînin?*ê

(zz. *Gelo qeçek-î kitabān wanenê?*) hatîye nîşandan. Ji ber ku binyada *FDEMê* li jor hat nîşandan ew dê li vir dîsa bi awayekî vekirî neyê bicihkirin.



2.2. REWŞA RÊZIMANÎ DI KURMANCÎ Û ZAZAKÎ DA

Di vê binbeşê da em dê bi kurtasî sîstema rewşa rêzimanî ya di kurmancî û zazakî da bidin nasîn. Lewra di *Beşa Sêyem* da em dê car caran hin mijaran têkildar bi rewşê ve nîqaş bikin. Danasîna rewşa rêzimanî ya li vê derê dê di çarçoveya rêzimana nerîtî da û li gor morfolojîyê bê kirin. Lê di *BGYê* da rewşên rêzimanî ji morfolojîyê wêdetir, ji alîyê sîntaktîkî ve tên vekolandin.

Rewş, sîstemeka nîşankirina navdêrên girêdayî ye li gor cureya têkilîya wan û sereyên wan. Têgeha rewşê, amaje bi nîşankirina kêşanî (inflectional) dike û bi awayekî giştî rewş, di risteyekê da têkilîya navdêrekê bi lêkerekê ve yan jî di frêzekê da têkilîya navdêrekê ya bi pêşdaçek, paşdaçek an jî navdêreka din ve nîşan dike (Blake, 2004, r. 1). Rewş têkilîyên rêzimanî kod dikin. Ev têkilîyên rêzimanî bo nimûne biker, berkar, berkara nerasterast û yd. in. Têkilîyên rêzimanî ji têkilîyên tematîk cuda ne. Lewra têkilîyên tematîk têkildar in bi wateyê ve, lê têkilîyên rêzimanî nîşan didin ku *FDIyek* di risteyekê da ji alîyê sîntaktîk ve peywireka çawa pêk tîne. Lewma morfolojîya ku têkildar e bi têkilîyên rêzimanî ve wek rewş tê binavkirin (bnr. Carnie, 2013, r. 336).

Ji bo rewşên di kurmancî da çend fikrên ji hevûdin cuda hene. Tan (2015, r. 91), İncekan (2014, r. 22), Yonat (2020b, r. 417) û Bingöl (2020, r. 65) ji bo kurmancî sê cure rewşan diyar dikin: rewşa TEWANGê, rewşa XWERÛ/RASTERAST (DIRECT) û rewşa BANGê/BANGKIRINê (VOCATIVE). Lê Blake (2004, r. 8) dibêje rewşa BANGê wekî rewşên din bi sereyekê ve ne di nav têkilîyekê da ye; li derveyî avahîya risteyê cih digire. Ji ber vê, her carê wek rewş nehatîye qebûl kirin. Haig (1998, r. 155), Bynon (2017, r. 96), Gündoğdu (2018, r. 327; 2022, r. 113) rewşa BANGê li der ve dihêlin û dibêjin di kurmancî da du heb rewş hene: XWERÛ û TEWANG.

Di kurmancî da rewşa XWERÛ bêtî gire ye (yan jî bi gireya sifirê ($\emptyset$) tê kodkirin), rewşa TEWANGê jî yan bi gireyên tewangê *-î* (nêrza-yekjimar), *-ê* (mêza-yekjimar), *-an* (nêtar-pirjimar) an bi cihnavên tewandî (wekî *min*, *te*, *wî*, *wê* û yd.) an jî di hin devokan da bi guherîneka dengî (dema di kêteya dawîn a bêjeyê da tîpa *ayê* hebe) ya bêjeyê (wekî *mast-î* → *mêst*, *şivan-î* → *şivên*) pêk tê. Di kurmancî da rewşa BANGê bi sê morfeman tê nîşankirin: *-o* (nêrza), *-ê* (mêza), *-ino* (pirjimar). Her sê cure rewşên TEWANG, XWERÛ û BANGê bi nimûneyên jêrîn hatine nîşandan.

(42) a. *Dîlan-ê pirtûk-Θ xwend*

b. *Heval-ino, hûn çi dikin?*

Di (42a)yê da *Dîlan* xwedî rewşa TEWANGê ye ku bi *-êyê*, *pirtûk* xwedî rewşa XWERÛ ye ku bi *Θê* û di (42b)yê da *heval* xwedî rewşa BANGê ye ku bi *-ino*yê hatiye nîşankirin. Wekî tê dîtin hêmana ku xwedî rewşa BANGê ye, li derveyî sînorên risteyê cih digire. Ji ber ku xebata me jî bi risteyê û hêmanên di nav risteyê da bisînorkirî ye, em dê rewşa BANGê li derveyî nîqaşên xwe bigirin.

Ji bo zazakî jî derbarê hejmar û cureya rewşan da em li rastî nihêrînên cuda tên. Todd (2008, r. 35) ji bo zazakî çar rewşan dijmêre: TEWANG, XWERÛ, CIH²¹ (LOCATIVE) û BANG. Baluken (2019, r. 30), Bingöl (2020, r. 65), Kırcan (2021b, r. 306) û Yıldız (2025, rr. 113-114) dibêjin di zazakî da sê heb rewş hene: TEWANG, XWERÛ û BANG (zz. *VENGDAYIŞ/VENGKERDIŞ*). Wekî ji bo kurmancî hatiye kirin, ji bo zazakî jî rewşa BANGê ji aliyên hin kesan ve li der ve hatiye hiştin; Gündoğdu û Bulan ji bo zazakî dibêjin rewşa XWERÛ û rewşa TEWANGê hene (2023). Di zazakî da rewşa TEWANGê bi gireyên *-î* (nêrza-yekjimar), *Θ* (mêza yekjimar), *-an* (nêtar-pirjimar), an jî bi cihnavên tewandî (wekî *mi/min* ('min'), *to* ('te'), *ey* ('wî'), *aye* ('wê') û yd.), pêk tê²², rewşa BANGê jî bi *-o* (nêrza-yekjimar), *-ê* (mêza-yekjimar) û *-êno/înoyê* (nêtar-pirjimar) pêk tê.

(43) a. *Dîlane-Θ kitab-an wanena* / krm. *Dîlan-Θ pirtûk-an dixwîne*

b. *Dîlane-Θ kitab-î wanena* / krm. *Dîlan-Θ pirtûk-ê dixwîne*

²¹ Todd (2008, r. 37) rewşa ku hêmana HEDEFî piştî lêkerê werdigire wek rewşa CIHê bi nav dike. Bo nimûne ew di nimûneya *ma-yê şinê Soyreg-tyê* ('Em diçin Sêwreg-ê') da *-iya* li ser *Soyregê* ('Sêwreg') wek nîşana rewşa CIHê diyar dike. Lê ev nîşana rewşa TEWANGê ye, lewma rewşa ku Todd wek CIH nîşan dide, em wek TEWANG disenifînin. Wek CIH diyarkirina vê rewşa TEWANGê, wesa xuya dike ji ber wê pêk tê ku Todd (2008, r. 36), dibêje di zazakî da navdêrên taybet gireya tewangê nastînin. Ji bo vê, nimûneya *Bêrîvan ez diyanê* (krm. *Bêrîvan-ê ez dîtîm*) nîşan dide. Di vê risteyê da li ser *Bêrîvanê* gireya tewangê tune ye. Todd (2008, r. 37) dibêje bi tenê li ser navdêrên mêza rewşa CIHê xuya dike ku wekî me nîşan da gireya wê wek *î* hatiye nîşandan. Nimûneyên Toddî ji herêma Çêrmûgê/Sêwregê ne. Di zazakîya Sêwregê da *îya* gireya tewanga mêza li ser biker û berkarê tê dîtin, lê ji ber ku *-i* dengdêreka lawaz (weak vowel) e, bihîstina wê zehmet e. Lewma meriv dikare di zazakîya Sêwregê da rastî risteya *Bêrîvan-î ez dîyayê* (krm. *Bêrîvan-ê ez dîtîm*) bê. Ji bo heman dengî Yıldız (2025, r. 114) dibêje di zazakîya Licê da jî wek qertafa tewangê tê bikaranîn û vê nimûneyê nîşan dide: *Ez Gul-î vînena* (krm. *Ez Gul-ê dibînim*)

²² Di zazakî da jî li hin herêman rewşa navdêrên nêrza wekî di kurmancî da bi guherîneka dengî pêk tê (bo nimûne *Hesen-î* → *Hesên*) (bnr. Yeşilkaya, 2019, r. 37), lê ev rewş bi qasî di kurmancî da, ne berbelav e.

c. *Dîlane-TWNG kitab-î-Θ wend-î* / krm. *Dîlan-ê pirtûk-Θ xwend-in*

d. *Embaz-êno, şima se kenê?* / krm. *Heval-ino, hûn çi dikin?*

Di (43a)yê da *-an* û di (43b)yê da *-îya* li ser *kitabê* ('pirtûk') bi rêzê rewşa TEWANGê ya *kitabê* nîşan didin. Di (43c)yê da *-TWNG* jî rewşa TEWANGê ya *Dîlaneyê* nîşan dide. Di di (43c)yê da li ser *kitabê* wekî di (43b)yê da *-î* xuya ye. Ev *-î*, ne gireya tewangê, ya pirjimarîyê ye. Lewma di (43c)yê da rewşa *kitabê* ne TEWANG, XWERÛ ye (nîşana *Θê* vê rewşa XWERÛ nîşan dide). Di (43c)yê da *-îya* li ser lêkera *wendeneyê* ('xwendin') pirjimarîya *kitabê* nîşan dide. (43d), reşwa BANGê ya *FDIya embazê* ('heval') nîşan dide. Ji bo zazakî jî em dê rewşa BANGê li derveyî nîqaşên xwe bigirin.

Li gel van rewşên morfolojîk, Karaca (2021) ji bo kurmancî û Yıldız (2025) jî ji bo zazakî behsa hin rewşên semantîk dikin. Rewşên semantîk ên ku di van xebatan da behsa wan tê kirin, bi saya daçekan çêdibin. Bo nimûne hin ji rewşên semantîk ên ku Karaca nîşan dide LÊBÛNÎ/LOKATÎVÎ (bo nimûne *li mal-ê*), JÊBÛNÎ/ABLATÎVÎ (bo nimûne *ji mal-ê*) ye. Ji aliyê semantîk ve di navbera hêmanên navdêrî (*mal*) yê van avahîyên daçekî da cudahî hebin jî wekî xuya dike, ew ji aliyê morfolojîk ve bi heman awayî, bi rewşa TEWANGê nîşankirî ne. Ji ber vê, em dê wan hemûyan wek heman rewş qebûl bikin. Eger em rewşa BANGê û rewşên semantîk li derve bihêlin wekî xuya dike ji aliyê morfolojîk ve di kurmancî û zazakî da du cure rewş hene: TEWANG û XWERÛ.

Di kurmancî û zazakî da cihnavên kesane û cihnavên nîşanî ji aliyê formê ve du cure ne: *Cihnavên xwerû* û *cihnavên tewandî*. Her sê tabloyên jêrîn bi rêzê forma rewşa XWERÛ û ya TEWANGê ya navdêran (an jî *FDIyan*), a cihnavên kesane û ya cihnavên nîşanî yê di kurmancî û zazakî da nîşan didin. Di çekirina tabloyan da ji bo beşên kurmancî ji Haig (1998, r. 155), Tan (2015, rr. 125-130) û Baranî (2018, rr. 85-91) ji bo beşên zazakî ji GXV (2005, rr. 63-66), Lezgîn (2015), Arslan (2016), Bingöl (2017, 2020), Başaran (2019), Kırkanî (2021b) sûd hatîye wergirtin²³.

²³ Di zazakî da li ser navdêrên mêza-yekjimar gireya *-eyê* heye. Bo nimûne di *keynekeyê* da *keyneke* berginda *keçika* kurmancî ye, *-eya* li ser *keynekê* jî mêzatiya wê nîşan dide. Di Çelik Dinçerê (2021, rr. 38-39) da ev *-e*, wek nîşana rewşa TEWANGê hatîye nîşandan. Lê li hin herêman li ser navdêrên mêza *-e* tune ye (bnr. Yeşilkaya, 2019, rr. 23-24). Di kurmancî da li ser navdêran gireyeka ku zayenda wan nîşan dide, tune ye. Gündüz (2013, r. 35) ji bo zazakî diyar dike ku dema navdêrên mêza

Gireyên Rewşa XWERÛ û ya TEWANGê ya Navdêran/FDIyan di Kurmancî û Zazakî da				
	Kurmancî		Zazakî	
Zayend-jimar	XWERÛ	TEWANG	XWERÛ	TEWANG
Nêrza-Yekjimar	-Θ	-î	-Θ	-î
Mêza-Yekjimar	-Θ	-ê	-Θ	Θ
Nêtar-Pirjimar	-Θ	-an	-Θ	-an

Formên Rewşa XWERÛ û ya TEWANGê ya Cihnavên Kesane di Kurmancî û Zazakî da				
	Kurmancî		Zazakî	
Zayend-jimar	XWERÛ	TEWANG	XWERÛ	TEWANG
K1.Y. (kesê yekemîn ê yekjimar)	<i>ez</i>	<i>mîn</i>	<i>ez</i>	<i>mi/mîn</i>
K2.Y. (kesê duyemîn ê yekjimar)	<i>tu</i>	<i>te</i>	<i>ti/tu</i>	<i>to</i>
K3.Y. (kesê sêyemîn ê yekjimar)	<i>ew</i>	<i>wî (nêrza), wê (mêza)</i>	<i>o (nêrza), a (mêza)</i>	<i>ey (nêrza), aye (mêza)</i>
K1.P. (kesê yekemîn ê pirjimar)	<i>em</i>	<i>me</i>	<i>ma</i>	<i>ma</i>
K2.P. (kesê duyemîn ê pirjimar)	<i>hûn</i>	<i>we</i>	<i>şima</i>	<i>şima</i>
K3.P. (kesê sêyemîn ê pirjimar)	<i>ew</i>	<i>wan</i>	<i>ê</i>	<i>înan</i>

vê gireyê werbigirin jî di rewşa wan a XWERÛ da guherînek pêk nayê. Yeşilkaya (2019, r. 37) jî ji ber ku vê -eyê di rehê bêjeyê da bi cih dike, dibêje hem di rewşa XWERÛ hem di ya TEWANGê da -e li ser bêjeyê dimîne. Di xebata xwe da em dê -eyê wek gireya tewangê nîşan nedin. Lewma hem rewşa XWERÛ hem jî ya TEWANGê em dê bi heman awayî, bo nimûne wek *keyneke* nîşan bidin.

Formên Rewşa XWERÛ û ya TEWANGê ya Cihnavên Nîşanî di Kurmancî û Zazakî da				
	Kurmancî		Zazakî	
	XWERÛ	TEWANG	XWERÛ	TEWANG
Nêzik-Yekjimar	<i>ev</i>	<i>vî</i> (nêza) <i>vê</i> (mêza)	<i>no</i> (nêza) <i>na</i> (mêza)	<i>ney</i> (nêza) <i>naye</i> (mêza)
Dûr-Yekjimar	<i>ew</i>	<i>wî</i> (nêza) <i>wê</i> (mêza)	<i>o</i> (nêza) <i>a</i> (mêza)	<i>ey</i> (nêza) <i>aye</i> (mêza)
Nêzik-Pirjimar	<i>ev</i>	<i>van</i>	<i>nê</i>	<i>nînan</i>
Dûr-Pirjimar	<i>ew</i>	<i>wan</i>	<i>ê</i>	<i>înan</i>

Li gor sîstema rewşa rêzimanî, kurmancî û zazakî xwedî du sîsteman e: Ergatîv/absolutîv (ergative/absolutive) û nomînatîv/akûzatîv (nominative/accusative). Tan (2015, r. 87) ji bo ergatîvîyê weha dibêje:

...ew tişt e ku di zimanekî da biresera [berkar] lêkera gerguhêz [têper] û kirdeya [biker] lêkera negerguhêz [têneper] bi heman morfema kirdarî werin nîşandan. Her wiha lêkera kirdeya gerguhêz bi morfemeke din were nîşandan... Kurdî [kurmancî] bi tenê di demên borî de ergatîv e, di demên niha de akûzatîv e...[lewma] Kurdî niv-ergatîv e.²⁴

Di zimanên koma akûzatîv da jî bikera lêkera têper û ya têneper bi heman rewşê (rewşa NOMÎNATÎV (NOMINATIVE)), berkara lêkera têper bi rewşeka cuda (rewşa AKÛZATÎV (ACCUSATIVE)) tê kodkirin (Carnie, 2013, r. 340). Rewşên her du sîsteman di nimûneyên jêrîn da xuya dikin.

(44) a. *Ez-Ø çûm* / zz. *Ez-Ø şîya*

b. *Min pirtûk-Ø xwend* / zz. *Mi kitab-Ø wend*

c. *Ez-Ø diçim* / zz. *Ez-Ø şîna*

²⁴ Niv-ergatîvî wek *ergatîvîya şikeştî* (split ergativity) jî tê zanîn.

d. *Ez-Θ pirtûk-ê dixwînim* / zz. *Ez-Θ kitab-î wanena*

Wekî di (44a) û (44b)yê da xuya dike, *eza* bikera lêkera *çûnê* (zz. *şîyayene*) ya teneper û *pirtûka* (zz. *kitab*) berkara lêkera *xwendinê* (zz. *wendene*) ya têper bi heman morfema sifirê (*Θ*) hatine kodkirin, lê bikera (*min* (zz. *mî*)) risteya di (44b)yê da ji van her duyan cuda, di forma tewandî da ye. Kurmancî û zazakî ji vî alîyî ve ergatîv in. Lê ev bi tenê di demên borî da pêk tê, lewra wekî di (44c) û (44d)yê da xuya dike, wextê, dema risteyê ne-borî be, bikerên risteyan bi heman awayî (bi gireya *Θê*), lê *pirtûka* berkar, ji wan cuda bi morfema tewangê hatîye (*-ê* / (zz. *-î*)) hatîye kodkirin. Kurmancî û zazakî ji vî alîyî ve jî nomînatîv/akûzatîv in.

BEŞA SÊYEM

ROL Û LÊKERÊN KURMANCÎ Û YÊN ZAZAKÎ

Ev beş, ji sê binbeşan pêk tê. Di binbeşa yekem da Teorîya ROLê tê pêşkêşkirin, di binbeşa duyem da lêkerên kurmancî û yên zazakî di çarçoveya ROLê da tên vekolandin û di binbeşa sêyem da jî pêveberên kompleks (wekî *ra-kirin*, *sor kirin*, *nexweş ketin*, *sond xwarin*) di heman çarçoveyê da tên vekolandin. Di xebatên rêzimana nerîtî ya kurmancî da hin cure *PK* wek lêkerên "dariştî" (wekî *ra-kirin*, *ve-xwarin*) (bnr. Bakır, 2020, rr. 172-175), hinek wek "lêkerên lêkdayî" (wekî *sor kirin*, *sond xwarin*) (bnr. Baran, 2018, rr. 179-181) û hinekên din jî yek caran wek "lêkerên biwêjî" (wekî *dev jê berdan*) (bnr. Baran, 2018, r. 184; Bakır, 2020, r. 182) (an jî "lêkerên bi daçek" (wekî *lê dan*) (bnr. Tan, 2015, rr. 265-267)) hatine senifandin. *PK* ji ber ku peywireka lêkerî bi cih tînin, hêmanên lêkerî ne, lê di xebata me da sedema senifandineka wekî "lêker" û "pêveberên kompleks" ew e ku lêker hêmanên ferhengî ne, lê derheqê rewşa ferhengîtiya pêveberên kompleks da lihevkirineka giştî tune ye. Wekî em dê bibînin, li gor hin zimannasan, ew hêmanên ferhengî ne û li gor hin zimannasên din ew bi proseseka sîntaktîk pêk tên. Nîqaşên di vî warî da kirin ku em *PK*yan di binbeşeka serbixwe da vekolin.

3.1. TEORÎYA ROLÊ

Me dîtibû di *BGyê* da, yek ji parçeyên rêzimanê *ferheng* bû. Di parçeyê ferhengê da *yekeyên ferhengî* (lexical items) li gel taybetmendiyên xwe yên fonolojîk, sîntaktîk û semantîk cih digirin. Teorîya ROLê, li ser têkilîyên taybetmendiyên semantîk û sîntaktîk ên yekeyên ferhengî kar dike, ku ev taybetmendî di zanyarîya ferhengî ya yekeyan da cih digirin. Chomsky, ji aliyê sereyan ve li argumentan lêbarkirina taybetmendiyên semantîk wek ROL²⁵ bi nav dike (1986, r. 93). Ji vî aliyê ve ROL, amaje bi têkilîyên tematîk ên yekeyên ferhengî yên xwedî naverokeka semantîk û argumentên wê dike. Bi gotineka din, yekeyên ferhengî yên xwedî naverokeka semantîk, ROLan li argumentên xwe bar dikan. Lewma her cure sere (bo nimûne sereyên kargînî) nikare ROLan bar bike. Lêkera *xwendinê* xwedî naverokeka semantîk e û du argumentên wê hene, ew ROLa *Ê/A DIXWÎNE/XWENDê* li argumenta li

²⁵ ROL, wek *teta ROL* (theta role) an jî *Θ-ROL* (Θ-role) jî tê binavkirin

pozîsyona bikerî, ROLa *Ê/A KU TÊ/HAT XWENDINê* li argumenta li pozîsyona berkarî bar dike. Lewma her yek ji argumentên lêkera *xwendinê* li gel wê xwedî têkilîyeka cuda ye. Ya yekem li pozîsyona bikerî cih digire û karê *xwendinê* pêk tîne û ya duyem li pozîsyona berkarî cih digire û tiştê ku dikeve ber karê *xwendinê* nîşan dide. Lê binavkirina ROLan a wekî *Ê/A DIXWÎNE/XWENDê* û ROLa *Ê/A KU TÊ/HAT XWENDINê* taybet e ji bo lêkera *xwendinê*. Eger em bi têgehên giştî bêjin ROLa *Ê/A DIXWÎNE/XWENDê* KARA (AGENT), ya *Ê/A KU TÊ/HAT XWENDINê* jî MIJAR (THEME) ye. Lewma lêker li argumentên xwe ROLên wekî KARA, MIJAR, CIH (LOCATION), KARLÊBÛYÎ (PATIENT) û yd. bar dikin.

ROL, li k-binyadê tên barkirin û li r-binyadê tên parastin. Bo nimûne *FDIyekê* li k-binyadê kîjan ROL wergirtibe, li r-binyadê jî heman ROLê diparêze. Ji ber vê, di encama cihguherînê da pozîsyona *FDIyê* biguhere jî ROLa ku lê hatîye barkirin, naguhere.

(1) a. *Dîlanê pirtûk xwend*

b. *Pirtûk hat xwendin*

(2) v [*pirtûk hat xwendin*]

Di (1a)yê da *pirtûk* ji lêkerê ROLa MIJARê werdigire. (1b) forma tebatî ya (1a)yê ye. Di (1b)yê da *pirtûkê* pozîsyona xwe guhertibe jî ROLa ku li k-binyadê li wê hatîye barkirin, diparêze. Vê, em dikarin di (2)yan da bibînin. (2), k-binyada (1b)yê nîşan dide. Di (2)yan da *pirtûk* li pozîsyona temamkerî ya lêkerê ye. ROLa xwe ya MIJARê ji lêkerê wergirtiye û piştê cih guherîye bo pozîsyona bikerî (di (2)yan da v vê pozîsyonê nîşan dide), ku li k-binyadê ev pozîsyon vala ye.

Wek zanyarîyeka ferhengî, ne bi tenê ROL, zanyarîyên din ên di binyada ferhengî (wekî zanyarîyên sîntaktîk, fonetîkê) da jî divê bên derdan. Ev, bi saya prensîpekê pêk tê ku Chomsky (bnr. 1988, r. 29) wê wek *Prensîpa Derdanê* (Projection Principle) dide nasîn. Li gor vê prensîpê, zanyarîya ferhengî li her asta sîntaktîk tê derdan.

3.1.1. Lêbarkirina ROLan

Lêker, ji ber ku ROLan li argumentan bar dikin, *ROL-barker* (ROLE assigner) û argumentên wê jî ji ber ku ROLan werdigirin *ROL-wergir* (ROLE assignee) in.

Lêbarkirina ROLan di çarçoveya *birêvebirinê* da pêk tê. Lêker, ROLan li argumentên ku bi rê ve dibe, bar dike. Li jêr em dê pêşî birêvebirinê bidin nasîn.

Di BGYê da têgeha *birêvebirinê*, di çarçoveya teorîya Birêvebirinê da tê pêşkêşkirin. Chomsky diyar dike ku têgeha birêvebirinê, derbarê têkiliya sereya avahîyekê û kategorîyên girêdayî da ye (1988, r. 5). Li vê derê sere rêvebir, kategorîyên girêdayî jî *birêvebirî* (governee) ne.

Berîya ku em derbasî danasîna birêvebirinê bibin, çend heb têgehên têkildar bi mijarê ve hene ku em dê bi kurtasî wan bidin nasîn. Ev têheg ev in: *çarçoveya binkategorîzasyonê* (subcategorization frame), *serdestî* (dominance), *qada birêvebirinê* (governing domain), *pêkhên-fermanberî* (*p-fermanberî*) (constituent-commanding (c-command)) û *mezintirîn fermanberî* (*m-fermanberî*) (maximal-command (m-command)).

Çarçoveya binkategorîzasyonê: Her kategorîya ferhengî dema li asta sîntaktîk cih digire, di çarçoveyeka sîntaktîk da cih digire. Ev wek çarçoveya binkategorîzasyonê tê zanîn. Bi gotina Horrocksî (2013, r. 34) ve çarçoveya binkategorîzasyonê diyar dike ku kategorîyek di binyadeka sîntaktîk da li gel kîjan kategorîyan xuya dike. Em dikarin ji bo hin lêkerên kurmancî çarçoveya binkategorîzasyonê weha nîşan bidin:


- (3) a. *xwendin*: [FDI _]
- b. *kenîn*: [_]
- c. *dan*: [FDI _ FD]

(3a), nîşan dide ku di binyadeka sîntaktîk da li alîyê çepê yê lêkera *xwendinê* *FDI*yek divê hebe, (3b) nîşan dide li alîyê rast an jî çepê yê lêkera *kenînê* jî frêzek divê tune be. Di (3c)yê da tê nîşandan ku di binyada sîntaktîk da lêkera *danê* divê di navbera *FDI* û *FD*yekê da cih bigire²⁶. Çarçoveyên binkategorîzasyonê yên di (3)yan da, di heman demê da diyar dikin ku kîjan cure frêz ji sereya frêzê şax dide/didin. Bo nimûne *xwendin* *FDI*yekê şax dide, *kenîn* frêzekê şax nade û *dan*, *FDI* û *FD*yekê şax dide.

²⁶ Di risteyên wekî *Azadî pirtûk da Dîlanê* da piştî lêkera *danê* *Dîlan* wek *FDI*yek xuya dike, lê me frêza piştî lêkera *danê* wek *FD* nîşan da. Sedemên vê rewşê em dê di beşên têkildar da rave bikin.

Her lêker dema di risteyê da dibe sereya pêveberê, *FDI*ya bikerî jî yek ji wan kategorîyan e ku di çarçoveya sîntaktîk a lêkerê da cih digire. Lê eger bala me kişandibe, di çarçoveyên binkategorîzasyonê yên di (3)yan da *FDI*ya bikerî cih negirtîye. Sedema wê ew e ku di *BGyê* da prensîpa bi navê *Prensîpa Derdanê ya Berfirehkirî (PDB)* (Extended Projection Principle) di her risteyê da hebûna bikerê dabîn dike (bnr. Carnie, 2013, r. 238). Ji ber vê jî di çarçoveya binkategorîzasyonê yên lêkeran da *FDI*ya bikerî cih nagire.

Serdestî: Têkilîyên stûnî yên di navbera hêmanên frêzekê da îfade dike. Movikeka *Ayê* li movikeka *Byê* serdestîyê dike, eger tenê bi tenê, *A*, di dardîagramê da ji *Byê* jortir be û eger xetek bikaribe ji *Ayê* ber bi *Byê* ve bê şopandin (Haegeman, 1994, r. 85).



Di dardîagrama (4)an da *X*, li *Y* û *Zyê*, *Y* li *A* û *Byê*, *Z* jî li *C* û *Dyê* serdestîyê dike. Li gel vê, *X* li hemû *Y*, *Z*, *A*, *B*, *C* û *Dyê* serdestîyê dike. Serdestîya dayikê ya li ser keçên xwe *serdestîya rasterast* (immediate dominating), serdestîya wê ya li ser nêvîyên xwe û yd. serdestîya nerasterast e. Di (4)an da serdestîya movika *Xa* dayik a li ser *Y* û *Zyê* serdestîya rasterast, a li ser movikên din serdestîya nerasterast e. Ji alîyê din ve *Y* li *C* û *Dyê*, *Z* jî li *A* û *Byê* nikare serdestîyê bike, lewra ji *Yyê* bi *C* û *Dyê*, ji *Zyê* jî bi *A* û *Byê* ber bi jêr ve xetek nayê şopandin.

Qada birêvebirinê: Em dikarin bêjin qada birêvebirinê, mezintirîn derdana sereya frêzê ye. Di dardîagrama (4)an da, eger em *Ayê* wek sereya frêza *Xê* qebûl bikin, wê demê qada birêvebirinê ya *Ayê* dê frêza *Xê* be.

(5) *p-fermanberî*:

Ayê li *Byê* *p-fermanberîyê* dike, eger tenê bi tenê;

a. *A* li *Byê* serdestîyê neke, û

b. Yekemîn movika ku li *Ayê* serdestîyê dike, di heman demê da li *Byê* jî serdestî bike (Black, 1999, r. 41)

Li jor di dardîagrama (4)an da *Y* li *Zyê*, *Z* jî li *Yyê* p-fermanberîyê dike. Ev jî nîşan dide ku xwişk li hevûdin p-fermanberîyê dikan. Lê dema xwişk şax bidin wê demê xwişka din dikare li ser xwarzê û nêvîyên xwişka xwe jî p-fermanberîyê bike. Ji vî alîyî ve p-fermanberîya di navbera xwişkan da taybet e û wek *p-fermanberîya sîmetrîk* (symmetric c-command) an jî *p-fermanberîya rasterast* tê binavkirin. Ji alîyê din ve p-fermanberîya ku movikek, li ser xwarzê û nêvîyên xwişka xwe û yd. pêk tîne, *p-fermanberîya asîmetrîk* (asymmetric c-command) e (Carnie, 2013, rr. 128-129). Li gor vê di (4)an da p-fermanberîya di navbera *Y* û *Zyê* da p-fermanberîya rasterast, p-fermanberîya *Yê* ya li ser *C* û *Dyê* û p-fermanberîya *Zyê* ya li ser *A* û *Byê* p-fermanberîya asîmetrîk (nerasterast) e. Ji alîyê din ve *A* û *B*, li *Zyê*, *C* û *D* jî li *Yyê* p-fermanberîyê nakin. Lewra wekî di pênasêya (5)an da tê dîtin, ji bo p-fermanberîyê mercek ew e ku ji bo ku movik bikaribin li hev p-fermanberîyê bikin, yekem movika ku li wan serdestîyê dike, divê heman movik be. Bi gotineka din hêmanên ku li hevûdin p-fermanberîyê dikan, ne rasterast be jî divê ji heman movikê şax dabîn. Ev rewş, bi diyarkirina Horrocksî (2013, r. 110), nîşan dide ku pêkhênêk nikare li pêkhênêka din a li derveyî mezintîrîn derdana xwe p-fermanberîyê bike. Bo nimûne di (4)an da mezintîrîn derdana *C* û *Dyê* *Z* ye, *Y* di nav vê derdanê da nine, lewma jî *C* û *D* li *Yyê* nikarin p-fermanberîyê bikin. Berevajî vê *C* û *D* bi rêya *Zyê* di nav mezintîrîn derdana *Xê* da cih digirin, *Y* jî di nav heman mezintîrîn derdana *Xê* da ye, lewma jî *Y* li *C* û *Dyê* p-fermanberîyê dike. Heman rewş ji bo têkilîya p-fermanberî ya di navbera *A*, *B* û *Zyê* da jî bi heman awayî ye.

M-fermanberî, cureyeka p-fermanberîyê ye. Ji bo dîtina vê, em li pênasêyeka din a p-fermanberîyê binihêrin:

(6) *p-fermanberî*

Ayek, li *Byekê* p-fermanberîyê dike, eger tenê bi tenê *A* li *Byê* serdestîyê neke û her *Xa* ku li *Ayê* serdestîyê dike li *Byê* jî serdestîyê bike (Chomsky, 1997, r. 8).

Eger di pênasêya (6)an da *X* wek mezintîrîn derdan bê qebûlîkirin, wê demê *m-fermanberî* çêdibe. Bi gotineka din di rewşeka weha da *A* li *Byê* m-fermanberîyê dike (Chomsky, 1997, r. 8). Li gor van zanyariyan pênasêya m-fermanberîyê weha çêdibe:


(7) *m-fermanberî*

Ayek li Byekê m-fermanberîyê dike, eger tenê bi tenê;

a. *A* li *Byê* serdestîyê neke û

b. Yekemîn mezintirîn derdana ku li *Ayê* serdestîyê dike li *Byê* jî serdestîyê bike

(Black, 1999, r. 42)



Di (8)an da *X*, li movikên *A*, *B*, *C*, *Dyê* serdestîyê nake û ew hemû tev ji mezintirîn derdana *X''*ê şax didin. Lewma jî yekemîn mezintirîn derdan (*X''*), *X* jî tê da li hemû movikên din serdestîyê dike. Ji ber ku *X''*a mezintirîn derdan, hem *Xê* hem jî yên din şax dide, *X* li hemûyan m-fermanberîyê dike. Li vir em divê bêjin ji ber ku frêz derdana *Xê* ye ew dikare li pêkhênên din m-fermanberîyê bike. Lewra bo nimûne *X''*, ne mezintirîn derdana *Byê* ye, ji aliyê din ve mezintirîn derdana *C* û *Dyê* jî *A* ye. Niha em dikarin li pênaseya birêvebirinê binihêrin:

(9) *Birêvebirin*:

Ayek, *Byekê* bi rê ve dibe eger tenê bi tenê


a. *A* rêvebir be; û

b. *A* li *Byê* m-fermanberîyê bike; û

c. di navbera *A* û *Byê* da *astengek* (barrier) tune be.


Mezintirîn derdan li ber birêvebirinê asteng in. Rêvebir sere ne (Haegeman, 1994, r. 137).

Li gor pênaseya birêvebirinê ya (9)an, em dikarin karkirina birêvebirinê ya di *FLyekê* da bi nimûneya jêrîn rave bikin:



Di (10)an da *xwendina* ku sereya *FLyê* ye, *DI''yê* bi rê ve dibe, ji ber ku *DI* sereyeka kargînî ye, *FL* dikare hundirê wê jî bi rê ve bibe, lewma ew dikare *N''yê* jî bi rê ve bibe, lê nikare hundirê *N''yê* bi rê ve bibe, lewra *N*, ne kargînî ye û dibe asteng. Sereya ku hundirê *N''yê* bi rê ve dibe, *Nya* sereya vê mezintirîn derdanê ye. Ji ber vê, *pirtûka* sere dikare bi awayekî azad pêgirêdayîyên xwe hilbijêre. Bo nimûne dikare temamkera *a bavê xweyê* hilbijêre ku wê demê *FL* dê bi awayê *pirtûka bavê xwe xwendê* çêbe. Lê lêker nikare biryara hilbijartina vê temamkera *pirtûkê* bide. Lêkera sere di çarçoveya binkategorîzasyon û s-hilbijartinê da dikare cureya kategoriya temamkera xwe û taybetmendîyên wateyî yên vê temamkerê diyar bike. Bo nimûne ji bo lêkera *xwendinê*, argumenta ku dikare li pozîsyona wê ya temamkerî cih bigire divê ji aliyê kategoriye ve *FDIyek* be û temamkera vê *FDIyê* (anku *N''*) jî divê xwedî taybetmendîya *[+xwendinî]*yê be. Ji ber vê, li pozîsyona temamkerî ya *FDIyê* *N''ya pirtûkê* dikare cih bigire, lê bo nimûne *N''ya avê* nikare cih bigire.

Piştî danasîna birêvebirinê em dikarin li lêbarkirina ROLan vegerin. Li jêr di dardîagramê da ROLên ku lêker li argumentên xwe bar dike, xuya dikin. Ji ber ku ROL li k-binyadê tên barkirin, di nimûneyê da k-binyada *FLyê* hatiye nîşandan.



Li k-binyadê bicihkirina bikerê ya li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê*, bi hîpotezeka bi navê *Biker di Nav FLYê dayê* (subject-in-VP hypothesis) hatiye pêşkêşkirin. Sedema vê yekê têkildar e bi ROLê ve. Wekî me nîşan dabû li r-binyadê biker cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê* li derveyî *FLyê* cih digire. Eger biker li k-binyadê li derveyî *FLyê* bê hilberîn, ji ber ku lêker dê nikaribe wê bi rê ve bibe, dê nikaribe ROLê jî li wê bar bike. Lê dema em bikerê wekî di (11)an da xuya dike li k-binyadê, di nav *FLyê* da, li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* bi cih bikin, wê demê kêşeya birêvebirinê ji holê radibe û lêker dikare ROLê li bikerê bar bike (bnr. Chomsky, 2015, rr. 54-55). Bi vî awayî biker li r-binyadê cih biguhere jî, ROLa xwe diparêze. Lewra ROL li her asta sîntaktîk tên parastin. Ev, bi saya zincîrê pêk tê ku em dê di *Beşa Çarem* da bibînin.

Di risteyekê da, her argument bi tenê yek ROLê werdigire û her ROL bi tenê li yek argumentê tê barkirin. Ev bisînorkirin wek *pîvera ROLê* (ROLE criterion) tê zanîn. (bnr. Chomsky, 1988, r. 36). Pîvera ROLê, diyar dike ku nabe ku ji hejmara ROLan zêdetir argument, ji hejmara *FDIyan* zêdetir jî ROL hebin (Carnieyî, 2013, r. 234) (lê wekî em dê bibînin ne bi tenê *FDI*, hin kategorîyên din jî ROLê werdigirin). Binpêkirina pîvera ROLê dibe sedema çêbûna binyadên nerêzimanî.

- (12) a. *Keçikê pirtûk xwend*
 b. **Keçikê jinikê pirtûk xwend*
 c. *Keçik û jinikê pirtûk xwend*

Nerêzimanîya (12b)yê ji ber wê ye ku hem *keçik* hem jî *jinik* berendam in ji bo wergirtina ROLa KARAYê. *Xwendin* bi tenê xwedî yek ROLa KARAYê ye. Lê wek pîver nabe ku ROLek ji aliyê ji yekê zêdetir argumentan ve bê wergirtin. Lewma jî yek

ji *keçik* an jî *jinikê* bêyî ROL dimîne; ev jî dibe sedema bînpêkirina pîvera ROLê. Ji ber vê jî binyad wek nerêzimanî tê kodkirin. Eger bê xwestin her du heman ROLê werbigirin, wê demê wekî di (12c)yê da tê dîtin, divê bi gihanekê ve bîr girêdan.

ROL, li pozîsyonên sîntaktîk bîr lêbarkirin jî li her pozîsyona sîntaktîk ROL nayê barkirin. Bi gotina Haegemanê (1994, r. 191) ve, argumenteka *Ayê* li *Pya* pozîsyona ROLê xuya dike û ROLa li pozîsyona xwe werdigire. Ji vî alîyê ve eger pozîsyonek, cihê lêbarkirina ROLê be ew pozîsyon, *R-pozîsyon* (ROLE-position/ θ -position) e. Pozîsyona ku ROL lê nayê barkirin jî *R'-pozîsyon* e. Eger sereyek ROLê li *A-pozîsyonekê*²⁷ bar bike, ew *A-pozîsyon* di heman demê da *R-pozîsyon* e (Uzun, 2000, rr. 152-153). Wekî tê dîtin di navbera pozîsyonên sîntaktîk û lêbarkirina ROLan da têkilîyek heye. Pozîsyonên sîntaktîk (ên ku ROL lê tê barkirin) ên sereyekê *binyada argumentî* ya wê diyar dikin. Di çarçoveya vê binyada argumentî da ji bo her sereya ku dikare ROLê bar bike, *binyadeka ROLî* (ROLE structure) jî çêdibe. Li jêr em dê bi kurtasî li ser van binyadan rawestin.

Eger em bi awayekî kurtasî bêjin, binyada argumentî amaje bi hejmara argumentan dike ku pêveber pêdivî bi wan heye. Li vê derê argument beşdarên (participant) çalakîya di karê lêkerê da ne. Ji alîyê din ve binyada argumentî, nîşan dide ku kîjan hêmanên risteyê mecbûrî ne (Haegeman, 1994, r. 44). Li gor vê, binyada argumentî amaje bi hejmar û cureya frêzên (wekî *FDI*, *FD*, *FTEM*) mecbûrî dike ku tev li karê wê dibin. Lewma jî hêmanên ku ne mecbûrî ne (wekî zêdekan, ku xwestekî ne) di nav binyada argumentî ya lêkerê da cih nagirin.

Lêker, ji alîyê hejmara argumentên xwe ve dabeş dibin: Lêkerên têper ên ku pêdivîya wan bi du argumentan hene, lêkerên *du-cihî* (two-place) ne, yên ku pêdivîya

²⁷ Her yek ji pozîsyonên argumentên sereyekê yên li k-binyadê wek *pozîsyona argumentî* (*A-pozîsyon*) (argument position/A-position) tê binavkirin. Ji alîyê din ve li k-binyadê hin pozîsyonên ku argumentên sereyê tê da cih nagirin wek *pozîsyona ne-argumentî* (*A'-pozîsyon*) (non-argument-position – A'-position) tên binavkirin û nîşandan (Uzun, 2000, r. 152). Bo nimûne pozîsyona temamkerî ya lêkera têper a *xwendinê*, li k-binyadê ji alîyê *FDI*yekê ve dagirtî ye. Ji ber vê ev, *pozîsyona argumentî* (an jî *A-pozîsyon*) ye. Lê bo nimûne pozîsyona nîşankerî ya *FTEM*ê li k-binyadê vala ye, lewma jî ev pozîsyon, *pozîsyoneka ne-argumentî* (an jî *ne-A-pozîsyon*) ye. Chomsky (2015, r. 49) dibêje pozîsyoneka rasteqîn (actual) an jî ROL-pozîsyoneka potansiyel (potential θ -position) *A-pozîsyonek* e; yên din *A'-pozîsyon* (*A-bar pozîsyon* (*A-bar position*)) in.

Em dikarin binyada ROLê bi awayekî din jî nîşan bidin ku ji bo vê nîşandanê *teta-grîd* (theta-grid) tê gotin. Teta-grîd bi kurtasî nîşandana binyada argumentî ya pêveberê ye li gel ROLên ku li van argumentan tên barkirin (bnr. Haegeman, 1994, rr. 52-53). Teta-grîda ji bo lêkera *xwendinê* dê weha be:

(15) *xwendin: L*

KARA	MIJAR
FDI	FDI
i	j

Di teta-grîda (15)an da *i* û *j* amaje pê dikin ku kîjan argument kîjan ROLê werdigire. Bo nimûne li jêr bi îndeksa *iyê* diyar dibe *Dîlan* ROLa KARAYê, bi îndeksa *iyê* jî diyar dibe *pirtûk* ROLa MIJARê werdigire.

(16) *Dîlanê_i pirtûk_j xwend*

Di lîteraturê da em li rastî gelek cure û binavkirinên cuda yên ROLan tên. Lê, bo nimûne Baker (1997, rr. 107-108) dibêje, esas sê cure ROL hene ku lêker li argumentên xwe yên binkategorîzekirî bar dikin. Ev ROL ev in: KARA/SEDEMKAR (CAUSER), KARLÊBÛYÎ/MIJAR û RÊ (PATH)/CIH (LOCATION). Li gor wî ROLên din ên wekî AMRAZ (INSTRUMENT) û HEVALTÎ (COMITATIVE) jî hene, lê ev ne ROLên argumentên binkategorîzekirî ne. Heta di hin zimanan da ev ROL tune ne. Lewma jî ev cure ROL, ne ROLên prîmîtîv (primitive) in, lê li gor ROLên bingeîn tên pênasekirin. Bo nimûne ROLa HEVALTÎyê KARAYA duyemîn an jî MIJARA duyemîn e. Em divê diyar bikin ku, wekî me nîşan da, lêker bikerê binkategorîze nake, lê ROLê li wê jî bar dike. Lewma ROL bi tenê li argumentên binkategorîzekirî nayên barkirin, heta li zêdekan jî tên barkirin, lê wekî em dê bibînin ROLên ku li zêdekan tên barkirin, ne li k-binyadê, li asta forma mantiqî tên barkirin.

Ji bo mijara nediyarîya cureyên ROLan Haegeman (1994, r. 54) dibêje, her çiqas em nikaribin cureyên ROLên ku pêveber li argumentên xwe bar dikin, bi awayekî teqez diyar bikin jî hejmara argumentên her pêveberê bi giştî zelal e. Lewma jî li şûna ku em ji bo her pêveberê cureya ROLan diyar bikin, em dikarin bi tenê hejmara argumentên pêveberê nîşan bidin. Bi vî awayî heta hewcedarî bi nîşandana ROLan a

bi awayekî aşkere tune be, em dikarin ji bo her lêkerê temsîla ferhengî bêyî nîşandana cureyên ROLan çêkin. Bo nimûne temsîla ferhengî ya lêkera *xwendinê* dê weha be:

(17) *xwendin*: L

1 FDI	2 FDI

Nexwe ji bo ku em bikaribin ji bo her lêkerê teta-grîda wê diyar bikin em divê diyar bikin ew xwedî çend argumentan e û ev argument kîjan cure frêz in. Di kurmancî da lêker yek, du yan jî sê argumentî ne. Tabloya jêrîn teta-grîda hin lêkerên kurmancî li gel nimûneyên wan nîşan dide. Di tabloyê da, di stûna *Nimûneyê* da her argument di nav kevanekan da li gel jimareya xwe hatiye nîşandan (Ji aliyê hejmara argumentan ve lêkerên zazakî jî yek, du an jî sê argumentî ne. Ji ber vê, em dê li vir bi tenê nimûneyên ji bo kurmancî nîşan bidin).

KURMANCÎ				
Lêker	Argument	Argument	Argument	Nimûne
	1	2	3	
<i>xwendin</i>	FDI	FDI	-	[Dîlanê] ₁ [pirtûk] ₂ xwend
<i>kenîn</i>	FDI	-	-	[Dîlan] ₁ kenîya
<i>dan</i>	FDI	FDI	FD	[Dîlanê] ₁ [pirtûk] ₂ da [Azadî] ₃
<i>dîtin</i>	FDI	FDI	-	[Dîlanê] ₁ [Azad] ₂ dît
<i>dîtin</i>	FDI	FTEM	-	[Dîlanê] ₁ dît [ku zarok pirtûkê dixwînin] ₂
<i>nihêrîn</i>	FDI	FD	-	[Dîlanê] ₁ [li pirtûkê] ₂ nihêrî

Lêker, ROLan li beşdarên ku tev li karên wan dibin, bar dikan. Gelek caran beşdarên lêkeran wek argument pêk tên, lê yek caran argument rasterast ne beşdara çalakîya di lêkerê da ye. Dema argument kategoriyeke ROL-wergir be, wê demê ROL rasterast li argumentê tê barkirin, lê dema argument ne cureyeke ROL-wergir be, wê demê ROL ne li argumentê, li hêmana ku di nav wê da cih digire û beşdarî karê lêkerê dibe, tê barkirin. Bo nimûne ji tabloya jorîn diyar dibe ku teta-grîda (yan jî temsîla ferhengî) ji bo lêkera *nihêrînê* weha ye:

(18) *nihêrîn*: L

1	2
FDI	FD

(18) nîşan dide ku di risteyekê da ku lêkera *nihêrînê* sereya *FLyê* ye, li pozîsyona bikerî *FDIyê* û li pozîsyona temamkerî jî *FDyê* cih digire. Lêkera *nihêrînê* du heb ROLan bar dike. Em vê ji ber hejmara argumentên wê dizanin. Yekê li *FDIya* bikerî bar dike, argumenta din jî *FD* ye, lê di Stowellî (1981, r. 144, 383) da cih digire ku ROL rasterast li *FDyan* nayê barkirin. ROL li asta forma mantiqî li berkara pêşdaçekê tê barkirin. Ev ROL dibe ku bi awayekî têkelî ji aliyê wateya pêşdaçekê û ROLên lêkerê yê guncav ên wekî "alî/hêl (direction)", "cih (location)" tê dariştin²⁹. Eger em bi awayekî din bêjin, ROLên ku li temamkerên *FDyan* tên barkirin ji têkelîya wateya daçekê û ROLa ku lêker wê dixwaze, tê dariştin. Li gor vê, di risteya *Dîlanê li pirtûkê nihêrîyê* da lêkera *nihêrînê* ROLê li *Dîlanê* bar dike, lê ROLa *pirtûkê* ji aliyê têkelîya *li+nihêrînê* tê dariştin. Anku wateya pêşdaçeka *liyê* û naveroka semantîk a lêkera *nihêrînê*, ku li ser daxwaza ROLa HEDEFê bandorker e, ROLa ku li *pirtûkê* tê barkirin, diyar dikan. Bi vî awayî wateya lêkerê sînoren cureya ROLê diyar dike û daçek jî di pêkhatina vê ROLê da kar dike. Di zazakî da berginda risteya *Dîlanê li pirtûkê nihêrîyê*, *Dîlane kitabî ra ewnîya* ye ku di vê risteyê da jî, argumenta *FDyî* ya lêkera

²⁹ Yê ku qebûl dikan pêşdaçek bixwe ROLê bar dikan jî hene. Bo nimûne bnr. Haegeman, 1994, r. 181; Elî, 2021, r. 85.

ewnîyayene ('nihêrîn'), *kitabî ra* ('li pirtûkê') ye ku ROLa ku li *kitabê* ('pirtûk') tê barkirin bi tîkelîya paşdaçek+lêkerê (*ra+weynayene*) ve pêk tê. Ji ber ku daçek nêzîktirîn rêvebir e ji bo temamkera xwe, em dikarin daçekê wek ROL-barker qebûl bikin. Lê jêdera ROLê daçek+lêker e. Karê lêbarkirina ROLê daçek pêk tîne.

Forma mantiqî, li gel k-binyadê, bi awayekî giştî parçeyê semantîk a rêzimanê ye di *BGYê* da û piştî k-binyadê cih digire. Chomsky (1986, r. 155) diyar dike ku k-binyad temsîla saf (pure) a binyada ROLê ye: Her argument li ROL-pozîsyonekê bi cih dibe û her ROL-pozîsyon ji alîyê argumentekê ve tê dagirtin ku li vê derê argument frêzek e û ROL divê li wê bê barkirin. Bi gotina Bakerî (1988, r. 46) ve, li k-binyadê hemû frêz li wan pozîsyonan bi cih dibin ku, ROLên ku werdigin, li wan pozîsyonan li van frêzan tên barkirin. Bi vî awayî k-binyad bi awayekî giştî temsîla binyada tematîk e. Nexwe li vir ji bo kurmancî (û ji bo zazakî) cudahî ew e ku bo nimûne lêkera *nihêrînê* (zz. *ewnîyayene*) du argumentî ye, nexwe li k-binyadê ev lêker divê du ROLan bar bike. Lewma ji bo kurmancî û zazakî, ROLên ku li *FDIyên* temamkerên *FDyên* argument tên barkirin, ne li asta forma mantiqî, li k-binyadê, bi tîkelîya (*pêş-paş*)daçek+lêkerê ve, lê ji alîyê daçekê ve tê barkirin. Yek dikare bêje di lêbarkirina ROLê da bandora daçekê tune ye, lê eger bandora daçekê di lêbarkirina ROLê da tune be wê demê bo nimûne her cure *FD* dikare temamkera lêkera *nihêrînê* be, nerêzimanîya nimûneya jêrîn nîşan dide ku ev ne rast e.

(19) **Dîlanê ji/bi/di pirtûkê nihêrî.*

Gotina Stowelî ku dibêje li temamkerên *FDyan* li asta forma mantiqî bi awayekî tîkel ROL tên barkirin, ji bo kurmancî û zazakî em qebûl dikin ji bo *FDyên* zêdek derbasdar e. Bo nimûne:

(20) *Dîlanê li malê li pirtûkê nihêrî / zz. Dîlane keye de kitabî ra ewnîya*

Di (20)î da *FDya li malê* (zz. *keye de*) ne argumenteka lêkera *nihêrînê* ye, ew zêdek e. Zêdek, li risteyê li asta r-binyadê tên zêdekirin. R-binyad, ne asta şirovekirina wateyî ye. Piştî r-binyadê tekane parçeyê rêzimanê yê ku şiroveya wateyî diyar dike

asta forma mantiqî ye. Lewma jî em dikarin bêjin ROLa ku li *malê* (zz. *keye*) tê barkirin, ku ji bo vê nimûneyê CIH e, li forma mantiqî tê barkirin.³⁰

Ji aliyê din ve, dema ku em li tabloya jorîn a teta-grîdên ji bo hin lêkerên kurmancî dinihêrin, em dibînin ku lêkera *dîtînê* li heman pozîsyona temamkerî hem dikare *FDI*yek hem jî dikare *FTEM*ekê binkategorîze bike (di zazakî da jî ji bo heman lêkerê (zz. *dîyene*) wesa ye). Li gel vê, dema temamkera wê *FDI* be ew li aliyê çepê yê lêkerê cih digire, dema ew *FTEM* be li aliyê rastê yê lêkerê bi cih dibe. Ev mijar têkildar e bi rewşa rêzimanî ve ku em dê di *Beşa Çarem* da li ser vê rawestin.

Wek encam heta vê derê me dît ku lêkerên kurmancî û yên zazakî sê cure temamkeran binkategorîze dikin: *FDI*, *FD* û *FTEM*. Hin lêker dikarin ji yekê zêdetir temamkeran wek alternatîf binkategorîze bikin. Ji aliyê din ve lêkerên ku *FD*yan binkategorîze dikin, *FD*yeka diyar binkategorîze dikin. Bo nimûne lêkera *nihêrînê* bi tenê *FD*ya ku sereya wê pêşdaçeka *liyê* ye binkategorîze dike. Lewma jî bi şêweya nîşandana Blackî (1999, r. 3) ve em dikarin çarçoveya binkategorîzasyonê ya lêkera *nihêrînê* weha nîşan bidin:

(21) *nihêrîn*: *L* [FD_[li] __] / zz. *ewnîyayene*: [FD_[ra] __]

3.2. ROL DI LÊKERÊN KURMANCÎ Û YÊN ZAZAKÎ DA

Cure û hejmara wan guherbar be jî di zimanan da ROL hene. Ji bo armancên xebata xwe, em dê cure û hejmara ROLên di kurmancî û zazakî da venekolin. Lewra ev zêdetir têkildar e bi semantîkê, lê li gel ku aliyekî mijara vê binbeşê têkildar e bi semantîkê, em dê zêdetir li ser têkilîya pozîsyona argumentên lêkeran û ROLan rawestin ku ev jî têkildar e bi sîntaksê ve. Ji ber vê, em dê li jêr lê binihêrin ka kîjan cure lêker xwedî çend ROLan e û ev ROL li kîjan pozîsyonan, li kîjan cure argumentan tên barkirin.

Di kurmancî û zazakî da cureyên lêkeran ji aliyê hejmara ROLên ku bar dikin, dibin sê kom: *Lêkerên yek-ROLî*, *lêkerên du-ROLî* û *lêkerên sê-ROLî*. Li gel vê, lêkerên ku hejmara ROLên wan heman e, ji aliyê cureya kategorîyên argumentan ve jî cudahîyê nîşan didin. Li jêr em dê lêkeran, bi rêzê li gor hejmara ROLan û cureya

³⁰ Ji bo hin cure ROLên ku di kurmancî da bi saya daçekan tên barkirin, bnr. Gündoğdu, 2018, r. 152.

argumentên wan vekolin. Ji ber ku ROL li k-binyadê tèn barkirin, di binbeşên jêrîn da heta ne hewce be, em dê bi tenê k-binyada *FLyan* nîşan bidin.


Hejmara ROLên lêkerekê rasterast têkildar e bi hejmara argumentên vê lêkerê ve. Lewma jî di bingegehê da li jêr em dê binyada ROLî ya lêkerên (û *PKyên*) kurmancî û yên zazakî vekolin ku wekî me dîtibû binyada ROLî argument û ROLan têkildar dike.

3.2.1. Lêkerên Yek-ROLî

Ev cure lêker, ji ber ku yek-argumentî ne, bi tenê dikarin yek ROLê bar bikin. Em dê lêkerên ku bi tenê yek ROLê bar dikin di bin sê koman da vekolin: *Lêkerên têneper*, *lêkerên tebatî* û *lêkerên neakûzatîv* (unaccusative).

Lêkerên têneper, ROLê bi tenê li *FDIya* bikerî bar dikin. Di kurmancî û zazakî da lêkerên wekî *meşîn*³¹, *kenîn* (zz. *huyayene*), *girîn* (zz. *bermayene*), *firîn* (zz. *firayene*), *kuxîn* (zz. *kuxayene*), *axivtin* wek lêkerên têneper kar dikin. Di çarçoveya xebata me da tiştê ku lêkerên têneper ji lêkerên din ên vê komê (anku lêkerên tebatî û yên neakûzatîv) vediqetîne ew e ku lêkerên têneper, ROLa KARAYê bar dikin. Bi gotineka din, ji lêkerên yek-ROLî, yên ku karê wan bi awayekî pratîkî ji alîyê bikerê ve tê kirin, lêkerên têneper in. Ji ber vê, her cure lêkerekê ku di rêzimana nerîtî da wek lêkera têneper tê senifandin ji alîyê xebata me ve lêkerekê têneper nine.

(22) *Dîlan kenîya* / zz. *Dîlane huya*



³¹ Eger ji bo lêkerekê nimûne berginda wê ya kurmancî yan jî zazakî nehatibe nîşandan, ew tê wê wateyê ku berginda wê lêkerê yan *PKyek* e, yan berginda wê heman cure kategoriyê binkategorîze nake yan jî cureya kategorîya ku binkategorîze dike bi awayekî teqez nehatîye tesbîtkirin. Bo nimûne berginda *meşînê* di zazakî da *PKya rayîr ra şîyene* ye ku ji *FDya rayîr ra* ('bi rê da') û *LSya şîyene* ('çûn') pêk hatiye.

Di kurmancî û zazakî da *FDI*yên lêkerên têneper ne mecbûrî ye bi awayekî aşkere pêk bên. Ew dikarin wek *cih*³² (zz. *ca*) jî pêk bên ku *cih* kategorîyeka vala ye, wek biker kar dike û dikare ROLê werbigire.

(24) *cih kenîya* / zz. *ca huya*

Niha jî em vegerin lêkerên tebatî. Di kurmancî da pêveber bi saya alîkarîya lêkera *hatinê* forma tebatî werdigirin. Di forma tebatî da lêkera bingehîn di forma raderî da ye.

(25) *Pirtûk hat xwendin*

Lêkera *xwendinê* di forma lebatî da xwedî du argumentan e û lewma jî du heb ROLan bar dike. Di nimûneya jêrîn da ev her du argument wek *FDI* pêk hatine.

(26) [_{FDI} *Dîlan*]/[_{FDI} *pirtûkê*] *dixwîne*

Di (26)yan da lêkera *xwendinê* ROLA MIJARê li temamkera xwe û ROLA KARAYê li argumenta bikerî bar dike. Tunebûna argumenta MIJARê wekî li jêr xuya dibe, dibe sedema nerêzimanîyê.

(27) * [_{FDI} *Dîlan*] *dixwîne*³³


³² Di *BGYê* da du cure bikerên ku bi awayekî aşkere pêk nayên hene: *cih(nav)* (pro) û *CIH(nav)* (PRO). *CIH*, ji bo ku ji *ciha piçûk* (little pro) bê veqetandin wek *CIHa mezin* (big PRO) jî tê binavkirin (Carnie, 2013, r. 450). *cih* xwedî taybetmendîya [+rêkeftin]ê ye, berevajî vê *CIH* xwedî taybetmendîya [-rêkeftin]ê ye. Dema lêkera binyadeka sîntaktîk bi morfolojîya rêkeftinê bê kişandin *cihê* kategorîya vala (anku pozîsyona bikerê) bi *cihê*, dema lêkera binyadeka sîntaktîk bi morfolojîya rêkeftinê neyê kişandin jî bi *CIHê* tê dagirtin (Arı Özdemir, 2020, r. 128). Zimanên ku dikarin *cihê* bi kar bînin, wek *zimanên bikerê dixin* (pro-drop languages) tên binavkirin. Kurmancî û zazakî jî van zimanan in. Di kurmancî û zazakî da *cih* bi tenê li pozîsyona bikerî bi *cih* nabe. Ew dikare li pozîsyona berkarî jî bi *cih* bibe. *ciha* ku li pozîsyona bikerî bi *cih* dibe wek *ciha bikerî* (subject pro), ya ku li pozîsyona berkarî *cih* digire jî wek *ciha berkarî* (object pro) tê binavkirin.

³³ Di nimûneyê da *xwendin* bi wateya xwe ya bingehîn hatîye bikaranîn, lê ev cure avahî di axavtina rojane da gelek caran bi wateya perwerdebûnê tê bikaranîn. Bo nimûne ev avahî dema wek *Dîlan dixwîneyê* tê gotin, mebest jê ew e ku *Dîlan* li dibistan, zanîngehê û yd. perwerde dibe. Lê bi ya me di rastîyê da berkar tiştêkî wekî *dersê* ye ku avahî di bingehê da wiha ye: *Dîlan ders dixwîne*. Ew dikare bi awayê *Dîlan li dibistanê ders dixwîne*, *Dîlan li zanîngehê ders dixwîne* û yd. jî pêk bê ku wateya perwerdebûnê radigihîne. Bo nimûne em derbarê kesayetên dîrokî da gelek caran rastî vegotinên wekî "fîlan kesî li cem/ li ber fîlan kesî ew qas sal ders xwendîye"yê tên ku li vê derê mebest jî *ders xwendîyeyê* perwerdebûn e. Lewma bi wateya perwerdebûnê bê bikaranîn jî di bingehê da *xwendin* xwedî berkarekê ye, lê ji ber sedemên pragmatîk ew nayê gotin. Ji ber ku em risteyê, ne di çarçoveya konteksteka diyar da, bi serê xwe û îzole dinirxînin, pêknehatina argumentên her cure lêkerê, ji bo me dibe sedema nerêzimanîyê. Lewra her riste dema di mêjî da tê hilberîn, bi serê xwe tê hilberîn. Dema derdikeve asta axavtina rasteqîn, ji ber hin sedeman dibe ku hin hêmanên risteyê di çarçoveya pragmatîk û ekonomîya di zimanî da jî risteyê bên xistin.

Dema em risteyên (25) û (27)an didin ber hev, em dibînin ku li gor (26)yan, di (25)yan da, hêmana ku di (26)yan da ROLa KARAYê werdigire (*Dîlan*), tune ye. Li gel vê, berevajî (27)an, (25) rêzimanî ye. Ji aliyê din ve eger em ji risteya (26)yan, di dema borî da bikerê bixin binyad dîsa nerêzimanî dibe:

(28) **pirtûk xwend*

Nexwe ji bo vê nimûneyê, forma tebatî dike ku lêkerekê ku di forma lebatî da du argumentî û du ROLî ye di forma tebatî da yek argumentî û yek ROLî be. Ji bo vê rewşê tê qebûlkirin ku ROLa KARAYê di risteyên tebatî da ji aliyê morfolojîya lêkerê ve tê *mêtin* (absorb) (Haegeman, 1994, r. 182). Bi gotineka din, lêkerên tebatî xwedî ROLa ku li bikerê bikin, ninin. Ev bûyer di ferhengê da, berîya ku lêker li binyadê bê bicihkirin pêk tê (Cook & Newson, 2007, r. 160). Ji aliyê din ve li gor ku di Larsonî (1988, rr. 357-358) da cih digire, tê qebûlkirin ku di îngilîzî da ROLa KARAYê li morfema tebatîkirinê tê barkirin û ev bi awayê jêrîn tê nîşandan (di nimûneya jêrîn da *hit* ('lê dan') lêker, *-en* morfema tebatîkirinê ye):



Ev jî nîşan dide ku morfema tebatîkirinê ya îngilîzî wek argument hatiye nirxandin. Baker û yd. (1989) jî morfema tebatîkirinê wek argument qebûl dikin û dibêjin, ROL li wê tê barkirin, lê cuda ji Larsonî ew morfemê li k-binyadê li derveyî *FLyê*, li bin *DEMê* bi cih dikin û diyar dikin ku ev morfema tebatîkirinê wek argumentekê ROLa xwe bi awayekî têkelî (compositional) ji *FLyê* werdigire. Berevajî îngilîzî di kurmancî da, tebatîkirin ne bi morfemekê, wekî hat diyarkirin, bi saya lêkera alîkar a *hatinê* tê çêkirin. Eger em bi awayekî giştî qebûl bikin ku lêker ROLê wernagirin, wê demê li şûna ku em qebûl bikin lêkera risteyê di forma tebatî da ROLa KARAYê li *hatinê* bar dike, eger em qebûl bikin, ROLa KARAYê ji aliyê *hatinê* ve tê mêtin, zêdetir raveker xuya ye. Lê her çi be jî forma tebatî ya lêkerekê nikare ROLê li bikera xwe bar bike. Eger bê xwestin bila KARA di risteyên tebatî da cih bigire, wê

demê ew, bo nimûne di kurmancî da, dikare di nav daçeka lêkdayî ya *ji alîyê...veyê* da, wek zêdek di risteyê da cih bigire.


(30) *Pirtûk ji alîyê Dîlanê ve hat xwendin*

Di zazakî da wateya tebatî bi du rêyan çêdibe: Yek ji wan rêyan wekî ya kurmancî ye. Lêkera alîkar a *ameyeneyê* ('hatin') forma tebatî çêdike. Di rêya duyem da wekî Keskin (2012, r. 244) jî diyar dike hejmareka bisînor a lêkeran, bêyî lêkera alîkar, bi saya gireya *-iyê* ('î') forma tebatî werdigirin. Di nimûneya (31a)yê da forma tebatî bi saya lêkera alîkar a *amayeneyê*, di (31b)yê da bi *-î* (û *-yayê*) pêk hatîye ku wateya her du risteyan jî di kurmancî da *Pirtûk hat xwendin* e.

(31) a. *Kitab ame wendene*


b. *Kitab wan-î-ya*³⁴

Di forma tebatî da tekane argumenta lêkerê, li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona bikerî ya risteyê. K-binyada *FLya* lêkerên tebatî bi nimûneya *Pirtûk hat xwendinê* (zz. *Kitab ame wendene/Kitab wanîya*) li jêr hatîye nîşandan.



Di (32)an da lêkera alîkar *hatin* û *-îyaya* ku di zazakî da forma tebatî ya lêkerê çêdike wek xwişka *Lyê* hatine bicihkirin. Esas em dikarin van hêmanan wek sereyeka serbixwe di bin *Frêza dîyatezî* (Voice Phrase) (*FDY*) da jî bi cih bikin. Di vê rewşê da dardiagram dê weha pêk bîn:

³⁴ Bingöl (2023) jî bo formên wekî *wan-î-yayê* dibêje ew ne *dîyateza* tebatî, lê *dîyateza navîn* (middle voice) e. Lewra diyar dike ku hemû lêkerên têper bi vî rengî nabin tebatî.



Di (33)yan da DY'' bixwe wek temamkera $DEMê$ pêk tê. Li r-binyadê di (33a)yê da *pirtûk* (zz. kitab) dê dîsa cih biguhere bo pozîsyona nîşankerî ya $FDEMê$, lê ew dê pêşî cih biguhere bo pozîsyona nîşankerî ya $FDYê$ û ji wir jî cih biguhere bo pozîsyona $[nîş, FDEM]ê$. Di (33b)yê da *kitab* dê bi heman awayî di du gavan da cih biguhere bo pozîsyona $[nîş, FDEM]ê$. Ji aliyê din ve ji bo ku forma *wanîyayê* pêk bê lêkera *wan-ê* jî dê cih biguhere bo pêşîya *-îyayê*. Binyadên frêzî yên (33)yan ji aliyê sintaktîk ve ji yên (33)yan ravekertir in, lê ji bo nîqaşên di xebata me da guherîneka giring pêk nayê. Binyadên frêzî ya (33)yan ravekertir bin jî ji bo hêsanîyê em dê di nimûneyan da binyada frêzî ya (32)an bi kar bînin³⁵.

Niha jî em li lêkerên neakûzatîv binihêrin. Me li jor got her cure lêkerekê ku di rêzimana nerîtî da wek lêkera teneper tê senifandin ji aliyê xebata me ve lêkerekê teneper nine. Bo nimûne Farqînî (2019, r. 37) diyar dike ku eger di wextê kêşanê da berkara risteyê hebe, anku eger heyberên candar û bêcan gava ku ji kirina bikerê bandorê bibînin ew lêker têper e. Lê eger di dema kêşana lêkerê da heyberên candar û bêcan ên ji kirina bikerê bandorê dibînin, tune bin ew lêker teneper e. Pênaseya Farqînîyî hem ji bo lêkerên têper hem jî ji bo lêkerên teneper amaje bi kirinek,

³⁵ Di warê frêza diyatezî da ji bo hin agahîyên zêdeir bnr. Kratzer, 1996; Gündoğdu, 2018, rr. 276-288. Binyada frêzî ya ku di van xebatan da cih digire û ya ku me nîşan da ne heman e.

çalakîyeka bikerekê dike. Niha dema pênasayên bi vî rengî ji bo lêkerên têper û yên teneper li ber destê me hebin, bo nimûne em nikarin lêkera *ketinê* bisenifînin. Lewra, ketin karekî kirinê nine. Anku kes ji bo bikeve tiştêkî nake, çalakîyekê pêk nayîne. Li gel vê, dema kes an jî tiştêk dikeve bandor li ser wî/wê çêdibe. Nexwe *ketin* ji alîyê pênaseya Farqînîyî ve, ne têper e ne jî teneper e. Lêkerên bi vî rengî wek lêkerên neakûzatîv tînin senifandin.

Li gel vê, boçûnên ku van lêkeran di bin koma lêkerên teneper an jî têper da bi cih dikin jî hene. Bo nimûne Baker (1988, r. 47) van cure lêkeran wek komeka diyar a lêkerên teneper diyar dike û dibêje, tekane argumenta van cure *lêkerên teneper ên nekarayî* (nonagentive intransitive verbs) li k-binyadê *berkara binyadî* (structural object) ye û li r-binyadê cih diguhere, dibe biker. Black (1999, r. 32) jî di heman çarçoveyê da van cure lêkeran wek cureyeka lêkerên teneper disenifîne û diyar dike ku tiştê diyarker ew e ku *FDIya* bikerî, kirina di lêkerê da pêk tîne yan di bin bandora wî karî da dimîne. Black, mijarê bi nimûneyên jêrîn rave dike.

(34) a. *Bill sleeps well* 'Bill baş radize'

b. *Bill died* 'Bill mir'

c. *The glass broke* 'Cam şikest'


d. *Bill broke the glass* 'Billî cam şikand'

Li gor raveyên Blackî (1999, rr. 32-33) di (34a)yê da lekera *sleepê* ('razan') li gel bikera KARAYê lêkerekê teneper a adetî (regular) e, lê berevajî vê di (34b)yê da *Bill* ji bo bimire tiştêkî nake, lewma jî biker xwedî ROLa MIJARê ye. Bi heman awayî di (34c) û (34d)yê da *the glass* ('cam') xwedî ROLa MIJARê ye. Di (34c)yê da lêker neakûzatîv e, di (34d)yê da lêker têper e. Dîsa Black diyar dike ku lêkerên wekî *sleepê* li k-binyadê li pozîsyona bikerî xwedî KARAYê ne û lêkerên wekî *dieê* ('mirin') li k-binyadê pozîsyona bikerî ya wan vala ye, lê pozîsyona berkarî bi ROLa MIJARê ve dagirtî ye. Ji alîyê din ve lêkerên wekî *breakê* ('şikêstin/şikandin') dikarin bi awayekî xwestekî xwedî KARAYê bin. Lêkerên wekî *dieê* wekî lêkerên tebatî tev digerin. Di lêkerên neakûzatîv da jî wekî di lêkerên tebatî da hêmana ku xwedî ROLa MIJARê ye, cih diguhere bo pozîsyona bikerî. Berevajî vê, Cook û Newson (2007, r. 122-123) jî diyar dikin ku lêkerên neakûzatîv wek lêkerên teneper xuya bikin jî xwedî hin taybetmendiyên lêkerên têper in. Heta Cook û Newson dibêjin lêkerên neakûzatîv

lêkerên têper in ku bi tenê yek tamamkerê hildibijêrin. Li gel vê, ev tamamker, çawa ku di lêkerên tebatî da pêk tê, bi heman awayî divê cih biguhere bo pozîsyona bikerî.

Dema em li agahîyên jorîn dinihêrin em dibînin ku lêkerên neakûzatîv ew lêker in ku wek lêkerên têneper tev digerin, lê ji alîyê ROLê ve wekî lêkerên resen ên têneper ROLê, ne li hêmana bikerî, li hêmana berkarî bar dikin. Ji vî alîyê ve ew dişîbin lêkerên tebatî. Jixwe hin zimannas lêkerên neakûzatîv wek lêkerên tebatî disenifînin. Bo nimûne Carnie (2013, r. 346) diyar dike ku lêkerên neakûzatîv, di siruştî xwe da lêkerên tebatî ne.

Wek encam, tekane argumenta lêkerekî neakûzatîv li k-binyadê li pozîsyona tamamkerî ya *FLyê* tê hilberîn. Ev bi nimûneya lêkera *ketinê* (zz. *kewtene*) li jêr hatîye nîşandan:




Elî (2021) di gotara xwe da lêkerên kurmancî bi awayekî kurtasî li gor cure û hejmara ROLên ku lêker bar dikin vedikole. Ew, lêkerên yek-ROLê di bin navê lêkerên têneper da vedikole. Elî ji bo lêkerên *çûn* û *hatinê* dibêje ev lêker li bikerên xwe ROLa KARAYê bar dikin, lewra li gor wê, ji ber ku di karên *çûn* û *hatinê* da rûdanek pêk tê, ev lêker ROLa KARAYê bar dikin. Bi ya me di van lêkeran da rûdanek tune ye. Bo nimûne di karê lêkera *çûnê* da, bi tenê di rewşa heyî da guherînek pêk tê. Anku "çûn" bixwe ne tevgereka pratîkî ye, ew rewşek e ku bi rêya karên wekî meşîn, firîn, bi ajotina maşînan û yd. pêk tê. Jixwe di lîteraturê da jî bi piranî lêkerên *çûn* û *hatinê* wek lêkerên neakûzatîv hatine senifandin (bo nimûne bnr. Haegeman, 1994, rr. 332, 333). Lewma em van lêkeran wek lêkerên neakûzatîv disenifînin û em dibêjin ev lêker li bikerên xwe ji bilî ROLa KARAYê, ROLeka din (wekî MIJAR, KARLÊBÛYÎ) bar dikin.

Di kurmancî û zazakî da lêkerên *çûn* (zz. *şiyayene*), *hatin* (zz. *ameyene*), *şewitîn* (zz. *veşayene*), *ketin* (zz. *kewtene*), *man* (zz. *mendene*), *mirin* (zz. *merdene*), *gihîştin* (zz. *resayene*), *guherîn* (zz. *virîyayene*), *werimîn* (zz. *masayene*), *xapîn* (zz. *xapîyayene*), *tirsîn* (zz. *tersayane*), *helîn* (zz. *helîyayene*), *herikîn* (zz. *herikîyayene*), *şikestin* (zz. *şikîyayene*), *qelişîn* (zz. *qelişîyayene*), hin ji lêkeran neakûzatîv in.

3.2.2. Lêkerên Du-ROLî

Lêkerên du-ROLî, yekê ji ROLên xwe, li argumenta bikerî ya din jî li argumenta xwe ya temamkerî bar dîkin. Kategorîya temamkerê dibe ku *FDIyek*, *FDyek* an jî *FTEMek* be. Di vê binbeşê da em dê van lêkeran li gor cureya kategorîya temamkera ku ew binkategorîze dîkin vekolin.

Di kurmancî û zazakî da hin lêker bi tenê *FDIyekê* binkategorîze dîkin. Hin ji van lêkeran ev in: *xwendin* (zz. *wendene*), *nivîsîn* (zz. *nuştene*), *xwarin* (zz. *werdene*). K-binyada giştî ya *FLya* van lêkeran bi nimûneya *Dîlanê pirtûk xwendê* (zz. *Dîlane kitab wend*) li jêr hatîye nîşandan.



Di kurmancî û zazakî da lêkerên wekî *gotin* (zz. *vatene*), *dîtin* (zz. *dîyene*), *xwestin* (zz. *waştene*), *viyan* (zz. *ganî*), *kirin* (zz. *kerdene*), *pirsîn* (zz. *persayene*), *bihîstin* (zz. *eşnawitene*) hem *FDIyek* hem jî *FTEMekê* wek alternatîf binkategorîze dîkin. Bûlbûl (2019) ji bo lêkerên ku dikarin wek temamker *FTEMekê* (di xebata wî da *hevoka temamker*) binkategorîze bikin, dibêje *FTEM* bi awayekî semantîk di rola bireserê (berkar) da ye³⁶. Li jêr û di hin beşên din da em dê nîşan bidin ku ev *FTEM* çawa û li gor çi ji alîyê semantîk û sîntaktîk ve wek berkar tên şirovekirin.

³⁶ Ji bo xebateka berfireh a lêker û *PKyên* kurmancî (yên devoka Torî) ku wek temamker *FTEMekê* werdigirin bnr. Gültekin, 2019.

(37) a. *Dîlanê [FDI pirtûk] dît / zz. Dîlane [FDI kitab] dî*

b. *Dîlanê dît [FTEM ku xwendekar pirtûkê dixwînin] / zz. Dîlane dî [FTEM ke wendekarî kitabî wanenê]*

Ji bo ku em bikaribin diyar bikin lêkerek bi rastî jî dikare ji yekê zêdetir kategorîyan wek alternatîf binkategorîze bike yan na, çend tişt hene ku em dikarin lê binihêrin. Berîya her tiştî wek testek em dikarin li vê binihêrin: Eger lêkerek bikaribe ji yekê zêdetir kategorîyan wek alternatîf binkategorîze bike, hebûna yekê û tunebûna ya din divê binyadê nerêzimanî neke. Wekî li jor tê dîtin, di (37a)yê da hebûna *FDIya pirtûkê* (zz. *kitab*) û tunebûna *FTEMa* di (37b)yê da, û di (37b)yê da jî hebûna *FTEMa ku xwendekar pirtûkê dixwîninê* (zz. *ke wendekarî kitabî wanenê*) û tunebûna *FDIya pirtûkê* ya di (37a)yê da binyadê nerêzimanî nake. Nexwe diyar dibe ku ew di risteyê da heman peywîrê bi cih tînin. Berevajî lêkera *dîtinê*, em li nimûneyên lêkera *xwendinê* (zz. *wendene*) binihêrin:

(38) a. *Dîlanê [FDI pirtûk] xwend / zz. Dîlane [FDI kitab] wend*

b. **Dîlanê şî xwend [FTEM ku tiştan hîn bibe]_i / *Dîlane şî wend [FTEM ke çîyan bimusa]_i*

Di (38a)yê da *xwendinê FDIya pirtûkê* binkategorîze kiriye û ROL li wê bar kiriye. Bi vî awayî, hem zanyarîya sîntaktîk hem jî ya ROLî ya lêkerê ji ferhengê hatîye derdan. Di (38a)yê da *pirtûk* wek berkara pêveberê tê şirovekirin ku ji bo lêkera *xwendinê* hebûna *FDIyeka* temamkerî mecbûrîyek e.

Di (38b)yê da hevîndeksîya (*i,i*)yê ya *ş* û *FTEMê* diyar dike ku *FTEM* li k-binyadê li pozîsyona temamkerî hatîye hilberîn û li r-binyadê wê cih guherîye bo pozîsyona piştî lêkerê. Eger em bi awayekî din bêjin, ev hevîndeksî tê wê wateyê ku *FTEMa* di (38b)yê da, li pozîsyona *pirtûka* di (38a)yê da hatîye hilberîn. Eger ev rast be, nexwe ev *FTEM* jî divê wek berkara pêveberê bê şirovekirin (wekî di nimûneya (37b)yê da). Dema ew wek berkar bê şirovekirin jî *FTEMa* di (38b)yê da divê bersiva pîrsa "Dîlanê çi xwend?"ê (zz. "Dîlan çi wend?") be. Ji ber ku bersiva vê pîrsê ne *"*Dîlanê xwend ku tiştan hîn bibe"* (zz. *"*Dîlan wend ke çîyan bimusa"*) ye, diyar dibe ku *FTEMa* di (38b)yê da, ne berkara pêveberê ye, lewma jî em nikarin bêjin ew temamkera pêveberê ye. Dema ew wek berkar bê şirovekirin wekî di (38b)yê da xuya dike, nerêzimanî pêk tê.

Testeka din jî ew e ku gelo em dikarin her du kategorîyan bi carê di risteyekê da bi cih bikin an na. Eger bi hebûna her du kategorîyan ve riste nerêzimanî bibe, nexwe pêveber dikare wan her duyan wek alternatîf binkategorîze bike. Lewra eger lêkerêk dikare du heb kategorîyan wek alternatîf binkategorîze bike, bi tenê yek ji wan dikare di risteyê da cih bigire. Eger hebûna her du kategorîyan binyadê nerêzimanî neke nexwe yek ji wan temamker, a din zêdek e.

(39) *Dîlanê* [*FDI pirtûk*] *xwend* [*FTEM ku tiştan hîn bibe*] / zz. *Dîlane* [*FDI kitab*] *xwend* [*FTEM ke çîyan bimusa*]

Di (39)an da bi awayekî zelal xuya dike ku hem *FDI* hem jî *FTEM* dikare di heman risteyê da cih bigire. Me li jor bi nimûneyên (38a)yê nîşan da ku *xwendin* *FDI*yekê binkategorîze dike. Nexwe diyar dibe ku *FTEMa* di (39)an da, ne temamker, zêdek e. Niha jî em lê binihêrin di heman risteyê da hebûna her du temamkerên alternatîf binyadê çawa nerêzimanî dike:

(40) **Dîlanê* [*FDI xwendekar*] *dît-(in)* [*FTEM ku xwendakar pirtûkê dixwînin*] / zz. **Dîlane* [*FDI wendkar-î*] *dî-((y)î)* [*FTEM ke wendekarî kitabî wanênê*]

Nerêzimanîya (40)î nîşan dide ku hem *FDI* hem jî *FTEM* temamker in û nabe her du di heman risteyê da cih bigirin. Sedema nerêzimanîyê têkildar e bi binyada *ROL*î ya lêkera *dîtînê* ve. Lêkera *dîtînê* du heb *ROL*an li argumentên xwe bar dike. Yekê ji van li *FDI*ya bikerî (*Dîlan*) bar dike, ya din jî li temamkera din. Lewma jî li holê temamkerêk bê *ROL* dimîne. Dema di binyadekê da hêmanek bê *ROL* bimîne ev rewş dibe sedema binpêkirina pîvera *ROLê*, ji ber vê jî (40) wek nerêzimanî tê kodkirin.

Hin cure lêkerên kurmancî û yên zazakî jî li pozîsyona xwe ya temamkerî bi tenê *FDI*yekê binkategorîze dikin. Bi gotineka din ev *FD* berkara van cure pêveberan e. Lewra wekî Încekan (2014, r. 15) jî diyar dike di kurmancî da lêkerên ku berkara wan bi awayekî nerastereast pêk tê, berkarên xwe bi saya daçekê werdigirin. Ev cure lêker, di kurmancî û zazakî da ne berbelav in. Yek ji nimûneya wan a berbelav *nihêrîn* (zz. *ewnîyayene*) e. Di kurmancî da *lîstin*, *girtin* (bi wateya "girtina bi tiştêkî") jî ji van cure lêkeran in.

(41) a. *Dîlanê* [*FD li pirtûkê*] *nihêrî* / zz. *Dîlane* [*FD kitabî ra*] *ewnîya*

b. *Dîlanê* [*FD lê*] *nihêrî* / zz. *Dîlane* *ci ra ewnîya*

Di (41a)yê da argumenta temamkerî ya lêkera *nihêrînê* wek *FDya li pirtûkê* (zz. *kitabî ra*) pêk hatiye. Pêşdaçeka *liyê* (zz. *ra*) bi têkarîya lêkera *nihêrînê*, ROLa HEDEFê (GOAL) li *FDIya pirtûkê* (zz. *kitab*) bar dike. Di (41b)yê da argumenta temamkerî wek *FDya lêyê* (zz. *ci ra*) pêk hatiye. Di kurmancî da hêmanên wekî *jê, lê, pê û têyê* ji pêşdaçekê û cihnavên nîşanî (*vî/vê, wî/wê*) an jî cihnavên kesê sêyem ê yekjimar (*wî/wê*) pêk tên (Farqînî, 2019, r. 50). Bo nimûne *lê* ji daçeka *liyê* û yek ji van cihnavan pêk tê (wekî *li+wê* → *lê*). Di xebatên rêzimanê û zimannasîya zazakî da *ci* (bi heman awayî *pi, ti*) gelek caran wek cihnav (a tewandî) a kesê sêyemîn ê yekjimar hatiye qebûl kirin (bnr. Todd, 2008, r. 47; Werner, 2012; Demîr, 2015, r. 42; Arslan, 2018, r. 12; Baluken, 2019, r. 51; Kırkan, 2021c, r. 62). Em li nimûneya jêrîn binihêrin:

(42) a. *Mi ci ra babet pers kerd* 'Min ji **wî/wê** mijar pirs kir'

b. *Mi aye ra babet pers kerd* 'Min ji **wê** mijar pirs kir'

Di (42b)yê da li şûna *ciya* di (42a)yê da, cihnava kesa sêyemîn a tewandî ya *ayeyê* ('wê') hatiye bicihkirin. Bi heman awayî, wekî di (41b)yê da xuya dike *ciyê* şûna *FDIya kitabî* ya di (41a)yê da, wergirtiye. Dîsa bo nimûne di avahîyên wekî *nameyê ciyê*³⁷ da li şûna *ciyê*, em dikarin forma tewandî ya cihnava kesê sêyem ê yekjimar bi cih bikin: wekî *nameyê ey/aye* ('navê wî/wê'). Ji ber çavdêriyên bi vî rengî gelek vekolerên zazakî hêmanên wekî *ci, pi, tiyê* wek cihnav qebûl dikin.

Lê her carê nabe li şûna *ciyê* ev cihnav bê bicihkirin. Bo nimûne di zazakî da *ci kerdene* ('jê kirin') *PKyek* e û nabe di vê *PKyê* da li şûna *ciyê ey/aye* bê bicihkirin, lewra avahîya **ey/aye kerdene* ('*wî/wê kirin') pêk tê ku nerêzimanî ye. Şanlı (2017, r. 104) di vê mijarê da dibêje berginda *jê reya* kurmancî di zazakî da *ci ra* ye û ew dibêje *ci* dibe ku di bingeha xwe da ji *ci+ê, ci+ayeyê* pêk hatibe, lê bi guherîneka dengî ve forma *ciyê* wergirtibe. Di vê boçûnê da *ci* dibe daçek ku di kurmancî da berginda *wê* dibe *ji*. Şanlı li heman derê diyar dike ku di hewramî da berginda *jiya*

³⁷ Di kurmancîya standard da rasterast berginda vê avahîyê tune ye, lê li hin herêman (bo nimûne herêma Semsûrê) avahîyên wekî *navê xwe* heye ku em dikarin bêjin, heman tiştî ifade dikin. Bo nimûne *nameyê ci weş o* ('navê **xwe** xweş e'). Çawa ku em dikarin di avahîya nimûneya zazakî da li şûna *ciyê* cihnava tewandî ya kesê sêyem ê yekjimar bi cih bikin, di avahîya nimûneya kurmancî da jî li şûna *xweyê* em dikarin heman cure cihnavê bi cih bikin: wekî *navê wî/wê xweş e*.

kurmancî daçeka *ceyê* ye û vê yekê jî wek nîşaneka din a têkiliya di navbera daçeka *ciya* zazakî û daçeka *jiya* kurmancî pêşkêş dike.

Bi rastî jî di navbera hin daçekên zazakî û yên hewramî da wekhevî tîn dîtin. Bo nimûne MacKenzie (1966, rr. 54-55) ji bo pêşdaçekên *ba* [be] û *jayê* [ce] ên hewramî dibêje ew bi *gireyên paşdaçekî* (postpositional suffixes) yên *-ana*, *-ara* û *-awayê* dibin yek û *pêşdaçekên lêkdayî* (compound prepositions) yên xwedî wateyên nû çêdikin. Dîsa heman pêşdaçek li pêş cihnavên kesê sêyem, cihnavên nîşanê, rengdêr û di hin kombînasyonên (combination) din da bi rêzê wek *p-* û *ç(i)* [ç(i)] xuya dikin û dema bi paşdaçekan ve dibin yek wek pêşdaçekên *mitleq* (absolute) kar dikin. Di xebata Baileyê (2018, r. 240) ya li ser goranî (ku hewramî wek dîalekteka goranî tê qebûlkirin) da wateya pêşdaçeka *bayê* wek *di...da* (îng. *in*), *li gel* (îng. *with*), *li gor* (îng. *according to/to*), wateya *jayê* jî wek *jê* (îng. *from/of*) hatine nîşandan ku *ba* ji alîyê wateyî ve wekî *biya* kurmancî û *biya* zazakî ye, *ja* berginda *jiya* kurmancî ye. Hin ji nimûneyên ku MacKenzie ji bo van rewşan nîşan dide, ku dişibin hin avahîyên zazakî ev in:

(43) a. *ba/ p- ...ara : ser* (îng. *on*), *tê ra* (îng. *through*)

b. *pɔra: ser* (îng. *on*)

c. *ja/ç(i)- ~ čana: tê da* (îng. *in*)

d. *ja/ç(i)- ... -awa ~ čɔ: jê* (îng. *from*), (îng. *to*)

Di zazakî da jî *bya* pêşdaçeka *biyê* dema daçek bi cihnavêkê dibe yek wekî di kurmancî (wekî *bi+wê* → *pê*) da dibe *p*. Bo nimûne *bi+ey* → *pey*, *bi+aye... (a)* → *pa*. Dîsa bergindên *p-* û *çaya* hewramî di zazakî da ji alîyê wateyî ve *pi* û *ci* ne. Li gel vê, di zazakî da formên wekî *pi ra* ('tê ra'), *ci ra* ('jê (ra)') hene ku ev nimûne hem ji alîyê formê ve hem jî ji alîyê wateyî ve gelek nêzî yên hewramî ne.

Li hin herêman formên cuda yên *ciyê* jî hene. Bo nimûne Yıldız (2025, rr. 117-118) dibêje di zazakîya du gundên li ser Licê (Licoke û Beney) da du formên *ciyê* hene: *cê* (nêrza), *ca/cay* (mêza). Dîsa li gor ku di Kırkanî (2018, rr. 184, 186, 195) da

cih digire *ciya* zazakî di mewlûda zazakî ya Osman Esad Efendîyî³⁸ da bi du formên din jî hatîye bikaranîn: *cay* (mêza) û *cey* (nêrza).

(44) a. (i) *Jew zî may 'Îsayê, Meryem namê ay* 'Yek jî diya Îsayî, Meryem navê **wê**'

(ii) *Ez senîn vajan bi to rindîya cay* 'Ez çawa bejim ji te ra rindîya **wê**

b. (i) *Hewnê cey te'bîr kerd merdim ci rê* 'Xewna **wî** te'bîr kir (**wî**) mirovî **jê** ra'

(ii) *Kerdo de'wet Xaliqî emşo bi ey* 'Kiriye de'wet Xaliqî îşev ew (**bi wî**)'

(iii) *Bê to biresnan verdê ningandê cey* 'Were te bigihînim ber lingî **wî**'


Di nimûneyên (44) an da li şûna *cay* û *ceyê* em dikarin *ciyê* yan jî li gor zayendê cihnavên *aye* (mêza) an jî *eyê* (nêrza) bi cih bikin. Bo nimûne di (44aii)yan da em dikarin risteyê bi awayê *Ez senîn vajan bi to rindîya ci*, yan jî (44biii)yan em bi awayê *Bê to biresnan verdê ningandê ciyê* çêkin. Nimûneyên (44)an rasterast nîşan nedin *cay* û *cey* ji pêşdaçekê (bo nimûne daçekê wekî *ce/ciyê* yan jî yeka din) pêk hatine jî, bi ya me têkilîyekê jî nîşan dide ku *cey* (û lewma jî *ci*) her carê rasterast ne forma tewandî ya cihnava kesê sêyem ê yekjimar e. Bo nimûne di (44bii)yan da li şûna *bi eyê* bicihkirina *ciyê* mimkin e. Di zazakîya Sêwregê da em dikarin bêjin *Mi ci de'wet kerd* ('min ew de'wet kir'). Eger *ci* her carê forma tewandî ya cihnava kesê sêyem be, nexwe em divê bikaribin li şûna *ciya* di vê risteyê da *ey* an jî *ayeyê* bi cih bikin, lê dema em vê bikin, binyad bi awayê **Mi ey/aye de'wet kerdê* ('*Min wî/wê de'wet kir') pêk tê ku nerêzimanî ye. Berevajî vê, em dikarin li şûna *wê* cihnava kesê sêyem ê yekjimar a netewandî bi cih bikin: *Mi o/a de'wet kerd* ('Min ew de'wet kir'). Dîsa li gor ku di Yildizê (2021, r. 336) da cih digire li hin herêman formên *ca* û *cêyê* hene ku li şûna

³⁸ Wek Osman Efendîyo Babij jî tê nasîn. Di sala 1852yan da li Sêwregê hatîye dinyayê, di sala 1928an da wefat kiriye. Di sala 1903an da bi zazakî mewlûdek nivîsandîye (bnr. Kırkan, 2018, rr. 83-85).

cayê ci ra/aye ra ('jê ra/ji wê ra'), li şûna *cêyê jî ci rê/ înan rê* ('jê ra/ ji wan ra') tên bikaranîn. Wek encam wesa dixuye ku *ci* di hin rewşan da ji pêşdaçek û cihnava kesê sêyem ê yekjimar an jî cihnava nîşanî ya yekjimar pêk tê.

Di lîteraturê da bi giştî zazakî û goranî (hewramî) li gor zaravayên din ên kurdî, nêzîktirî hevûdin tên nirxandin û senifandin (bo nimûne bnr. Tan, 2015, r. 19; Khalid, 2020, r. 140). Dema em vê rastîyê û zanyarîyên li jor bi hev ra binirxînin em dikarin piçek din rehetir *ci*, *pi*, *tiyê* zazakî di hin rewşan da wek frêzên daçekî ku ji pêşdaçek û cihnavekê pêkhatine (wekî *jê*, *lê*, *pê*, *têya* kurmancî), qebûl bikin. Wekî me bi nimûneyên *pey* û *payê* nîşan da *b* dibe *p*, lewma em dê pêşdaçeka ku di çekirina *piyê* da cih digire wek *bi* qebûl bikin, lê ji bo diyarkirina pêşdaçeka di *ci* û *tiyê* da li ber destê me bi têra xwe zanyarî tune ne. Ji ber vê, em dê ji bo *ciyê* *cyê*, ji bo *tiyê* *tyê* wek pêşdaçekên cîgir ên di van avahîyan da bi cih bikin. Bi kurtasî dema em van hêmanan wek *FD* binirxînin em dê forma vekirî ya *ciyê* wek *c+cihnav*, a *piyê* wek *bi+cihnav* û ya *tiyê* jî wek *t+cihnav* nîşan bidin. Ev mijar ne zelal be û nîqaşî xuya be jî li jêr dema em li ser pêveberên kompleks kar bikin, em dê hin delîlên ku dikin ku em *ci*, *pi*, *tiya* zazakî wek *FD* qebûl bikin, pêşkeş bikin. Ji ber vê, nîqaşên li vê derê dê li jêr bi kêrî me bên.

Dema em vegerin nimûneyên (41b)yê em divê bêjin li k-binyadê *lê* (zz. *ci ra*) bi awayekî vekirî, bo nimûne wekî *li+wêyê* (zz. *c+ey+ra*) pêk tê. Li vê astê ROL li *wêyê* (zz. *ey* (nêrza)) tê barkirin. Forma *lêyê* (zz. *ci*) dibe ku li asta forma fonetîk pêk tê. Ev giring e, lewra bo nimûne di kurmancî da forma navdêrî ya *FLya li pirtûkê nihêrîyê* wek *nihêrîna li pirtûkê*, ya *FLya li wê nihêrîyê* wek *nihêrîna li wêyê* çêdibe, lê forma navdêrî ya *FLya lê nihêrîyê* wek **nihêrîna lêyê* pêk nayê. Lewma jî em dibêjin dibe ku formên wekî *jê*, *lê*, *pê* û *têyê* yên kurmancî û *ci*, *pi*, *tiyê* yên zazakî ne li k-binyad û r-binyadê, li asta forma fonetîk pêk tînin. Li jêr dardîagrama (45a)yê binyada ROLî ya nimûneya kurmancî, dardîagrama (45b)yê binyada ROLî ya nimûneya zazakî ya di (41a)yê da nîşan dide.



Di hin xebatan da *FDya* ku lêker binkategorîze dikin wek beşeka wan lêkeran hatiye qebûlkin. Bo nimûne Tan (2015, rr. 265-266), lêkerên kurmancî yên ku *FDyekê* binkategorîze dikin wek lêkerên *bidaçek* bi nav dike û dibêje ev lêker, bêyî daçekan nayên kişandin, anku bi serê xwe nayên bikaranîn. Ji ber vê jî, bo nimûne ew dibêje forma "rastîn" a lêkera *nihêrînê* (di pirtûka wî da *nihartin*) *lênihêrîn* e. Bi heman awayî ji bo lêkerên wekî *zanîn*, *lîstin*, formên *pêzanîn*, *pêlîstinê* diyar dike. Angaşt ku Tan li vir pêşkêş dike tê wê wateyê ku lêkerên ku em dibêjin *FDyekê* binkategorîze dikin, divê di ferhenga kurmancî da li gel temamkerên xwe cih bigirin. Anku di ferhenga kurmancî da li şûna *nihêrîn*, *zanîn*, *lîstin* formên *lênihêrîn*, *pêzanîn*, *pêlîstin* divê cih bigirin.

Di çarçoveya xebata me da wekî me nîşan da *lêya* ku di risteyê da li gel lêkera *nihêrînê* xuya dike, ne beşeka lêkerê bixwe ye, lê kategorîyek e ku lêkera *nihêrînê* wê binkategorîze dike. Ji vî alîyî ve cudahiya wê ji kategorîyên *FDI* û *FTEMê* tune ye. Eger em vê nihêrîna Tanî qebûl bikin, bersiva wê pirsê tune ye ku çima em *FDyên* wekî *lê*, *jê*, *pê*, *têyê* wek beşeka forma lêkerê dihesibînin, lê formên wan ên vekirî (bo nimûne *lê = li wê*) û kategorîyên *FDI* û *FTEMê* nahesibînin? Dîsa, çawa ku berkareka rasterast li gel lêkerê wateyeka nû ya ferhengî pêk nayîne, bi heman awayî *lê*, *jê*, *pê*, *tê* jî wateyeka nû pêk nayînin. Bo nimûne lêkera *nihêrînê* û lêkera *nihêrînê* ya di forma *lênihêrînê* da heman "nihêrîn" e. Nexwe ji ber ku wateyeka nû pêk nayê, *lênihêrîn* wek hêmaneka lêkerî ya nû jî nikare bê nirxandin. Dîsa Bakır (2020, rr. 181-184) jî di bin

navê lêkerên biwêjî da hin formên wekî *pê re gotin* (bo nimûne *Min bi wî re got / Min pê re got*), *pev re xwarin* (bo nimûne *Me bi hev re xwar/Me pev re xwar*), *ji zû de hatin*, *jê re gotinê* wek lêkerên hevedudanî (lêkdayî) dide nasîn. Di van nimûneyan da bi rêzê hêmanên *pê re*, *pev re*, *ji zû de* û *jê reyê* li gel lêkerên xwe wateyeka nû pêk nayînin. Bo nimûne di *pev re xwarinê* da, her karê "xwarin"ê heye; *pev re*, bi tenê hêmanek e ku karê "xwarin"ê li gel wî/wê tê kirin ku di çarçoveya xebata me da zêdek e. Lewma bi ya me ev cure form ne lêker (ên lêkdayî) in.

Ji bo zazakî jî di hin xebatan da hin zêdekên ku li gel lêkerê xuya dikin li lêkerê hatine zêdekirin û hatîye angaştîkirin ku ev beşên li lêkerê zêdekirî, binyada argumentî ya lêkerê diguherînin. Bo nimûne Arslan (2016, r. 77) *ci ra vateneyê* bi wateya "ji yekî/ê ra gotina tiştêkî" wek "lêker"eka sê-cihî (anku sê argumentî) disenifîne. Dîsa Kırkan (2021c, r. 59) lêkera *vateneyê* ('gotin') wek lêkerekê têper (a du argumentî) nîşan dide. Lê Kırkan (2021c, r. 63) *cira vateneyê* (*ci* û *rayê* zeliqandî dinivîsîne) jî bi wateya "ji yekî/ê ra gotin" wek "lêker"ek a cot-têper (anku sê argumentî) disenifîne. Bi heman têgehiştinê ew formên *ci ra perskerdene* ('jê pirs kirin'), *ci ra heskerdeneyê* ('jê hez kirin') jî wek lêkerên cot-têper disenifîne. Dîsa Demîr (2015, rr. 44, 49) jî hêmanên *pazeleqnayeneyê* ('pê ve zeliqandin') û *ciraveteneyê* ('jê derxistin') dide nasîn. Di ferhenga zazakî-tirkî ya Canpolatî (2006, r. 127) da *cı resnaene* bi wateya "gihandina tiştêkî bi tişt an kesekî" (berginda *resnaeneyê* di kurmancî da *gihandin* e), *cı ra vejîayene* ('jê derketin') ku yek ji wateyên wê wek "ji nav derketin" e, cih digirin. Di vê ferhengê da gelek avahîyên wekî van cih digirin. Eger em li gor vê boçûnê bêjin em divê bêjin di kurmancî da lêkera *gotinê* du argumentî ye û lêkerekê din a di forma *jê ra gotinê* heye ku ev jî sê argumentî ye ku *jê ra* li gel *gotinê* lêkerekê (ya rast *PKyeka*) sê argumentî pêk tîne. Kêşeya herî mezin a nihêrîneka bi vî rengî ew e ku zêdekeka lêkerê wek pêkhênêka lêkerê bixwe tê hesibandin.

Dîsa di hin xebatan da hin ji pêkhênên *PKyê* wek argumenta heman *PKyê* hatîye qebûlîkirin. Bo nimûne Arslan (2018, rr. 10-11) dibêje lêkera *kerdeneyê* ('kirin') du-cihî (anku du argumentî) ye, lê lêkera (di xebata me da *PK*) *pi-ra kerdene*yê ('lê kirin') lêkerekê sê-cihî ya dîtansîtîv (ditransitive) e û ji bo vê, nimûneya jêrîn nîşan dide:

(46) *Hosta-y boax-Ø ker-d-Ø bon-i ra*

hoste-TWNG boyax-XWR kir_{BORİ}-BORÎ-K3.Y. xanî-TWNG BRP

'Hosteyî boyax li xanîyî kir" (anku 'Hosteyî xanî boyax kir')

Di vê nimûneyê da *bon* ('xanî') li şûna *piya* di *pi-rayê* da hatiye bicihkirin û ev *bon* wek argumenteka lêkera *pi-ra kerdneyê* hatiye nirxandin. Anku wekî hat gotin, pêkhênêka (ya rast zêdek) lêkerê wek beşeka lêkerê hatiye qebûlkirin. Nihêrîneka bi vî rengî ji aliyê semantîkî ve vê fikra nakok bi xwe ra tîne: *pi* hem beşeka lêkerê ye ku wateya argumentan diyar dike, hem jî dema ew bi awayekî vekirî pêk tê (di nimûneyê da *bon*) ji lêkera ku ew bixwe jî beşeka wê ye, ROLê distîne. Anku hêmanek hem ROL-barker hem jî ROL-wergir e. Lê hêmaneka ku ROLê bar dike nabe ku ROLê werbigire. Ji aliyê din ve bo nimûne dema *pi* di risteya nimûne da cih bigire û riste bi awayê *Hostay boax kerd pi rayê* ('Hosteyî boyax lê kir') pêk bê, em dê bêjin *pi* argument e yan beşeka lêkerê ye? Eger em bêjin *pi* argument e, nexwe em divê bêjin ew ne beşeka lêkera *pi-ra kerdneyê* ye, lewma jî lêker bi tenê *ra kerdene* ye, lê wê demê wateya *pi ra kerdneyê* winda dibe, eger em bêjin beşeka lêkerê ye, em divê bêjin ew ne argument e, lewma jî *pi ra kerdene* dê bibe du-cihî.

Berîya her tiştî, ji bo ku hêmanek li ser hejmara argumentan û binyada argumentî bandorekê çêbike, ew divê li ser wateyê guherînekê pêk bîne. Wateya lêkera *vateneyê* "gotin" e, di forma *ci ra vateneyê* da jî dîsa wateya "gotin"ê heye, wateyeka nû çênebûye. Bi tenê hêmaneka HEDEFî (*ci*) ya ku "gotin" ber bi wî/wê pêk tê, lê hatiye zêdekirin. Di nimûneya *pi-ra kerdneyê* ya Arslanî da *pi rayê* wateyeka nû çêkiriye. Ji ber ku hêmana ku dibe sedema wateyeka nû *pi ra* bixwe ye, nabe ku beşek ji wê (li vir *pi* (an jî hêmaneka ku li şûna wê tê bicihkirin)) wek argument bê qebûlkirin. Berevajî angaştê Arslanî bi ya me *pi ra kerdene* lêkerekê (*PK*) du-cihî (anku du argumentî) ye, *bona* ku li şûna *piyê* bi cih bûye, hemaneka zêdek e, lewma jî ne argument e. Sedema bicihbûna *bonê* ya li şûna *piyê* ji ber binyada *piyê* der tê ku wekî me nîşan dabû em qebûl dikin ew ji *bi+cihnavê* pêk tê. Di nimûneyê da *bon*, ne ku li şûna *piyê*, di *bi+cihnavê* da, li şûna *cihnavê* bi cih dibe. Lê ji ber ku di zazakî da forma vekirî ya *piyê* tune ye (anku ji holê rabûye) *pi* ji binyadê dikeve û (ne wesa be jî) wesa xuya dike ku *bon* li şûna *piyê* bi cih bûye. Lê eger forma vekirî ya *piyê* wekî em dibêjin *bi+cihnav* be, di nimûneyê da, *bon* dê piştî *biyê* weha xuya bike: *bi bon-î ra*.

Di kurmancî û zazakî da hin lêker jî wek temamker *FDyêk* an jî *FTEMekê* binkategorîze dikin. Ev lêker ne berbelav in. Nimûneyên van lêkeran ev in: *Karîn* (zz. *eşkayene*), *zanîn* (zz. *zanayene*). Di kurmancî û zazakî da sereya *FDya* ku *karîn* û *zanîn*

binkategorîze dike *biye*. Ev *FD* dibe ku wek *pê* (di zazakî da wek *pey* jî dikare pêk bê) jî pêk bê.

(47) a. *Ez [FD bi wê] dizanim/min [FD bi wê] zanî / zz. Ez [FD bi aye] zana/Mi [FD bi aye] zana*

b. *Ez [FD pê] dizanim/min [FD pê] zanî / Ez [FD pê] zana /Mi [FD pê] zana*

Yek ji nimûneyên wê yên bi temamkera *FTEMî* jî weha ye:

(48) *Ez şî zanim [FTEM (ez) vê pirtûkê bixwînim]_i / mi şî zana [FTEM (ez) ney kitabî biwana]_i*

Di hin xebatan da lêkera *karînê* wek lêkerekê teneper hatîye danasîn. Yek ji wan Thackston e ku di xebata xwe da lêkera *karînê* wek lêkerekê teneper disenifîne. Ew diyar dike ku di dema borî da xwerûtî yan jî tewanga bikerê ji alîyê "lêkera temamker" ve tê diyarkirin. Dema lêkera temamker teneper be biker jî xwerû ye (2006, r. 58). Du nimûneyên ku ew ji bo vê rewşê nîşan dide li jêr in:

(49) a. *Ez êdî nikarîbûm li ser lingan rawestiyama.*

b. *Qederê mehekê min nikarîbû dora xwe bidîta*

Di çarçoveya nihêrîna Thackstonî da, di (49a)yê da ji ber ku lêkera *rawestîne* (ku wek lêkera temamker bi nav dike) teneper e, bikera lêkera *karînê* (di nimûneyê da *ez*) jî xwerû ye, lê ji ber ku di (49b)yê da *dîtina* lêkera temamker têper e, bikera *karînê* jî (di nimûneyê da *min*) tewandî ye. Bi vî awayî derdikeve ku li gor Thackstonî, li ser xwerûtî yan jî tewanga bikerê ne lêkera risteyê (anku *karîn*), lê lêkerekê din diyarker e. Ev di çarçoveya xebata me da bikêşe xuya ye. Lewra me diyar kir ku lêkera *karînê* *FD* an jî *FTEMekê* binkategorîze dike. Eger lêkerek, li gel bikerê xwedî argumenteka din be ew nabe ku teneper be. Di nimûneyên Thackstonî da jî bi rêzê *li ser lingan rawestiyama û dora xwe bidîta*yê *FTEMên* binkategorîzekirî ne, lewma jî wek temamkerên *karînê* kar dikin. Sedema tewanga bikerê ya di (49b)yê da, ne ji ber têperîya lêkera *dîtinê*, ji ber têperîya lêkera *karînê* bixwe pêk tê. Ji ber ku ew têper e, di demên borî da jî risteya ku bi wê tê çekirin, xwedî avahîya ergatîv e. Em dikarin forma r-binyadê ya (49b)yê bi awayê jêrîn nîşan bidin (ji ber ku *qederê mehekê* zêdek e, em wê li jêr nîşan nadin):

(50) *min şî nikarîbû [FTEM min dora xwe bidîta]_i*

Wekî di *FTEMa* (50)î da xuya dike, wekî her risteyekê, ew xwedî bikera xwe ye ku wek *min* pêk hatiye. Dîsa hevîndeksiya *ş* û *FTEMê* jî nîşan dide ku *FTEM* temamkera (anku berkar) risteyê ye. Ji ber vê, wekî her risteya kurmancî ya di avahîya ergatîv da, di vê risteyê da jî biker (a risteya bingeîn) wek *minê*, bi forma tewandî pêk hatiye. Li hin herêman bikaranînên wekî (49a)yê hebin jî, di çarçoveya xebata me da, ev binyad wek nerêzimanî tî qebûlîkin. Lewra nabe bikera lêkerekê tîper di demên borî da netewandî be.

Ji bo lêkerên du-ROLî yê ku bi tenê *FTEMekê* binkategorîze dikin me bi tenê lêkera *wêrînê* (zz. *wetardene*) tesbît kir. Ev lêker, di rêzimana nerîtî da gelek caran wek lêkera modal (modal) an jî lêkera alîkar tî senifandin. Lê ji alîyê sîntaktîk ve ew wek lêkerekê serbixwe tev digere. Lewra wekî Bûlbûl (2019, rr. 265-266) jî nîşan dide ev cure lêker (anku lêkerên modal ên wekî *xwestin*, *karîn*, *wêrîn* û yd.) lêkerên tîper in. Wekî me hin nimûneyên wan li jor dîtin, ev cure lêkerên ku wek modal tî senifandin, temamkerekê jî binkategorîze dikin ku binkategorîzekirina temamkerekê û bikerekê, ji cureya temamkerê azade, taybetmendîya lêkerên tîper e.

(51) *Ez diwêrim [FTEM pirtûkan bixwînim] / zz. Ez wetarena [FTEM kitabên biwana]*

3.2.3. Lêkerên Sê-ROLî

Ev cure lêker, ROLan li sê argumentan bar dikin û du argumentan binkategorîze dikin. Ji her du temamkeran yek li pêş lêkerê yek piştî wê cih digire. Temamkera pêş lêkerê berkara rasterast e, temamkera piştî lêkerê ku berkareka nerasterast e, ROLA wê HEDEF/WERGIR (RECIPIENT) e. Nimûneyên van lêkeran *dan* (zz. *dayene*), *şandin* (zz. *riştene*), *xistin* (zz. *finayene*), *avêtin* (zz. *eştene*), *birin* (zz. *berdene*) in.


Pêşî em lê binihêrin her du temamkerên pêveberê li asta sîntaktîk li kîjan pozîsyonan bi cih dibin. Ji bo diyarkirina vê em dikarin serî li binyada ku Larson (1988, rr. 342-349) ji bo *avahîyên datîv* (dative constructions) pêşniyaz dike, bidin. Ji bo vê em dê li analîza Larsonî ya ji bo risteyên wekî ya jêrîn binihêrin:

(52) *John sent a letter to Marry*

John şand yek name ji Marry

'Johnî nameyek şand ji Marryê ra' / ' Johnî ji Marryê ra nameyek şand'

Larson ji bo van cure risteyan, *FLyeka du-tebeqeyî ya ku ji du heb FLyan pêk tê* pêşniyaz dike.



(53), k-binyada beşeka ji (52)yan e. Wekî di (52)yan da tê dîtin, lêkera *sendê* ('şandin') li pêş *a letterê* ('nameyek') cih digire. Lewma li r-binyadê *send* cih diguhere bo pozîsyona vala ya *Lya* jorîn. Lê em divê bêjin Larson qebûl dike ROL ji alîyê *L'yê* ve li bikerê tê barkirin. Lewma jî li jor, ROLa ku li *Johnî* tê barkirin ne ji alîyê *Lyê* ve, ji alîyê *a letter send to Marryê* ve tê barkirin.


Di îngilîzî da, çawa ku avahîyên datîv ên wekî (52)yan hene, yên wekî jêrîn jî hene. Di van risteyan da hêmana datîv berîya berkara rasterast cih digire.

(54) *I [gave to John]_i everything that he demanded ş_i*

Min [da bi John] her tişt ku wî xwest

'Min her tiştê ku xwest, da Johnî'

Li gor Larsonî, risteya (54) an bi cihguherîna *gave to Johnî* ya ji dayîwa risteyê, pêk tê (hevîndeksiya *gave to John* û şyê vê cihguherînê nîşan dide). Ji bo van cure risteyan jî binyada jêrîn pêşniyaz dike:



Eger em bala xwe bidinê, di (55)an da, wekî nimûneya pêşîn lêker û *FDyê* (*give +to John*) *L'* pêk neanîne, ew di *Lyê* da dibin yek. Analîzeka bi vî rengî piştî xwe dide rêzikeka ku Larson wê wek *Veanalîza L'yê* (*V' Reanalysis*) bi nav dike. Vê rêzika wî, em dikarin bi kurtasî bi awayê jêrîn pênase bikin (ji pênaseya Larsonî hatîye lihevanîn).


(56) *Veanalîza L'yê*

Frêzeka *Ayê* ya *L'yî* dema yek ji *ROLên* xwe yên hundirîn nehewîne, wê demê çêdibe wek *L* bê veanalîzkirin.

Di (55)an da lêker xwedî du heb *ROLên* hundirîn e, yek a *everything that...*ê ya din a *Johnî* ye. Di nav *L'yê* da bi tenê *ROLa Johnî* pêk hatîye, lewma jî *ROLa* din di nav wê da cih nagire. Ji ber vê jî ew wek *L* ji nû ve hatîye analîzkirin. Ev *Lya* ku ji *give+to Johnî* pêk tê, li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona vala ya *Lya* jorîn û risteya (54)an pêk tê.


Di xebata xwe da em qebûl dikin ku *ROLa* bikerê ji aliyê *Lyê* ve tê barkirin (wekî me got Larson qebûl dike *L'* *ROLa* bikerê bar dike). Dîsa di kurmancî û zazakî da, hewce nake di avahîyên datîv da lêker cih biguhere. Li gel vê, ji bo lêkerên sê-*ROLî* yên kurmancî û zazakî, bi hin guhertinan ve, em dikarin *veanalîza L'yê* ya Larsonî bi kar bînin. Em dê binyadê du-tebeqeyî bi kar neyînin. Binyada ku em pêşniyaz dikin dîsa ji *FLyekê* pêk tê, lê berîya ku em binyada ku em pêşniyaz dikin, nîşan bidin em divê pozîsyonên berkara rasterast û temamkera *HEDEFî/ WERGIRî*

diyar bikin. Wekî li jor tê dîtin, Larson argumenta HEDEFÎ li pozîsyona xwişkî ya lêkerê bi cih dike. Lê em dê temamkera berkara rasterast (anku argumenta MIJARÎ) li jêr argumenta HEDEFÎ li pozîsyona xwişkî ya lêkerê bi cih bikin. Grimshaw (bnr. 1991, r. 41) wek temamkera herî nêzîk a lêkerê, argumenta MIJARÎ bi cih dike. Argumenta HEDEFÎ jî di rêza duyem da bi cih dike. Em jî vê bicihkirina Grimshawê ji bo lêkerên sê ROLî yên kurmancî û yên zazakî bi kar tînin. Di encamê da binyada ku em pêşniyaz dikin bi awayê jêrîn e:



Dardîagrama (57)an piştî xwe dide vê: Çawa ku di lêkerekê du-ROLî da hêmana temamker dike ku *L* têr bibe û wek *L'* pêk bê, bi heman awayî dema lêker sê-ROLî be jî, du heb ji van ROLan temamker in û ji ber ku têrbûna *Lyê* bi temamkeran ve dabîn dibe, her du temamker jî divê li bin *L'yê* bi cih bibin. Binyada frêzî ya (57)an vê hewcedarîyê dabîn dike: Di (57)an da lêkera *Xê* û frêza *Yya* MIJARÎ dibin yek û *Lyê* pêk tînin, lewra *L* hêj ji bo ku *L'yê* pêk bîne têr nebûye. Ev têrbûn, dema *Zya* HEDEFÎ/ WERGIRÎ li pozîsyona temamkerî ya *Lyê* bi cih dibe, pêk tê û bi vî awayî *L'* pêk tê. Wekî lêkerên din, hêmana bikerî jî dîsa li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih digire.

Di kurmancî û zazakî da yek ji lêkerên sê-ROLî ya berbelav lêkera *danê* (zz. *dayene*) ye. Eger em ji bo risteya *Dîlanê pirtûk da hevala xweyê* (zz. *Dîlane kitab da embaza xo*) dardiyagremeka li gor ya (57)an çêkin, dê weha be:



Di (58)an da lêkera *danê* ROLê hem li *pirtûka* (zz. *kitab*) li pozîsyona xwe ya xwişkî, hem li *hevala xwe* (zz. *embaza xo*) ya li pozîsyona xwe ya temamkerî hem jî li *Dilana* biker a li pozîsyona xwe ya nîşankerî bi cih bûye, bar dike³⁹.

3.2.4. ROL di Pêveberên Kompleks ên Kurmancî û yên Zazakî da

Ji bo ku em bikaribin di *PKyan* da ROLê vekolin, divê em binyada frêzî û binyada argumentî ya *PKyan* diyar bikin. Ji bo vê, em dê li jêr nîqaşeka teorîk li dar bixin, li hin model û analîzên ku ji bo *PKyan* hatine pêşkêşkirin binihêrin û hewl bidin ji van nîqaşan ji bo *PKyan* binyadeka frêzî û ya argumentî pêşkêş bikin. Lê berîya wê em dê bi kurtasî li ser *PKyan* rawestin, cure û taybetmendiyên sereke yên *PKyên* kurmancî û yên zazakî nîşan bidin ku hin ji van zanyarîyên derbarê *PKyan* da em dê di nîqaşa teorîk da bi kar bînin.

3.2.4.1. Pêveberên Kompleks

Berîya ku em dest bi mijara pêveberên kompleks bikin, em dê piçek li ser têgeha pêveberê (predicate) bisekinin. Çawa ku me berê jî dîtibû riste bi awayekî giştî ji *FDI*

³⁹ Di kurmancî û zazakî da avahîyeka bi navê *avahîya hokarî* (causative construction) jî heye. Ev avahî bi alîkarîya lêkera *danê* (zz. *dayene*), ku xwedî kêş e û lêkera bingehîn ku di forma raderî da ye, pêk tê. Bo nimûne *Dilanê pirtûk da xwendin*. (zz. *Dilane kitab da wendene*). Avahîya hokarî li ser binyada argumentî bandorê çênake. Risteyên heman lêkerê, di forma wê ya demdar û avahîya hokarî da xwedî heman binyada argumentî ne. Bi tenê li ser ROLa bikerê bandorek pêk tê. Bo nimûne di risteya *Dilanê pirtûk xwendê* da ROLa *Dilanê* KARA, ya *pirtûkê* MIJAR e, lê di risteya hokarî ya *Dilanê pirtûk da xwendinê* da li gel ku ROLa *pirtûkê* diya MIJAR e, lê ROLa *Dilanê* SEDEMKAR e. Ji ber ku guherîn bi tenê di warê cureya ROLê da pêk tê, me di xebatê da avahîya hokarî ji aliyê ROLê ve analîz nekir. Bi heman sedeman em dê wan ji aliyê REWŞê ve jî analîz nekin.

û *FL*yekê pêk tê. Dîsa me diyar kiribû ku di risteyekê da *FL* pêveberê pêk tîne. Bo nimûne di risteya *Dîlanê pirtûk xwendê* da pêveber *pirtûk xwend* e, ne bi tenê *xwend* e, *xwend* sereya pêveberê ye. Di risteya *Dîlan hatê* da jî pêveber bi tenê jî *hatê* pêk tê û sereya vê pêveberê jî *hat* e. Di van pêveberan da sere bi tenê yek hêman (bi rêzê *xwend* û *hat*) e. Dema mijar pêvebera kompleks be, li vê derê têgeha *kompleksê* amaje bi kompleksîya sereya pêveberê dike. Di rewşa normal da sereya pêveberê *X⁰*ek e (anku bi tenê yek sere ye), lê di *PK*yan da sere jî yekê zêdetir in (Amberber û yd., 2010, r. 2). Bo nimûne di risteya *Dîlanê destê xwe derman kirê* da pêveber *destê xwe derman kir* e û sereya vê pêveberê *derman kir* e ku jî du hêmanan (*derman* û *kir*) pêk tê. Ji ber vê, em jî bo van cure pêveberên ku sereyên wan jî yekê zêdetir in, dibêjin pêveberên kompleks.

Bi vî awayî derdikeve ku têgeha pêvebera kompleks, jî bo wan avahîyan tê bikaranîn ku jî du yan jî zêdetir hêmanên pêveberî (predicational) (wekî navdêr, lêker, rengdêr) pêk tên û wek yekeyekê kar dikin (Butt, 2010, r. 49). Dema em bi vî çavî li *PK*yê binihêrin diyar dibe ku di kurmançî û zazakî da her yek jî *ve-bûn* (zz. *a-bîyayen*), *ve-kirin* (zz. *a-kerdene*), *nexweş ketin* (zz. *nêweş kewtene*), *nexweş kirin* (zz. *nêweş kerdene*), *jê kirin* (zz. *ci kerdene*), *derman kirin* (zz. *derman kerdene*), *sond xwarin* (zz. *sond werdene*), *ji bîr bûn* (zz. *ra vîr bîyayene*), *ji bîr kirinê* (zz. *ra vîr kerdene*) *PK*yek e.

Di *PK*yan da hêmana lêkerî wek *lêkera sivik* (light verb) (*LS*), hêmana pêkhên a din a *PK*yê jî bi giştî wek hêmana *ne-lêkerî* (non-verbal) tê binavkirin. Ji alîyê din ve lêkerên sade yên bergindên *LS*yan jî wek *lêkerên giran* (heavy verbs) (an jî *lêkerên tematîk* (thematic verbs)) tên binavkirin. Bo nimûne di *sond xwarinê* da, *sond* hêmana ne-lêkerî, *xwarin* lêkera sivik e. Di *şîv xwarê* da jî *xwar(in)* lêkera giran e. Hêmana ne-lêkerî li gor zimanan dibe ku biguhere. Bo nimûne di kurmançî û zazakî da hêmana ne-lêkerî dibe ku navdêrî (*N*) (*derman kirin*/ zz. *derman kerdene*), rengdêrî (*R*) (*sor kirin*/ zz. *sûr kerdene*), daçekî (*D*) (*bi dest* xistin/zz. *bi dest fînayene*), pirtikî (*P*) (*ve-kirin*/zz. *a-kerdene*) be.

Bi giştî li ser wê tê lihevkirin (bnr. Haig, 2002, r. 23; Butt, 2010, r. 52; P. Paul, 2016, r. 178) ku *LS* wek lêkerçêkerê (verbalizer) kar dike. Anku lêkerçêkerîya *LS*yê dike ku hêmana ne-lêkerî wek sereya pêveberê kar bike. Bo nimûne *sond* bi serê xwe navdêrek e, lê dema di *PK*ya *sond xwarinê* da cih digire, *LS*ya *xwarinê* dike ku *sond*

wek sereya pêveberê kar bike û taybetmendîyeka pêveberî (an jî lêkerî) werbigire. Peywireka din a *LSyan* jî kodkirina taybetmendîyên lêkerî yên wekî kes, jimar, dem, xuyang, rêkeftin, mod û yd. e (Baker & Harvey, 2010, r. 14).

PK, yek ji mijarên zimannasî ye ku di lîteraturê da em derbarê wê da rastî gelek boçûnên ji hevûdin cuda tên. Wekî di destpêka xebata Amberber û yd. (2010) da hatîye gotin, *PK* jî bo teorîya zimanî, bi taybetî jî bo cudahîyên ku ji bo ferheng, morfolojî û sîntaksê hatine diyarkirin, kêşeyan derdixin. Di warê *PKyan* da gelek analîzên ji hevûdin cuda hebin jî em dikarin bêjin nîqaşên li ser *PKyan* bi piranî li dora pirsên jêrîn çêbûne:

- a- Gelo wateya *PKyan* jî alîyê hêmana ne-lêkerî ve tê diyarkirin an bi têkarîya her du hêmanên ne-lêkerî û *LSyê* ve tê diyarkirin?
- b- *PK* ferhengî ne yan bi proseseka sîntaktîkî pêk tên?
- c- Gelo binyada argumentî ya *PKyan* jî alîyê *LSyê* ve tê diyarkirin, jî alîyê hêmana ne-lêkerî ve tê diyarkirin an jî ew bi awayekî têkel tê diyarkirin?
- d- Di *PKyan* da rewşa sîntaktîk a hêmana ne-lêkerî çi ye? Bi taybetî di *PKyên* jî hêmaneka navderî û *LSyê* (wekî *sond xwarin*, *hez kirin* û yd.) pêkhatî da hêmana navdêrî wek argumenteka *LSyê* (an jî risteyê) kar dike, yan na?

Li jêr em dê bi kurtasî li ser pirsên jorîn rawestî û em dê lê binihêrin di lîteraturê da jî bo van pirsan kîjan bersiv hatine dayîn û hewl bidin jî bo bingeha boçûna xwe ya jî bo *PKyan* çêkin, jî bo van pirsan li bersivan bigerin.

Li ser fikra hebûn an tunebûna têkarîya semantîk a *LSyê* ya li ser wateya *PKyê* lihevkiyane tune ye. Zimanên ku hatine vekolandin ji hevûdin cuda bin jî, hin zimannas dibêjin wateya *PKyê* bi piranî hêmana ne-lêkerî diyar dike û bandora *LSyê* jî alîyê wateyî ve tune yan jî xumam e (bnr. Grimshaw & Mester, 1988; Mohammad & Karimi, 1992, rr. 201, 208; Haig, 2002, r. 23; Karimi-Doostan, 2005, r. 1742; Baker & Harvey, 2010, r. 14; Gündoğdu, 2015, r. 281; Montaut, 2016, r. 142). Yek ji nimûneyên ku Mohammad û Karimi (1992, r. 202) jî bo vê rewşê wek delîl nîşan didin, *PKyên mecbûr kerdên û mecbûr nimûdenê* yên farisî ne, li gel ku *LSyên wan* (bi rêzê *kerden* ('kirin') û *nimûden* ('nîşan dan')) ji hevûdin cuda ne, lê wateya her duyan jî yek e ku di kurmancî da beramberî *mecbûr kirinê* ye.

Ji alîyê din ve, hin zimannasên din angaşt dikin ku di PKyan da, LS ji alîyê semantîk ve bi temamî ne vala ye û li ser wateya PKyê bandorê çêdike (bnr. Butt, 2010, r. 48). Ji bo piştrastkirina vê, Butt li heman derê diyar dike ku di navbera *take a bath* ('ser (ê xwe) şûştin') û *give a bath* ('ser (ê kesekî/ê) şûştin') cudahîyeka zelal heye. Gündoğdu (2018, rr. 116, 117) jî ji bo PKyên *eşkere bûn/eşkere kirin, vebûn/vekirin, bi rê ketin/bi rê kirinê* yên kurmançî dibêje tercîha LSyê li ser van avahîyan cudahîyên wateyî yên piçûk çêdike. Li gel vê, li gor Gündoğduyê naveroka semantîk a PKyên kurmançî ji alîyê hêmana ne-lêkerî ve tê dabînkirin. Ebûzeîd jî (2019, rr. 98, 100) ji bo PKyên kurmançî yên ku ew wan wek karên (lêker) lêkdayî disenifîne, dibêje wateya lêkera lêkdayî bi piranî ji alîyê hêmana ne-lêkerî ve tê diyarkirin û hêmana lêkerî ji alîyê wateyî ve heta radeyekê vala dimîne. Li gel vê, Ebûzeîd jî bo avahîyên ku ji pêşgir û lêkerekê pêk tên (wekî *ve-xwarinê*), ku ew wan wek lêkerên darijtî disenifîne û em wek PK, diyar dike ku wateya wan bi têkarîya pêşgir û lêkerê ve tê çêkirin. Vaidya û yd. (2019) bi nimûneyên *make a mistake* ('şaşitî kirin') û **take a mistake* ('*şaşitî girtin') angaşt dikin ku li ser wateya PKyê bandora LSyê jî heye. Lewra di van avahîyan da hêmana navdêrî (*mistake* ('şaşitî')) yek e, lê dema LSya wan diguhere wekî tê dîtin, ya duyem nerêzimanî dibe. Goldberg (1996, r. 133) jî dibêje wateya PKyan bi awayekî ne-têkelî (non-compositional) ye, anku wateya PKyan ji wateya parçeyên wê çênabe. Bo nimûne ew dibêje PKya wateya *guh kerdana* ('guh kirin') farisî rasterast "kirina guhî" nine, dîsa *dûst daştin* ('hez kirin'), rasterast ne *xwedîbûna* ('daştin') *hevalekî/ê* ('dûst') ye. Ji ber vê, ew angaşt dike ku wateya PKyan bi tenê ji alîyê hêmana ne-lêkerî yan jî lêkera sivik ve nayê diyarkirin, lê ew bi *kombînasyona* (combination) wateya van beşan pêk tê.

Em dê qebûl bikin ku wateya PKyê bi têkarîya hemana ne-lêkerî û LSyê tê dabînkirin. Lewra di PKyên *ve-kirin, ve-ketinê* da hêmana ne-lêkerî (*ve-*) heman be jî bi awayekî zelal wateyên wan cuda ne. Bi heman awayî wateya *ra-kirin* û ya *ra-xistinê* jî ji hevûdin bi temamî cuda ne, heta dijberî hevûdin in.

Di warê pirsê duyem da (anku PK ferhengî ne yan sîntaktîkî ne) hin zimannas di wê bawerîyê da ne ku PK hêmanên ferhengî ne û çawa ku bêje di ferhengê da cih digirin PK jî di ferhengê da cih digirin û li wir tên parastin. Bo nimûne Goldberg (1996, rr. 133, 144) di xebata xwe ya li ser PKyên farisî da dibêje li gel ku PKyên farisî li asta sîntaktîk wek yekeyên yekgirtî xuya nakin jî, PK di ferhengê da tên parastin. Dîsa ew

diyar dike ku *PK* bi giştî wek hêmanên lêkerî yên sade tevdigerin. Bo nimûne ew ji aliyê taybetmendiyên binyada argumentî ya xwe ve ji bergindên xwe yên sade (anku giran) cuda ne, navdêrîkirina wan mimkin e û nabe ku beşên wan, bo nimûne bi hoker û hin argumentan ve, ji hevûdin bên veqetandin. Ji bo cudahiya binyada argumentî ya lêkerên sade û *PK*yan Goldberg (1996, r. 134) nimûneya jêrîn nîşan dide (di (59a)yê da *girift-en* ('girt-in') lêkerekê sade, di (59b)yê da *erûsî girift-en* ('dawet çêkir-in') *PK*yek e). Goldberg bi nerêzimanîya binyada (60)î nîşan dide ku dema *PK* wek sereya pêveberê kar dike, ji bo hebûna argumenteka jêderîyê destûrê nade (di nimûneya (60)î da *ez û* ('ji wî/wê') argumenta jêderîyê ye).

(59) a. *Kitab ra ez men girift*

Pirtûk DIY ji min girt-K3. Y.

'(Wî/wê) pirtûk ji min girt'

b. *Berayê û erûsî girift-em*

Ji bo wî/wê dawet çêkir-K1. Y.

'Min ji bo wî/wê dawet çêkir'

(60) **ez û erûsî giriftem* **min ji wî/wê dawet çêkir*

Eger em bi kurtasî bêjin lêkera *giriftenê* dema wek lêkerekê giran (di (59a)yê da) wek sereya pêveberê kar dike, dikare argumenteka jêderîyê qebûl bike, lê dema wek *LSyekê* kar dike (di (60)î da) nahêle argumenteka jêderîyê di avahîya zimanî da cih bigire. Dabir-Moghaddam (1997, rr. 25-26), di xebata xwe da, ku li ser lêkerên lêkdayî (di xebata me da beramberî *PK*yan in) yên farisî çêkiriye, ji bo çêbûna *PK*yan du prosesên bi navên *kombînasyon* (combination) û *beşdarbûnê* (incorporation) diyar dike ku ew, van her du prosesan jî ferhengî qebûl dike. Haig (2002, r. 28) jî di xebata xwe da, ku li ser *PKyên* kurmancî yên *N+LSyî* çêkiriye, qebûl dike ku hin cure *PKyên* ku ew wek *PKyên beşdarbûyî* (incorporating CPs) disenifîne, ku bi lêkerên *kirin* û *danê* (wekî *maç kirin*, *av dan*) tên çêkirin, xwedî taybetmendiyên ferhengî ne.

Li hember fikra ferhengîtîya *PK*yan, di hin xebatan da jî hatiye qebûlkirin ku *PK* bi proseseka sîntaktîkî pêk tî. Baker (1988, rr. 1, 80) çêbûna *PK*yan wek proseseka

*beşdarbûnê*⁴⁰ (incorporation) rave dike. Li gor wî, bêjeyeka ku ji aliyê semantîk ve bi serê xwe ye, cih diguhere bo hundirê yeka din. Bi vî awayî ew qebûl dike ku *PK* bi proseseka sîntaktîkî pêk tînin, ne ku bi yeka ferhengî. Mohanan (1994, rr. 208-210) ji bo *PKyên N+LSyî* yê zimanê hindî nîşan dide ku bi awayekî giştî pêkhênên *PKyan* bi awayekî azad ji hevûdin nayên veqetandin, lê *LS* dikarin ji *Nyên* xwe veqetin û di serê risteyê da wek topîk (topic) cih bigirin. Ne bi awayekî azadane be jî, ji ber ku di hin rewşan da cihguherîna hêmanên *PKyan* pêkan e, ew qebûl dike ku *N* û *LS* yekeyeka ferhengî pêk nayînin. Lewra nabe ku *binpêkhênên* (subconstituent) yekeyeka ferhengî ji hevûdin bînin veqetandin. Megerdoomian (2001, r. 98), ji bo *PKyên* farisî dibêje formên navdêrî û rengdêrî yê ku ji bo ferhengîya *PKyan* wek delîl tînin nîşandan proseseka çêkirina bêjeyan e û *PK* li asta sîntaktîk tînin çêkin. Lewra li gor wê, eger çêbûna bêjeyan bi ferhengê ve bisînorkirî nine, wê demê çêdibe *PK* li asta sîntaktîk bînin navdêrîkirin û ne hewce ye ew wek yekeyên ferhengî yan jî yekeyên *X⁰*ê bînin qebûlkin. Ji bo navdêrîkirina *PKyan*, *derman + kirin* → *dermankirin*, ji bo forma rengdêrî jî *dermankir-îyê* em dikarin wek nimûne nîşan bidin. Folli û yd. (2004, rr. 7, 35), di xebata xwe da *PKyên* farisî yê *N+LSyî* analîz dikin û digihêjin wê encamê ku ev cure *PK* di farisî da bi proseseka sîntaktîkî çêdibin. Lewra li gor wan, ji ber ku çêdibe *N* û *LS* di risteyê da bi hêmanên wekî neyînîkirinê, yê dema bê ji hevûdin bînin veqetandin û çêdibe *N* bînin modîfîyekirin (ev ji bo hin *PKyên* kurmancî û yê zazakî jî derbasdar e), çênabe ku ev cure *PK* di ferhengê da bînin parastin. Me li jor got Haig ji bo hin cure *PKyên* kurmancî dibêje ew xwedî taybetmendiyên ferhengî ne. Lê Haig (2002, r. 34), ji bo *PKyên* din ên ku ew wan wek *ne-beşdarbûyî* (non-incorporating) disenifîne (wekî *sond xwarin*, *hez kirin*, *bêrî kirin*), dibêje ev cure *PK* piştî xwe didin qalibên sîntaktîk ên hilberîner. Di xebatên Gündoğduyê (2015; 2018) da tê qebûlkin ku her cure *PKya* kurmancî bi awayekî sîntaktîkî çêdibe. Ebûzeîd (bnr. 2019, rr. 112-115), *PKyên* kurmancî (wek karên lêkdayî bi nav dike) di çarçoveya *BGyê* da analîz dike û diyar dike ku *PK* li asta r-binyadê bi *beşdarbûnê* (di xebata wê da *hevgirtin*) ve pêk tînin. Li gor wê li asta r-binyadê hêmana ne-lêkerî cih diguhere nik lêkerê, *beşdarî* wê dibe û *PK* çê dibe.

⁴⁰ Têgeha *beşdarbûnê* di Dabir-Moghaddam, Haig û Bakerî da rasterast heman tiştî îfade nake. Di prosesa xebatê da cudahiyên wan dê bînin dîtin.

Em qebûl dikin ku *PK* di ferhengê da tîn çekirin, lê di ferhengê da nayên parastin, lewma jî bi proseseka sîntaktîk pêk nayên. Lê berîya ku em ji bo çêbûna *PKyan* pêşniyaza xwe diyar bikin, em dê lê binihêrin çima em ji bo kurmancî û zazakî parastina *PKyan* a di ferhengê da yan jî çêbûna wan a bi proseseka sîntaktîkî ve pêşniyaz nakin.

Dijberîya me ya ji bo pêşniyaza parastina *PKyan* a di ferhengê da piştî xwe dide têkilîya ROL û avahîya ergatîv. Wekî me ditibû di kurmancî (û zazakî) da binyada ergatîv di dema borî da derdikeve, biker tewandî ye. Dema lêker di ferhengê da ji yekê zêdetir ROLan bihewîne, wê demê li r-binyadê di demên borî da ew xwedî avahîya ergatîv e. Bo nimûne di risteya jêrîn da *Dîlan* tewandî ye (bi -êyê hatîye nîşandan) û *pirtûk* li gel lêkerê rêkeftî ye (li ser lêkerê bi *Θ*ê hatîye nîşandan ku kesê sêyemîn ê yekjimar kod dike)

(61) *Dîlan-ê pirtûk xwend-Θ*

Lêkera *xwendinê*, di ferhengê da xwedî du ROLan e, lewma jî du argumentan dide der. Yek ji van *Dîlan* ya din *pirtûk* e û ROLan jî li van argumentan bar dike. Dema lêkerekî neakûzatîv an jî teneper be, wê demê, ji ber ku bi tenê xwedî yek ROLê ye, bi tenê yek argumentê dide der û ji ber vê jî avahîya ergatîv pêk nayê.

(62) a. *Zarok-Θ ket*

b. *Zarok-Θ kenîya*

Ketin, lêkerekî neakûzatîv, *kenîn* jî teneper e, ji ber vê jî wekî di (62)yan da tê dîtin, avahîya ergatîv pêk nayê.

Niha dema em li gor vê li *PKyên* wekî *sond xwarin* (zz. *sond werdene*), *şerm kirin* (zz. *şerm kerdene*), *xwê dan* (zz. *ereq dayene*) û yd. binihêrin em dibînin ku ew bi tenê xwedî yek ROLê ne. Lewra wekî em dê bibînin di van *PKyan* da hêmanên navdêrî (*sond*, *şerm*, *xwê*) ROLê wernagirin. Eger ROLê werbigirin, ew dê wek temamkera (an jî wek berkar) rasteqîn bên şirovekirin. Bo nimûne *sond* dê wek tişteki xwarinî yê rasteqîn bê şirovekirin. Dîsa eger wesa be, di demên ne-borî da *Nya* van cure *PKyan* divê bitewe. Lê em dibînin ku binyada jêrîn a (63b)yê nerêzimanî ye.

(63) a. *Ez sond dixwim / zz. Ez sond wena*

b. **Ez sond-ê dixwim / zz. *Ez sond-î wena*

Berevajî vê, ev cure *PK* di demên borî da xwedî avahîya ergatîv in:

(64) *Min sond xwar / zz. Mi sond werd*

Eger *PK* di ferhengê da tîen parastin û wek lêkerên sade kar dikin û eger lêkerên yek *ROLî* nikarin avahîya ergatîvî pêk bînin, nexwe (64) çawa pêk tê? Lewra eger *sond xwarin* di ferhengê da wek lêkerek sade tê parastin, di (64)an da *sond xwarin*, divê wekî lêkerek tîenper an jî neakûzatîv tevbigere; anku biker divê netewe, lê dema ev bê kirin, wekî di binyada jêrîn da xuya dike, nerêzimanî pêk tê.

(65) **Ez sond xwar-im / zz. *Ez sond werd-a*

Nexwe em dikarin bêjin ku di kurmancî û zazakî da *PK* di ferhengê da nayên parastin. Bi gotineka din eger di ferhenga kurmancî û zazakî da, ti lêkerek xwedî yek argumentê (yan jî yek *ROLê*) ya ku di demên borî da avahîya ergatîv dide destpêkirin, cih nagire, wê demê em qebûl dikin ku *PKyên* yek-*ROLî* jî nabe ku di ferhenga kurmancî û ya zazakî da cih bigirin. Eger cureyeka *PKyê* di ferhengê da cih nagire, nexwe cureyên din jî cih nagirin. Lewma jî *PK* di ferhengê da nayên parastin.

Dijberîya me ya ji bo pêşniyaza çêbûna *PKyan* a bi proseseka sîntaktîk jî piştî xwe dide binyada *ROLî*. Wekî me diyar kiribû, *ROL* zanyarîyên di ferhengê da ne. Binyada *ROLî* ya lêkerê jî li gor *ROLên* ku di ferhengê da dihevinê pêk tê. Bo nimûne eger lêkerek di ferhengê da xwedî yek *ROLê* be, ew xwedî yek argumentê ye, eger du *ROLên* wê hebin, du argumentên wê hene. Ji ber vê, li asta sîntaktîk (wekî k-binyad û r-binyad) ev *ROLên* lêkerê tîen parastin ku ev pêwîstîyeka Prensîpa Derdanê ye. Bi gotineka din asta sîntaktîk, cihê guherîna binyada *ROLî* ya lêkerê nine, lewma cihê guherîna binyada argumentî jî nine. Li gel vê, wekî me bi nimûneyên ji bo *PKya sond xwarinê* dît, li gel ku lêkera giran a *xwarinê* du-*ROLî* ye, *PKya sond xwarinê* yek-*ROLî* ye. Nexwe diyar dibe ku li ser binyada *ROLî* ya lêkera *xwendinê* guherînek pêk hatiye. Yekemîn asta sîntaktîk a ku zanyarîyên ferhengê lê tîen derdan k-binyad e. Nabe ku li k-binyadê binyada *ROLî* û binyada argumentî ya yekeyeka ferhengî biguhere. Nexwe cihê çêbûna *PKyan* divê li pêş vê astê be ku ew jî ferheng e.

Lê li vê derê em divê çêbûna *PKyan* a di ferhengê da û parastina wan a di ferhengê da ji hevûdin veqetînin: Dema em dibêjin *PK* di ferhengê da çêdibin mebest jê ew e ku *PK* di ferhengê da bi saya hin rêzikên ferhengî çêdibin; dema em dibêjin

PK di ferhengê da tîn parastin ew tê wê wateyê ku *PK* wekî lêkerên sade ne û wek yekeyeka ferhengî di ferhengê da tîn parastin. Em li gel boçûna yekem in.

Eger em bînin bîra xwe, me gotibû forma tebatî ya lêkeran di ferhengê da çêdibe. Wekî me dîtibû forma tebatî li ser binyada *ROLî* ya lêkerê guherîn pêk dianîn, lewra *ROLa* bikerê ji lêkerê werdigirt. Em *PKyan* jî ji vî alîyê ve wekî lêkerên tebatî qebûl dikin: Bo nimûne di ferhenga kurmancî da avahîyeka wekî ya *hatin xwendinê* cih nagire û li wir nayê parastin. Lewma *PK* jî di ferhengê da cih nagirin û nayên parastin.

Niha jî em vegerin pîrsa sêyem, anku pîrsa derbarê binyada argumentî ya *PKyê* da. Di vê mijarê da sê boçûn hene: Li gor boçûna yekem binyada argumentî ya *PKyê* ji alîyê hêmana ne-lêkerî ve tê diyarkirin (bnr. ji bo japonî Grimshaw & Mester, 1988; ji bo farisî Karimi-Doostan, 2005, r. 1742), li gor boçûna duyem li ser binyada argumentî hem hêmana ne-lêkerî hem jî *LS* diyarker e (bnr. ji bo hindî Mohanan, 1994, rr. 201-205, 222; Butt, 2019). Li gor boçûna sêyem jî li ser binyada argumentî bi tenê *LS* diyarker e (bnr. ji bo farisî Megerdooian 2001, r. 98). Hin xebatên ku li ser hin cure *PKyên* kurmancî hatine çêkirin jî di mijara binyada argumentî da hin nêzîkahî diyar kirine. Haig (2002, rr. 36, 40, 45) ji bo *PKyên N+LSyî* yên kurmancî her çiqas bandora *Nyê* red neke jî, ew *Nyê* wek diyarkereka binyada argumentî qebûl nake. Li gor wî, cudahîya binyada argumentî ya *PKyan* û bergindên giran ên *LSyan*, bi taybetî, di *PKyên* ne-beşdarbûyî da (wekî *sond xwarinê*), dibe ku ji ber wê be ku *Nya PKyan* bi awayekî, pozîsyona argumentî ya lêkerê dadigire. Ji alîyê din ve ev jî bo *PKyên* ne-beşdarbûyî ên bi temamkerên daçekî (wekî *hez kirin*), dibêje dibe ku bandora *Nyê* li ser binyada argumentî hebe. Eger em tiştê ku Haig dibêje bi nimûneyekê rave bikin, tişteki weha dê derkeve: Binyada argumentî ya *PKya sond xwarinê* û ya lêkera giran a *xwarinê* cuda ye. *Sond xwarin* xwedî yek argumentê ye (biker), lêkera giran a *xwarinê* xwedî du argumentan e (biker û temamker). Ev cudahî ji ber wê pêk tê ku *sond* di *PKya sond xwarinê* da pozîsyona temamkerî ya *xwarinê* dadigire. Esas ev di heman demê da bi xwe ra wê encamê tîne ku lêker di *PKyê* da jî hewcedariyên xwe yên argumentî yên di forma giran da didomîne. Jixwe wesa xuya ye sedema ku Haig hin *PKyan* wek ne-beşdarbûyî disenifîne, ev e. Ji ber ku lêker di *PKyê* da hewcedariyên argumentên xwe didomîne, lewma *Nyên* van *PKyan* wek berkar kar dikin. Bi heman awayî Gündoğdu (2018, r. 117) jî diyar dike ku *LS* li gel bergindên xwe yên tematîk (anku ên giran) xwedî heman naveroka semantîk û binyada argumentî ninin, Li gor

wê, *LS* karatî (agentivity) û valensa (valency) *PKyê* diyar dike û *Nya PKyê* jî naveroka wateyî diyar dike.

Di vê mijarê da em qebûl dikin ku binyada argumentî ya *PKyan* ji alîyê her du hêmanên *PKyê* ve tê diyarkirin. Lewra binyada argumentî têkildar e bi wateya sereyê ve. Me qebûl kir wateya *PKyan* bi têkarîya hêmana ne-lêkerî û *LSyê* pêk tê. Ji ber ku bi saya têkarîya pêkhênên *PKyê* wateyeka nû pêk tê, lewma jî wek encameka siruştî binyada argumentî ya ku li gor vê wateyê pêk tê, ji alîyê têkarîya pêkhênên *PKyê* ve tê diyarkirin. Lê prosesa çêbûna *PKyê*, li ser têperîya *LSyê* bandorekê çênake. Lêkerekê têper dema wek *LS* kar dike dîsa têper e, lêkerekê teneper (neakûzatîv) dema wek *LS* kar dike dîsa teneper e.

Pirsa çarem di warê rewşa sîntaktîk a hêmana ne-lêkerî da bû. Xebatên di vî warî da bi taybetî rewşa sîntaktîk a *Nya PKyan* vedikolin. Anku dixwazîn diyar bikin gelo *N* wek argument (anku berkara pêveberê) kar dike yan na. Li gor vê jî du boçûn hene: Li gor boçûna yekem *N* wek berkar kar nake, lewra ew rewşa xwe ya argumentî winda dike. Bo nimûne Mithun (1984, r. 849) dibêbe di hin zimanan da hin binyadên zimanî hene ku di van binyadan da *Lyek* û berkara wê ya rasterast tên cem hevûdin û bi awayekî hişk bi hev ve tên girêdan. Di van binyadan da, *L* û *N* ji alîyê fonolojîk ve wek bêjeyên ji hevûdin cuda xuya dikin; lê wekî di hemû lêkdayîyan da tê dîtîn *N* wek argumenteka risteyê statuya xwe ya sîntaktîk winda dike û yekeya *L+Nyê* wek pêvebereka teneper kar dike. Nash û Samvelian (2016, rr. 2-3) jî di heman çarçoveyê da dibêjin di çêbûna *PKyên LS+Nyê* da yek ji rêyên herî berçav ew e ku berkara rasterast, rewşa rêzimanî jî tê da gav bi gav taybetmendîyên xwe yê argumentî winda dike û di nav *LSyê* da dihele. Boçûna duyem jî berevajî vê ye û *Nyê* wek berkar dinirxîne. Bo nimûne ne ji bo hemû *PKyan* be jî Mohanan (1994, rr. 230-238), Haig (2002, r. 36), Gündoğdu (2015, r. 290), Açar (2024, r. 287) (bi awayekî kurt behsa *PKyan* dike ku *PKyan* wek lêkerên lêkdayî bi nav dike) qebûl dikin ku di hin cure *PKyan* da *Nya* wan wek berkara rasterast kar dike. Csirmaz û Ceplová (bêdîrok) jî bo *Nyên* zazakî dibêjin *Nyên PKyên* ku berkareka rasterast wernagirin, wek berkar kar dikin, *PKyên* ku dikarin berkareka rasterast werbigirin jî *Nyên* wan wek berkar kar nakin.

Nîqaşeka din a di warê *Nya PKyan* da ew e ku gelo ew bar (anku ferhengî/sere) e yan frêzî ye. Di vê mijarê da jî du boçûn hene. Mohanan (1994, rr. 210-211), ji bo

PKyên N+LSyî yên hindî dibêje *Nya* wan nayê modîfîyekirin, lewra ew kategorîyeka ferhengî ye. Eger ew hêman bê modîfîyekirin wê demê êdî ew nikare bibe kategorîyeka ferhengî. Dîsa Dabir-Moghaddam (1997, r. 53) qebûl dike ku di *PKyên N+LSyî* yên farisî da, *N* her carê navdêrek (anku bar) e. Lê li gor Mohammad û Karimiyê (1992, r. 203), di *PKyên* farisî da *Nya PKyan* frêzî ye. Dîsa Gündoğdu (2015, r. 289) ji bo *PKyên* kurmancî yên *N+LSyî* bi nimûneyên jêrîn nîşan dide ku di hin *PKyan* da çêdibe *Nya* wan bi navdêrekê ((66a) (*Remezan*)), bi rengdêrekê ((66b) (*giran*)), bi îzafeya xwedîtiyê ((66c) (*xwe*)) bê modîfîyekirin, hin *N* jî bar ((66d) (*destnimêj*)) in û nayên modîfîyekirin.

(66) a. (e)wî *rojî-ya Remezan-ê girt-Ø*

b. *Min serma-yek-î giran girti-bû-Ø*

c. *Min bêhn-a xwe da-Ø*

d. *Me şeveqê destnimêj girt-Ø*

Di vê rewşê da, (66d) ne tê da, *Nyên PKyên* jorîn dibin frêzî, lewra wekî wextê me frêz dan nasîn, me diyar kiribû ku frêz berfireh dibin, lê bêje, berfireh nabin. Csirmaz û Ceplová (bêdîrok) dibêjin *Nyên PKyên* ku berkareka rasterast wernagirin, ji ber ku *Nyên* wan wek berkar kar dikin, ev *N* frêzî ne; *Nyên PKyên* ku dikarin berkareka rasterast werbigirin jî ji ber ku ev *N* wek berkar kar nakin, *Nyên* wan ne frêzî, lê navdêr in, anku sereyek in.

Me qebûl kir ku *PK* di ferhengê da çêdibin. Ji ber vê nabe ku em pêkhênên ne-lêkerî ya *PKyê* frêzî qebûl bikin. Ew bar in. Li gel vê, çawa ku dema yekeyeka ferhengî derdikeve asta sîntaktîk frêzî ye, pêkhênên ne-lêkerî yên *PKyê* jî li asta sîntaktîk frêzî ne. Hin cure *PK* jî dikin ku em bêjin ev hêman frêzî ne. Em jî li gel wê fikrê ne ku di hin cure *PKyan* da (wekî *sond xwarin*, *şerm kirin*) da *Nya* wan wek berkar kar dike. Wekî me li jor got, prosesa çêbûna *PKyê* li ser têperîya lêkerê bandorekê çênake. Ji ber ku lêkerên wekî *xwarin* û *kirinê* têper in, dema wek *LS* kar dikin jî ji ber vê têperîyê li sîstemê hêmanek divê hebe ku wek berkar bê şirovekirin. Ji bo ku vê peywirê bi cih bînin, ew divê frêzî bin. Delîleka din em dikarin ji hin *PKyên* zazakî nîşan bidin ku, wekî Csirmaz û Ceplová (bêdîrok) jî nîşan didin, *Nya* wan pirjimar e û ev pirjimarî li ser *LSyê* tê kodkirin. Wek nimûne em dikarin li *PKya qiseyî kerdene* (zz. *xeber dan*) binihêrin. Di vê *PKyê* da, di *qise-(y)îyê* (*xeber-prj*) da *-(y)î* gireya pirjimarîyê ye û di

(67) <i>Dîlane</i>	<i>bi</i>	<i>ey</i>	<i>a</i>	<i>qise-(y)î</i>	<i>kerd-î</i>
Dîlan -TWNG	bi	wî	D _{paş}	xeber-prj.	da-prj.
'Dîlanê bi wî ra xeber da'					

(68) *Wê awir-ek da min*

Di her zimanî da her cure *PK* tune be jî *PK* di gelek zimanan da tên dîtin. Haig (2002, r. 17) derbarê *PKyên N+LSyî* da dibêje ew bi taybetî di zimanên Hindo-Aryayî (Indo-Aryan) da berbelav in. Hin zimanên din ên ku *PKyên N+LSyî* tê da tên dîtin, zimanên japonî, tamîlî û bi giştî zimanên dravîdî (dravidian), tirkî, polînezî (polynesian) ne. Vaidya û yd. (2019) jî dibêjin *PK* bi taybetî di zimanê hindî û zimanên din ên Başûr-Asyayî (South Asian) da gelek hilberîner e. Bo nimûne Montaut (2016, r. 142) dibêje, beşeka mezin a ferhenga lêkerî ya hindî *PK* pêk tînin. Di zimanên wekî kurdî û farisî da bi taybetî *PKyên N+LSyî* wek rêyeka hilberîner a çêkirina lêkeran/pêveberan hatiye dîtin (bnr. Haig, 2002; Gündoğdu, 2015, r. 280). Li gor ku di Dabir-Moghaddamî (1997, rr. 36-37) da tê gotin di farisîya navîn (P.Z. 224-651) (Middle Persian (224-651 A.D.)) da hejmara lêkeran ne zêde bûye û di farisîya devkî û nivîskî ya îroyîn da hejmara herî zêde ya lêkerên sade 115 e. Ev kêmasî bi *kombinasyona navdêr+lêkerê* ve hatiye telafîkirin. Heman tiştî Butt (2010, r. 52) ji bo zimanê ordûkî dibêje û diyar dike di vî zimanî da hejmara lêkerên sade dora 500î ye û ji ber vê, ji bo zimanên wekî ordûkî *PKyên N+LSyî* ji bo çêkirina lêkerên nû û ji bo bêjeyên deynkirî bikevin nav sîstema lêkeran rêyeka gelek hilberîner e. Gündoğdu (2015, rr. 279-280) jî dibêje di kurmançî da *PK* gelek berbelav in. Di nav *PKyan* da jî li gor cureyên din, *PKyên N/R+LSyî* bi awayekî zelal zêde ne. Wek nimûne di xebatekê da, ku Gündoğdu wê wek çavkanî nîşan dide, ji 692 *PKyan*, dora 600 hebî ji wan *PKyên N/R+LSyî* ne. Dîsa ew diyar dike ku hejmara *PKyan* ji ya lêkerên sade zêde ye.

Haig û Öpengin (2018, r. 183, 188) dibêjin di kurmancî da hejmara lêkerên sade ihtimal e ji 150yî zêdetir nebe û kurdî jî wekî gelek zimanên Îranî, bi awayekî berfireh ji bikaranîna pêveberên kompleks sûd werdigire ku yek ji rêyên çekirina wateyên lêkerî yên nû ye.

Di kurmancî û zazakî da li gor *LSyên* din *LSyên kirin* (zz. *kerdene*), *bûn* (zz. *bîyayene*), *danê* (zz. *dayene*) bi awayekî berbelav tên bikaranîn. Li gel van her sê lêkeran, di kurmancî û zazakî da hin lêkerên din ên ku wek *LS* dikarin kar bikin weha ne: *xwarin* (zz. *werdene*) (krm. *sond xwarin*, zz. *sond werdene*), *ketin* (zz. *kewtene*) (krm. *nexweş ketin*, zz. *nêweş kewtene*), *anîn* (zz. *ardene*) (krm. *bi cih anîn*, zz. *bi ca ardene*), *xistin* (zz. *fînayene*) (krm. *lê xistin*, zz. *ci fînayene*), *hatin* (zz. *ameyene*) (krm. *lê hatin*, zz. *ci ameyene*), *çûn* (zz. *şîyayene*) (krm. *jî xwe ve çûn*, zz. *xo ser(î) ya şîyayene*).

Li jêr, di bin vê binbeşê da em dê hewl bidin cureyên *PKyan* di kurmancî û zazakî da diyar bikin û hin taybetmendiyên sereke yên *PKyên* kurmancî û yên zazakî diyar bikin.

3.2.4.1.1.1. Cureyên Pêveberên Kompleks

Di warê senifandina *PKyên* kurmancî da hin pêşniyaz di lîteraturê da hene. Haig (2002) *PKyên* kurmancî bi du awayan disenifîne: Senifandina yekem li gor cureya kategorîya ferhengî ya hêmana ne-lêkerî û têperî û teneperîya *LSyê*, senifandina duyem jî ji bo *PKyên N+LSyî* hatîye çekirin ku ev senifandina duyem li gor statuya sîntaktîk a hêmana navdêrî û cureya temamkera van *PKyan* hatîye çekirin.

Di senifandina yekem a Haigî (2002, rr. 21-22) da *PKyên* kurmancî bi awayê tabloya jêrîn hatine senifandin, lê Haig diyar dike ku wî hin cure *PK* nexistine nav vê tabloyê: Wekî *PKyên* ku hêmana wan a ne-lêkerî jî yekê zêdetir in (wekî **dest pê kirin**), *PKyên* ku hêmana wan a ne-lêkerî piştî hêmana lêkerî cih digire (wekî **anîn cih**) û *PKyên* ku dijar e ku bê diyarkirin ka hêmana wan a ne-lêkerî rengdêr an jî navdêr e. Anku hin pêkhênên ne-lêkerî hene ku zehmet e meriv diyar bike ka ew rengdêr in an navdêr in. Li gel van, em divê diyar bikin ku *PKyên* ku ji *FDyên* wekî *jê*, *lê*, *pê*, *tê*, *jev*, *pev* û *LSyê* (wekî **lê kirin**, **jev kirin**) pêk tên jî di tabloya Haigî da cih nagirin.

	Hêmana Ne-Lêkerî		
Lêker	Pirtik (an jî pêşlêker (preverb))	Rengdêr	Navdêr
Têneper	<i>derketin</i> (pirtik <i>der</i> + lêker <i>ketin</i>)	<i>rast hatin</i> (rengdêr <i>rast</i> + lêker <i>hatin</i>)	<i>dil ketin</i> (navdêr <i>dil</i> + lêker <i>ketin</i>)
Têper	<i>vekirin</i> (pirtik <i>ve</i> + lêker <i>kirin</i>)	<i>pîroz kirin</i> (rengdêr <i>pîroz</i> + lêker <i>kirin</i>)	<i>maç kirin</i> (navdêr <i>maç</i> + lêker <i>kirin</i>)

Di senifandina PKyên *N+LSyî* da Haig (2002, r. 26) van PKyan li gor "behreya (ability) birêvebirina berkara rasterast a îlawe" di bin du komên sereke da disenifîne: *PKyên Beşdarbûyî* (incorporating CPs) û *PKyên ne-beşdarbûyî* (non-incorporating CPs). PKyên wekî *av dan*, *derman kirin*, *maç kirin*, *xwedî kirin* di bin koma PKyên beşdarbûyî da hatine senifandin. Haig (2002, r. 27) diyar dike ku ew têgeha *beşdarbûyî* bi wateya "beşdarbûna sîntaktîk" (syntactic incorporation) bi kar tîne ku bi vî awayî Nya beşdarbûyî ji aliyê sîntaktîk ve ne çalak e. Bi gotineka din statuya wê ya sîntaktîk ji holê radibe. Lewma jî lêker dikare bi awayekî azad rola berkartîyê li *FDIyeka* din bar bike. Bo nimûne di risteya *Dîlanê kulîk av danê* da *av* beşdarbûyî ye, lewma nikare rola berkartîyê bi cih bîne. Ji ber vê jî *kulîlk*, wek berkara rasterast kar dike. Ji bo Haigî (2002, r. 34), nebûna nîşankirina bi rewşa rêzimanî, nebûna azadiya cihguhertinê û nebûna çendîker (quantifier)⁴¹ û modîfîyekeran li ser Nyê, ji ber wê ye ku *N* ne argumentek e. Ji aliyê din ve di forma tebatî da ew nabin biker û dîsa ew û lêker rêkeftî ninin û ya dawîn ew rê didin hebûna berkareka rasterast a îlawe. Ev hemû nîşan didin ku Nya PKyên beşdarbûyî ne xwedî statuyeka argumentan e.

Wekî dê bê texmînkirin di PKyên ne-beşdarbûyî da jî Nya wan wek berkar kar dike. Ji bo PKyên ne-beşdarbûyî Haig dibêje Nya wan her çiqas wekî berkarên rasterast bi rewşa rêzimanî neyê nîşankirin û xwedî azadiya cihguhertinê nebe jî wesa dixuye

⁴¹ Hin ji cureyên çendîkeran di kurmançî da ev in: Çendîkera nenasyar (indefinite quantifier) (wekî *gelek*, *hin*), çendîkera hejmarî (numeral quantifier) (wekî *du*, *sê*, *çar*), çendîkera dijber (contrastive quantifier) (wekî *tenê*, *hew*, *bes*), çendîkera pirsariyê (interrogative quantifier) (wekî *kîjan*, *çiqas*) Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Bilbil, 2017, rr. 21-26; Gündoğdu, 2018, rr. 64-75.

ku ew di risteyê da pozîsyona berkara rasterast bloke dike, anku ew piçekî xwedî statuyeka argumentî ya jêmayî ye (2002, r. 36). Haig ji bo *PKyên* ne-beşdarbûyî sê koman diyar dike: *PKyên têrbûyî* (saturated CPs), *PKyên bi tamamkera daçekî* (adpositional complement CPs), *PKyên bi tamamkera xwedîtîyê* (possessor complement CPs).

PKyên têrbûyî, *argumenteka îlawe* (additional argument) naxwazin. Nimûneyên vê komê wek *baz dan*, *şerm kirin*, *xwey dan* û *can dan* in. Ev binavkirina wek *têrbûyî* ji ber wê ye ku *Nya* di *PKyê* da cih digire, hewcedarîya argumentî ya lêkerê bi cih tîne (Haig, 2002, r. 29). Bo nimûne:

(69) *Dîlanê şerm kir*

Eger em li gor analîza Haigî li (69)an biniherin, *şerm* wek argumentekê hewcedarîya berkarî ya lêkera *kirinê* bi cih tîne. Ji ber ku *kirin* lêkerekê têper e û hewcedarîya wê bi berkarekê heye û ji ber ku ev hewcedarî ji alîyê *şermê* ve tê dabînkirin, (69) rêzimanî ye.

PKyên bi tamamkera daçekî wek argumenta îlawe frêzeka daçekî werdigirin. *Mêze kirin*, *hez kirin* hin ji nimûneyên vê komê ne (Haig, 2002, r. 29). Di nimûneya jêrîn da *PK* wek argument, *FDya ji pirtûkanê* werdigire, lê ev *FD* ji ber ku berkareka nerasterast e, hewcedarîya berkara rasterast a lêkera *kirinê*, *hez* bi cih tîne lewma jî avahîya (70)yî rêzimanî ye.

(70) *Dîlan [FD ji pirtûkan] hez dike*

PKyên bi tamamkera xwedîtîyê, ew jî argumentekê dixwazin, lê argumenta wan bi *morfema girêdanê* (linking morpheme) (-a û -î) wek xwedîyê/a Nyê pêk tê. Bi vî awayî argumenta îlawe dikeve navbera *N* û *LSyê*. Hin nimûneyên van *PKyan alîkarî kirin*, *gazî kirin* in (bnr. Haig, 2002, rr. 30-32). Ji bo koma sêyem em dikarin nimûneya jêrîn nîşan bidin. Di nimûneyê da tamamkera *PKyê*, *FDIya hevala xweyê* ye û ew bi -ayê bi *Nya PKyê* ve hatîye girêdan.

(71) *Dîlanê bêrî-ya hevala xwe kir*

Ji bo *PKyên* vê komê Haig (2002, r. 30) diyar dike ku di tebatîkirinê da, ne bi tenê *N*, li gel wê xwedîya wê jî cih diguhere bo pozîsyona bikerî ku ev jî nîşan dide ew her du pêkhênêkê pêk tînin (bo nimûne *qal-a me nehatîye kirin*). Lewma jî ev avahî

weha ye: *[alîkarî-ya-X]_{FN} kirin*. Bi vî awayî Haig diyar dike ku li vê derê *Xa* argumenta îlawe, xwedî statuyeka sîntaktîk e ku ew ji vî alîyî ve ji temamkera daçekî ya *PKyan* (wekî ya di nimûneya (70)yî da) gelek cuda ye.

Wek encam Haig (2002, r. 34) *PKyên N+LSyî* yên di kurmancî da li gor taybetmendiyên jêrîn weha dabeş dike:

<i>PKyên Beşdarbûyî</i>	<i>PKyên Ne-beşdarbûyî</i>
<i>N</i> ji alîyê sîntaktîk ve ne çalak e. Lêzêdekirina berkara rasterast pêkan e.	<i>N</i> şûna berkara rasterast dadigire. Lêzêdekirina berkara rasterast ne pêkan e.
<i>PK</i> ji alîyê sîntaktîk ve têper e.	<i>PK</i> ji alîyê sîntaktîk ve têneper e.
<i>N û L/S</i> ji alîyê morfolojîk ve ne beşdarbûyî ne	

Xebata din a ku *PKyên* kurmancî disenifîne, ya Gündoğduyê (2015) ye. Gündoğdu di vê xebatê da *PKyên N+LSyî* di bin du komên sereke da disenifîne: *PKyên têper û PKyên ne-ergatîv* (unergative). *PKyên* têper beramberî *PKyên* beşdarbûyî, *PKyên* ne-ergatîv jî beramberî *PKyên* ne-beşdarbûyî yên di senifandina Haigî da ne. Gündoğdu (2015, r. 286, 290) diyar dike ku *PKyên* têper ji alîyê hejmarê ve kêmtir in û ji bo van cure *PKyan* wek nimûne *PKyên av dan, bar kirin, girê dan, xwey (xwê) kirinê* nîşan dide. Ew jî wekî Haigî dibêje Nya van *PKyan*, beşdarbûyî ye. Anku ji alîyê sîntaktîk ve ne çalak e. Gündoğdu (2015, r. 295), *PKyên* ku hêmana wan a ne-lêkerî *Nyek nine* jî wek *PKyên* têper û *PKyên* têneper disenifîne. Têperî û têneperîya van *PKyan* li gor *LSyê* diyar dibe. Eger *LS* têper be *PK* jî têper e (wekî *ve-kirin, nexweş kirin, bi rê kirin*), eger *LS* têneper be *PK* jî têneper e (wekî *ve-bûn, nexweş ketin, bi rê ketin*).

Ji bo senifandina *PKyên* ne-ergatîv Gündoğdu (2015, rr. 286-288), li ser şopa Haigî, heman sê komên *PKyên têrbûyî, PKyên bi temamkera daçekî û PKyên bi temamkera xwedîtîyê* diyar dike. Ji bo *PKyên* bi temamkera daçekî nimûneyên *xeber dan, govend girtin, tinaz kirin, hez kirin, bawer kirin*, jî bo *PKyên* bi temamkera *xwedîtîyê* *PKyên* wekî *pesn dan, guh dan, alîkarî kirin, hîn kirin, şîn girtin* hatine nîşandan. Gündoğdu (2015, rr. 289) diyar dike ku ev her sê cure *PKyên* ne-ergatîv jî li

gel ku xwedî berkareka rasterast ninin, lê rêzbûna ergatîv didin destpêkirin (trigger). Ji bo vê rewşê em dikarin nimûneyên jêrîn nîşan bidin:

(72) a. *Dîlan-ê li televîzyonê **temaşe kir***

b. *Dîlan-ê **bêrîya** hevala xwe **kir***

c. *Dîlan-ê **serma girt***

Wekî tê dîtîn Gündoğdu jî *PKyên* kurmancî bi awayekî giştî di çarçoveya nêzîkahîya Haigî da disenifîne. Lê wekî em dê bibînin, Gündoğdu ji Haigî cuda ji bo *PKyan* boçûneka sîntaktîk pêşniyaz dike.

Em dê *PKyan* li gor têperîya/neakûzatîvîya *LSyê* û cureya kategorîk a pêkhêna/ên ne-lêkerî bisenifînin. Ji aliyê *LSyê* ve em dê *PKyan* bikin du kom: *PKyên têper* û *PKyên neakûzatîv*. *PKyên têper* em dê li gor hêmana wan a ne-lêkerî wek *PKyên N(avdêrî)+LSyî*, *PKyên R(engdêrî)+LSyî* (wekî *nexweş kirin*, *sor kirin*), *PKyên D(açekî)+LSyî* (wekî *bi dest xistin*, *jê kirin*), *PKyên P(irtikî)+LSyî* (wekî *ve-kirin*) û *PKyên N(avdêrî)+D(açekî)+LSyî* (wekî *dest pê kirin*, *pê lê kirin*) dabeş bikin. Em dê *PKyên N+LSyî* jî li gor hebûn-tunebûn an jî cureya kategorîya temamkera wan bikin çar kom: *PKyên bi temamkera FDIyî* (wekî *maç kirin*, *derman kirin*), *PKyên bi temamkera xwedîtîyê* (wekî *bêrî kirin*, *qal kirin*, *gudarî kirin*), *PKyên bê temamker* (wekî *sond xwarin*, *şerm kirin*) û *PKyên bi temamkera daçekî* (wekî *hez kirin*, *bawer kirin*). *PKyên bi temamkerên FDIyî* beramberî *PKyên beşdarbûyî*, *PKyên bê temamker beramberî PKyên têrbûyî* yên Haigî ne. *PKyên ne-ergatîv* ên Gündoğduyê di senifandina me da, di bin *PKyên têper* da cih digirin. *PKyên N+LSyî*, ji bilî yê bi temamkerên *FDIyî*, yê mayîn dikevin nav koma *PKyên ne-ergatîv* ên Gündoğduyê. *PKyên neakûzatîv* jî em li gor hêmana ne-lêkerî wek *PKyên R+LSyî* (wekî *nexweş ketin*), *PKyên D+LSyî* (wekî *bi rê ketin*) û *P+LSyî* (wekî *ve-ketin*, *ve-bûn*) dîkin sê kom.

Di warê *PKyên zazakî* da em bi tenê li rastî xebateka serbixwe hatin. Ev gotara newêşandî ya Csirmaz û Ceplovâyê (bêdîrok) li ser *PKyên bi N+kerdeneyî* ('kirin') pêkhatî radiweste û van cure *PKyan* jî aliyê sîntaktîk ve vedikole. Xebat *PKyên N+kerdeneyî* bi awayekî giştî di bin du komên bi navê *avahîyên lêkerên sivik ên têper* (transitive light verb constructions) û *avahîyên lêkerên sivik ên teneper* (intransitive light verbs constructions) vedikole. *Avahîyên lêkerên sivik ên têper* jî li gor rewşa

berkartîya Nya PKyan cuda vedikole. Ên ku Nya wan wek berkar kar dike û yê ku hêmana wan a ne-lêkerî wek berkar kar nake, ku em dê li jêr li ser rawestin. Di xebatê da PKyên ku forma wan a tebatî pêk nayê (wekî *fîrar kerdene* ('fîrar kirin')) wek PKyên teneper hatine senifandin. Di vê xebatê da ji hin alîyan ve senifandina PKyan hebe jî, ew di çarçoveyeka teng da û bi tenê ji bo hin cure PKyan hatiye kirin. Di xebatên din da, PKyên zazakî li gor cureya pêkhêna ne-lêkerî ya PKyê yan jî li gor wateyê hatine senifandin û bi piranî di bin navê lêkerên lêkdayî û lêkerên dariştî da hatine danasîn. Toddî (2008, r. 83) PKyên *P+LSyî* yê zazakî di bin navê *lêkerên kompleks* (complex verbs) da (wekî *ro-nîştîş* ('rûniştin'))⁴², *a-nîştîş* ('veniştin')) bi cih kirine. Dîsa Toddî (2008, r. 84) PKyên *N+LSyî* (wekî *yazî kerdîş* ('nivîsandin')), yê *R+LSyî* (wekî *pak kerdîş* ('pak/paqij kirin')) di bin navê *lêkerên lêkdayî* (compound verbs) da senifandine. Di GXVê (2005, rr. 96-98) da PKyên *P+LSyî* (wekî *ra-kerdene* ('raxistin')), yê *N+LSyî* (wekî *aw dayene* ('av dan')) û yê *R+LSyî* (wekî *berz kerdene* ('bilind/berz kirin')) cih digirin ku ev PK di bin navê *lêkerên lêkdayî* (zz. *karo pêbeste*) da hatine bicihkirin. Gündüzî (2013, rr. 180-182), PKyên *P+LS*, *N+LS*, *R+LSyî* bi navê *lêkerên lêkdayî* (tr. *bileşik fiiller*) bi nav kirine. Wî (Gündüz, 2013, r. 183) PKyên *N+D+LSyî* (wekî *dest pêkerdene* ('dest pê kirin'), *dest cira antene* ('dest jê kişandin')) jî wek *lêkerên biwêjî* (tr. *deyim fiiller*) bi nav kirine. Verojî (2014, rr. 209-210), PK di bin navê *lêkerên lêkdayî* (zz. *karê pêrabesteyî*) da senifandine. Demîrê (2015, rr. 24-26, 38, 40) PKyên *N+LSyî* di bin navê *navdêr+lêker* (zz. *name+kar*), PKyên *R+LSyî* di bin navê *rengdêr+lêker* (zz. *sifet+kar*), hin PK wek lêkerên lêkdayî yê *biwêjî* (zz. *idyomin*) senifandine (wekî *dest pêkerdene*, *fek verdayene* ('dev (jê) berdan')), hin PK jî wek *lêkerên lêkdayî* yê ku ji *eksê pêk tên* (zz. *karanê pêrabesteyî ke akîs ra virazîyenî*) (wekî *çilk kerdene* ('çilkîn'), *pif kerdene* ('pif kirin') *vir vir kerdene* ('vir vir kirin')). Kırkanî (2021c, rr. 35-39, 42-44) hin PKyên ku em wek PKyên *P+LSyî* (wekî *a-kerdene* ('vekirin')), wek *D+LSyî* (wekî *ci ra kerdene* ('jê kirin'), *pi ro kerdene* ('lê kirin/rijandin')) disenifandin, wek lêkerên *dariştî* (zz. *viraştayî*) senifandine. Kırkanî PKyên *N+LSyî* û yê *R+LSyî* bi navê *lêkerên lêkdayî* (zz. *pêrabesteyî*) senifandine. Ji

⁴² Di zazakî da gireya *-işê* navê lêkerê diyar dike, gireya *-eneyê* jî gireya raderê ye. Bo nimûne *werd-iş* (krm. *xwar-in*) (navê lêkerê) û *werd-ene* (krm. *xwar-in*) (forma raderê). Wekî xuya dike di kurmancî da her du form bi heman gireya *-inê* tên çêkirin. Di GXVê (2016, rr. 11-12) da ev her du gireyên *-iş* û *-eneyê* wek gireyên raderê hatine senifandin, lê ji bo ku navê lêkerê û forma raderê jî hevûdin bîn veqetandin, *-iş* ji bo navê lêkerê, *-ene* ji bo raderê hatiye bikaranîn.

bo *navdêr+lêkerê* nimûneyên wekî *adir cikewtene* ('agir pê ketin'), *bermî dayene* ('giri kirin')), ji bo *rengdêr+lêkerê* nimûneyên wekî *çewt kerdene* ('xwar kirin'), *teng kerdene* ('teng kirin')) hatine nîşandan.

Senifandina ku me ji bo kurmancî bi kar anî em dê ji bo zazakî jî bi kar bînin. Li gor vê senifandinê, hin nimûneyên ji bo PKyên têper û neakûzatîv ên zazakî weha ne:

PKyên Têper ên N+LSyî: PKyên bi temamkera *FDIyî*: *maç kerdene* ('maç kirin'), *derman kerdene* ('derman kirin'); PKyên bi temamkera *xwedîtîyê*: *bêrî kerdene* ('bêrî kirin'), *qal kerdene* ('qal kirin'), *goşdarî kerdene* ('guhdarî kirin'); PKyên bê temamker: *sond werdene* ('sond xwarin'), *şerm kerdene* ('şerm kirin'); PKyên bi temamkera *daçekî*: *hes kerdene* ('hez kirin'), *bawer kerdene* ('bawer kirin').

PKyên Têper ên Cureyên Din: PKyên *R+LSyî*: *nêweş kerdene* ('nexweş kirin'), *sûr kerdene* ('sor kirin'); PKyên *D+LSyî*: *ci kerdene* ('jê kirin'); PKyên *P+LSyî*: *a-kerdene* ('vekirin') û PKyên *N+D+LSyî*: *dest pê kerdene* ('dest pê kirin'), *fek ci ra verdayene* ('dev jê berdan').

PKyên neakûzatîv: PKyên *R+LSyî*: *nêweş kewtene* ('nexweş ketin'); PKyên *D+LSyî*: *ci ra mendene* ('jê mayîn'); PKyên *P+LSyî*: *ra-kewtene* ('raketin'), *a-bîyayene* ('vebûn').

Di kurmancî û zazakî da, di hin PKyan da hêmana ne-lêkerî piştî *LSyê* bi cih dibe. Bo nimûne PKyên wekî *anîn cih* (zz. *ardene ca*), *kirin cot* (zz. *kerdene cit*), *çûn ava* (zz. *şîyayene awa*) hene ku em van cure PKyan jî dîsa li gor têperî û nekûzatîvîya *LSyê* û hêmana ne-lêkerî, di senifanfina jorîn da bi cih dikin. Bo nimûne *anîn cih* di nav PKyên têper ên *N+LSyî* da, *kirin cot* di nav PKyên têper ên di *R+LSyî* da, *çûn ava* jî di nav PKyên neakûzatîv ên *R+LSyî* da cih digire. Pozîsyona hêmana ne-lêkerî ji aliyê senifandinê ve cudahîyan dernaxe. Lewra çî li aliyê çepê çî li ya rastê bin, hêmanên ne-lêkerî li heman pozîsyona sîntaktîk bi cih dibin. Jixwe di bergindên hin ji van PKyan da, hêmana ne-lêkerî berîya *LSyê* jî cih digire. Bo nimûne *anîn cih*, wek *bi cih anîn* jî tê bikaranîn. Cudahî di cureya hêmana ne-lêkerî da derdikeve. Di ya yekem da *FDIyî* (*cih*), di ya duyem da *FDyî* (*bi cih*) e (*anîn cih* wek *anîn bi cih* jî tê bikaranîn). Helbet em nikarin bêjin ev ji bo hemû PKyên bi vî rengî derbasdar e.

3.2.4.1.1.2. Taybetmendîyên Sereke yê Pêveberên Kompleks

Di kurmancî û zazakî da di hin cure *PKyên N+LSyî* da *N* wek berkar kar bike jî ew berkareka rasteqîn nine. Ji bo dîtina vê em dikarin li forma navdêrî ya *FLyan* binihêrin. Bo nimûne wekî Haig (2002, rr. 32-33) jî nîşan dide di kurmancî da dema *FL* tê navdêrîkirin, berkara rasterast a lêkerekê têper wek *xwedî* (possessor) tê îfadekirin. Di *FLya* (73a)yê da *pirtûk* berkara rasterast a lêkera *xwendinê* ye, ji ber ku *pirtûk* berkara rasterast a rasteqîn e, di (73b)yê da forma navdêrî ya vê *FLyê* pêk tê.

(73) a. *pirtûk xwend-Ø*

b. *xwendin-a pirtûkê*

Dîsa li heman derê Haig diyar dike ku *N* û *LSya PKyan* nikarin *avahiya xwedîtîyê* (possessive construction) çêkin. Ev rewş di zazakî da jî bi heman rengî ye.

(74) a. *avdan/*dayina avê / zz. awedayene/*dayena awe*

b. *dermankirin/*kirina dermanî / zz. derman kerdene/*kerdena dermanî*

Ev ji ber çi pêk tê? Mohammad û Karimi (1992, r. 202) diyar dikin ku bi tenê *FDIyên* ku li gel lêkerê *xwedî* têkilîyeka tematîk in dikarin di avahiya îzafeyî da cih bigirin ku ev avahî ji sereyeka navdêr û argumentên wê yê tematîk pêk tê (li vê derê avahiya îzafeyî beramberî avahiya *xwedîtîyê* ya Haigî ye). Ji ber vê, sedema nerêzimanîya **xwarina sondê*, **dana avê*, **kirina dermanîyê* ew e ku di navbera hêmanên navdêrî û lêkerî da tekiliyeka tematîk tune ye⁴³. Lê ev nerêzimanî çima û

⁴³ Me gotibû berevajî angaştê hin vekolîneran, di kurmancî (û zazakî da jî) cureyeka îzafeyî ya bi navê îzafeya anaforîk tune ye. Ji bo vê em dikarin jî *ROLê* jî delîlekê nîşan bidin. Em li nimûneya jêrîn binihêrin:

Hatin-a te baş bû, ya wî ne baş bû

Li gor angaştê yê ku dibêjin di kurmancî da îzafeyeka bi cureya anaforîk heye, di nimûneya jorîn da îzafeya (*y*)ayê ya di frêza ya *wîyê* da, amaje bi navdêra *hatinê* dike. Lêkernav ji ber ku lêkerên navdêrî ne, *ROLan* li temamkerên xwe bar dikin. *Hatin* lêkernaveka yek *ROLî* ye, lewma jî yek *ROLê* bar dike. Ev *ROL* di risteya yekem (*Hatin-a te baş bû*) da li *teyê* hatiye barkirin. Ji ber vê, *ROLa* ku di risteya duyem (*ya wî ne baş bû*) da li *wîyî* bê barkirin namîne, lê divê *wî* jî bê *ROL* nemîne. Ji bo vê, li pêş îzafeyê lêkernavek divê hebe ku bikaribe *ROLê* li *wîyî* bar bike. Ji bo vê risteyê ev, lêkernava *hatinê* ye lê ev lêkernava *hatinê* ne ya yekem e, ji wê cuda ye. Bi gotineka din li vir du heb *hatin* hene û ew jî vî alîyî ve ji avahîyên wekî *hatina te û wî baş bûyê* cuda ye, lewra di vê nimûneyê da bi tenê yek karê "hatin"ê heye ku *te û wî* li gel hev hatine. Lê li k-binyada nimûneya jorîn du heb *hatin* cih digirin ku forma temam a risteyê weha ye:

Hatin_i-a te baş bû, hatin_i-a wî ne baş bû

Di vê risteyê da, ji ber ku her du *hatin* hevîndeks in, ya duyem tê jêbirin û riste bi awayê *Hatin-a te baş bû, ya wî ne baş bûyê* pêk tê. Lê ev nayê wê wateyê ku (*y*)a amaje bi *hatina* yekem dike. Eger

çawa pêk tê? Bi ya me sedema wê ew e ku ROL li Nya PKyan nayê barkirin. Ji ber vê jî di navbera *N* û *LSyê* da têkilîyeka tematîk pêk nayê. Sedemên wernegirtina ROLê ya *Nyê* em dê piştî rave bikin.

Taybetmendîyeka din a PKyên kurmancî û zazakî wekî Haig (2002, r. 33) jî nîşan dide, *forma partîsîp* (participle formation) a PKyan e. Di kurmancî da bi reha dema borî ya lêkerê û paşgira (suffix) *-îyê* partîsîp tê çekirin (wekî *man* → *mayî*). Heman tişt ji bo PKyan jî derbasdar e. Di zazakî da jî forma partîsîpê bi paşgirên *-êyê* (mêza) û *-eyê* (nêza/pirjimar) pêk tê.

(75) *Birîna dermankir-î / zz. dirbeta dermakerd-ê*

Hin taybetmendîyên PKyên kurmancî û yên zazakî dişibin ên lêkerên sade. Bo nimûne hin ji wan nayên parçekirin; di hin rewşan da nabe ku hêmanên din têkevin navbera hêmana ne-lêkerî û *LSyê*. Nerêzimanîya di (76b)yê da ji ber wê ye ku hokera *bilezê* (zz. *leze*) ketiye navbera *N* û *LSya* PKya *derman kirinê* û ew parçe kiriye. Di (77b)yê da jî hêmana ku dibe sedema nerêzimanîyê, pozîsyona *FDIya destê xweyê* (zz. *destê xo*) ye ku ketiye navbera *N* û *LSyê*.

(76) a. *Dîlanê destê xwe bilez derman kir / zz. Dîlan destê xo leze derman kerd*

b. **Dîlanê destê xwe derman bilez kir / zz. *Dîlan destê xo derman leze kerd*

(77) a. *Dîlanê destê xwe derman kir / zz. Dîlan destê xo derman kerd*

b. **Dîlanê derman destê xwe kir / zz. *Dîlan derman destê xo kerd*

Her çiqas taybetmendîyên jorîn nîşan bidin *PK* li gel lêkerên sade xwedî hin taybetmendîyên hevpar in jî, bo nimûne ji bo kurmancî hatiye çavdêrîkirin (bnr. Haig, 2002, rr. 32-33) ku ji alîyê hin taybetmendîyên din ve, PKyên kurmancî wek lêkerên sade tevnagerin; di kurmancî da gireya neyînîyê di lêkerên sade da tê pêşîya lêkerê, lê di PKyan da heman gire, ne li serê PKyê, li serê *LSyê* bi cih dibe. Heman tişt ji bo gelek cure PKyên zazakî jî derbasdar e.

(78) a. **Dîlanê destê xwe ne-derman kir / zz. *Dîlan destê xo nê-derman kerd*

lêkernava duyem ji ya yekem cuda be (bo nimûne *hatin-a te baş bû*, *çûn-a wî ne baş bû*) wê demê jêbirin pêkan nîne.

b. *Dîlanê destê xwe **derman** ne-kir / zz. Dîlan destê xo **derman** nê-kerd*

Ji alîyê din ve wekî Ebûzeîd (2019, rr. 98-99) jî diyar dike di PKyên kurmancî yê *P+LSyî* (ew van PKyan wek *karên* (lêker) *darijtî* disenifîne) da jî gireya neyînîyê dikeve navbera *P* û *LSyê*. Bo nimûne *rû-nişt* → *rû-ne-nişt*. Di PKyên *P+LSyî* yê zazakî da, cuda ji kurmancî, wekî Todd (2008, r. 83) jî diyar dike gireya neyînîyê nakeve navbera pêkhênên PKyê (di xebata wî da ev cure PK wek "lêkerên kompleks" hatine binavkirin). Bo nimûne *ro-nişt* → *nê-ro-nişt* (krm. *rû-ne-nişt*)⁴⁴.

Dîsa xuyang, di PKyên kurmancî da, ne li serê PKyê, wekî gireya neyînîyê li serê *LSyê* cih digire. Di (79a)yê da sedema nerêzimanîyê ew e ku *di*-ya gireya xuyangê li serê PKyê cih digire. Di zazakî da xuyang di rehê lêkerê da xuya dike. Di *ke-n-ayê* (krm. *di-k-im/e*) da xuyangê *-n* nîşan dide.

(79) a. **Dîlan destê xwe **di**-derman k-e*

b. *Dîlan destê xwe **derman** di-k-e / zz. Dîlan destê xo **derman** ke-n-a*

Ji alîyê din ve Gündoğdu (2015, rr. 289-290) diyar dike ku ji ber ku Nyên PKyên kurmancî xwedî taybetmendiyên berkara rasterast ên rasteqîn nînin, ew ne di rewşa AKÛZATÎVê da ne, cihê wan nikare bi awayekî azad bê guhertin (scramble) û berevajî berkarên rasterast di forma tebatî da ev Nyên PKyan nabin biker. Ji bo van her sê rewşan em dikarin li nimûneyên jêrîn binihêrin. Di nimûneya (80a)yê da sedema nerêzimanîyê ya nimûneya nerêzimanî ew e ku Nya PKya *serma girtinê*, xwedî rewşa AKÛZATÎV e, di (80b)yê da *N* ji *LSyâ* xwe hatiye veqetandin û di (80c)yê da jî sedem ew e ku *temaşeya* ku Nya PKyê ye, wekî berkarên rasterast ên rasteqîn di forma tebatî da li pozîsyona bikerê hatiye bicihkirin.

(80) a. *Dîlan zû **serma** digire / *Dîlan zû **serma**-yê digire*

b. *Dîlan li televîzyonê **temaşê** dike/* Dîlan **temaşê** li televîzyonê **dike***

c. *hat **temaşekirin**/***temaşê** hat **kirin***

Heman tişt ji bo zazakî jî derbasdar e. Nimûneyên jêrîn bi rêzê bergindên nimûneyên kurmancî yê di (80)yê da ne.

⁴⁴ Di hin devokên kumancî da jî (bo nimûne devoka Torê) gireya neyînîyê ji bo van cure PKyan li serî cih digire. Bo nimûne *rû-nişt* → ***ne**-rû-nişt*. Lê ji ber ku em xebata xwe bi kurmancîya standard bisînor dikin, binyadên bi vî rengî em li derveyî nîqaşê digirin.

(81) a. *Dîlane rew serd gêna* / **Dîlane rew serd-î gêna*

b. *Dîlane televizyonî temaşe kena* / **Dîlane temaşe televizyonî kena*

c. *ame temaşekerdene* / **temaşe ame kerdene*

Li vir em divê diyar bikin ku cihneguherbarîya Nya PKyan her carê ne ew qas hişk e. Bo nimûne avahîyên wekî *Ew çi sond bû te xwar!* / zz. *O çi sond bî to werd!* ew qas beloq nexuyane.

3.2.4.2. Çarçoveya Teorîk


Di vê binbeşê da em dê li hin xebatên ku PKyên zimanên cuda ji aliyê ROLê ve analîz kirine û hin xebatên ku li ser PKyên kurmancî yan jî yên zazakî hatine çekirin, binihêrin. Em dê lê binihêrin ka em dikarin model û analîzên ku di van xebatan da hatine pêşkêşkirin, di xebata xwe da wek modela bingeîn bi kar binin an na. Ji bo vê jî pîverên me dê ew bin ku gelo model û analîzên ku hatine pêşkêşkirin dikarin ji aliyê birêvebirin, ROL, REWŞ û prensîpên din ên BGYê ve her cure PKya kurmancî û ya zazakî rave bikin an na. Wekî heta niha me dît, kurmancî û zazakî ji aliyê binyadî ve bi rêjeyeka gelek zêde wekî hev e. Ji ber vê, ji bo ku mijar dirêj nebe, di vê nîqaşa teorîk da, heta hewcedarî bi nimûneyên zazakî û raveyên ji bo zazakî nebe em dê nîqaşê bi piranî di ser kurmancî ra bişopînin. Lewra encamên ku ji bo kurmancî derkevin dê ji bo zazakî jî derbasdar bin.

Pêşî em dê li ser du boçûnên ku PKyan di çarçoveya ROLan da analîz dikin rawestin. Yek ji wan, boçûna *beşdarbûnê* (incorporation) ya Bakerî (1988) û ya din jî *Hîpoteza Transfêra Argumentan* (Argument Transfer Hypothesis) a Grimshaw û Mesterî (1988) ye. Piştî em dê li xebatên Haig (2002), Csirmaz û Ceplová (bêdîrok) û Gündoğdu (2015; 2018) binihêrin ku xebatên Haig û Gündoğduyê li ser PKyên kurmancî, xebata Csirmaz û Ceplováyê jî li ser PKyên zazakî hatiye amadekirin.


Wekî berê jî hatibû qalkirin, Baker (1988) prosesa çêbûna PKyan li asta sîntaktîk bi prosesa *beşdarbûnê* ve rave dike. Baker (1988, r. 229) diyar dike ku *beşdarbûn* cihguherîneka sîntaktîk e û di vê cihguherînê da kategorîyeka X^0 ê cih diguhere, bi sereya xwe ya X^0 ê ve dizeliqe, tev li wê dibe. Bi gotîneka din hêmana ku cih diguhere, bi lêkera rêvebir ve dizeliqe. Ji bo zelalkirina boçûna Bakerî em dikarin li nimûneyên ji zimanê *onondagayî* (yek ji zimanên çermsorên Amerîkayê) binihêrin ku ji Bakerî hatine wergirtin:

- (82) a. *Pet wa?-ha-htu-?t-a* *ne? o-hwist-a?*
 Pet BORÎ-K3.Y. NZ/K3.NT-**winda kir**-SDM-XYNG DIY PÊŞG-**pere**-PAŞG
 ‘Petî pere **winda kirin**’
- b. *Pet wa?-ha-hwist-ahtu-?t-a*
 Pet BORÎ-K3.Y.NZ-**pere-winda kir**-SDM-XYNG
 ‘Petî pere **winda kir**’


Ji bo nimûneyên jorîn Baker (1988, rr. 76-77) diyar dike ku her du xwedî heman ROLan in. Di (82a)yê da *hwist* ('pere') ji lêkerê cuda ye, lê di (82b)yê da li gel lêkerê xuya dike. Li gel vê, di her du risteyan da jî ew xwedî heman ROLê ye ku vê ROLê ji lêkerê werdigire. Lewma jî di (82b)yê da *hwist* wek berkara lêkerê kar dike (Li vir em divê bala xwe bidinê ku di boçûna Bakerî da lêkera *PKyê*, xwedî naverokaka semantîk e, lewra ROLê li hêmana navdêrî ya *PKyê* bar dike). Ji ber ku binyada ROLî ya her du risteyan wek hev hatiye qebûlkirin, Baker (1988, r. 80) k-binyada wan jî bi awayê jêrîn nîşan dide.



Di (82b)yê da *pere-winda kir-* bi cihguherînê pêk tê. Baker (1988, r. 80) nîşan dide ku ev avahî, bi cihguherîna hêmana navdêrî ve pêk tê: Hêmana navdêrî cih diguhere bi jor, bi hêmana lêkerî ve dizeliqe û her du wek yek hêman kar dikin. Vê cihguherînê Baker bi awayê jêrîn nîşan dide:



Cihguherîna ku bi nimûneya Bakerî hat nîşandan wek *beşdarbûna navdêrê* (noun incorporation) tê binavkirin. Baker (1988, rr. 77-78) dibêje beşdarbûna navdêrê, hêmaneka navendî ya wan gelek zimanan e ku wek *polisîntetîk* (polysynthetic) tên binavkirin. Prosesa beşdarbûna navdêrê ya Bakerî dibe ku ji bo hin *PKyên* kurmancî yê *N+LSyî* ji aliyê sintaktîk ve raveker be, lê ji aliyê ROLê ve nabe. Bo nimûne em li *PKya sond xwarinê* binihêrin. Li jêr (85a) k-binyad, (85b) jî r-binyada risteya *Dîlanê sond xwarê* nîşan dide.



ROL li k-binyadê tên barkirin. Di (85a)yê da *sond* wek *FN/FDIyek* li pozîsyona temamkerî ya lêkera *xwarinê* bi cih bûye û li vê derê li gor boçûna Bakerî *xwarin*, ROLê li *FNya sondê* bar dike. Li r-binyadê *sond* wek *N* cih diguhere bo pozîsyona xwişkî ya *xwarinê*. Anku hêmana ku cih diguhere, ne *FN* ye, *Nya* sereya vê *FNyê* ye.

Ji ber ku *sond* li vê pozîsyona nû, ne frêzî ye lewma nikare rewşa rêzimanî werbigire⁴⁵. Ev jî dikare rave bike çima di demên ne-borî da, di risteya *Dîlan sond dixweyê* da *sond*, li gel ku li gor boçûna Bakerî temamkera *xwarinê* ye, lê rewşa rêzimanî wernagire û bi awayê **Dîlan sond-ê dixweyê* pêk nayê ku nerêzimanî ye.


(85), di heman demê da angaşt dike ku *xwarin* ROLa bikerê (*Dîlan*) jî bar dike. Ev jî tê wê wateyê ku *xwarina* di *PKya sond xwarinê* da û berginda wê ya giran a di *Dîlanê şîv xwarê* xwedî heman ROLan in. Ev jî rê li ber wê vedike ku em bêjin wateya *xwarina* sivik û ya giran heman e. Dema weha be, ji bo *PKya sond xwarinê* em divê bêjin, bi rastî jî *sond* wekî *şîvê* hatiye *xwarin*. Lê di kurmancî da *sond* bi vî awayî nayê fêmkirin an jî şirovekirin. Eger wesa bihata şirovekirin bo nimûne ji bo risteya *Dîlanê sond xwarê* pirs *Dîlanê çi xwar?*ê divê qebûlbar bûya, lê ev pirs ne ji bo vê risteyê, dibe ku ji bo risteyeka wekî *Dîlanê şîv xwarê* bê kirin. Dîsa Mohanan (1994, rr. 227-228) ji bo hindî dibêje di risteyên *belê/nayê* (yes/no) da, ji xeynî pêveberê mimkin e her tişt bê xistin, lê nabe ku Nyên *PKyan* di van risteyan da bîn xistin. Heman tişt ji bo kurmancî jî derbasdar e, bo nimûne ji bo risteya *Dîlanê şîv xwar?*ê bersiv dibe ku *belê*, *xwar* be, lê ji bo risteya *Dîlanê sond xwar?*ê bersiv nabe ku *belê*, *xwar* be. Nexwe têkilîya di navbera *şîv-xwarinê* da divê ji têkilîya di nav *sond-xwarinê* da cuda be ku ev, ji ber cudahiya têkilîya tematîk (anku ya ROLî) pêk tê: *Şîv* ji *xwarinê* ROLê distîne, lê *sond* nastîne. Ji ber van cure sedeman beşdarbûna Bakerî di hin rewşan da ji bo *PKyên* wekî *sond xwarin*, *xwê dan*, *şerm kirinê* ji aliyê sîntaktîk ve raveker be jî ji aliyê ROLê, anku ji aliyê wateyî ve, raveker nine.

Em bikaribin hin cure *PKyên* kurmancî ji aliyê sîntaktîk ve rave bikin jî hinekên din bi boçûna Bakerî ve nayên ravekirin. Bo nimûne em li *PKya bêrî kirinê* ya bi temamkera xwedîtîyê binihêrin.

(86) *Dîlanê bêrî-ya hevala xwe kir*

Li gor boçûna Bakerî em divê bêjin *bêrî* li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona xwişkî ya lêkerê. Ev rewş li jêr hatiye nîşandan:

⁴⁵ Lewra wekî em dê bibînin, bi tenê pêkhênên risteyê yên frêzî dikarin rewşê werbigirin.



Li gor dardîagramên (87)an piştî cihguherînê binyada **Dîlanê (y)a hevala xwe bêrî kir* pêk tê ku ev binyad di kurmancî da nerêzimanî ye. Li vir yek dikare bêje di binyada (87a)yê da cihguherîn ne hewce ye, lewra *bêrîya hevala xwe* wek temamkara *kirinê* kar dike, lewma jî boçûna Bakerî ji bo van cure PKyan raveker e. Lê eger cihguherîn pêk neyê em nikarin bêjin *bêrî kirin* PKyek e, lewra tiştê ku dike ku ew wek PK bê şirovekirin cihguherîna wê ye. Heke na, bo nimûne cudahîya *bêrîyê* dê ji kara di risteya *Dîlanê kar-ê hevala xwe kirê* yan jî cudahîya *pesnê* ya di risteya *Dîlanê pesn-a wî dayê* da, dê ji *pirtûka* di risteya *Dîlanê pirtûk-a wî dayê* tune be, lê bi awayekî zelal têkarî û bandora Nyên nimûneyên yekem ji yên duyem cuda ne.

Ne bi tenê ji bo PKyên jorîn, wekî Haig (2002) û Gündoğdu (2015) nîşan didin, ji bo hin cureyên din ên PKyan jî boçûna Bakerî raveker nine. Bo nimûne Haig (2002, r. 25) ji bo kurmancî wek pîver diyar dike ku her riste bi tenê dikare yek berkara rasterast werbigire. Lewma eger em di PKyan da Nya wan wek berkar qebûl bikin divê di risteyê da berkareka din tune be, lê di risteyên wekî *Dîlanê destê xwe derman kirê* da bi awayekî zelal ji bilî Nyê (*derman*) berkareka din (*destê xwe*) heye. Haig di xebata xwe da PKyan ji aliyê ROLê ve analîz nake, lê ji aliyê ROLê ve jî analîza Bakerî ji bo van cure PKyan raveker nine. Dema em *dermanê* jî wek berkar qebûl bikin, lêkera *kirinê* divê sê ROLan bar bike: du heban li berkaran (*destê xwe* û *derman*) ya din li bikerê (*Dîlan*). Wekî me berê dîtibû lêkera giran a *kirinê* du heb ROLan bar dike. Gündoğdu jî ji ber çend sedeman beşdarbûna Bakerî raveker nabîne. Yek ji van

sedeman li gor Gündoğduyê (2015, r. 297) ew e ku Baker dibêje hemû nimûneyên beşdarbûyî xwedî bergindeka nebeşdarbûyî ne (bo nimûne wekî me li jor dît berginda *pere-winda kir* a beşdarbûyî, berginda nebeşdarbûyî ya *winda kir pereyan bû*), lê di kurmancî da rewş ne wesa ye. Gündoğdu ji bo vê rewşê wek nimûne *PKya N+LSyî* ya *av danê* nîşan dide û diyar dike ku berginda wê ya nebeşdarbûyî ya **avê danê* nerêzimanî ye. Ev nakokîya ku Gündoğdu nîşan dike, di çarçoveya xebata me da, dîsa ji ber têkilîya ROL û temamkerê pêk tê. Anku eger wekî di boçûna Bakerî da tê gotin, lêker ROLê li hêmana navdêrî bar bike, bivê nevê di kurmancî da avahîyên wekî **avê da-*, **maçê kir-*, **sonde xwar-ê* jî divê hebin, lê ji ber ku li Nyê ROL nayê barkirin, ev avahî jî pêk nayên.

Niha jî em vegerin xebata Grimshaw û Mesterî (1988). Ew di xebata xwe da, ku li ser *suruya* ('kirin') *LSya* japonî çêkirine, dibêjin di vî zimanî da bandora *suruyê* li ser diyarkirina hejmar û cureyên argumentên risteyê tune ye. Li gor boçûna Grimshaw û Mesterî (1988, rr. 205, 211) *suru FDIya* berkara rasterast binkategorîze dike û rewşa rêzimanî li wê bar dike, lê nikare ROLê li wê bar bike. Her çiqas ev *FDI* berkara wê ya rasterast be û *suru* rewşê li vê *FDIyê* bar bike jî ew ne argumenteka *suruyê* ye. Lêbarkirina ROLan a di kompleksên bi *suruyê* çêkirî da, bi proseseka bi navê *Transfêra Argumentan* (Argument Transfer) pêk tê. Li gor vê, navdêrîya ROL-barker (anku *FDIya* berkara rasterast a *suruyê*) çend heb an jî hemû argumentên xwe transferî *LSya suruyê* dike. Di encamê da hem *suru* hem jî sereya *FDIya* berkarî dikarin di qada xwe ya lêbarkirina ROLan da wek ROL-barker kar bikin. Hejmar û cureya argumentên navdêrên ku bi *suruyê* xuya dikin, dibe ku guharber be. Navdêr argumentên xwe bi deyn dide *suruyê*, *suru* dibe ROL-barker û navdêr bixwe ji aliyê lêbarkirina ROLan ve lawaz dibe. Lewma li gor vê boçûnê, *transfer*, ne têkilkirina du pêveberan û binyada argumentî ya wan e di yekeyekê da. Di van binyadên zimanî da peywira *suruyê*, hilgirtina kêşa lêkerî ya risteyê û lêbarkirina rewşê ye û dike ku navdêra ku berkara wê ya rasterast e di konteksta lêkerî da ROLan bar bike. Bi vî rengî dema *FDIyek* bi *suruyê* di *PKyekê* da cih digire, sereya vê *FDIyê* ji aliyê fonksîyonê ve wek lêker kar dike.

Wekî diyar dibe di boçûna Grimshaw û Mesterî da jêdera ROLan *Nya PKyê* ye. Em dikarin *PKya derman kirinê* li gor vê boçûnê bi nimûneya jêrîn analîz bikin:

(88) *Dîlanê destê xwe derman kir*

Di nimûneya jorîn a (88)an da *Dîlan* û *destê xwe* argumentên *dermanê* ne, ew van argumentan û ROLên xwe transferî lekera sivik a *kirinê* dike, lêkera *kirinê* bi saya vê transferê êdî dikare ROLan li van argumentan bar bike. Lê li vir cudahîya di navbera *PKyên* japonî û yên kurmancî da ew e ku lêkera sivik a japonî, rewşê li hêmana navdêrî ya *PKyê* bar dike, di kurmancî da ev pêk nayê. Di japonî da ev rewş bi awayekî morfolojîk xuya dike, lê di hêmana navdêrî ya *PKyên* kurmancî da, li ser hêmana navdêrê nîşaneka morfolojîk a aşkere tune ye. Di nimûneya jêrîn a Grimshaw û Mesterî (1988, r. 207) da morfema *-oyê* ya li ser *hanashiyê* ('xeber/axivtin'), ku wek hêmana navdêrî ya *PKyê* kar dike, nîşan dide ku rewşa AKÛZATÎV li wê hatîye barkirin (Di (89)an da, *shita* forma dema borî ya lêkera *suruyê* ye).

(89) *John-wa Mary-ni hanashi-o shita* 'Johnî bi Maryê ra xeber da'

Transfera Argumentan, Nya *PKyan* vedikole, lê di kurmancî da hêmanên ne-lêkerî, wekî berê jî hatibû dîtîn, dibin ku wek kategorîyên din jî pêk bên (wekî rengdêrî, daçekî û yd.) Eger em boçûna Grimshaw û Mesterî berfireh bikin û bêjin ROL ji aliyê hêmana ne-lêkerî ya *PKyan* ve tê diyarkirin, wê demê guherîna *LSyê* divê li ser binyada argumentî û têkildar bi vê, li ser binyada ROLê guherînekê pêk neyîne. Lê di kurmancî da dema lêkera sivik diguhere di hin *PKyan* da binyada argumentî ya *PKyan* jî diguhere.

(90) a. *Ez nexweş ketim*

b. *Te ez nexweş kirim*

Di (90a)yê da *PK nexweş ketin* e, di (90b)yê da *nexweş kirin* e. Hêmana ne-lêkerî ya her du *PKyan* jî *nexweş* e. Eger di her duyan da jî bi tenê *nexweş* hejmar û ROLa argumentan diyar dike, nexwe çima di (90a)yê da bi tenê biker (*ez*) wek argument û di (90b)yê da du heb argument (*te* û *ez*) hene? Em nikarin vê rewşê bi boçûna Transfera Argumentan ve rave bikin. Kêşeyên bi vî rengî nahêlin em boçûna Transfera Argumentan di xebata xwe da wek modela bingeîn bi kar bînin.

Niha jî em dê li xebatên Haig (2002), Gündoğduyê (2015; 2018) û Csirmaz û Ceplová (bêdîrok) binihêrin ku xebatên Haig û Gündoğduyê li ser *PKyên* kurmancî, xebata Csirmaz û Ceplováyê jî li ser *PKyên* zazakî hatîye amadekirin. Di van xebatan da *PK* ji aliyê sîntaktîk ve hatine analîzkirin.


Wekî me dîtîbû navenda xebata Haigî, *PKyên* kurmancî yê *N+LSyî* pêk tînin û ew di xebata xwe da rewşa sîntaktîk a hêmana navdêrî ya *PKyan* vedikole. Dîsa me dîtîbû Haig *PKyên N+LSyî* dike du komên sereke: *PKyên* beşdarbûyî û *PKyên* ne-beşdarbûyî. Di *PKyê* beşdarbûyî (wekî *derman kirin*, *maç kirin*) da hêmana navdêrî wek berkar kar nake, lewma jî *PK* rê dide berkareka rasterast a îlawe. Di *PKyên* ne-beşdarbûyî (wekî *sond xwarin*, *hez kirin*, *bêrî kirin*) da hêmana navdêrî hewcedarîya berkara rasterast a *LSyê* dabîn dike, lewma jî *FDIyeka* din di van *PKyan* da xuya nake.

Em lê binihêrin gelo em dikarin van analîzên Haigî di xebata xwe da bi cih bikin, anku gelo em dikarin van analîzan ji bo ravekirina binyada *ROLî* (û ji bo *REWŞê*) ya *PKyên* kurmancî (û lewma jî ji bo yê zazakî) bi kar bînin an na.

Eger em bêjin *Nya PKyên* beşdarbûyî pozîsyona berkara rasterast bloke nake û *Nya PKya* ne-beşdarbûyî pozîsyona berkara rasterast bloke dike, ev tê wê wateyê ku *Nya PKyên* beşdarbûyî û *Nya PKyên* ne-beşdarbûyî divê li heman pozîsyonê cih negirin. Berkara rasterast a lêkerekî giran li pozîsyona temamkerî ya lêkerê cih digire. Ji ber vê, eger em *Nya PKyên* beşdarbûyî wek berkar qebûl nekin, em divê wê di dardîagramê da li pozîsyona temamkerî bi cih nekin, em dikarin li pozîsyona xwişkî ya lêkera sivik bi cih bikin. Dîsa eger em *Nya PKyên* ne-beşdarbûyî wek berkar qebûl bikin, nabe ku em wê li heman pozîsyona cureya pêşîn bi cih bikin; eger ev bê kirin, ji aliyê sîstemê ve ew dê wekî hev bîn şirovekirin. Ev jî tê wê wateyê ku *Nya PKyên* ne-beşdarker divê li pozîsyona temamkerî ya *PKyê* bê bicihkirin. Her du rewş li jêr hatine nîşandan.


(91)

- a. *Dîlanê destê xwe derman kir* (beşdarbûyî) b. *Dîlanê sond xwar* (ne-beşdarbûyî)



Tiştê ku di destpêkê da em bêjin ew e ku eger em qebûl bikin hemû *PK* bi heman prosesê pêk tên, em nikarin binyadên frêzî yên (91)ê rast qebûl bikin; lewra di her du cureyan da *Nyên PK*yan li pozîsyonên cuda cih girtine. Ji alîyê din ve, dema em vê kêşeyê li ber çavan negirin û (91)ê rast qebûl bikin, îcar ji alîyê rewşa rêzimanî ve kêşe derdikevin. Di (91a)yê da ji alîyê *LSya kirinê* ve rewş li *FDIya destê xweyê* tê barkirin. Ev jî nîşan dide ku *LS* dikare rewşê bar bike. Eger weha be çima di (91b)yê da *xwarin* nikare rewşê li *sondê* bar bike? Diyar e ku ew nikare rewşê bar bike, lewra eger rewş li *sondê* bê barkirin, wekî me berê jî dîtibû, di demên ne-borî da (91b) divê bi awayê **Dilan sond-ê dixweyê* pêk bê ku ev di kurmancî da nerêzimanî ye. Lê di vê sistêmê da tiştê ku nahêle rewş li *sondê* bê barkirin xuya nake.

Dîsa *PKyên* bi temamkera daçekî (wekî *hez kirin*) jî, ku Haig wan di bin *PKyên* ne-beşdarbûyî da disenifîne, li gor analîza Haigî *Nya* wan, wekî di (91b)yê da, hewcedariya berkara rasterast a *LSyê* dabîn dike, lê di heman demê da ev *PK* wek argument *FDyê*kê binkategorîze dikin. Binkategorîzetîya *FDyê* di çarçoveya xebata me da amaje bi temamkerîya wê dike, anku ew divê di dardîagramê da li pozîsyona temamkerî ya *PKyê* bi cih bibe. Bo nimûne *Dilan ji hevala xwe hez dike*. Lê dema em *FDya ji hevala xweyê* di çarçoveya teorîya *X-barê* da li pozîsyona temamkerî ya *PKyê* bi cih bikin, kêşe derdikevin. Eger em qebûl bikin ku *hez* wek berkara *kirinê* kar dike, wekî di (91b)yê da xuya dike, em divê *hezê* li pozîsyona temamkerî ya lêkerê bi cih bikin ((92b)). Berevajî vê, eger em *FDya* ku ev *PK* binkategorîze dike li pozîsyona temamkerî bi cih bikin, wê demê jî em divê *hezê* wekî di (91a)yê da, li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* bi cih bikin ((92a)).



Eger em (92a)yê rast qebûl bikin, *hez* divê wekî di *derman kirinê* da, beşdarbûyî be, lê Haig vê PKyê wek ne-beşdarbûyî disenifîne, eger em (92b)yê da rast qebûl bikin, wê demê *hez*, bi têgehiştina Haigî, dikare wek berkar kar bike (lewra li pozîsyona temamkerî ya lêkerê bi cih bûye, em kêşeya rewşa rêzimanî niha nahesibînin), lê di vê rewşê da jî pozîsyona *FDya ji hevala xweyê* kêşeyan derdixe; ev *FD* li pozîsyona zêdekê bi cih bûye. Lewra bi lêzêdekirina vê *FDyê L'* ji aliyê binyadî ve berfireh nebûye, xwe dubare kiriye. Eger *FD* wekî di (92b)yê da wek zêdek bê qebûlkirin, wê demê jî em divê qebûl bikin di risteyê da *ji hevala xwe* tune be jî binyad divê rêzimanî be, lê di kurmancî da dema *hez kirin* bêyî frêzeka daçekî bê bikaranîn wekî di **Dîlan hez dikeyê* da, binyadên nerêzimanî pêk tên.

Ji bo çareserîyê em dikarin *Nya* her cure PKyê li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* bi cih dikin. Bi vî awayî ne hewce ye *Nya* PKyên ne-beşdarbûyî li asta sîntaktîk pozîsyona berkara rasterast dagire. Vê rewşê em dikarin wek giştîsazîyek (generalized) bi awayê jêrîn diyar bikin:

(93) Di PKên têper da, dema li r-binyadê pozîsyona temamkerî ne dagirtî be, jortirîn *FDIya* di nav *L'yê* da wek berkara rasterast tê şirovekirin.


Giştîsazîyeka bi vî rengî dikare rave bike ku çima *Nya* PKyên ne-beşdarbûyî wek berkara rasterast kar dike; dema pozîsyona temamkerî ne dagirtî be, pozîsyona xwişkî ya *LSyê* dibe jortirîn pozîsyona *FDIyê*. Ji ber vê jî *Nya* PKyê wek berkara rasterast tê şirovekirin. Di avahîya ergatîv da dema *FDIya* berkarî ya rasteqîn tune be *N* li gel lêkerê rêkeftî dibe.

Niha jî em vegerin analîzên Gündoğduyê (2015; 2018) yê ji bo PKyên kurmancî. Wekî me li jor diyar kir, Gündoğdu PKyên kurmancî yê *N+LSyî* bi navên PKyên têper (wekî *derman kirin*) û PKyên ne-ergatîv (wekî *sond xwarin*, *hez kirin*, *bêrî kirin*) disenifîne. PKyên ne *N+LSyî* jî, li gor têperîya *LSyê* wek PKyên têper (wekî *nexweş kirin*, *jê kirin*, *bi rê kirin*, *ve-kirin*) û PKyên teneper (neakûzatîv) (wekî *nexweş ketin*, *lê ketin*, *bi rê ketin*, *ve-ketin*) dike du beş. Pêşî em dê li analîzên wê yê ji bo PKyên *N+LSyî* binihêrin.

Di her du xebatên Gündoğduyê da modela ku ji bo PKyên kurmancî hatiye bikaranîn binyada argumentî ya Ken Hale û Samuel Jay Keyserî ye. Li gor vê modelê, Gündoğdu (2015, rr. 290-291) diyar dike ne bi tenê *PK*, lêkerên sade jî bi awayekî

hundirîn kompleks in. Her lêker bi ser *yekeyên atomîk ên bingehîn* (basic atomic units) ve tê veqetandin û bi mekanîzmayên wekî temamkirin û pêvekirinê ve tê yekkirin, ku bi vî awayî binyada argumentî ji aliyê konfigrasyonên (configuration) sîntaktîk ve tê diyarkirin ku ev konfigrasyonên sîntaktîk girêdayî taybetmendiyên hêmanên lêkerî ne. Her lêker, ji hêmaneka ne-lêkerî û *dendikeka lêkerî* (verb nucleus) pêk tê. Di hin zimanan da ev her du beş dibin yek, wekî di îngilîzî da, û di hin zimanan da ew cuda ne, wekî di baskî û kurdî da. Gündoğdu piştî vê çarçoveyê datîne, wek nimûne dibêje di îngilîzî û di baskî da lêkerên ne-ergatîv di bingeha xwe da xwedî binyadên têper in⁴⁶, di van lêkeran da *Nya* berkar ji aliyê lêkerê ve tê hildibijartin û bi awayekî xwestekî beşdarî lêkerekê sivik a karayî (agentive) dibe. Ji ber ku di baskî da lêkerên sivik ji aliyê morfolojîk xuya dikin, lêkerên ne-ergatîv ên wekî *lan egin* ('kar kirin') xwedî formên analîtîk (analytic forms) in ku rasterast binyada têper a bingehîn nîşan didin. Lê di îngilîzî da lêkera sivik ji aliyê morfolojîk ve xuya nake, ji ber vê jî di bingehê da bi awayê *do workê* ('kar kirin') be jî bi awayê *workê* ('kar kirin/xebitîn') sîntetîk (synthetic) e. Dîsa angaştê Gündoğduyê ew e ku modela Hale û Keyserî ji bo her cure *PKya* kurmançî raveker e.


Eger em modela ku Gündoğdu pêşniyaz dike bi şemayeka giştî nîşan bidin, dê bi awayê jêrîn be. Bi kurtasî *LS* hêmana ne-lêkerî hildibijêre û ev hêmana ne-lêkerî li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* bi cih dibe.



Li gor vê modelê, Gündoğdu (2015, r. 291) ji bo *PKyên* ne-ergatîv dibêje ew di bingeha xwe da xwedî binyada têper in û *LSya* karayî, berkara xwe ya navdêrî hildibijêre (dariştin di sîntaksê da tê yekkirin (merge)). Cudahî ew e ku berevajî lêkerên ne-ergatîv ên navrehî (denominal) yên îngilîzî, di kurmançî da hêmana navdêrî ne-beşdarbûyî ye. Her du rewşên îngilîzî û yên kurmançî bi awayê jêrîn nîşan dide:


⁴⁶ Hin nimûneyên lêkerên ne-ergatîv ên îngilîzî, *work* ('kar kirin/xebitîn'), *make a fire* ('agir dadan'), *fast* ('rojî girtin'), *speak* ('xeber dan') in (bnr. Gündoğdu, 2015, r. 286).

- (95) a. îngilîzî (lêkerên navrehî) b. kurmancî (*PKyên* ne-ergatîv)




Eger bala me kişandibe di (95)an da frêza lêkerî ne wek *FL*, lê wek *Fl* (*lya* piçûk) hatiye nîşandan. Sedema wê ew e ku li gor Gündoğduyê (2015, r. 292) di kurmancî da sereya ku ji rewşa AKÛZATÎV berpirsyar e, *lya* piçûk e. Ji ber vê jî di kurmancî da hemû lêkerên sivik ên têper li pozîsyona sereyê ya *lyê* bi cih dibin. Hêmana navdêrî ya *PKyê*, taybetmendîya rewşê ya lêkera sivik têr dike û lewma binyad wek têper tê şirovekirin û di dema borî da avahîya ergatîv dide destpêkirin.


Ji aliyê din ve Gündoğdu (2015, r. 292) ji aliyê pozîsyona sîntaktîk ve jî Nyên *PKyên* ne-ergatîv û berkarên rasterast ên rasteqîn ji hev vediqetîne. Li gor wê, *Nya PKyên* ne-ergatîv beşek e ji qada lêkerî, lê berkara rasterast a rasteqîn argumenta hundirîn a lêkera tematîk e. Di xebata wê da berkara rasterast a rasteqîn li pozîsyona nîşankerî ya frêza lêkerî (*lya* piçûk) ((96a)), *Nya PKyên* ne-ergatîv jî di nav qada *PKyê* da li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* ((96b)) tê bicihkirin.



Me li jor nîşan da ku Gündoğdu *LSyên* têper, di bin *lya* piçûk da bi cih dike, lewra ev *lya* piçûk ji kontrolkirina rewşa AKÛZATÎV berpirsayar e. Nexwe *LSyên* *PKyên* teneper li kîjan pozîsyonê ne? Pozîsyona wan divê ne *lya* piçûk be, lewra lêkerên teneper bi awayekî sirûştî nikarin rewşa AKÛZATÎV kontrol bikin. Gündoğdu (2015, rr. 295-296), *LSyên* teneper li bin *Lya* mezin bi cih dike. Bi vî awayî *PKyên* teneper di nav *FLyê* da pêk tên. Bergindên têper ên *PKyên* teneper jî di nav *FLyê* da, bi bicihkirina *FLyê* pêk tên. Ev her du rewş bi awayê jêrîn hatine nîşandan. Di (97b)yê da *LSya kirinê* cih diguhere bo pozîsyona *lya* piçûk, lewra li vê pozîsyonê dikare rewşa AKÛZATÎV a berkarê (*ez*) kontrol bike.




Ji bo *PKyên* *P+LS* û *D+LSyê* jî Gündoğdu (2018, rr. 138-140), binyada frêzî ya wan, bi nimûneyên *vebûn/vekirin*, *bi rê ketin/bi rê kirinê* wekî nimûneyên (98) û (99)an nîşan dide. Gündoğdu ji bo pirtikan dibêje di kurmancî da bi piranî wek daçekan in. Ji ber vê, pirtika *ve-yê* li jêr di (98)an da, di *PKya vebûn/vekirinê* da wek *D+LS* hatiye nîşandan. Tekane cudahî ev e ku *FDya* di (98)an da, *FNyekê* nahewîne û bi rêya *D'yê* rasterast diçe *Dyê*.




Modela binyada ku Gündoğdu peşniyaz dike, bi rastî jî ji hin alîyan ve xurt e û ravekirinên qanihker dihevwîne. Lê dîsa jî nikare ji bo xebata me bi temamî raveker be. Di vî warî da çend tiştan em dikarin bêjin: Yek ew e ku Gündoğdu (2015, rr. 292-293), *PKyên* têper ên *N+LSyî* jî bi heman modelê ve analîz dike, lê cudahîya wan ji *PKyên* ne-ergatîv ew e ku ew qebûl dike di van cure *PKyan* da li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* *FDyek* heye ku ev hêmana *FDyî* amaje bi têkilîya nîşanker û temamkerê dike, lê *Dya*

sereya vê *FDyê* ji aliyê morfolojîk ve vala ye û bi *Nya PKyê* ve dibe yek. Em dikarin binyada ku Gündoğdu ji bo vê pêşniyaz dike, bi nimûneya jêrîn nîşan bidin:




Li vir pirs ev e: Çima *N* wek *temamker* li pozîsyona *temamkerî* ya *Dya* vala bi cih dibe? Derbarê vê da me di xebatê da sedemên zimannasîyî nedîtin. Bi tenê hatîye qebûlîkirin ku di van *PKyan* da *Dyeka* vala heye ku têkilîya nîşanker û *temamkerê* sererast dike.

Dîsa Gündoğdu (2018, rr. 140), ji bo *PKyên* bi frêzên daçekî yê wekî *lê, jê* (di xebata wê da ev frêzên daçekî wek *daçekên mitleq* (absolute prepositions) hatine binavkirin) çêkirî jî bo nimûne diyar dike ku *PKya lê danê* xwedî formeka wekî *D+min+LSyê* ye. Di van *PKyan* da *min* li pozîsyona *FNya* *temamkerî* ya *FDyê* bi cih dibe. Bi vî awayî, forma ku *Lya* sere beşdarî *lya* piçûk dibe, ji bo van cure *PKyan* jî raveker e û varyanta wan a têper dabîn dike. Gündoğduyê binyada frêzî ya *lê danê* wek dardîagram nîşan nedaye, lê di çarçoveya boçûna wê da eger em li *PKyên lê ketin* û *lê xistinê* binihêrin binyadên argumentî yê wan bi rêzê dê bi awayê jêrîn bin:



Wekî me li jor di dardîagramên (99)an da dîtibû di *PKya bi rê ketin/kirinê* da *rê* jî wekî *dara* di (101)ê da li pozîsyona temamkerî ya *Dyê* hatibû bicihkirin. Lê em dizanin ku di kurmancî da dema temamkera daçekê *FDI* be, ditewe. Li gel ku *dar* tewîyaye, di *PKya bi rê kirin/ketinê* da *rê* natewe. Bi heman awayî di *PKyên bi dest ketin, bi dest xistin, bi nav kirin, ji dest dan, bi cih kirinê* da, hêmana navdêrî natewe. Nexwe di van cure *PKyan* da pozîsyona hêmana navdêrî divê ne pozîsyona temamkerî ya daçekê be. Em dê li vê mijarê dîsa vegerin.

Dema em *ROLê* têxin nav sîstemê, em dibînin ku modela *Gündoğduyê* dîsa ji bo hemû *PKyên* kurmancî raveker nine (jixwe di modela wê da *ROL* cih nagirin). Wekî me berê diyar kiribû li gor *Gündoğduyê*, wateya *PKyê* ji aliyê hêmana ne-lêkerî ve tê diyarkirin. Ev di çarçoveya xebata me da tê wê wateyê ku *ROLan* hêmana ne-lêkerî bar dike (yan jî çavkanîya *ROLan* hêmana ne-lêkerî ye). Wekî me dîtibû *ROL* di çarçoveya birêvebirinê da dihatin lêbarkirin. Dema em bi vî çavî li pêşniyaza binyada frêzî ya *Gündoğduyê* binihêrin, em dibînin ku hin kêşe derdikevin. Bo nimûne em nimûneyên wê yên (97)an li jêr wek (102) cardin bi cih bikin û kêşeyên ku me nîşan kirin, li ser van nimûneyan diyar bikin.



Eger di *PKyan* da wateyê bi tenê pêkhêna ne-lêkerî diyar dike, wê demê di *PKyên acis bûnê/kirinê* da ROLan rengdêra *acisê* divê bar bike. Di (102a)yê da li ber vê astengek tune ye. *Acis* dikare *ezê* bi rê ve bibe lewma jî dikare ROLê li wê bar bike. Bi heman awayî di (102b)yê da jî ROL li *ezê* bêtê asteng tê barkirin. Lê *acis* nikare ROLê li *teya FDIya* bikera *PKyê* bar bike. Ji bo ku *acis* bikaribe ROLê li wê bar bike, ew divê li k-binyadê li *teyê* p-fermanberîyê (an jî m-fermanberîyê) bike. Ji bo ku bikaribe li wê p-fermanberîyê bike jî *te* û *acis* divê di nav heman mezintirîn derdanê da cih bigirin. Lê di (102b)yê da *acis* di nav *FLya* mezintirîn derdanê, *te* di nav *FIya* mezintirîn derdanê da cih digire. Ji ber vê jî *acis* nikare *teyê* bi rê ve bibe. Wek enmcam *te* bêtê ROL dimîne. Wekî xuya dike, dema em ROLan jî têxin nav sîstemê, binyada frêzî ya wekî (102b)yê dê wek nerêzimanî bê kodkirin, lê ew di kurmançî da rêzimanî ye.⁴⁷

Di xebata Csirmaz û Ceplováyê da *PKyên zazakî* yên bi *kirinê* çêdibin, ji aliyê sîntaktîk ve hatine analîzkirin. Di vê xebatê da *Nya PKyan* wek *argumenta sivik* (light argument) hatiye binavkirin û hatiye diyarkirin ku hin argumentên sivik (ên *lêkerên sivik ên têper ên bê berkar* (transitive light verbs with no objects) wekî *zûr kerdene*

⁴⁷ Gündoğdu (2018, rr. 317-328) *PKyên* kurmançî ji xeynî vê modelê, bi modeleka din a li gor *binyada bûyerî* (event structure) jî analîz dike. Ev analîz jî ji aliyê sîntaktîk ve kêmkê zêde wekî modela nîşankirî ye. Ev model jî wekî ya din, ji aliyê têgeha birêvebirinê ya di xebata me da kêşeyan derdixe, lewma jî ji bo pêkhatina ROLê (û REWŞê) ya di *PKyên* kurmançî û zazakî da raveker nine. Ji ber vê em modelê li vir bi cih nakin. Lê bi kurtasî bo nimûne di vê modelê da, di *PKya aciz bûnê* da *aciz* wek frêzek li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* bi cih dibe (di modela pêşîn da *aciz* wek sere li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* bi cih dibe), lewma jî wek sereyeka di nav frêzekê da nikare argumentên *PKyê*, ku li derveyî vê frêza sereyê bi cih bûne, bi rê ve bibe.

('derew kirin')) dikarin wek *temamkera sîntaktîk* (syntactic complement) kar bikin û hinekên din (ên *lêkerên sivik ên têper ên bi berkar* (transitive light verbs with objects), wekî *paçi kerdene* ('maç kirin')) jî dikarin wek beşeka ji sereya lêkerî kar bikin. Li jêr em dê li ser koma yekem ku nikarin berkareka rasterast werbigirin rawestin, lewra ji bo koma din mijareka nîqaşî ne xuya ye.

Xebata Csirmaz û Ceplováyê ji bo berkartîya Nya PKyên ên bê berkar sê delîlan nîşan dide: *N*, di demên borî da li gel *LSyê* rêkeftî ye, *N* di avahîya tebatî da dikare bibe biker û *N* di avahîyên dançêker da li gel lêkera dançêker (di xebatê da wek *da* (zz. *dayene*) cih digire) rêkeftî ye. Em li PKya *zûr kerdene* ('derew kirin') binihêrin ku di xebatê da wek nimûne hatîye bikaranîn:

(103)

- a. *layiki zur-i kerd-i*⁴⁸ 'lawikî derew kir'
- b. *no zur hete layiki -ra amê kerdene* 'ev derew ji alîyê lawikî ve hat kirin'
- c. *malîmi ebe mi zur-i da-(y)i kerdene* 'mamosteyî bi min derew dan kirin'

Di (103a)yê da *iya* (*î*) li ser *zur* ('derew') û ya li ser *kerd*-ê ('kir-') pirjimarîyê kod dikin, ku wekî me jî berê nîşan dabû, ev nîşan dide di navbera *zur* û *kerd*-ê da rêkeftin heye, lewma jî *zur* wek berkar kar dike. Di (103b)yê da *no zur* ('ev derew') wek bikera risteya tebatî kar dike, ev jî nîşan dide ku *zur* wek berkarên rasteqîn di avahîya tebatî da dikare wek biker kar bike. Di (103c)yê da jî *zur* û *da*- ('da-') rêkeftî ne ku ev jî di xebatê da wek delîleka berkatîya *zurê* hatîye qebûlkin. Wek delîleka din jî hatîye diyarkirin ku Nya PKyan rewşa rêzimanî werdigire û ev nimûne hatine nîşandan:

(104) *no layik xer-i/ xer-an keno* 'ev lawik xêr-ê/xêr-an dike'

Li gor xebatê, di (104)an da *-i* û *-ana* li ser *xerê* ('xêr') gireyên tewangê ne, lewma jî *xerê* rewşa rêzimanî wergirtiye. Hin ji van nimûneyên di xebatê da ku ji bo berkartîya Nya PKyan wek delîl hatine nîşandan di çarçoveya xebata da me da bikêşe xuya ne. Pêşî eger Nyên wekî *zurê* di avahîya tebatî da dikarin bibin biker wê demê ROL jî divê li wan bê barkirin. Ev jî tê wê wateyê ku *zur* divê wek tiştekî kirinê bê fêmkirin. Em nizanin li hin herêman *zur* ji alîyê zazakîzaran bi vî rengî tê fêmkirin an na, lê eger em

⁴⁸ $\varepsilon = [\varepsilon]$, $\dot{\varepsilon} = [\dot{\varepsilon}]$, sembolên IPAYê û bergendên wan yên ku di nimûneyan da hatine bikaranîn.

qebûl bikin ROL li *zurê* tê barkirin, wê demê cudahiya wê û berkarên rasteqîn namîne. Eger di navbera wê û berkarên rasterast ji vî aliyê ve cudahiyeke tune be, wê demê li ber destê me krîterek namîne ku em bêjin ew li gel *kerdeneyê PKyê* pêk tîne. Em dê li jêr nîşan bidin ev cure *N* nikarin di avahiya tebatî da wek berkar kar bikin, lewma ji em dê avahiyeke wekî (103b)yê wek nerêzimanî kod bikin. Dîsa di (104)an da, ji aliyê *Nyê* ve wergirtina rewşa rêzimanî ji bikêşe ye. Lewra wergirtina rewşa rêzimanî dîsa di çarçoveya xebata me da tê wê wateyê ku ew *ROLê* werdigire. Di vê rewşê da ji aliyê semantîk ve cudahiya *xera* di nimûneyê da û *karê xoyê* di risteya *no layik karê xo kenoyê* ('ev lawik karê xwe dike') da namîne. Bi kurtasî bi angaştên di vê xebatê da em nikarin raveyên zimannasîyê ji bo van cure *PKyan* diyar bikin. Em qebûl dikin ku li *Nya PKyan* rewşa rêzimanî nayê barkirin, lewra ROL li wan nayê barkirin.

Li jor me nîşan da ku hin modelên ku *PKyan* ji aliyê *ROLê* ve analîz dikin û hin analîz û modelên ku *PKyên* kurmancî û yên zazakî ji aliyê sîntaktîk ve analîz dikin, ji aliyê *ROLê* (û *REWŞê*) ve ji bo *PKyên* kurmancî (û yên zazakî) bi temamî raveker ninin. Ji ber vê, em dê hewl bidin ji bo *PKyên* kurmancî û yên zazakî modeleka binyadî pêşniyaz bikin. Binyada ku em pêşniyaz dikin piştî xwe dide taybetmendiyên jêrîn:

(105) a. *PK* di ferhengê da çêdibin, lê di ferhengê da nayên parastin

b. Wateya *PKyan* bi têkelîya hêmana ne-lêkerî û *LSyê* ve, bi awayekî kombînasyonî pêk tê.

c. Ev wateya nû binyadeka argumentî ya nû pêk tîne

d. Binyada argumentî ya *PKyê* bi têkarîya hêmana ne-lekerî û *LSyê* ve tê diyarkirin.

e. Hêmanên ne-lêkerî yên *PKyan* li asta sîntaktîk frêzî ne û li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* bi cih dibin

f. Di *PKyên N+LSyî* da *LS*, *ROLê* li *Nyê* bar nake


g. *ROLên* argumentan, ji aliyê têkelîya yekeya hêmana ne-lêkerî û *LSyê* ve tên diyarkirin.

h. Têperî yan jî neakûzatîvîya *LSyê*, têperî yan jî neakûzatîvîya *PKyê* diyar dike. *LS* têper be *PK* têper e, *LS* neakûzatîv be *PK* neakûzatîv e.

i. Di *PKyên* têper da têperîya *PKyan* bermayîya lêkera giran a berginda *LSyê* ye.

j. Di *PKên* têper da, li r-binyadê dema pozîsyona *temamkerî* ne dagirtî be jortirîn hêmana *FDIyê* ya di nav *L'yê* da wek berkara rasterast tê şirovekirin û di demên borî da li gel *LSyê* rêkeftî ye.

Li gor taybetmendiyên jorîn, binyada ku pêk tê em dikarin bi awayê dardîagrama jêrîn diyar bikin:



(106), k-binyada *PKyan* nîşan dide. Li gor vê binyadê, her *PKya* kurmancî û ya zazakî wekî her frêzê, xwedî pozîsyoneka nîşankerî û *temamkerî* ye. Li k-binyada *PKyên* têper her du pozîsyon an jî yek ji wan dagirtî ye, lê li k-binyada *PKyên* neakûzatîv bi tenê pozîsyona *temê* dagirtî ye. Di daridyardîagrama (106)an da *X''* amaje bi her cure frêza hêmana ne-lêkerî ya *PKyan* dike. Bo nimûne di *sond xwarinê* da li pozîsyona *X''ê* *FDIya sondê*, di *nexweş ketinê* da *FRya nexweşê*, di *bi rê kirinê* da *FDya bi rêyê* cih digire. Dîsa me got *PK* di ferhengê da pêk tên, lewma jî pêkhênên ne-lêkerî yên *PKyan* *bar* in, lê wekî her yekeyeka ferhengî, dema ew derdikevin asta sîntaktîk ew bi awayekî frêzî derdikevin vê astê. Bo nimûne di *PKya bi rê kirinê* da pêkhêna ne-lêkerî ya *PKyê* *FDya bi rê* ye. Di vê pêkhênê da *bi* wek *FDyek*, *rê* jî wek *FDIyek* derdikeve asta sîntaktîk. Lê ev frêz wekî frêzên din kar nakin. Bi gotineka din ji ber ku sereyên wan têkarîyê li wateya *PKyê* dikin her yek ji sereyên van frêzan, li gel *LSyê* wek sereya pêveberê kar dikin. Lêwma dema di *FLyê* da argument an jî zêdekek hebe, li k-binyadê û li forma mantiqî bi kombînasyonekê *ROLê* li argument an jî zêdekan bar dikin. Wek encam di dardîagrama (106)an da sereya *FLyê* *L_{PK}* ye, lê serekîya *L_{PKyê}* ne ji vê pozîsyonê, bi awayekî kombînasyonî ji pozîsyona sereyên ku

PKyê pêk tînin, dest pê dike. Lewma bo nimûne dema em dibêjin di *FLya ew bi rê kirê* da *L_{PK} ROLê* li *ewê* bar dike, ev tê wê wateyê ku çavkanîya *ROLê bi+rê+kirin* e, lê ji ber ku *L_{PK}* vê kombînasyonê temsîl dike, em dibêjin *ROLê L_{PK}* bar dike. Li jêr, em dê di cureyên *PKyên* kurmancî û yên zazakî da, *ROLê* li gor vê binyada frêzî ya pêşniyazkirî vekolin.

3.2.4.3. ROL di Pêveberên Kompleks ên Têper da


Me *PKyên* têper di nav xwe da li gor hêmana wan a ne-lêkerî, wek *PKyên N+LSyî* (wekî *sond xwarin* (zz. *sond werdene*), *hez kirin* (zz. *hes kerdene*)), *PKyên D+LSyî* (wekî *bi dest xistin* (zz. *bi dest finayene*), *jê kirin* (zz. *ci kerdene*)), *PKyên R+LSyî* (wekî *nexweş kirin* (zz. *nêweş kerdene*)), *PKyên P+LSyî* (wekî *ve-kirin* (zz. *a-kerdene*)) û *PKyên N+D+LSyî* (wekî *dest pê kirin* (zz. *dest pê kerdene*)) dabeş kiribûn. Li jêr, em dê bi dorê li ser van cure *PKyan* rawestin. Hin cure *PKyên* vê komê dibe ku ji yekê zêdetir argumentan binkategorîze bikin. Bo nimûne hin ji *PKyên* ku em wek *PKyên* bi temamkera *FDIyî* disenifînin, li gel *FDIyekê*, dikarin *FTEMekê* jî wek alternatîf binkategorîze bikin (bo nimûne *fêm/fehm kirin*/zz. *fehm kerdene*). Lewma senifandina ku me diyar kiriye, van cure *PKyan* bi temamî nagire nava xwe û me dikarîbû ji bo van cure *PKyan* komeka din jî ava bikira. Lê me senifandina giştî ya *PKyan* li gor cureya kategorîk a hêmanên ne-lêkerî çêkir. Ji ber ku vekolîna jêrîn dê di heman çarçoveyê da bê kirin, em dê *PKyên* ku ji yekê zêdetir argumentan binkategorîze dikin, li gor senifandina jorîn bi cih bikin.

3.2.4.3.1. ROL di Pêveberên Kompleks ên N+LSyî da


Ji van *PKyan*, *PKyên* bê temamker *ROLeke*, yên mayîn du heb *ROLan* bar dikin. Me *PKyên N+LSyî* li gor cureya temamkerên wan kiribûn çar kom: *PKyên bi temamkera FDIyî* (wekî *derman kirin* (zz. *derman kerdene*)), *PKyên bi temamkera xwedîtîyê* (wekî *bêrî kirin* (zz. *bêrî kerdene*)), *PKyên bê temamker* (wekî *sond xwarin* (zz. *sond werdene*)) û *PKyên bi temamkera daçekî* (wekî *hez kirin* (zz. *hes kerdene*)).

Pozîsyona temamkerî ya *PKyên* temamkera *FDIyî*, wekî navê wan jî amaje pê dike, bi *FDIyekê* dagirtî ye. Nimûneyên van *PKyan* wekî *derman kirin* (zz. *derman kerdene*), *maç kirin* (zz. *maç kerdene*), *av dan* (zz. *awe dayene*), *bar kirin* (zz. *bar kerdene*), *çap kirin* (zz. *çap kerdene*), *fêm/fehm kirin* (zz. *fehm kerdene*), *texmîn kirin* (zz. *texmîn kerdene*), *nîşan kirin* (zz. *nîşan kerdene*), *qebûl kirin* (zz. *qebûl kerdene*),

xwedî kirin (zz. *wayîr kerdene*), *şax dan* (zz. *şax dayene*), *gez kirin* (zz. *gaz kerdene*) in. Dardîagrama jêrîn k-binyada *FLya Dîlanê kulîlk av danê* (zz. *Dîlane vileyî awe dayî*) nîşan dide.




Hin ji van *PKyan* dikarin *FTEMekê* jî binkategorîze bikin. Bo nimûne *PKya fêm/fehm kirin* (zz. *fehm kerdene*), ji van *PKyan* e. Ev *FTEM* li r-binyadê cih diguhere bo piştî lêkerê, lê li jêr k-binyada *FLyê* hatîye nîşandan. Ji ber vê *FTEM* li pozîsyona temamkarî ye.



Di *PKyên N+LSyî* yên bi temamkera *xwedîtîyê* da temamkera *PKyê* wek *xwedîyê/a Nya PKyê* pêk tê. Lewma jî li pozîsyona temamkerî ya *Nyê* da pêk tê. Esas ev temamker jî *FDIyek* e, lê ji ber ku ew wek *xwedîyê/a Nyê* pêk tê û ji ber ku *xwedîyên* navdêrekê bi îzafeyê bi navdêrê ve tîr girêdan, ew wek frêzeka îzafeyî xuya

dike. Hin ji van *PKyan bêrî kirin* (zz. *bêrî kerdene*), *biryar dan* (zz. *qerar dayene*), *hêvî kirin* (zz. *hêvî kerdene*), *alîkarî kirin/alî kirin* (zz. *hetkarî kerdene*), *qal kirin* (zz. *qal kerdene*), *behs kirin* (zz. *behs kerdene*), *zor birin* (zz. *zor berdene*), *telefon kirin* (zz. *telefon kerdene*) e. Dardîagrama jêrîn k-binyada *FLya Dîlanê bêrî-(y)a hevala xwe kirê* (zz. *Dîlane bêrî-(y)a embaza xo kerd*) nîşan dide.



Me gotibû dema pozîsyona *temamkerî* ya *PKyê* dagirtî nebe, jortirîn *FDIya* di nav *L'yê* da wek *berkar* tê şirovekirin. Di *PKyên bi tamamkera xwedîtîyê* da ji ber ku *temamker* li pozîsyona *temamkerî* ya *Nyê pêk* tê, *tevahîya FDIyê* (di nimûneya jorîn da *bêrîya hevala xwe*) wek *berkara PKyê* tê şirovekirin.


Ji alîyê din ve me *temamkera* van cure *PKyan* li pozîsyona *temamkerî* ya *Nyê* bi cih kir û me nîşan da ku têkilîya *N* û *temamkerê* îzafê pêk tîne. Lê Açar (2024, rr. 285-286) hêmanên ku em li vir wek îzafê (*i/ê* û *-a*) nîşan didin, ew wan wek enklîtîk dide nasîn û di navbera wan da cudahîyek dafîne: Li gor Açarî di *PKyên* wekî *telefon kirinê* da enklîtîka *-i/êyê* tê bikaranîn (wekî *telefonî/ê min kir*), lê di bingeha xwe da ev cure *PK*, wek *temamker FDIyeka* ku sereya wê *li ye*, werdigirin. *Li* dikeve lewma ji

avahîyên wekî *telefonî/ê min* kirê pêk tên. Ji bo vê rewşê nimûneyeka ku nîşan dide ev e: *Mamosteyî li min telefon kir/Mamosteyî telefon li min kir* → *Mamosteyî telefonî min kir*. Açar dibêje enklîtîka *-î/ê* rewşa berîdanê (datîv) nîşan dide, lê enklîtîka *-ayê* rewşên wekî *xwedîtî*, *derketin/dûrketin* an ji diyarkirinê nîşan dide (bo nimûne *Hevalan behsa te kir*). Ji vî alîyê ve analîzên Açarî jî bereql xuya ne. Bo nimûne di nimûneya *telefonî min* kirê da, bi awayekî zelal di navbera *telefon* û *minê* têkilîyeka *xwedîtîyê* tune ye. Lê têkilîyeka berîdanê heye. Lewma binavkirina me ya ji bo van cure *PKyan* (*PKyên bi temamkera xwedîtîyê*) dibe ku her cure *PKyê* negire nav xwe, lê dîsa jî em dê vê binavkirinê bidomînin û binyada frêzî ya ku me pêşkêş kir qebûl bikin. Ji bo vê du sedemên me hene: Ya yekem ew e ku di kurmancîya standard da avahîyên wekî *telefonî/ê min* kirê ji yên wekî *li min telefon kirê* (an jî *telefon li min kir*) zêdetir tên dîtin û ya duyem jî ew e ku eger em formên resen ên temamkerê wekî *li minê* qebûl bikin, ji bo niha em nizanin ji ber kîjan sedemên zimanî *li min* formên wekî *-î/ê min* werdigirin. Ji bo forma *telefon li min* kirê dibe ku em bikaribin bêjin ew piştî guherîneka dengî û morfolojîk forma *telefonî/ê min* kirê werdigire, lê ji bo guherîna *li min telefon kir* → *telefonî/ê min* kirê diyar e ku cihguherînek pêk tê, lê ev cihguherîn mecbûrî ne xuya ye, lewma jî em dikarin bêjin ew cihguherîn stîlistîk e. Em vê nîqaşê vekirî dihêlin.

Hin ji *PKyên* vê binkomê dikarin *FTEMekê* jî wek temamker binkargorîze bikin. *Biryar dan, hêvî kirin* ji van *PKyan* in. Bo nimûne *Dîlanê biryar [FTEM vê pirtûkê bixwîne] da* (zz. *Dîlane qerar [FTEM nê kitabî biwano] da*).


Di *PKyên* bê temamker da bi tenê yek argument heye ku ew jî biker e. Hin nimûneyên van *PKyan* *sond xwarin* (zz. *sond werdene*), *şerm kirin* (zz. *şerm kerdene*), *xwê dan* (zz. *ereq dayene*), *can dan* (zz. *can dayene*), *rojî girtin* (zz. *roce girewtene*), *baz dan* (zz. *vaz dayene*) e. Dardîagrama jêrîn k-binyada *FLya Dîlanê sond xwar* (zz. *Dîlane sond werd*) nîşan dide.

(110)



Li pozîsyona temamkerî ya *PKyên* bi temamkera daçekî, *FDyek* cih digire. Hin ji van *PKyan*, *hez kirin* (zz. *hes kerdene*), *bawer kirin* (zz. *bawer kerdene*), *ceza birîn* (zz. *ceza birnayene*), *xeber dan* (zz. *qiseyî kerdene*), *derew kirin* (zz. *zûrî kerdene*) e. Binyada frêzî ya van cure *PKyan* bi nimûneya *Dîlanê ji hevala xwe hez kirê* (zz. *Dîlane embaza xo ra hes kerd*) li jêr hatîye nîşandan. Çawa ku lêkerên ku *FDyekê* binkategorîze dikin, li gel *Dyê ROLê* diyar dikin û *ROL* li temamkera *Dyê* tê barkirin, di van cure *PKyan* da jî *ROLa* temamkera argumenta *FDyî*, ji alîyê sereyên *PKyê* û *Dyê* ve tê diyarkirin. Lewma di nimûneya jêrîn da *ROLa* ku li *hevala xweyê* (zz. *embaza xo*) tê barkirin ji alîyê *ji+hez kirinê* (*ra+hes kerdene*) ve tê diyarkirin, lê ji alîyê *jiyê* ve tê barkirin.

(111)




Hin ji van *PKyan* dikarin *FTEMekê* jî wek temamker werbigirin. *Bawer kirin*, *PKyeka* bi vî rengî ye. *FTEMa* wê jî wekî argumenta wê ya *FDyî*, li pozîsyona

temamkerî tê hilberîn. Bo nimûne *Dîlanê* [_{FTEM} ew dê bi ser bikeve] bawer kir (zz. *Dîlane* [_{FTEM} a do bi ser bikewo] bawer kerd).

3.2.4.3.2. ROL di Pêveberên Kompleks ên R+LSyî da

Ev cure *PK* du heb ROLan bar dîkin. Temamkera van *PKyan* her carê wek *FDIyek* pêk tê. Ji vî aliyê ve ew dişibin *PKyên* bi tamamkerên *FDIyê* û lêkerên têper ên bi tamamkerên *FDIyê* (wekî *xwendin*, *xwarin* û yd.) Hin nimûneyên van *PKyan* *nexweş kirin* (zz. *nêweş kerdene*), *sor kirin* (zz. *sûr kerdene*), *xweş kirin* (zz. *weş kerdene*), *bilind kirin* (zz. *berz kerdene*), *winda kirin* (zz. *vinî kerdene*), *paqij/pak kirin* (zz. *pak kerdene*), *hişyar kirin* (zz. *aya kerdene*), *xemgîn kirin* (zz. *xemgîn kerdene*), *belav kirin* (zz. *vila kerdene*), *vala kirin* (zz. *veng kerdene*), *birîndar kirin* (zz. *dirbetin kerdene*), *xwar kirin* (zz. *çewt kerdene*) in. Li jêr k-binyada *PKya* *nexweş kirinê* ya ji bo *FLya* *Dîlanê* zarok *nexweş kirê* (zz. *Dîlane* *qeçek nêweş kerd*) hatîye nîşandan.




3.2.4.3.3. ROL di Pêveberên Kompleks ên D+LSyî da

Ev *PK*, du heb ROLan bar dîkin. Hêmana ne-lêkerî ya van *PKyan* bi çar awayan pêk tê: An daçek (D) bi navdêrekê (N) (yan jî cihnava vegerok an jî ya hevkarîyê) dibe yek (wekî *bi dest xistin* (zz. *bi dest fînayene*), *ji xwe kirin* (zz. *xo ra vetene*), *bi cih anîn* (zz. *bi ca ardene*), *li hev xistin* (zz. *pê ro dayene*)), an D û Dyeka bêjeyî dibin yek (wekî *bi pêş xistin* (zz. *a ver berdene*), an bi daçekê bêjeyî û navdêrekê (wekî *bin av kirin* (zz. *bin awe kerdene*), an jî bi tenê ji Dyekê (wekî *li kirin* ('lê kirin')) (zz. *bi ra kerdene* ('pi ra kerdene')), *ji kirin* ('jê kirin') (zz. *c kerdene* ('ci kerdene')))) pêk tên. Li k-binyadê pozîsyona tamamkerî ya gelek ji van cure *PKyan* bi *FDIyekê* dagirtî ye,


di hinekan da vala xuya ye, lê dibe ku di rastîyê da ew ne vala be ku em dê li jêr rave bikin.

Dema me li ser modela Gündoğduyê nîqaş dikir, ji bo *PKyên D+LSyî* me got Gündoğdu hem *rêya* di *bi rê kirinê* da hem jî *min* a di *lê danê* (wekî *li + min dayê*) da li heman pozîsyonê, li pozîsyona *temamkerî* ya *Dyê* bi cih dike û me gotibû ev pozîsyon ji bo ya yekem di cih da nexuyaye. Dema em her du hêmanan li heman pozîsyona *temamkerî* ya daçekê bi cih bikin, kêşeyên ku derdikevin em dikarin di dardîagrama jêrîn da bibînin:




Me gotibû di kurmancî û zazakî da daçek, *FDIyên* li pozîsyona xwe ya *temamkerî* ditewînin. Binyada (113)an bikare *PKyên* wekî *lê dan*, *jê kirinê* rave bike jî yê din nikare. Lewra dema em her duyan li heman pozîsyonê bi cih bikin, çawa ku di *lê danê* (li *wî/wê*) da *-ê* di forma tewandî da ye, di *PKyên* wekî *bi rê kirin*, *bi dest xistin*, *bi nav kirinê* da jî bi rêzê navdêrên *rê*, *dest* û *navî* divê bitewin, lê binyadên wekî **bi rê-yê kirin*, **bi dest-î xistin*, **bi nav-î kirin* nerêzimanî ne. Dema piştî van hêmanên navdêrî, *FDIyeka* din bê bicihkirin jî forma wan naguhere. Bo nimûne di kurmancî da binyadeka wekî ya **Min pirtûk bi dest-ê xwe xist*, nerêzimanî ye, forma wê ya rêzimanî *min pirtûk bi dest xwe xist* e. Nexwe di van *PKyan* da *FDI* divê netewe, ji bo vê jî ew divê li pozîsyonekê be ku hem bikaribe têkariya wateyî li *PKyê* bike hem jî netewe. Ji bo vê tekane pozîsyon, pozîsyona xwişkî ya *Dyê* ye. Lewma em van *FDIyan* li pozîsyona xwişkî ya *Dyê* bi cih dikin. Li vir em divê bêjin pozîsyona xwişkî ya *Dyê* jî pozîsyona lêbarkirina rewşê ye, lê di *BGyê* da tê qebûlkirin ku ji bo ku

*FDI*yek bikaribe rewşê werbigire, *ROL* divê li wê hatibe barkirin. Ev wek *xuyanîti* (visibility) tê zanîn. Li gor *xuyanîtiyê* ji bo ku *FDI*yek *ROLe*kê werbigire divê xuya be (ji aliyê fonolojîk ve pêk hatibe) û ji bo ku xuya be jî divê rewş li vê *FDIyê* hatibe barkirin (Haegeman, 1994, r. 194). Di *PKyên* wekî *bi rê kirinê* da *ROL* li *rêyê* nayê barkirin. Ji ber ku xwedî *ROL* nine, rewş jî li wê nayê barkirin. Lê her *FDIya* ku li k-binyadê li pozîsyona *temamkerî* bê hilberîn, ji ber ku pozîsyona *temamkerî* li k-binyadê pozîsyona lêbarkirina *ROLê* ye, divê *ROLê* werbigire. Eger *ROL* li wê bê barkirin ew nikare edî *têkarîyê* li wateya *PKyê* bike; hêmaneka ku *ROL* wergirtiye, nikare di heman demê da *ROLê* bar bike. Binyada frêzî ya *FDya* van *PKyan*, em bi awayê jêrîn diyar dikin.




Niha li gor binyada frêzî ya (114)an em dikarin *PKyên* *D+LSyî* li gor cureya wan a ne-lêkerî binirxînin. Me got di yekem cureya van *PKyan* da *FD* ji *D* û *Nyekê* pêk tê. Nimûneyên van *PKyan* weha ne: *bi dest xistin* (zz. *bi dest fînayene*), *ji xwe kirin* (zz. *xo ra vetene*), *bi bîr anîn* (zz. *ra vîr ardene*), *ji bîr kirin* (zz. *xo vîr ra kerdene*), *bi dar da kirin* (zz. *dar de kerdene*), *bi cih anîn* (zz. *bi ca ardene*), *di xew ra kirin* (zz. *hewn a kerdene*), *bi cih kirin* (zz. *bi ca kerdene*), *ji hev kirin* (zz. *pê ra kerdene*), *li hev xistin* (zz. *pê ro dayene*). *Temamkera* van *PKyan* her carê wek *FDI* li pozîsyona *temamkerî* ya *PKyê* pêk tê. Bo nimûne em li k-binyada *FLya* *Dîlanê karê xwe bi cih anîyê* (zz. *Dîlane karê xo bi ca ard*) binihêrin.

(115)




Hin ji van *PKyan* dikarin *FTEMekê* jî wek temamker binkategorîze bikin. *Ji bîr kirin* (zz. *xo vîr ra kerdene*) yek ji van *PKyan* e. Bo nimûne *Min ji bîr kir [FTEM pirtûkê bigirim]* (zz. *Mi xo vîr ra kerd [FTEM kitab-î bigîra]*).

Di cureya duyem da *FDya PKyê* ji daçekeka xwerû û daçekeka bêjeyî pêk tê. *Bi der kirin*, *bi pêş xistin* (zz. *a ver berdene*), *bi paş xistin* (zz. *a pey fînayene*), *bi ser da kirin*, *li ber xistin* hin nimûneyên van *PKyan* in. Ji bo van cure *PKyan* jî em dê li nimûneya *Dîlanê xwe bi pêş xistê* (zz. *Dîlane xo a ver berd*) binihêrin.




FDya cureya sêyem ji daçekeka bêjeyî û navdêrekê pêk tê. Hin nimûneyên vê binkomê ev in: bin av kirin (zz. bin awe kerdene), bin pê kirin (zz. bin lingan kerdene), ser av kirin (zz. ser awe kerene)). K-binyada FLya Dîlanê firaq ser av kirinê (zz. Dîlane firaqî ser awe kerdî) weha ye:




Koma çarem a van cure *PK*yan ji *D* û *LSyê* pêk tê. Ev *D*, wek frêzeka daçekî di kurmancî da bi awayê *jê, lê, pê, tê*, di zazakî da wek *ci, pi, ti* xuya dike. Wekî me berê jî nîqaş kiribû em qebûl dikin ku *FDya* van *PK*yan bi tenê ji sereyê (anku ji daçekê) pêk tê. Ev *PK* wek *lê dan* (zz. *ci fînayene*), *lê xistin* (zz. *ci fînayene/pi ro dayene*), *lê kirin* (zz. *pi ro kerdene*), *jê kirin* (zz. *ci kerdene*), *pê xistin* (zz. *pê fînayene*), *pê ve kirin* (zz. *pa kerdene*), *tê ra kirin* (zz. *pi ra kerdene*), xuya dikin, lê hin çavdêrîyên zimanî û hin prensîpên *BGyê* dikin ku em qebûl bikin ev cure *PK*, di bingeha xwe da xwedî formên wekî *li dan* (zz. *c fînayene*), *li xistin* (zz. *bi...ro dayene*), *li kirin* (zz. *bi...ro kerdene*), *ji kirin* (zz. *c kerdene*), *bi xistin* (zz. *bi fînayene*), *bi...ve kirin* (zz. *bi...a kerdene*), *di...ra kirinê* (zz. *bi...ra kerdene*) ne.

Eger em vê qebûl nekin û em van hêmanên piştî daçekê li k-binyadê, li pozîsyona temamkerî yan jî ya xwişkî ya daçekê bi cih bikin, hin kêşe derdikevin. Pêşî em wan di dardîagramê da, li pozîsyona temamkerî ya *Dyê* bi cih bikin. Bo nimûne em li k-binyada *FLya Dîlanê sûret bi dîwarî ve kirê* (zz. *Dîlane resim bi dîwarî (y)a kerd*) binihêrin:



Di (118)an da kêşeya yekem ew e ku eger *dîwar* li pozîsyona temamkerî ya *Dyê* cih bigire, ew tê wê wateyê ku ROL li *dîwarê* tê barkirin ku wê demê jî *dîwar* dê wek temamkerka *PKyê* bê şirovekirin. Ev ji bo *PKyên* têper kêşeyan dernexe jî ji bo *PKyên* neakûzatîv kêşeyan derdixe. Bo nimûne eger em ji bo *FLya tîr li darê ketê darê* wek temamkera *PKyê* qebûl bikin, wê demê *PKya lê ketinê* dibe xwedî du heb ROLan (ROLa *tîrê* û ya *darê*), eger weha be em divê bêjin *PKya lê ketinê* *PKyeka* têper e, lê em qebûl dikin ku *PKyên* neakûzatîv xwedî yek ROLê ne û nabe ku em ji bo *lê ketinê* bêjin ew têper e, lewra avahîya ergatîvî nade destpêkirin. Dema em *darê* wekî di *PKyên* din ên vê komê da, li pozîsyona xwişkî ya daçekê bi cih bikin, îcar hin kêşeyên din derdikevin.




Di dardîagrama (119)an da, em dikarin li şûna *darê* cihnavêkê jî bi cih bikin, wê demê *PK*, dê bi awayê *li wê xist* an jî *lê xistê* be, lê kêşe dê hêj berdewam be. Di dardîagrama (119)an da ji ber ku *dar* li pozîsyona xwişkî ye, em dikarin bêjin ew têkarîyê li wateya *PKyê* dike, lê kêşe ew e ku li r-binyadê ew ditewe (wekî *li dar-ê xist*). Em qebûl dikin ku bi tenê *FDIyên* ku *ROL* li wan hatîye barkirin, dikarin rewşa rêzimanî werbigirin. Lewma eger *dar* li wateya *PKyê* têkarîyê dike ew tê wateyê ku ew beşeka *ROL-barkerê* ye, anku *ROLê* bar dike. Eger *ROLê* bar dike divê *ROLê* wernegire, eger *ROLê* wernegire divê li r-binyade netewe, anku rewşê wernegire. Eger wesa be, nexwe di *PKyên* wekî *bi dest xistinê* da çima ev kêşe derneketin? Lewra di wan da me qebûl kir ku *dest* têkarîyê li wateya *PKyê* dike û *ROL-barker* e, ji ber vê *ROLê* wernagire, ji ber ku *ROLê* wernagire jî ew li r-binyadê natewe. Lê heman rewş ji bo *PKyên* vê binkomê (*lê dan*, *lê kirin*) derbasdar nine, lewra hêmanên piştî daçekê ditewin. Dîsa di navbera *PKyên* wekî *bi dest xistin* û *lê xistinê* da cudahîyeka giring heye: Di ya yekem da *dest* hêmaneka neguher e, dema ew biguhere wateya *PKyê* ji holê radibe (wekî **bi kevir xistin*, **bi pirtûk xistin* û yd.), lê di ya duyem da hêmana navdêrî guherbar e û guhertina hêmana navdêrî li ser wateya *PKyê* bandorê çênake (wekî *li darê xist*, *li derîyê xist*, *li dîwarî xist* û yd.). Ev jî wê xurttir dike ku em bêjin


di cureya duyem da hêmana navdêrî ya piştî daçekê ne ROL-barker, lê ROL-wergirek e.

Eger ev rast be tekane rêya çareserîyê wesa xuya ye ku em *dara* di (119)an da ji k-binyadê derxin û wê wek zêdek qebûl bikin. Wê demê hem ew dikare ROLê werbigire, hem jî dikare bitewe. Dema em wê wek zêdek qebûl bikin, bivê nevê *PK* dê wek forma *li+xistê* bimîne. Di rastîyê da ev form ji alîyê zimanî ve kêşeyan jî dernaxe, lewra ev forma wê ya berîya asta bilêvkirinê ye ku wekî me diyar kiribû *PK* di ferhengê da pêk tîn, lewma jî li asteka razber in. Wesa dixuye ku çavdêrîyên jorîn û angaştê me ya ji bo pêkhatina *PK*yan a di ferhengê da hevûdin temam dikan. Eger zêdek li risteyê neyê zêdekirin û nimûneyên wekî *li darê/wê/wî xistê* çênebin, li asta forma fonetîk, *PK*ya *li xistê* forma *lê xistinê* werdigire, *PK*yên zazakî yên ku *ci, pi, tiyê* dihewînin jî van forman li forma fonetîk werdigirin. Lê ev çawa pêk tê?

Wek taybetmendîyeka kurmancî û zazakî di binyadeka zimanî da daçek bi serê xwe cih nagirin. Ew her carê hewcedarî bi hêmaneka navdêrî hene. Ji ber vê jî ev cure *PK*, dema li r-binyadê cih digirin, dikarin zêdekekê werbigirin (wekî *li wê, li darê*) yan jî dibe ku li asta forma fonetîk bi awayekî nevekirî (wekî *lê xistinê*) pêk bên. Bo nimûne ji bo risteya *Min tîr li darê xistê* em nabêjin *PK* (anku sereya *PK*yê) *li darê xistin* e, lê em dibêjin *lê xistin* e. Ji ber ku kurmancî rê nade forma *li xistinê*, cihnavêk tê pêşîya *liyê*, lê ev cihnav jî dikeve nav daçekê û li gel hevûdin forma *lêyê* pêk tînin. Ev form, forma navdêrî ya van *PK*yan jî pêkan dike, lewra ji bo navdêrîkirinê, nediyarî hewce ye. Bo nimûne wekî *sondxwarin, bidestxistin, pêxistin*, her yek ji van amaje bi rewşeka giştî ya nediyar dikan. Lewma dema hêmana navdêrî ya van *PK*yan bi awayekî vekirî pêk bê forma wan a navdêrî nabe ku bi awayê **liwêxistinê* pêk bê. Eger em bêjin *wê* temamker e û *PK* jî *lê xistin* e, nexwe forma navdêrî divê bi awayê *lêxistina-a wê* pêk bê, lê li vir *wê* amaje bi temamkera li pozîsyona *PK*yê (di nimûneyê da li *tîrî*) dike, ne bi temamkera navbera *D* û *LSyê*. *PK*ya risteya nimûne bi awayê *lêxistin-a tîrî ya li wê* (an jî *lêxistin-a tîrî ya li darê*) dibe ku bê çêkirin, lê wê demê jî, *wê/darê* ne wek temamker, zêdetir wek zêdek xuya dike. Xumamîya binyada *?lêxistin-a li darê ya tîrî* zêdektîya vê hêmanê xurttir dike. Wek encam em k-binyada van cure *PK*yan bi awayê jêrîn diyar dikan:



Ji bo zazakî jî em dikarin li nimûneya jêrîn binihêrin. Dardíagrama jêrîn k-binyada *FLya Dîlane tîre dar ro dayê* ('Dîlanê tîr li darê xist') nîşan dide ku bi *PKya pi ro dayeneyê* ('lê xistin') hatîye çêkirin.




Wekî me di destpêka vê binbeşê da got, hin ji *PKyên* vê binkomê wek bêtemamker xuya ne. Bo nimûne *lê dan PKyeka* bi vî rengî xuya ye. Wekî *Zarokan li hevalê xwe dayê*. Dibe ku di van cure *PKyan* da, di rastîyê da temamkerek hebe, lê nayê bilêvkirin. Bo nimûne *PKya lê xistinê*, wekî li jor hat nîşandan, dikare temamkerekê werbigire, lê heman *PK* dema bi wateya *lê danê* tê bikaranîn

temamkerekê wernagire. Bo nimûne *zarokan li hevalê xwe xistê*. Lewma ev riste dibe ku di rastîyê da bi awayê *Zarokan [tişteki] li hevalê xwe xist/dayê* be.


3.2.4.3.4. ROL di Pêveberên Kompleks ên *P+LSyî* da

PKyên vê komê du heb *ROLan* bar dikin. Di van *PKyan* da hêmana ne-lêkerî pirtik e. Pirtik wek hêmanên *xwedî* naverokeka semantîk xuya nekin jî cudahiya di navbera *kirin* û *ve-kirinê* zelal dike ku pirtika *ve-yê* *xwedî* naverokeka semantîk e. Temamkera van *PKyan* bi awayê *FDI* pêk tê. Hin nimûneyên van cure *PKyan* *ve-kirin* (zz. *a-kerdene*), *ve-qetandin* (zz. *a-birnayene*), *ve-gerandin* (zz. *ra-çarnayene*), *ra-xistin* (zz. *ra-fînayene*), *ro-kirin* (zz. *ro-kerdene*), *ba-dan* (zz. *ta-dayene*) e. Li jêr k-binyada *FLya Dîlanê derî vekir* (zz. *Dîlane keyber akerd*) hatîye nîşandan.



3.2.4.3.5. ROL di Pêveberên Kompleks ên *N+D+LSyî* da


Di van cure *PKyan* da pêşî *D* û *LS* dibin yek, piştî li wan *N* tê zêdekirin. Ev cure *PK* bi tenê yek *ROLê* bar dikin. Ev, *ROLa* bikerê ye. Nimûneyên van *PKyan* *dest pê kirin* (zz. *dest pê kerdene*), *dev lê kirin* (zz. *fek ci kerdene*), *dev jê berdan* (zz. *fek ci ra veradayene*), *dest jê kişandin* (zz. *dest ci ra antene*), *agir pê ketin* (zz. *adir ci kewtene*) e. Dardiagrama jêrîn k-binyada *FLya Dîlanê dest pê kirê* (zz. *Dîlane dest pê kerd*) nîşan dide. Ji ber ku di van *PKyan* da jî hêmana *Dyî* li k-binyadê bi tenê ji daçekê pêk tê, *pêya* vê *PKyê* wek *bi* hatîye nîşandan.




3.2.4.4. ROL di Pêveberên Kompleks ên Neakûzatîv da

LSyên van *PKyan* lêkerên neakûzatîv in. Ev *PK* bi tenê yek *ROLê* bar dîkin ku ew jî *ROLa* temamkerê ye. Wekî lêkerên neakûzatîv, ji ber ku *PKyên* neakûzatîv jî xwedî yek argumentê ne, ev argument li r-binyadê bi awayekî mecbûrî cih diguhêre bo pozîsyona nîşankerê ya *FDEMê*.

Me *PKyên* neakûzatîv li gor hêmana ne-lêkerê wek *PKyên R+LSyî* (wekî *nexweş ketin* (zz. *nêweş kerdene*)), *PKyên D+LSyî* (wekî *bi rê ketin* (zz. *ra raye kewtene*)), *lê ketin* (zz. *pi ro kewtene*) û *PKyên P+LSyî* (wekî *ra-ketin* (zz. *ra-kewtene*)) dabeş kiribûn. Di hemû cure *PKyên* neakûzatîv da temamker wek *FDIyek* pêk tê. Binyada frêzî ya giştî ya van *PKyan* bi awayê jêrîn e.




Nimûneyên PKyên $R+LSyî$, *nexweş ketin* (zz. *nêweş kewtene*), *sor bûn* (zz. *sûr bîyayene*), *mezin bûn* (zz. *girs bîyene*), *dereng man* (zz. *berey mendene*), *paqij/pak bûn* (zz. *pak bîyene*), *xemgîn bûn* (zz. *xemgîn bîyene*), *belav bûn* (zz. *vila bîyene*), *vala bûn* (zz. *veng bîyene*), *brîndar bûn* (zz. *dirbetin bîyene*), *xwar bûn* (zz. *çewt bîyene*) e. Li jêr k-binyada $FLya$ *Dîlan nexweş ketê* (zz. *Dîlane nêweş kewt*) hatîye nîşandan.




Hêmana daçekî ya PKyên $D+LSyî$ yê neakûzatîv, wekî ya bergindên wan ên têper bi çar awayan çêdibe: An D bi Nyekê dibe yek (wekî *bi dest ketin* (zz. *bi dest fînayene*), *bi rê ketin* (zz. *ra raye kewtene*), *bi bîr hatin* (zz. *ra vîr ameyene*), *bi ser ketin* (zz. *bi ser kewtene*) *bi dar da bûn* (zz. *dar de bîyayene*), *bi cih hatin* (zz. *bi ca ameyene*), *di xew ra çûn* (zz. *hewn a şîyayene*)), *ji hev bûn* (zz. *pê ra bîyayene*), an D û daçekeka bêjeyî dibin yek (wekî *bi pêş ketin* (zz. *a ver kewtene*), *bi paş ketin* (zz. *a pey kewtene*), *di ser ra çûn* (zz. *ser ra şîyayene*), *li ber ketin* (zz. *ci ver kewtene*)) an daçekeka bêjeyî û Nyek dibin yek (wekî *bin av bûn* (zz. *bin awe bîyayene*), *bin pê bûn* (zz. *bin lingan bîyayene*), *ser av bûn* (zz. *ser awe bîyayene*),) an $jî$ bi tenê ji Dyekê (wekî *li ketin* ('lê ketin') (zz. *c ro kewtene* ('ci ro kewtene')), *ji mayîn* ('jê mayîn') (zz. *c ra mendene* ('ci ra mendene')), *ji bûn* ('jê bûn') (zz. *c bîyayene* ('ci biyayene')), *li hatin* ('lê hatin') (zz. *c ameyene* ('ci ameyene')), *bi...ve bûn* ('pê ve bûn') (zz. *bi...a bîyayene* ('pa bîyayene')) û yd.) pêk tên. Li jêr ji bo her yek ji van cure PKyan nimûneyek hatîye nîşandan. Ji ber ku binyada frêzî ya Dya van PKyan û ya bergindên wan ên têper bi heman awayî ye, di dardîagraman da, $Dyên$ wan bi awayekî vekirî nehatine nîşandan.


(126)




(127)




(128)






Berginda *meşînê* di zazakî da wek *PKya ray şîyenyê* jî tê bikaranîn. *Ray şîyene* jî *Nya ray* ('rê') û lêkera neakûzatîv a *şîyenyê* ('çûn') pêk hatiye. Ji ber ku *LSya* wê, lêkerekî neakûzatîv e, li gor senifandina me, em divê wê wek *PKyeka* neakûzatîv biseninfîn. Lê di senifandina me ya *PKyên* neakûzatîv da cureyekî *PKyeka N+LSyî* ya neakûzatîv tune ye û hemû *PKyên N+LSyî* me wek *PKyên* têper senifandin. Bi awayekî zelal *PKya ray şîyenyê* ne têper e, lewra di demên borî da bikera wê natewe. Wekî *Ez ray şîya* ('Ez meşîyam/Ez bi rê ve çûm') / **Mi ray şî(ya)* ('*Min meşî(yam)/*Min bi rê da çû(m)'). Dîsa me gotibû ji *PKyên N+LSyî* yên ku temamkerekê binkategorîze nakin, *Nya* wan wek berkar tê şirovekirin. Li gor vê jî di *ray şîyenyê* da *ray* divê wek berkar bê şirovekirin, lewma jî ew divê wek têper bê senifandin. Ev her du encamên nakok du tiştan nîşan didin: An di senifandina me ya ji bo *PKyan* da kêmasîyek heye, yan jî di vê ev *PK* ne *PKyeka N+LSyî* be. Eger bala me kişandibe berginda wê ya di kurmancî da ne bi tenê *meşîn*, *PKya bi rê ve çûnê* ye jî. *Bi rê ve çûn* *PKyeka D+LSyî* (*bi rê ve+çûn*) ye. Ji ber ku *ray* *Nyek* e, nabe ku em *ray şîyenyê* wek *PKyeka* neakûzatîv a *R+LSyî*, yan jî yekî *P+LSyî* biseninfîn. Tekane alternatîf *D+LSyî* dimîne. Formekî *PKya* zazakî ya din *rayîr ra şîyenyê* ku *FDya* wê *rayîr+ra* (ji *Nya rayîr* ('rê') û daçekî *rayê* pêk tê) ye. Dema em vê formê û berginda wê ya *D+LSyî* ya di kurmancî da li ber çavan bigirin em dikarin bêjin di *ray şîyenyê* da *ray* esas di nav frêzekî da cih digire, lewma jî di rastîyê da ew *ray ra şîyene* ye ku ev form li hin herêman (bo nimûne herêma Sêwregê) tê bikaranîn.

Nimûneyên PKyên $P+LSyî$ yên neakûzatîv wekî *ra-ketin* (zz. *ra-kewtene*), *ve-bûn* (zz. *a-bîyeyene*), *rû-nîştin* (zz. *ro-nîştene*), *ve-nîştin* (zz. *a-nîştene*) e. Li jêr k-binyada FLya Zarok *ra-ketê* (zz. *Qeçek ra-kewt*) hatîye nîşandan.




3.2.4.5. ROL di Pêveberên Kompleks ên Tebatî da

Ji ber ku di forma tebatî da ROLa bikerê tê mêtin, bi tenê forma tebatî ya wan PKyên têper pêk tê ku xwedî temamkerekê ne. Bo nimûne PKyên bê temamker (wekî *sond xwarin*) ji ber ku xwedî temamkerekê ninin, forma wan a tebatî jî nabe ku bê çêkirin. Wekî me dît, hin cure PKyên $N+LSyî$ û hemû PKyên têper ên $R/D/P+LSyî$ wek temamker *FDIyekê* binkategorîze dîkin. *FDIya* van PKyan di forma tebatî da, li r-binyadê wekî di forma tebatî ya lêkerên sade da, cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Ji ber ku cureya temamkera van hemû PKyan heman e, li vir bi tenê em dê ji bo yek cureyê nimûne nîşan bidin.



Ji bo forma tebatî ya *PKyên* bi temamkera xwedîtîyê, li jêr k-binyada forma tebatî ya *PKya qal kirinê* (zz. *qal kerdene*) wek nimûne hatîye nîşandan.



Wekî di dardîagrama (132)yan da xuya dike, li k-binyadê lêkera alîkar a tebatîkirinê (*hatin* (zz. *ameylene*)) li pêş *PKyê* bi cih dibe, lewma jî k-binyad bi awayê *hat qala wan kirinê* (zz. *ame qalê înan kerdene*) pêk tê, lê dema *qala wan* (zz. *qalê înan*) li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*, binyad bi awayê *qala wan hat kirinê* (zz. *qalê înan ame kerdene*) pêk tê.

Di forma tebatî ya *PKyên* bi temamkera daçekî da jî, *FDya* temamker li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Ji ber ku k-binyada van *PKyan* ji ya (131)ê ya jorîn cuda nine (bi tenê cureya temamkerê cuda ye), em dê li vir dîsa nîşan nedin. Lê bi kurtasî bo nimûne k-binyada ji bo *PKya hez kirinê* (zz. *heskerdene*) dê bi awayê *ji wê hat hezkirin* (zz. *ay ra ame heskerdene*) pêk bê.

BEŞA ÇAREM


REWŞ Û LÊKERÊN KURMANCÎ Û YÊN ZAZAKÎ

Ev beş ji du binbeşan pêk tê: Di binbeşa yekem da em dê Teorîya REWŞê pêşkêş bikin. Di binbeşa duyem da em dê lêkerên (û *PKyên*) kurmancî û yên zazakî li gor hêza wan a lêbarkirina REWŞê analîz bikin.

4.1. TEORÎYA REWŞÊ

Teorîya REWŞê, hin taybetmendiyên formal ên *FDIyên* aşkere rave dike û rewşa rêzimanî ya di rêzimana nerîtî da li rêzimana hilberîner zêde dike (Haegeman, 1994, r. 155). Cureya rewşên rêzimanî yên ku me ji bo kurmancî û zazakî dabûn nasîn (*XWERÛ* û *TEWANG*), wekî me diyar kiribû li gor morfolojîya bêjeyan pêk tê. Bo nimûne eger hêmaneka navdêrî morfemek wernegirtibe, ew di rewşa *XWERÛ* da ye, lê eger yek ji morfemên *tewangê* wergirtibe di rewşa *TEWANGê* da ye. Lê Teorîya REWŞê, rewşan ne bi tenê ji aliyê morfolojîk ve, esas ji aliyê sintaktîk ve vedikole. Chomsky (1988, r. 6) diyar dike ku teorîya REWŞê, li ser lêbarkirina (assignment) *REWŞa razber* (abstract Case) û pêkhatina (realization) wê ya morfolojîk kar dike. Li jêr em dê lê binihêrin ka mebest ji REWŞa razber çi ye.

REWŞ ji aliyê sereyan ve tê barkirin. Di teorîya REWŞê da kategorîyên ku REWŞê li argumentên xwe bar dikin wek *REWŞ-barker* (CASE assigner) û yên ku REWŞê werdigirin jî wek *REWŞ-wergir* (CASE assignee) tên binavkirin. Chomsky (2015, r. 103) dibêje lêbarkirina REWŞê, di bin birêveberinê da çêdibe. Bi nimûneya jêrîn em dikarin lêbarkirina REWŞê nîşan bidin (di nimûneya jêrîn da r-binyada *FDEMê* hatiye nîşandan).




Di (1)ê da *xwendin* wek sereyek li *FDIya pirtûkê* p-fermanberîyê dike û wê bi rê ve dibe. Lewma jî *xwendin* REWŞê li *pirtûkê* bar dike. Ji alîyê din ve *DEM* li *FDIya Dilanê* m-fermanberîyê dike û wê bi rê ve dibe. Bi vî awayî *DEM*, REWŞê li *FDIya Dilanê* bar dike⁴⁹.


Ji bo kurmancî hin modelên din ên lêbarkirina REWŞê jî hatine pêşkêşkirin. Îbo (2008, rr. 36-40) di xebata xwe da, lêbarkirina REWŞê ya li biker û berkarê bi rêzê bi frêza rêkeftina bikerî (*Agr.s*) û rêkeftina berkarî (*Agr.o*)⁵⁰ rave dike. Em li nimûneya wê ya jêrîn binihêrin (di dardiyagramê da Ç'' ji bo frêza çendîker (*du hevalan*) hatîye bikaranîn):

⁴⁹ Gündoğdu (bnr. 2011, rr. 62-64) ji bo cihguherîna bikerê ya di kurmancî da du heb sedemên sintaktîk pêşkêş dike. Yek ji wan di kurmancî da hebûna modala dema bêtê ((y)ê/dê/wê) ya din girêdana cihnavê vegerok (*xwe*) e ji alîyê bikerê ve. Ji ber ku di kurmancî da hêmana dema bê piştî bikerê cih digire (wekî *Dilan dê pirtûkê bixwîne*) biker ji pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih diguhêre bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Lewra hêmana dema bê di bin *DEMê* da cih digire ku ev pozîsyon li gor pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* li jortir û pêştir e. Cardin ji bo ku biker bikaribe cihnavê vegerok girêbide divê ew li pêş wê be (wekî *Dilanê xwe dît*), ji bo vê jî biker divê cih biguhêre.

⁵⁰ *Agr.s* û *Agr.o* kurtenavên îngilîzî ne ku bi rêzê ji bo *rêkeftina bikerî* (subject agreement an jî agreement with subject) û *rêkeftina berkarî* (object agreement yan jî agreement with object) hatîye bikaranîn.




Li gor vê dardîagramê, biker (*ez*) pêşî ji pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê* û ji wir jî cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *Agr.syê*. Ev cihguherîn ji ber hewcedarîyên *PDByê* pêk tê. Dîsa biker ji rêkeftina bikerî (ji sereya wê) rewşa NOMÎNATÎV werdigire. Lêker li asta forma mantiqî bi awayekî nepenî (covert) cih diguhere bo pozîsyona rêkeftina berkarî (*Agr.o*). Ji ber vê cihguherîna lêkerê, frêza çendîker jî ji bo ku ji lêkerê rewşa AKÛZATÎV werbigire cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *Agr.oyê*. Lê li gor Îboyê ji ber ku di binyada (2)yan da rêkeftina bikerî ya li gel lêkerê bihêz û rêkeftina berkarî lawaz e, ne hewce ye cihguherîna berkarê û lêkerê bê nîşandan. Lewra ev cure cihguherîn li asta r-binyadê bi awayekî aşkere pêk nayên û bandora vê cihguherînê li ser derdanê tune ye. Ji ber vê jî dardîagrama jorîn bi awayê jêrîn ji nû ve nîşan dide:



Wekî dê bê texmînkirin di demên borî da jî hewcedarî dê bi nîşandana movika rêkeftina bikerî nemîne, lewra ev rêkeftin, di demên borî da lawaz e. Lê cudahîya vê ji ya jorîn dê ew be ku cihguherîna bikerê, dê ne ji ber hewcedarîya têkilîya sere-nîşankerê⁵¹, bi tenê ji ber hewcedarîyên *PDB*yê pêk bê. Biker dê li pozîsyona nîşankerî ya *FDEM*ê bi cih bibe. Dardîagrama heman nimûneya jorîn, dê di dema borî da weha be:

⁵¹ Îbo lêbarkirina REWŞê li gor têkilîya sere-nîşankerê rave dike. Wekî di nimûneyên jorîn da xuya dike, her yek ji biker û berkarê bi rêzê li pozîsyona nîşankerî ya frêzên *Agr.s* û *Agr.o*yê bi cih dibin û REWŞên xwe bi rêzê ji sereyên xwe (*Agr.s* û *Agr.o*) werdigirin. Di demên ne-borî da, di navbera berkar û lêkerê da rêkeftin tune ye. Li gel vê, berkar li asta k-binyadê li pozîsyona temamkerî ya lêkerê ye. Ev pozîsyon, pozîsyona nîşankerî nine, lewma jî lêker nikare di çarçoveya têkilîya sere-nîşankerê da REWŞê li berkara xwe cih biguhere. Îbo (2008, r. 101) ji bo *FLyên* têper binyadê du tebeqeyî (wek *FLya jêkvekirî* (*VP-shell*) bi nav dike) pêşniyaz dike ku bi vî rengî lêker cih diguhere bo pozîsyona vala ya sereya *Fly*a jorîn (bi *ly*a piçûk tê nîşandan, *FLya* binîn bi *Lya* mezin tê nîşandan), berkar jî cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *Fly*a jorîn. Bi vî rengî di navbera berkar û lêkerê da têkilîya sere-nîşankerê pêk tê, lewma jî lêker dikare REWŞê li berkarê bar bike. Me ji bo *FLyên* kurmancî û zazakî binyadê yek tebeqeyî pêşniyaz kiribû. Ji ber vê, em di xebatê da li ser analîza du tebeqeyî ya *FLyê* ranawestîn.

(4)



Li gor vê analîzê (bnr. Îbo, 2008, rr. 73-74) ji ber ku bikerên lêkerên têneper (û yê neakûzatîv) li gel lêkerê rêkeftî ne ew dê jî rewşa ABSOLUTÎV (di xebata me da rewşa XWERÛ) ji sereya rêkeftina bikerî werbigirin.

Me gotibû REWŞa bikerê *DEM* li wê bar dike. Xuyakirina forma morfolojîk a rewşa bikerê li gor taybetmendiyên *DEM*ê diyar dibe. Wextê *DEM* xwedî taybetmendiyên *[+rêkeftin, ±borî]*yê be, rewşa bikerê XWERÛ, wextê xwedî taybetmendiyên *[-rêkeftin, +borî]*yê be rewşa bikerê TEWANG e. Wekî xuya dike li ser cureya forma morfolojîk a REWŞa bikerê, wekî Îbo jî nîşan dide, bandora taybetmendîya *[±rêkeftin]*ê diyarker e. Li gel vê, wekî em dê bibînin ji aliyê sîntaktîk ve cudahiya forma morfolojîk a rewşê ne giring e. Ew her rewşa bikerê (yan jî ya berkarê) ye. Ji ber vê em dê frêzên rêkeftinê nexin nav binyadên risteyan û em dê qebûl bikin ku REWŞa bikerê ji aliyê *DEM*ê ve tê barkirin. Heman tişt ji bo REWŞa berkara rasterast jî derbasdar e ku ji aliyê lêkerê ve tê barkirin.

4.1.1. REWŞa Razber û Rewşa Morfolojîk

REWŞ, ji aliyê kodkirinê ve du cure ne: REWŞên ku hem mimkin e bi morfeman hem jî mimkin e bêyî morfeman bên kodkirin wek *REWŞên razber* (Uzun, 2000, r. 191), REWŞên ku her carê bi hin morfemên diyar ve tên kodkirin jî wek *rewşên*

morfolojîk (morphological case)⁵² tên binavkirin (Arı Özdemir, 2020, r. 87). Nexwe eger rewşa *FDI*yekê bêyî morfemeka diyar hatibe kodkirin ew teqez xwedî REWŞa razber e, lê berevajî vê ne rast e. Anku *FDI*yeka ku rewşa wê bi morfemekê hatibe kodkirin, dibe ku xwedî REWŞa razber an jî ya morfolojîk be. Carnie (2013, r. 337) dibêje esas hemû *FDI* xwedî REWŞ in, lê bi tenê em wan bi morfolojîyeka diyar bi awayekî aşkere nabînin, ev cure REWŞ, razber in. Di vî warî da Chomsky jî diyar dike ku di hin zimanan da (wekî sanskrîtî, latînî, rûsî) rewş bi awayekî morfolojîk pêk tê, di hin zimanan da kêr (wekî îngilîzî, fransî) xuya dike yan jî di hin zimanan da qet (wekî çînî) xuya nake, lê REWŞ her carê bi awayekî razber pêk tê (2015, r. 101). Heta dibe ku di navbera zaravayên zimanekî da jî ji vî alîyê ve cudahî hebin. Bo nimûne wekî Gündoğdu (2022) nîşan dide li gel ku di hin zaravayên kurdî da (heta di nav devokên heman zaravayî da) hin rewş bi awayekî morfolojîk tên kodkirin, di hinekê din da kodkirina morfolojîk a rewşê tune ye. Li gor ku di Sigurðssonî (2003, r. 224) da cih digire, hin xebatên tîpolojîk (typological) nîşan didin ku dora 45%î zimanên dinyayê bêrewş (caseless) in, dora 50%î dibe ku xwedî rewş bin û ên mayîn jî rewş-lawaz (case-poor) in. Lewma wekî Haegeman (1994, rr. 177-178) jî diyar dike pêkhatina REWŞa razber a morfolojîk li gor zimanan dibe ku guherbar be. Ji ber vê, dema em dibêjin REWŞa razber mimkin e bi morfem an jî bêyî morfeman bê kodkirin, ew nayê wê wateyê divê di her zimanî da REWŞa razber di heman demê da wek alternatîf hem bi morfem hem jî bêyî morfem bê kodkirin. Di hin zimanan da dibe ku bi tenê bêyî morfem jî bê kodkirin.

(5) a. *Azad-î Dîlan-Ø dît*

b. *Azad-Ø Dîlan-ê dibîne*

Di (5a)yê da *Azad* bi gireya tewangê (-î) hatiye kodkirin, *Dîlan* bêyî gire ye. Di (5b)yê da *Azad* bêyî gire ye, *Dîlan* bi gireya tewangê (-ê) hatiye kodkirin. Hem di (5a)yê hem jî di (5b)yê da *Azad* heman peywira bikertîyê bi cih tîne, bi heman awayî *Dîlan* di her du risteyan da jî peywira berkertîyê bi cih tîne. Diyar dibe ku peywira wan ji forma wan a morfolojîk azad e. Di vê çarçoveyê da Gündoğdu (2011, r. 76) ji bo kurmancî dibêje rewşa ERGATÎV a bikeran (di demên borî da rewşa bikerên risteyên

⁵² Di lîteraturê da REWŞa razber ji bo ku ji rewşa morfolojîk bê cudakirin an tîpa wê ya yekem an jî hemû tîpên wê girdek tên nivîsandin. Di vê xebatê da em hemû tîpên wê girdek dinivîsin.

têper) û rewşa NOMÎNATÎV a bikeran (di demên ne-borî da rewşa bikerên risteyên têper) ji alîyê sîntaktîk ve heman rewş e, lê pêkhatina wan a morfolojîk cuda ye. Wekî Haig jî nîşan dide, di hin rewşan da dema biker û berkar, bi têgeha wî, *FNyên kompleks* (complex NPs) bin, wê demê cudahiya rewşa rêzimanî ji holê radike (1998, r. 156). Di vê rewşê da berevajî (5)an, yek ji wan jî bi awayekî morfolojîk xwedî rewşa TEWANGê (ji bo bikerê rewşa ERGATÎV) nine. Lê ev rewş bi awayekî razber li wan tê barkirin.

- (6) a. *[_{FN} Birayê min]-Θ [_{FN} pirtûka sor]-TWNG dixwîne*
 b. *[_{FN} Birayê min]-TWNG [_{FN} pirtûka sor]-Θ xwend*

Nexwe diyar dibe ku hem di (5) hem jî di (6)an da *FDI* rewşên xwe ne bi morfemên diyar, lê bi awayekî razber werdigirin. Ji ber ku di kurmancî da mimkin e rewşa ERGATÎV/TEWANGê hem bi morfemên diyar hem jî bêyî morfemeka diyar pêk bê, em dibêjin di kurmancî da rewşa ERGATÎV (û ya TEWANGê) rewşeka razber e, ne morfolojîk e. Em dikarin REWŞa razber bi nimûneyên ji zazakî bi awayekî zelaltir rave bikin.

- (7) a. *Ma-XWR kitab-î wanenê / krm. Em pirtûk-ê dixwînin*
 b. *Ma-TWNG kitab wend / krm. Me pirtûk xwend*

Di zazakî da forma xwerû û ya tewandî ya cihnava kesê sêyem ê pirjimar bi heman awayî ye ku wekî di nimûneyan da xuya dike *ma* ye (forma xwerû û ya tewandî ya cihnava kesê duyem ê pirjimar jî heman e: *şima* ('hûn/we')). Lê di (7a)yê da rewşa *mayê* XWERÛ di ya (7b)yê da TEWANG e. Her du ji alîyê forma morfolojîk ve bi heman awayî ne. Ji ber vê, REWŞa wan razber e. Wekî em dê li jêr bibin em angaşt dikin ku di kurmancî û zazakî da rewşên morfolojîk tune ne. Lê ji bo mijar zelal bibe em dikarin nimûneyekê ji zimanê tirkî nîşan bidin:

- (8) a. *Azad ev-e gidiyor / krm. Azad diçe mal-ê*
 b. *Azad ev-e gitti / krm. Azad çû mal-ê*
 c. **Azad ev-Θ gidiyor/gitti / krm. *Azad çû/diçe mal-Θ*

Di tirkî da ji dema risteyê azade, rewşa BERPÊBÛNÎ/DATÎVÎ her carê bi morfemeka diyar (di nimûneyên (8a, b)yê da -eya li ser evê ('mal')) tê kodkirin. Lewra

dema ev neyê kodkirin wekî di (8c)yê da xuya dibe, binyad nerêzimanî ye. Ji ber vê, di vî zimanî da rewşa BERPÊBÛNÎ, rewşeka morfolojîk e.

4.1.1.1. REWŞa Razber di Kurmancî û Zazakî da

Wekî me got em angaşt dikin di kurmancî û zazakî da rewşên morfolojîk tune ne. Lê Îbo (2008, r. 103) dibêje di kurmancî (devoka behdînî) da rewşa ERGATÎV (an jî TEWANGê (di xebata wê da *TIYAN*)), ne rewşeka razber, rewşeka morfolojîk e. Li gor wê, rewşa ERGATÎV di demên borî da, li ser bikerê her carê bi hin nîşanên morfolojîk ên diyar tê kodkirin ku bi gireyên tewangê pêk tê. Ev, dema bikera risteyê ne *FDI/FNyên* kompleks be rast e. Lê wekî me bi nimûneyên jorîn (*[_{FN} Birayê min]-TWNG [_{FN} pirtûka sor]-Ø xwend*) nîşan da REWŞa ERGATÎV dibe ku bi awayekî razber jî pêk bê. Esas Îbo (2008, r. 150) bixwe jî diyar dike û dibêje frêzên îzafeyî (di nimûneyên jorîn da bergindên *FNyên* kompleks in) rewşa xwe bi awayekî razber werdigirin. Bo nimûne ew jî bo risteya *Cîrana te ez gehandimê* dibêje frêza *cîrana teyê* rewşa ERGATÎV bi awayekî razber werdigire. Sedema vê jî li gor wê ew e ku îzafe, li ber lêbarkirina rewşê (ya morfolojîk) dibe asteng. Ji ber vê, rewşa ERGATÎV bi awayekî razber li hemû frêzê tê barkirin. Lê me îzafe wek sereyeka kargînî qebûl kir û li gor analîzên me ew li ber birêvebirinê nabe asteng. Lewra eger îzafe li ber birêvebirinê asteng bûya, wê viyabû nehişt da frêza *xwendin-a pirtûkanê* da *xwendin* ROLê li *FDIya pirtûkanê* bar bikira, lê ev binyad rêzimanî ye, lewma jî em qebûl dikin îzafe li ber birêvebirinê nabe asteng. Wek encam her çî be jî, eger çêdibe rewşa ERGATÎV bi awayekî razber jî bê barkirin, ew tê wê wateyê ku ew REWŞeka razber e, ne ku morfolojîk e, ku me ev jî bo zazakî jî bi cihna *mayê* ('me/em') û *şimayê* ('hûn/we') nîşan dabû. Ev jî nîşan dide ku wergirtina REWŞa ERGATÎV ya bi awayekî razber her carê têkildar nine bi hebûna frêzeka îzafeyî.

Vê, em dikarin di *FDyan* da jî bibînin. Tan (2015, r. 198) jî bo kurmancî dibêje "taybetîyeke daçekan ev e ku peyvên piştî xwe ditewînin". Ev taybetmendîyeka giştî ya daçekan e ku me berê jî diyar kiribû. Heman tişt jî bo zazakî jî derbasdar e, lewma yek dikare rewşa ku hêmanên navdêrî piştî daçekê werdigirin wek rewşa morfolojîk bifikire. Bo nimûne dema *FDIyek* piştî daçekê netewe nerêzimanî pêk tê. Di (9a) û (9b)yê da, dema risteyê biguhere jî *pirtûka* (zz. *kitab*) ku di (9a)yê da peywira berkara nerasterast bi cih tîne, di (9b)yê jî ber ku netewiyaye (anku rewş wernegirtiye) binyad nerêzimanî ye.

- (9) a. *Dîlan-ê li pirtûk-ê nihêrî* / zz. *Dîlane-Θ kitab-î ra ewnîya*
 b. **Dîlan-Θ li pirtûk-Θ dinihêre* / zz. **Dîlane-Θ kitab-Θ ra ewnena*

Li gel vê, ev her carê pêk nayê. Bo nimûne wekî Yonat û Aslanoğlu jî diyar dikin di kurmançî da cihavên vegerok (*xwe*) û şirikî (di xebata wan da *hevbeşî*) (*hev(du)*) bi tenê *xwedî* formekê ne (2023, r. 18). Ne bi tenê ev cihnav, forma *çi-bêjeyan* (wh-word)⁵³ jî ne li pozîsyona berkarî ne jî dema piştî daçekan cih digirin, diguhere. Anku ew natewin. Dema bên tewandin, wekî di nimûneyên nerêzimanî yên (10)an da tê dîtin, dibin sedema nerêzimanîyê.

- (10) a. *Em xwe-Θ dibinin* / **Em xwe-yê/yan dibinin*
 b. *Em hev-Θ dibînin* / **Em hev-an dibînin*
 c. *Em çi dibînin?* / **Em çi-yê/yî dibînin?*
- (11) a. *Em li xwe-Θ dinihêrin*
 b. *Em li hev-Θ dinihêrin*
 c. *Em li çi-Θ dinihêrin?*

Di nimûneyên jorîn ên rêzimanî da em nikarin bêjin *xwe*, *hev* û *çi* bêyî REWŞ in, lewra dema em li şûna wan cihnavên kesane bi cih bikin, diyar dibe ku ew *xwedî* REWŞ in.

- (12) a. *Em wî dibinin*
 b. *Em wan dibînin.*
- (13) a. *Em li wî dinihêrin*
 b. *Em li wan dinihêrin*

Heman tişt ji bo zazakî jî derbasdar e. Bo nimûne di risteya jêrîn da, *xoya* ('*xwe*') cihnava vegerok li gel ku li pozîsyona temamkerî ya *FDyekê* cih digire, lê gireya tewangê nestandîye.

⁵³ Di îngilîzî da bêjeyên ku dikevin şûna navdêran an jî hêmanên din û wan dipirsin wek *çi-bêje* tên zanîn (wekî *who* ('*kî/kê*'), *where* ('*ku/ li ku/ku der*'), *when* ('*kengî*'), *which* ('*kîjan*'), *how* ('*çawa*') û yd.) ku ev cure bêje di binyada frêzî da bi navê *çi-frêzê* (wh-phrase) cih digirin. Di kurmançî da ev cure bêje bi tîpa *ç* yan jî *kyê* dest pê dikin; wekî *çi*, *çend*, *çima*, *çawa*, *kî/kê*, *kîjan*, *kengî* û yd. di vê xebatê da ji bo *why*a îngilîzî *çi* hatîye tercîhkirin.

(14) Dîlane **xo- Θ ra** ewnîya / krm. *Dîlanê li xwe nihêrî*

Nexwe em nikarin bêjin di kurmancî û zazakî da her hêmana ku piştî daçekan cih digire, bi awayekî morfolojîk tê kodkirin. Pozîsyoneka din a ku di kurmancî û zazakî da REWŞ lê tê barkirin, piştî lêkerê ye. Bo nimûne di kurmancî da li vê pozîsyonê dema *FDI* cih digirin, ew ditewin, lê dema cihnavên *xwe*, *hev*, *çiyê* cih digirin ew dîsa gireya tewangê nastînin.

(15) a. *Me diyarî dan heval-an*

b. *Me diyarî dan hev- Θ*

c. *Tu diçî mal-ê?*

d. *Tu diçî ku- Θ ?*

e. *Te rahişt pirtûk-ê?*

f. *Te rahişt çî- Θ ?*

Di zazakî da jî dîsa cihnava *xoyê* piştî lêkerê gireya tewangê nastîne. Bo nimûne *Lajek-î diyarî da-(y)î xo- Θ* (krm. *lawik-î diyarî da-n xwe- Θ*)

Wekî daçekan, îzafe jî *FDI*yên ku piştî *xwe* cih digirin ditewîne, lê heman cihnavên *xwe*, *hev*, *çiyê* li vê pozîsyonê jî natewin.

(16) a. *a keçîk-ê/te/ zz. a keyneke-TWNG/to*

b. *a xwe- Θ /hev- Θ /çî- Θ / zz. a xo- Θ /a çî- Θ*

Wekî xuya dike têkilîya morfolojî û rewşên rêzimanî hebe jî ev têkilî her carê ne teqez e. Wekî hat gotin pêkhatina morfolojîk a rewşan di navbera zimanan da dibe ku guherbar be. Di vê mijarê da Cook û Newson dibêjin rewş her carê ji binyada rûser nayê fêmkirin, di îngilîzî da bi tenê di forma cihnavan da xuya dike, lê di zimanên wekî latînî û finî (Finnish) da li ser navdêran xuya dike (2007, r. 75). Tirkî jî yek ji wan zimanan e ku rewşên navdêrên di risteyê da, gelek caran bi morfemeka diyar tên kodkirin. Lê çavdêrîyên jorîn nîşan didin ku di kurmancî û zazakî da, têkilîya rewş û morfolojîyê her carê ne teqez e. Bi kurtasî di kurmancî û zazakî da li heman pozîsyonê hêmanên navdêrî hem mimkin e bi awayekî morfolojîk bîr kodkirin hem jî ew dikarin bêyî nîşaneka rewşê di risteyê da cih bigirin. Nexwe em dikarin bêjin di kurmancî û

zazakî da her cure rewşa rêzimanî bi awayekî razber tê barkirin û di kurmancî û zazakî da rewşên morfolojîk tune ne.

Ji alîyê din ve li gor têkilîya wan a bi ROLê ve REWŞ du cure ne: *REWŞa binyadî* (structural Case) û *REWŞa hundirîn* (inherent CASE).

4.1.2. REWŞa Binyadî û REWŞa Hundirîn

Hin cure REWŞ ji ber ku ROL li wan hatîye barkirin li *FDIyan* tên barkirin. Hin cure REWŞ jî hene ku, ne ji ber ROLê, ji ber pozîsyona sîntaktîk a wan li *FDIyan* tên barkirin.

(17) a. *Dîlan pirtûk-ê dixwîne* / zz. *Dîlane kitab-î wanena*

b. *Pirtûk-Θ tê xwendin* / zz. *Kitab-Θ yeno wendene*

Di (17a)yê da *pirtûkê* (zz. *kitab*) wek berkar ROLa MIJARê wergirtiye. Ev ROL ji alîyê lêkerê ve li wê hatîye barkirin. Ji alîyê din ve heman lêkerê, REWŞ jî li wê bar kiriye. Anku her du ROL û REWŞ ji alîyê heman sereyê ve li wê hatine barkirin. (17b), forma tebatî ya (17a)yê ye. Wekî tê dîtîn di (17b)yê da *pirtûkê* cih guherîye bo pozîsyona bikerî ya risteyê û REWŞa wê ji ya pêşîn cuda ye (li pozîsyona yekem rewşa wê TEWANG, li ya duyem rewşa wê XWERÛ ye). Lê di (17b)yê da li gel ku *pirtûk* bikera risteya tebatî ye, ew berkara mantiqî ya lêkera *xwendinê* (zz. *wendene*) ye û ROLa wê hêj MIJAR e. Eger *pirtûkê* REWŞa xwe ji ber ROLa xwe werbigirta, REWŞa wê viyabû piştî cihguherînê neguherîya. Lê wekî tê dîtîn dema *pirtûk* di binyada frêzî da pozîsyona xwe ya sîntaktîk diguhere, REWŞa wê jî diguhere. Nexwe *pirtûk* REWŞa xwe ji ber pozîsyona xwe ya sîntaktîk werdigire. Ji vî alîyê ve têkilîya ROLa *pirtûkê* û REWŞa ku werdigire, tune ye. Wekî me berê nîşan dabû *FDIya* bikerî jixwe piştî cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*, li wir REWŞê werdigire. Lewma biker jî REWŞa xwe ji ber pozîsyona xwe ya sîntaktîk werdigire. REWŞa ku têkildar e bi ROLê, em dikarin bi nimûneyên jêrîn ên ji zimanê tirkî rave bikin:

(18) a. *Dîlan kitab-a baktı* 'Dîlanê li pirtûkê nihêrt'

b. *Kitab-a bakıldı* 'Li pirtûkê hat nihêrîn'

Di her du risteyên (18)an da jî *kitab* ('pirtûk'), ROLa wê HEDEF e û rewşa wê jî BERPÊBÛNÎ ye ku bi *-ayê* hatîye kodkirin. Li gel ku li gor (18a)yê di (18b)yê da *kitabê* cih guherîye, lê rewşa wê wek xwe maye. Ji vî alîyê ve têkilîya ROL û REWŞA

wê teqez e. Chomsky REWŞa ku têkilîya wê bi ROLê tune ye (yan jî ne teqez e) wek *REWŞa binyadî*, ya ku têkildar e bi ROLê ve wek *REWŞa hundirîn* bi nav dike (1988, r. 171). Sereyek eger ROLê li *FDIyekê* bar bike, dikare REWŞa hundirîn li wê bar bike, lê ji bo REWŞa binyadî hewcedarîyeka tematîk a bi vî rengî tune ye (Chomsky, 2015, r. 104). Em dikarin weha jî bêjin; REWŞa hundirîn bi ROLê ve zeliqandî ye, lê ya binyadî ne zeliqandî ye. Chomsky dibêje REWŞên hundirîn, li k-binyadê, REWŞên binyadî li r-binyadê tên barkirin (1988, r. 292). Sedema vê jî em dikarin bêjin ew e ku cihguherîna *FDIyan* ne li asta k-binyadê, li asta r-binyadê pêk tê. Ji ber vê jî eger REWŞa *FDIyekê* piştî guherîna pozîsyonê biguhere, wê demê diyar dibe ku ev REWŞ li r-binyadê tê barkirin.

4.1.2.1. REWŞa Binyadî û REWŞa Hundirîn di Kurmancî û Zazakî da

Li gor nîqaşên jorîn em dikarin bêjin di kurmancî û zazakî da REWŞên ku biker û berkar werdigirin, REWŞên binyadî ne. Chomsky (1988, r. 170) di îngilîzî da REWŞa ku pêşdaçek bar dike jî wek REWŞa binyadî disenifîne. Lê li gor ku Chomsky (1988, rr. 292-293) nîşan dide, sedema wê ew e ku di îngilîzî da temamkera pêşdaçekê dikare ji nav *FDyê* derkeve û cih biguhere bo pozîsyoneka din a risteyê. Bo nimûne em li nimûneyeka ji Chomskyî binihêrin:

(19) *who did John speak to?* 'Johnî bi kê ra xeber da?'

Di nimûneya (19)an da *whoyê* ji piştî pêşdaçeka *toyê* cih guherîye bo pozîsyona serê risteyê. Lewma li k-binyadê ev riste xwedî forma *did John speak to whoyê* ye. Ji ber vê jî *who* dikare li pozîsyona xwe ya li r-binyadê REWŞeka cuda werbigire. Lê di kurmancî û zazakî da *FDI* nikare daçeka xwe biterikîne. Ji ber vê jî binyadeka wekî ya (19)an di kurmancî û zazakî da pêk nayê. Bo nimûne li jêr *pirtûkê* (zz. *kitab*) li gel daçeka *liyê* (zz. *ra*) cih guherîye.

(20) a. *Dîlanê li pirtûk-ê nihêrî* / zz. *Dîlane kitab-î ra ewnîya*

b. *Li pirtûk-ê hat nihêrîn* / zz. *Kitab-î ra ame ewnîyayene*

Jixwe Chomsky jî REWŞa ku ji aliyê pêşdaçekan ve tê barkirin wek hundirîn kategorîze dike, lê ew dibêje ji ber ku îngilîzîyê REWŞa xwe ya hundirîn winda kiriye, REWŞa ku pêşdaçek bar dikin ne REWŞa TEWANGê ya hundirîn e, lê wekî lêker dikin, ew jî REWŞa BERKARÎ (OBJECTIVE) ya binyadî bar dikin. Zimanên wekî îtalî, fransî û zimanên ku rê nadin terikandina pêşdaçekê, pêşdaçekên wan REWŞa

TEWANGê (ku REWŞeka hundirîn e) bar dîkin (1988, rr. 292-293). Wekî me nîşan da kurmancî û zazakî jî rê nade terikandina pêşdaçekê. Ji ber vê, REWŞa temamkera daçekê di kurmancî û zazakî da jî hundirîn e. Lê Îbo (2008, rr. 130-131) jî bo kurmancî dibêje REWŞa ku pêşdaçek (di xebata wê da *bernav*) li temamkera xwe bar dike, REWŞeka binyadî ye. Dîsa ew dibêje pêşdaçek ROLên cuda cuda derdibirin û diyar dike ku "Kar [lêker] bi rêya bernavê ... ROLê watayîyê ... dibexşîte tewawkerê [temamker] bernavî".

Wesa xuya dike ku, li gor Îboyê, ROL ji aliyê lêkerê ve, REWŞ jî ji aliyê pêşdaçekê ve li temamkera pêşdaçekê tê barkirin⁵⁴. Eger weha be, di cih da ye ku Îbo REWŞa temamkera pêşdaçekê wek REWŞa binyadî diyar bike. Lewra sereya ku ROLê û ya ku REWŞê bar dike, cuda ne. Lê bi awayekî balkêş ew (Îbo, 2008, r. 141) diyar dike ku di bazinedaçekan da bandora paşdaçekê (di xebata wê da *paşbend*) li ser ROLê heye. Sedema vê bi van nimûneyan rave dike:

(21) a. *Wan ji me pare wergirtin*

b. *Wan ji me ra pare wergirtin*

Li gor wê, di (21b)yê da, li gor (21a)yê, di ROLa *meyê* da guherînek pêk tê ku sedema vê guherînê di risteyê da hebûna paşdaçeka *rayê* (di (21a)yê da ROLa *meyê* JÊDER di (21b)yê da HEDEF/ARMANC e). Ji ber vê bandora paşdaçekê ya li ser ROLê, ew dibêje paşdaçek REWŞa hundirîn (di nimûneyê da WERGIR (DATIVE)) li temamkerê bar dike. Lê dîsa dibêje pêşdaçeka *jiyê* li heman temamkerê (*me*) REWŞa binyadî bar dike. Ew, vê lêbarkirina du REWŞên cuda ya li heman hêmanê, bi diyardeya *lêbarkirina REWŞa Lêkdayî* (Compound Case Marking) rave dike.

Wekî me berê jî nîşan dabû, em qebûl dîkin ku ROLa temamkera (pêş)daçekan ne bi tenê ji aliyê lêkerê ve, ji aliyê tîkelîya (pêş)daçek+lêkerê ve tê diyarkirin û ji aliyê daçekê ve tê barkirin. Lewma jî bandora pêşdaçekê li ser diyarkirina ROLê heye. Dîsa em bazinedaçekan wek daçekên serbixwe qebûl dîkin ku ji pêşdaçek û paşdaçekekê pêk hatine. Bo nimûne bazindaçeka *ji...rayê*, ne ku bi lêzêdekirina paşdaçeka *rayê* ya li pêşdaçeka serbixwe ya *jiyê* pêk tê. Ew daçekeka serbixwe ye û

⁵⁴ Îbo, di xebateka xwe ya din da, ku piştî vê xebatê hatiye weşandin, diyar dike ku lêker nikare ROLê li temamkera pêşdaçekê bar bike, pêşdaçek ROLê li temamkera xwe bar dike. Lewra pêşdaçek li ber lêbarkirina ROLê ya ji aliyê lêkerê ve dibe asteng (bnr. Elî, 2021, r. 85).

têkilîya wê û jiya serbixwe tune ye. Ji ber vê, ROLa ku li temamkera *ji...rayê* tê barkirin, ji aliyê têkarîya *ji...ra+lêkerê* ve tê diyarkirin. Wek encam çi pêşdaçek be çi bazinedaçek be ji ber ku bandora wan li ser ROLa temamkera xwe heye em REWŞa temamkera wan wek REWŞeka hundirîn qebûl bikin.

Me li jor dît, di kurmancî û zazakî da, di du pozîsyonên din da (piştî îzafeyê û piştî lêkerê) jî REWŞ tê barkirin. Li jêr em dê vekolin ka cureya REWŞa di van pozîsyonan da, ji ya binyadî û ya hundirîn kîjan e.



Ji bo kurmancî Bedirxan û Lescot (2018, r. 305) dibêjin berkarên nerasterast ên lêkerên ku wateya aliyekî, berpêbûnekê di hewînî (wekî *danê*), dema piştî lêkeran cih digirin bêtir daçekan jî dikevin rewşa nerasterast (anku ditewin). Bo nimûne *Axê tîfîngêk da şivên*. Di vê risteyê da *şivên* berkara nerasterast e û tewiyaye. Baran (2018, rr. 209-210) jî di heman çarçoveyê da dibêje di kurmancî da, têrker bi piranî bi alîkarîya daçekan tên çêkirin (wekî *li çi, ji kê, di çi da*). Lê dema di risteyê da lêkerên berpêbûnî (wekî *çûn, rahiştin*) hebin bêtir bikaranîna daçekan jî têrker çêdibin. Bo nimûne *Zîlan çû mal-ê*. Di vê risteyê da *mal* têrker e. Di nimûneya Bedirxan û Lescotî da jî, di ya Baranî da jî hêmanên tewandî yên piştî lêkeran ji aliyê morfolojîk ve di rewşa TEWANGê da ne û wek *FDI* pêk hatine. Ji bo lêkerên sê argumentî yên zazakî jî Arslan (2016, r. 77) bi heman awayê kurmancî, argumenta piştî lêkerê di rewşa TEWANGê da û wek *FDI* nîşan dide. Bo nimûne *Wair-i astîk-i da-Ø-y kutîk-i* (krm *Xwedî-(y)î (yê wî) hestî da-n kûçîk-î*). Di vê nimûneya Arslanî da, *kutîk* ('kûçîk') wek argumenta HEDEFî ya lêkera *dayeneyê* ('dan') pêk hatîye ku wek kategori jî *FDI* ye.

Lê gelo ev rewşa TEWANGê ya argumenta piştî lêkerê ji aliyê lêkerê ve li wê tê barkirin an ji aliyê hêmaneka din ve? Ji bo diyarkirina vê, em divê diyar bikin ka ew REWŞeka binyadî ye yan REWŞeka hundirîn e. Eger ew REWŞeka binyadî be, tekilîya wê û ROLê divê tune be, eger REWŞeka hundirîn be ew divê têkildar be bi ROLê ve.


(22) *Dîlanê pirtûk da keçîk-ê / zz. Dîlane kitab da keyneke-TWNG*

Di (22)an da *keçîk* (zz. *keyneke*) xwedî rewşa TEWANGê ye, lewra di nimûneya kurmancî da bi *-êyê* hatîye kodkirin, di zazakî da gireya tewangê li ser wê tune ye, lê jixwe di zazakî da rewşa TEWANGê ya ji bo navdêrên mêza, bêtir gireyê pêk tê. ROLa *keçîkê* jî HEDEF/WERGIR e. ROL li her asta sîntaktîk tên parastin. Ji ber vê, dema


em pozîsyona *keçikê* biguherînin, eger REWŞa wê biguhere wê demê dê diyar be ku REWŞa *keçikê* binyadî ye, eger neguhere nexwe ew REWŞeka hundirîn e û ji ber ROLa xwe vê REWŞê werdigire. Ji bo diyarkirina vê, pêşî em dikarin li binyada frêzî ya *FLya* (22)an binihêrin. Wekî me di *Beşa Sêyem* da nîşan dabû lêkerên kurmancî û yê zazakî yê sê-ROLî xwedî k-binyada jêrîn a (23)an bûn. Me hêmana HEDEFî wek *FD* diyar kiribû, lê ji bo nîqaşa li vê derê em dê li jêr wê wek *FDI* (*DI'*) nîşan bidin. (24), r-binyada (23)an nîşan dide. Di (24)an da *FTEM* nehatîye nîşandan.



Di (24)an da *keçik* cih naguhere, lewma ji bo ku em fêm bikin REWŞa *keçikê* binyadî ye yan hundirîn e, em dikarin li forma tebatî ya risteyê binihêrin. Dardiagrama jêrîn k-binyada forma tebatî ya (22)yan nîşan dide.



Li asta r-binyada (25)an *pirtûk* (zz. *kitab*) dê cih biguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *DEM''*ê, lê *keçik* jî divê cih biguhere, heke na binyadeka bi awayê **Pirtûk hat dayîn keçikê* / zz. **Kitab ame dayene keynekeyê* dê pêk bê ku nerêzimanî ye. *Keçik* divê cih biguhere bo pozîsyoneka berîya lêkerê. Di (25)an da pozîsyoneka vala ya ku *keçik* bikaribe cih biguhere, pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* ye, lê pozîsyona nîşankerî ya *FLyê*, pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê nine (Cook & Newson, 2007, r. 160). Lewma eger *keçik* cih biguhere bo wê derê û eger REWŞa wê ya piştî lêkerê hundirîn be, dê li vê pozîsyona nû REWŞê jixwe wernegire. Eger REWŞa wê binyadî be ji ber ku pozîsyona *[nîş, FL]yê* pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê nine, ew dê bêtir REWŞ bimîne, lewma jî nerêzimanî dê pêk be. Ji bo ku em pozîsyoneka çetir bibînin em dikarin *keçikê* li pozîsyona xwişkî ya *FLyê* bi cih bikin, wê demê r-binyada jêrîn dê pêk bê.



Di (26)an da jî kêşeyeka din derdikeve; lêker nikare *keçikê* bi rê ve bibe, lewra nikare li wê p-fermanberîyê (yan jî m-fermanberîyê) bike, lewma nikare REWŞê jî li wê bar bike. Jixwe wekî em dê li jêr bibînin, lêker dikarin bi tenê yek REWŞa binyadî bar bikin ku vê REWŞê di forma tebatî da winda dikin. Li gel vê, di vê nimûneyê da eger lêker bikaribe REWŞê bar bike jî REWŞa *keçikê* çî bi gireya tewangê çî bêyî vê gireyê pêk bê, binyadên ku pêk bîn dê bi rêzê bi awayê **Pirtûk keçik-ê hat dayîn/*Pirtûk keçik-Θ hat dayîn* (zz. **Kitab keyneke-Θ ame dayeneyê*) pêk bîn ku di kurmancî û zazakî da binyadên nerêzimanî ne (helbet em dikarin *keçikê* li serê risteyê jî bi cih bikin ku wê demê binyad dê bi awayê **Keçik-ê/keçik-Θ pirtûk hat dayîn / zz. *Keyneke-Θ kitab ame dayene* pêk bê ku ev jî nerêzimanî ye). Tekane rêya ku *keçik* bikaribe li pozîsyoneka berîya lêkerê cih bigire ew e ku, ew wek temankereka daçeka biyê (zz. *bi*) bê bicihkirin ku wê demê binyada rêzimanî ya *Pirtûk bi keçik-ê hat dayînê* (zz. *Kitab bi keyneke-Θ ame dayene*) pêk tê. Nexwe ev pêşdaçek ji ku tê? Eger hêmana ku li k-binyadê ROLa HEDEFê û REWŞê li *keçikê* bar dike lêker bixwe be, li pozîsyona cihguherî jî ev REWŞ divê bê parastin û hewcedarî bi pêşdaçekê tune be,

lê wekî me got lêkerên tebatî nikarin REWŞê bar bikin. Di kurmancî û zazakî da, di risteyên cuda da ROLa HEDEFê li pozîsyona pêşîya lêkerê ji alîyê têkarîya *daçek+lêkerê* ve tê barkirin. Wekî *Dîlanê li pirtûkê-nihêrî* (zz. *Dîlane kitab-î ra ewnîya*), ku di vê risteyê da *pirtûk* (zz. *kitab*) xwedî ROLa HEDEFê ye û ev ROL bi têkarîya *li+nihêrînê* (zz. *ra+ewnîyayene*) hatiye diyarkirin. Nexwe ji bo nimûneya me ya jorîn tekane rê wesa dixuye ku em bêjin hêmanên navdêrî yên ku piştî lêkerên sê-ROLî xuya dikin (zêdek jî bi heman awayî), di bingeha xwe da li pozîyona temamkerî ya daçekê cih digirin. Lewra REWŞa *keçikê* bi ROLê ve têkidar xuya ye. Lewma jî forma risteya jorîn a (22)yan em wek a jêrîn pêşniyaz dikin:

(27) *Dîlanê pirtûk da bi keçikê-ê / zz. Dîlane kitab da bi keyneke-TWNG*

Ji alîyê din ve Elî (2017, r. 217) ji bo kurmancî (devoka behdînî) di nimûneya *Narîne govar da vi Nesrîne da vi Nesrîneyê* wek temamkerekê *FDyî* ya lêkera *danê* dide nasîn ku sereya wê pêşdaçeka *viyê* ye. Li gel vê, hebûna pêşdaçekê berîya hêmanên navdêrî yên piştî lêkerên kurmancî ji alîyê Karacayî (2021, rr. 100-101) ve jî wek îhtimalek hatiye diyarkirin. Ew bi sê nimûneyên ji zaravayên kurdî yên hewramî, soranî û zazakî nîşan dide ku di hewramî da hêmana ku piştî lêkerê cih digire, hem berîya wê daçek heye hem jî ew ditewe, di soranî da daçek heye, lê tewang tune ye û di zazakî da, ne daçek heye ne jî tewang. Di ser van çavdêrîyan ra Karaca dibêje dibe ku di kurmancî da jî berê li pêş hêmana piştî lêkerê daçek hebûye, lê bi demê ra ew daçek ketibe. Nimûneyên ku Karaca ji van zaravayan nîşan dide, li jêr in ku berginda wan a kurmancî *Zarok diçin dibistanê* ye. Di (28a)yê ya nimûneya hewramî da *pey* pêşdaçek, -y gireya tewangê ye, di (28b)ya nimûneya soranî da *bo* daçek e û (28c) nimûneya zazakî ye.

(28) a. *Korake malane pey medrese-y*

b. *Kurrekan deron bo qutabxane-Ø*⁵⁵

c. *Lacekî şinê mekteb-Ø*

Di nimûneya zazakî ya Karacayî da *mekteb* wek *FDI* xuya bike jî wekî me di danasîna daçekên zazakî da bi nimûneya *Ez şona be/ve Dersimê* ('Ez diçim (bo)

⁵⁵ Açar (2024, r. 283) ji bo nimûneya *Ez diçim bo malêyê* dibêje hem di soranî da hem jî di devoka behdînî ya kurmancî da ev pêşdaçeka *boyê* tê bikaranîn.

Dêrsimê') nîşan dabû, di zazakî da berîya *FDI*ya HEDEFî ya piştî lêkerê çêdibe pêşdaçekek jî hebe ku di vê risteyê da pêşdaçeka *be/veyê* beramberî pêşdaçeka *bo* (an jî *bi*) kurmancî ye. Dîsa di mewlûda Osman Esad Efendîyî (bnr. Kırkan, 2018, rr. 175-202) da jî nimûneyên bi vî rengî hene. Du heb nimûne ji wan *Rew şima bêrên bi cennet...* ('Zû hûn werin (bi) cenetê') û *Ef kerê ma û birasnî tu bi înan* ('Ef bikî me û bigihînî (bi) wan') in ku ev nimûne jî nîşan didin di zazakî da berîya hêmana HEDEFî (*cennet* ('cenet/bihuşt'), *înan* ('wan')) pêşdaçek (*bi*) dikare cih bigire (ji bo hin nimûneyên din bnr. Gündüz, 2013, r. 52; Kaçan, 2018, r. 62; Yıldız 2023, r. 138).

Li gel van zanyarî û çavdêrîyan, Baker (1988, r. 374) dibêje lêker, dikarin REWŞa binyadî bi tenê li yek *FDI*yê bar bikin. Chomsky (1988, r. 171) jî dibêje her sere bi tenê yek REWŞê bar dike. Lê lêbarkirina bi tenê yek REWŞê, nayê wê wateyê ku wek sereyek lêker, bi tenê yek cure REWŞê bar dikan. Bo nimûne Haegeman û Guéron (1999, rr. 129-130) nîşan didin ku di almanî da lêkera *helfenê* ('alîkarî kirin') temamkereka bi REWŞa DATÎV, lêkera *sehenê* ('dîtin') temamkereka bi REWŞa AKÛZATÎV werdigire, lê di îngilîzî da lêker bi tenê REWŞa AKÛZATÎV bar dike. Eger em qebûl bikin di kurmancî û zazakî da jî lêker bi tenê yek REWŞê (ya binyadî) bar dikan û ev REWŞa BERKARÎ ye, nexwe REWŞa piştî lêkerê divê ne ji aliyê lêkerê ve bê barkirin. Ji ber vê jî em vê REWŞ-barkerê, wek daçekek qebûl dikan.

Ev çavdêrî, bi xwe ra wê tînin ku di kurmancî û zazakî da lêker nikarin REWŞên hundirîn bar bikin. Lewra ROLên wekî HEDEF, CIH, JÊDER di kurmancî û zazakî da bi alîkarîya daçekan tînin barkirin ku ev ROL tîkildar in bi REWŞa hundirîn ve. Em qebûl bikin berîya *FDI*ya li pozîsyona piştî lêkerê pêşdaçekek heye jî bi taybetî di kurmancî da ew gelek caran bi awayekî aşkere pêk nayê. Em dê argumenta piştî lêkerê wek *FDI* bi cih bikin, lê ji bo ku amaje bi hebûna pêşdaçekekê bike, em dê di nav *FDI*yê da nîşan bidin.

Em divê diyar bikin ku gelek ji xebatên ku li ser kurmancî hatine çêkirin, hêmana HEDEFî ya piştî lêkerê wek *FDI* qebûl dikan. Bo nimûne Bülbül (2016, r. 40) ji bo kurmancî dibêje di forma tebatî da hêmana datîv bi awayekî mecbûrî ji risteyê tê avêtin. Eger em li gor nihêrîna wî bêjin di binyada nerêzimanî ya **Pirtûk hat dayîn keçikêyê* da sedema nerêzimanîyê hebûna hêmana datîv (*keçik*) e. Lê wekî me nîşan da sedema vê nerêzimanîyê ne hebûna *keçikê* ye, qebûlkirina wê ye wek *FDI*. Eger ew wek *FD* bê qebûlkin, ev nerêzimanî pêk nayê. Lewma binyada *Pirtûk hat dayîn bi*

keçikêyê (an jî *pirtûk bi keçikê hat dayîn*) bi awayekî berbelav neyê bikaranîn jî bi ya me em nikarin bêjin ew nerêzimanî ye. Dîsa me gotibû forma tebatî ROLa KARAYê dimêje. Lêkera *danê* sê-ROLî ye, di forma wê ya tebatî da, ROLa KARAYê jê tê mêtin, lê du heb ROLên wê dimînin ku MIJAR û HEDEF in. Ji ber vê, esas eger em di forma tebatî da hêmana HEDEFî jê bibin, dê bibe sedema nerêzimanîyê. Lewra binyada ROLî ya forma tebatî ya lêkera *danê* dê bi temamî neyê derdan. Anku Prensîpa Derdanê dê bê bînpêkirin.

Niha jî em dikarin vegerin li rewşa ku li ser *FDIyên* piştî îzafeyê xuya dike (wekî *a Dîlan-ê*). Lê pêşî em divê diyar bikin ku li gel ku hin zimannas îzafeyê wek *rewş-barker* qebûl dikin (bnr. Larson & Yamakido, 2008; Larson & Samiian, 2020), hin zimannasên din bi şikbarî li nêzî *rewş-barkertîya* îzafeyê dibin (bnr. Samvelian, 2007, r. 617; Samvelian, 2008, rr. 345-347; Haig, 2011, rr. 380-382). Ji ber vê, em divê pêşî diyar bikin ka îzafe *rewş-barkerek* e yan na.

Me berê nîşan dabû ku dema argument *FDIyên* kompleks bin (di (29)an da *destê keçikê*) wê demê *REWŞa* wan bi awayekî razber û bi gireya *Θê* pêk tê ku li jêr di (29)an da hatîye nîşandan.

(29) a. *Dîlan [dest-ê keçikê]-Θ dişo*

b. *Dîlanê [dest-ê keçikê]-Θ şûşt*

(30) a. *Dîlan dest-ê keçik-ê dişo*

b. *Dîlanê dest-ê keçik-ê şûşt*

Eger îzafe *rewşa* rêzimanî bar nake em divê bêjin di (30a)yê da *-êya* li ser *keçikê* aîdî *FDIya destê keçikê* ye, ne bi tenê ya *keçikê* ye. Lê me di (29)an da nîşan da ku *rewşa FDIya destê keçikêyê* bi awayekî razber pêk tê, ne bi morfemekê. Dîsa eger ev *rewş*, ya *destê keçikêyê* be ji ber ku *dest* nêrza ye û wek sereyek taybetmendîya xwe dide hemû frêzê, *rewş* viyabû ne bi *-êya* mêza, bi *-îyê* nêrza wek **destê keçik-î* pêk bihata ku ev binyadeka nerêzimanî ye. Nexwe em divê bêjin *-ê* *rewşa* rêzimanî ya *FDIya keçikê* nîşan dide ku îzafe li wê bar dike.

Ji bo vê em dikarin li nimûneya jêrîn jî binihêrin. *Hatin* lêkereka neakûzatîv (têneper) e, lewma bikera wê her carê di *rewşa XWERÛ* da ye. Eger em *-îya* piştî *lawikî* wek gireya nîşankera *rewşa TEWANGê* ya frêza *bavê lawikîyê* qebûl bikin, em

divê bêjin *bavê lawikî* tewiyaye. Di vê rewşê da em divê bêjin lêkera *hatinê* têper e, lewra bi tenê bikerên lêkerên têper di demên borî da, di rewşa TEWANGê da ne. Lewma jî diyar dibe ku *-îya* li ser *lawikî* ne rewşa frêza *bavê lawikî*, lê ya *lawikî* bixwe ye ku ji alîyê îzafeya *êyê* ve hatîye barkirin.

(31) *Bav-ê lawik-î hat*

Niha jî em li hin nimûneyên ji zazakî binihêrin. Werner (2012) ji bo zazakî dibêje rengdêr jî wekî navdêran ji alîyê zayend, jimar û rewşê ve tîk kodkirin û hin nimûneyên ku ji bo vê rewşê nîşan dide, yê jêrîn in:

(32) a. *henar-ê sûr-î* 'hinar-ên sor'

b. *henaran-ê sûr-a* 'hinar-ên sor'

Werner di (32a)yê da *-îya* li ser *sûrê* ('sor') wek gireya pirjimarîyê nîşan dide. Werner diyar dike ku rengdêr bi tenê di forma pirjimarî ya tewandî da rewşê werdigirin û (32b)yê wek forma tewandî nîşan dide. Bi vî awayî li gor nihêrîna Wernerî di (32b)yê da rengdêra *sûrê* tewandî ye ku bi *-aya* ('-an') gireya pirjimarîyê ve hatîye kodkirin. Dema em her du (32a) û (32b)yê di risteyekê bi kar bînin cudahiya wan zelaltir xuya dibe:

(33) a. *Dîlane ê/henar-ê sûr-î werdî* / krm. *Dîlanê ew/henar-ên sor xwarin*

b. *Dîlane înan/henaran-ê sûr-a wena* / krm. *Dîlan wan/henar-ên sor dixwe*

ê, forma xwerû ya kesê sêyem ê pirjimar e, *înan* jî forma wê ya tewandî ye. Ji ber vê, em nikarin wan li şûna hevûdin bi kar bînin. Bo nimûne eger em di risteya (33b)yê da li şûna forma tewandî (*înan*), forma xwerû (*ê*) bi kar bînin binyada **Dîlane ê wena* ('*Dîlan ew dixwe') pêk tê ku nerêzmanî ye. Lê berevajî nihêrîna Wernerî ne hewce ye berkar her carê pirjimar be. Bo nimûne:

(34) *Dîlane ey/henarê sûr-î wena* / krm. *Dîlan wî/henar-ê sor dixwe*

Di (34)an da *-îya* li ser *sûrê* wekî di (32a)yê da, ne gireya pirjimarîyê, gireya tewangê ya nêrza-yekjimarîyê ye. Eger weha be wekî Werner angaşt dike, ne bi tenê di forma pirjimarîyê da, di forma yekjimarîyê da jî rengdêr ditewin. Lê çavdêrîyên bi vî rengî, bi awayekî zelal nîşan nadin di zazakî da rengdêr rewşê werdigirin û ditewin.

Ji bo zelalkirina mijarê em dikarin li nimûneyên jêrîn binihêrin. Risteyên jêrîn di nihêrîna pêşîn da dikin ku em bifikirin îzafeyê rewşê bar nake.

(35) a. *Dîlane kutik-ê sûr-î vînena* / krm. *Dîlan kûçik-ê sor dibîne*

b. *Dîlane kutik-o sûr dî* / krm. *Dîlanê kûçik-ê sor dît*

Di (35a)yê da *FDIya kutikê sûrîyê nêrza* ye û di rewşa TEWANGê da ye. Di (35b)yê da *FDIya kutiko sûr* di rewşa XWERÛ da ye. Eger em wekî Wernerî qebûl bikin ku rengdêr rewşê werdigirin, wê demê em dikarin bejin eger îzafeyê di zazakî da rewş bar bikira, di (35b)yê da jî rewş viyabû li *sûrê*, wekî di (35a)yê da, bihata barkirin. Lewra di *FDIya kutik-o sûrê* da jî îzafeya *oyê* heye. Lê dema em li nimûneyên zazakî binihêrin em dikarin bêjin *-îya* di (35a)yê da, ya li ser *sûrê*, aîdî hemû *FDIyê* ye, lewma jî *FDIya* berkarî di rewşa TEWANGê da ye ku wek *FDIyeka nêrza* ev rewş bi *-îyê* hatiye kodkirin. Di (35b)yê da *FDIya kutik-o sûr* jî ber ku rewşa wê XWERÛ ye, li ser rengdêrê, ya rasttir li ser *FDIye* bixwe morfemeka *tewangê* tune ye. Lê ev nayê wê wateyê ku îzafeyê rewşê bar nake. Ev tê wê wateyê ku berevajî angaştî Wernerî, di zazakî da, wekî di kurmancî da, rengdêr rewşê wernagirin û wekî me got, gireya *tewangê* ya ku li ser rengdêran xuya dike ya hemû *FDIyê* ye. Dema temamkerên navdêran *FDI* bin diyar dibe ku wekî di kurmancî da, di zazakî da jî îzafeyê rewşê bar dike.

(36) a. *Dîlane kutik-ê lajek-î vînena* / *Dîlan kûçik-ê lawik-î dibîne*

b. *Dîlane kutik-ê lajek-î dî* / krm. *Dîlanê kûçik-ê lawik-î dît*

Wekî di nimûneyên (36)an da xuya dibe, di her du risteyan da jî *FDIya lajekî* ('lawik'), di forma tewandî da ye, eger REWŞa *lajekî* têkildar bûya bi hemû *FDIyê* û eger îzafeyê REWŞ bar nekira, di (36b)yê da *lajek* viyabû bêtî *-îyê* xuya bikira, lewra *FDIya kutik-ê lajek-îyê* di rewşa XWERÛ da ye. Wê demê binyad divê bi awayê **Dîlane kutik-ê lajek-Ø dîyê* pêk bihata, lê ev binyad di zazakî da nerêzimanî ye. Wek encam em îzafeyê wek rewş-barkerek qebûl dikin.

Piştî vê, em dikarin lê binihêrin ka REWŞa ku îzafeyê bar dike gelo binyadî ye yan hundirîn e. Wekî me dîtibû dema argument wek *FD* pêk tî, ROL li temamkerên wan tê barkirin. Lê gelo bo nimûne di *FLya a te dîtê* da ROL li *teyê* tê barkirin an na? Ji bo vê em dikarin bipirsin ê ku hatiye dîtin *te* ye yan kesek an jî tiştek din e? Wekî me nîşan dabû di *FNyan* da frêza îzafeyî li pozîsyona temamkerî ya navdêran cih digire, lewma em dikarin *FÎya a teyê* wek temamkera navdêrekê bi cih bikin.


(37) *Min pirtûk-a te dît*

Li gor (37)an bi awayekî zelal diyar dibe ku ya ku hatîye dîtin, ne *te*, lê *pirtûk-a te* ye. Lewma diyar dibe ku di vê nimûneyê da *FÎ* ne argument e, ew temamkera navdêrê ye. Tunebûna *FÎ* nabe sedema nerêzimanîyê. Li gel vê, dema navdêra sere lêkernavek be, *FÎ*ya temamker dibe argumenteka mecbûrî ya *FNyê*. Bo nimûne em nikarin bêjin **Min hatin dît*, lewra temamkera *FNyê* pêk nehatîye, binyadê em dikarin bi awayê *Min hatin-a te dît* rêzimanî bikin. Ev nîşan dide ku têkilîya ROL û REWŞê ya temamkerên *FÎ*yan (di nimûneyê da *te*) tune ye. Lewra, yan ew ne hêmanên mecbûrî ne (wekî di (37)an da) yan jî ROL ji aliyê sereyeka din ve, REWŞ ji aliyê sereyeka din ve li wan tê barkirin (di *Min hatin-a te dît* da *te* ROLê ji *Nya hatinê*, REWŞê ji îzafeya *ayê* werdigire). Nexwe em dikarin bêjin REWŞa ku îzafe bar dike, ne hundirîn, lê REWŞeka binyadî ye. Lewra wekî di Haegemanê (1994, r. 176) da cih digire, eger *A* REWŞ-barkereka hundirîn be, ew divê ROLê li *FDIyê* bar bike. Baker (1988, r. 114) jî dibêje REWŞên binyadî, ji aliyê hêmanên ferhengî ve di çarçoveya birêvebirinê da li her *FDIyê* tê barkirin. Ji bo vê hebûn an jî tunebûna têkilîya semantîk a di navbera wan da diyarker nine. Îzafe, ROLê li temamkerên xwe bar nake. Lewra îzafe xwedî naverokeka semantîk nine. Ji ber vê jî nabe ku REWŞa ku îzafe bar dike, REWŞeka hundirîn be. Bi kurtasî, ji ber ku di avahiya îzafeyê da temamkera îzafeyê ROLA xwe ji sereyeka din, REWŞa xwe ji îzafeyê distîne, REWŞa wê binyadî ye.

Niha jî em li binavkirina van REWŞan binihêrin. Me li jor got di kurmancî û zazakî da du cure rewş hene: Rewşa XWERÛ û rewşa TEWANGê. Ji ber ku binavkirinên wekî XWERÛ û ya TEWANGê amaje bi kodkirineka morfolojîk dikin, em dê ji bo ku amaje bi kodkirineka morfolojîk nekin, REWŞan, li gor pozîsyona wan bi nav bikin: REWŞa BIKERÎ (REWŞa bikerê), REWŞa BERKARÎ (REWŞa berkara rasterast), REWŞa DAÇEKÎ (REWŞa temamkera daçekan), REWŞa ÎZAFEYÎ (REWŞa temamkera îzafeyan). Di termînolojîya me da navên ku me ji bo REWŞan diyar kirin hem rewşa XWERÛ hem jî ya TEWANGê digire nav xwe. Bo nimûne REWŞa BIKERÎ hem rewşa XWERÛ hem jî ya TEWANGê ya bikerê nîşan dide, bi heman awayî REWŞa BERKARÎ, ya DAÇEKÎ û ya ÎZAFEYÎ jî. Lewra bo nimûne REWŞa BIKERÎ li pozîsyona sîntaktîk a [*nîş, FDEM*]ê da tê barkirin, ji ber vê jî amaje bi forma morfolojîk nake.

Wek encam di kurmancî û zazakî da çar sere REWŞê bar dikin: *DEM*, lêker (a têper), daçek û îzafe. REWŞên ku ev her çar sere bar dikin jî REWŞên razber in. Ji aliyê din ve REWŞên ku *DEM*, lêker û îzafe bar dikin, REWŞên binyadî, REWŞa ku daçek bar dike, REWŞa hundirîn e. Dîsa ji van hêmanan lêker û daçek sereyên ferhengî ne, *DEM* û îzafe jî sereyên kargînî ne. Cure û lêbarkirina REWŞan di kurmancî û zazakî da em dikarin bi awayê jêrîn nîşan bidin:

(38)



Li jêr em dê lêkerên (û *PK*) kurmancî û yê zazakî li gor REWŞê vekolin. Di *Beşa Sêyem* da me lêker li gor hejmara *ROLên* ku ew bar dikin vekolandibûn. Lê di vê beşê da em nikarin lêkeran li gor hejmara REWŞan dabeş bikin. Lewra wekî hatibû vegotin, lêkerên ku REWŞê bar bikin, dikarin bi tenê yek REWŞê bar bikin ku ew jî REWŞa *BERKARÎ* ye. Hinek lêker jî nikarin REWŞê bar bikin. Horrocks (2013, r. 103) dibêje sereyên ferhengî temamkerên xwe bi rê ve dibin, eger rêvebir xwedî hêza lêbarkirina REWŞê be, wê demê ew REWŞê li temamkerên xwe bar dike. Nexwe ji bo lêkeran em dikarin bêjin lêkerên ku wek temamker hêmaneka REWŞ-wergir binkategorîze dikin dikarin REWŞê bar bikin. Lê ne bi tenê temamkerên REWŞ-wergir, şop jî dikarin REWŞê werbirin. Bo nimûne *FTEM* bixwe REWŞ-wergir ninin, lê dema ew cih diguherin REWŞ li şopên wan tên barkirin. Nexwe lêkeran ji aliyê lêbarkirina REWŞê ve em dikarin bikin du kom: *Lêkerên ku REWŞê bar dikin* û *lêkerên ku REWŞê bar nakin*.

4.1.3. Lêkerên ku REWŞê Bar Dikin û yên ku REWŞê Bar Nakin

4.1.3.1. Lêkerên ku REWŞê Bar Dikin

Ji bo ku em bikaribin diyar bikin kîjan cure lêker dikare REWŞê bar bike, yek ji rêyan ew e ku em lê binihêrin ka ew lêker *FDI*yekê binkategorîze dike yan na. Lewra *FDI*REWŞ-wergir in û eger lêkerek *FDI*yekê binkategorîze dike û ev *FDI* li r-binyadê cih naguhêre, wê demê ew lêker dikare REWŞê bar bike. Bo nimûne em li nimûneyên ku ji Haegeman û Guéronê (1999, r. 137) hatine wergirtin binihêrin:

(39) a. *She asked the time* 'Wê wext pirsî'

b. *She asked what time it was* 'Wê pirsî wext çi bû'

(40) a. **She inquired the time*

b. *She inquired what time it was* 'Wê xwest bizanibe wext çi bû'

Haegeman û Guéron dibêjin di (39)an da, *ask* ('pirsîn') hem li gel risteyeka temamker hem jî li gel *FDI*yekê tê bikaranîn. Lewma jî *ask* REWŞ-barkerek e, lê di (40)î da li gel ku *inquire* ('lê pirsîn/agahî girtin') jî aliyê wateyî ve nêzî *askê* ye jî nikare *FDI*yekê wek temamker bigire, lê dikare risteyekê wek temamker werbigire. Ev jî nîşan dide ku *inquire* nikare REWŞê bar bike.

Li gel vê testa jorîn, em dikarin serî li *çi-frêzan* jî bidin. Dema li şûna temamkerekê em bikaribin *çi-frêzekê* bi cih bikin, wê demê ew lêker dikare REWŞê bar bike, lewra *çi-frêz* REWŞ-wergir in, lê dema em nikaribin li şûna temamkerê *çi-frêzekê* bi cih bikin, wê demê ew lêker nikare REWŞê bar bike.

(41) a. *Te çi xwend?*


b. **Te çi nihêrî?*

Di (41a)yê da, em dikarin *çiyê* li şûna temamkera *xwendinê* bi cih bikin, *xwendin* REWŞê li *çiyê* bar dike, lewma jî *xwendin* REWŞ-barkerek e. Ji aliyê din ve nerêzimanîya (41b)yê nîşan dide ku *nihêrîn* nikare REWŞê li *çiyê* bar bike, lewma jî *nihêrîn* lêkerek REWŞ-barker nine.

Dema em bi vî çavî li lêkeran binihêrin, diyar dibe ku lêkerên ku REWŞê bar dikin, lêkerên têper in. Lê wekî me di nimûneya **Te çi nihêrî*yê da dît, her cure lêkera

têper REWŞê bar nake. Li jêr em dê bi dorê lê binihêrin kîjan cure lêkerên têper dikarin REWŞê bar bikin.

Yekem cure lêkerên ku dikarin REWŞê bar bikin, ew cure lêker in ku bi tenê *FDIyekê* binkategorîze dikin. Li k-binyada van lêkeran, wekî me di *Beşa Sêyem* da jî dîtibû, li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* jî *FDIyek* bi cih dibe. Lê wekî me li jor got ev pozîsyon, pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê nine, ji ber vê, *FDIya* li vê pozîsyonê li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Nimûneyên van lêkeran me wek *xwendin* (zz. *wendene*), *nivîsîn* (zz. *nuştene*), *xwarin* (zz. *werdene*) nîşan dabûn. Li jêr nimûneya ji bo lêkera *xwendinê* hatîye nîşandan. Di nimûneyan da heta ku nîşandana k-binyadan ne hewce be, bi tenê r-binyadên nimûneyan dê bên nîşandan. Dîsa heta ne hewce be, *FTEMa* ku *FDEMê* digire nav xwe dê neyê nîşandan. Ji aliyê din ve heta ne hewce be lêbarkirina REWŞa bikerê dê neyê nîşandan, lewra em bi tenê li ser lêbarkirina REWŞê ya lêkeran kar dikin, lê REWŞa bikerê ji aliyê *DEMê* ve tê barkirin. Me li k-binyadên risteyan, *FDI* bi forma wan a REWŞ lêbarkirî nîşan dabûn. Bo nimûne me li k-binyada risteya *Dîlan-ê pirtûk xwendê*, *Dîlan* li gel gireya REWŞa wê (-ê) nîşan da, lê me dît REWŞ (a binyadî) li r-binyadê tê barkirin. Me ji bo hêsanîya fêmarîya risteyan *FDI* li gel REWŞên wan nîşan dabûn, lê di rastîyê da ji ber ku REWŞ li r-binyadê tê barkirin, bo nimûne *Dîlan* li k-binyadê bêyî REWŞ bi awayê *Dîlanê* (wekî ***Dîlan*** *pirtûk xwend*) pêk tê. Di vê binbeşê da em dê lêbarkirina REWŞê nîşan bidin. Ji bo ku lêbarkirina REWŞê bê diyarkirin, em dê ji nîşandana li k-binyadê cuda, REWŞa kategorîyên REWŞ-wergir, bi xêzikê (-) ji kategorîyên REWŞ-wergir veqetînin: wekî *Dîlan-ê*. Di nimûneyan da tîrê xwar lêbarkirina REWŞê nîşan dide. Bo nimûne di dardîagrama jêrîn da tîrê xwar nîşan dide ku lêkera *xwendinê*, REWŞê li *FDIya pirtûkê* (zz. *kitab*) bar dike.




Cureyeka din a lêkeran ku REWŞê bar dike, wek alternatîf *FDI* yan jî *FTEM*ekê binkategorîze dike. Me nimûneyên van lêkeran wek *gotin* (zz. *vatene*), *dîtin* (zz. *dîyene*), *xwestin* (zz. *waştene*), *kirin* (zz. *kerdene*), *pirsîn* (zz. *persayene*) nîşan dabûn. Dema ev lêker wek temamker *FDI*yekê binkategorîze dikin, ew li van *FDI*yan, wekî lêkerên koma jorîn REWŞê bar dikin, lewma em dê li vir dîsa wê nîşan nedin. Lê dema temamkera wan wek *FTEM* pêk tê, ev *FTEM* cih diguhere. Bêjerêzîya bingeîn a kurmancî û zazakî biker-berkar-lêker e. *FTEM*ên temamker wek berkarên risteyê kar dikin. Heta niha, me *FTEM*ên temamker li k-binyadê, li pozîsyona temamkerî bi cih kirin, lê me got ku ew li asta r-binyadê, li pozîsyona piştî lêkerê bi cih dibin. Dîsa me gotibû bû sedema vê, rewşa rêzimanî ye. Niha em dikarin vê mijarê rave bikin.

Wekî me got *FDI* REWŞê werdigirin (a rast cihnav, *çi-frêz*, şop jî REWŞê werdigirin, lewra li gel *FDI*yan ev hemû kategori, hêmanên navdêrî ne). Stowell (1981, r. 391) dibêje dema *FTEM*ek (di xebata wî da *RS'* (*S'*), anku risteya hundirîn (embedded clause) wek argument pêk bê, ew divê cih biguhere bo pozîsyoneka *ne-A-pozîsyonê* (anku pozîsyona ne-argumentî) û şopa xwe ya REWŞê lêbarkirî, girêbide. Di vê mijarê da Chomsky (2015, r. 29) dibêje riste, ne hewce ye REWŞa razber werbigirin, lewra bi gotina Haegemanê (1994, r. 179) pîvera REWŞê li ser *FDI*yan kar dike, ne li ser risteyan. Lewma bêREWŞtîya *FTEM*ê, li ser rêzimanîtiya risteyê bandorê çênake. Dîsa Chomsky (1986, r. 74) dibêje morfolojîya tebatîyê REWŞa BERKARÎ dimêje. Ji

ber vê, eger lêkerek tebatî temamkerek *FDI*î wernegire, wê demê ne hewce ye ev temamker cih biguhere. Chomsky ji bo vê rewşê nimûneya jêrîn nîşan dide ku lêker tebatî (*is believed*, 'tê bawerkirin') ye û temamker wek riste (*that John is intelligent* ('ku John is zîrek e')) pêk hatiye, lê li gel ku li pozîsyona temamkerî (lewra di îngilîzî da pozîsyona temamkerî hema piştî lêkerê ye) cih digire, ew cih naguhere.

(43) *it is widely believed that John is intelligent* 'Bi piranî tê bawerkirin ku John zîrek e'

Eger em vê gotina Chomskyî ji berevajî şirove bikin, nexwe dema lêkerek hêza lêbarkirina REWŞa BERKARÎ ji dest nedabe û temamkera wê wek riste pêk hatibe, ev riste ji bo ku xwe ji lêbarkirina REWŞê rizgar bike, divê cih biguhere. Ji ber vê, temamkera ku wek *FTEM* pêk tê, bi awayekî mecbûrî cih diguhere. Lê ev *FTEM* nabe ku di nav mezintirîn projeksiyona lêkerê da bi cih bibe. Lewra dema di nav wê da cih bigire, dê dîsa ji alîyê lêkerê ve bê birêvebirin û REWŞ li wê bê barkirin. Em dikarin pozîsyona ji bo cihguherînê, wek pozîsyona xwişkî ya *L'*yê diyar bikin. Li jêr cihguherîna *FTEMa* van cure lêkeran bi nimûneya *Dîlanê dît ku xwendekar pirtûkê dixwîninê* (zz. *Dîlane dî ke wendekarî kitabî wanenê*) hatiye nîşandan.



Li gel vê, em divê diyar bikin gelo ev cihguherîna *FTEM*ê ji alîyê rêzimanê ve guncav e yan na. Ev, piştî cihguherînê, ji bo ku *FTEM* wek berkara lêkerê bê şirovekirin giring e. Bo nimûne di (44)an da dema *Dilan* cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEM*ê jî ew li gor pozîsyona xwe ya resen a li k-binyadê (pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* ku di (44)an da şopa *Dilanê* nîşan dide) tê şirovekirin. Ev şirove bi saya zincîra ku ew pêk tîne, pêk tê. Ji bo ku ev pêk bê, *Dilan* divê şopa xwe *girê bide* (binding). Girêdan di *BGyê* da bi teorîya Girêdanê tê pêşkêşkirin û weha tê pênasekirin:

(45) *Girêdan*

Ayek, Byekê girê dide eger tenê bi tenê

a. *A û B hevîndeks bin û*

b. *A li Byê p-fermanberîyê bike* (Cook & Newson, 2007, r. 166)

Di nimûneya (44)an da hem şopa *Dîlanê* hem jî ya *FTEMê* bi awayekî siruştî li gel wan hevîndeks in. Li gel vê em divê lê binihêrin ka ew li şopên xwe p-fermanberîyê dikin an na. Ji bo dîtina vê em dikarin pênaseya p-fermanberîyê bi bîr bînin.

(46) *p-fermanberî*:

Ayek li Byekê p-fermanberîyê dike, eger tenê bi tenê;

a. *A li Byê serdestîyê neke, û*

b. *Yekemîn movika ku li Ayê serdestîyê dike, di heman demê da li Byê jî serdestî bike.*

Dema em li r-binyada (44)an binihêrin, diyar dibe ku hem *Dîlan* hem jî *FTEM* li şopên xwe p-fermanberîyê dikin. Di nimûneya me da, li gor pênaseya (46)an *Dîlan* û *FTEMA* ne, şopên wan jî *B* ne. Li gor vê, yekemîn movika ku li *Dîlanê* serdestîyê dike *DEM''* e, ev *DEM''* di heman demê da li şopa wê jî serdestîyê dike. Wekî hatibû dîtina serdestîya dayîkê ya li ser keçên xwe serdestîya rasterast, serdestîya wê ya li ser nêvîyên xwe û yd. serdestîya nerasterast bû. *Dîlan* keça *DEM''ê* ye lewma jî *DEM''* li wê serdestîya rasterast dike, şopa *Dîlanê* nêvîya *DEM''ê* ye, lewma jî serdestîya wê ya li ser şopa *Dîlanê* serdestîyeka nerasterast e. Lê dawîya dawîn, wekî (46) wek merc datîne, *DEM''* li her duyan jî serdestîyê dike. Nexwe diyar dibe ku *Dîlan* şopa xwe girê dide. Lewra her du mercên girêdanê jî pêk tên: *Dîlan* û şop hevîndeks in û *Dîlan* li şopa xwe p-fermanberîyê dike.

Dema em vegerin *FTEMê*, tê dîtina ku piştî cihguherînê, li r-binyadê yekemîn movika ku li *FTEMA* temamker serdestîyê dike, *L''ya* herî jorîn e. Ev *L''* di heman demê da bi awayekî nerasterast li şopa *FTEMA* cihguherî jî serdestîyê dike. Lewma *FTEMA* cihguherî li şopa xwe p-fermanberîyê dike. Ji ber vê jî ew şopa xwe girê dide. Bi vî awayî diyar dibe ku di kurmancî û zazakî da cihguherîna *FTEMA* di (44)an da ji alîyê p-fermanberî û girêdanê ve bi awayekî serkeftî pêk tê. Ji vî alîyê ve pozîsyona xwişkî ya *L''ya* bingeîn ji bo *FTEMA* temamker a risteyê *cihê venişînê* (landing site) yê guncav e.

Lê ji bo ku em temam bikin gelo cihguherîna *FTEMA* temamker di cih da ye yan na em divê li tiştêkî din jî binihêrin. Cihguherîn divê binyada li k-binyadê biparêze. Tiştê ku di *BGYê* da vê dabîn dike *Prensîpa Binyadparêz* (Structural Preservation Principle) e ku ev prensîp weha tê diyarkirin:

(47) *Prensîpa Binyadparêz*

Veguherîn divê binyadê biparêzin (Uzun, 2000, r. 297)

Di (47)yan da mebest ji veguherînê, cihguherîn e. Prensîpa binyadparêz, diyar dike ku pêkhêna ku cih diguhere divê li gel *binyada darî* (tree structure) ya heyî lihevkişî be. Ev jî tê wê wateyê ku bo nimûne sereyek nikare li pozîsyoneka temamkerekê bê bicihkirin an jî frêzek nikare li pozîsyoneka sereyekê bê bicihkirin (Black, 1999, rr. 23-24). Lewra pêkhên kîjan cure be (wekî frêz an jî sere) ew dikare cih biguhere bo pozîsyonekê ku xwedî heman taybetmendîyan e. Ev taybetmendîyên pozîsyonan li k-binyadê tên diyarkirin û li r-binyadê tên parastin. Wekî Haegeman diyar dike prensîpa binyadparêz kategorîyên sîntaktîk jî diparêze. Bo nimûne *FDI* cih diguherin bo pozîsyonên *FDI*yan, lê nikarin cih biguherin bo pozîsyonên *FR*yan. Lê ev nayê wê wateyê ku *FDI* divê bi tenê cih biguherin bo pozîsyonên *FDI*yan. Heta ku prensîpên rêzimanê yê din neyên bînpêkirin *FDI* dikarin cih biguherin bo pozîsyonên din ên ku bi kategorîyeka sîntaktîk a diyar ve nehatine nîşankirin. Li gel vê, prensîpa binyadparêz li r-binyadê li ber çêkirina pozîsyoneka nû, ku li k-binyadê cih nagire, nabe asteng (bnr. 1994, r. 338). Bi gotineka din, li r-binyadê ji bo hêmana ku dê cih biguhere, em dikarin pozîsyoneka nû çêkin. Bo nimûne li k-binyadê, bi tenê pozîsyonên ji bo argumentan û pozîsyonên vala yê ku ev argument dikarin cih biguherin bo van pozîsyonan, tên hilberîn. Lê di risteyan da bi tenê argument (ku pêkhênên mecbûrî ne) cih nagirin. Di risteyan da zêdek jî dikarin cih bigirin. Pozîsyonên zêdekan li r-binyadê tên hilberîn ku hilberîna van pozîsyonan binyada bîngehîn a li k-binyadê xera nake, lewra ev pozîsyon jî li gor prensîpên binyada frêzî (anku prensîpên teorîya *X*-barê) tên çêkirin.

Di nimûneya (44)an da cihê venişînê yê *FTEMa* temamker, hatiye çêkirin. Ev pozîsyona nû, taybetmendîyên *X*-barê bin pê nake. Lewra ew prensîpa du-şaxîti ya *X*-barê diparêze. Dîsa ev pozîsyoneka frêzî ye. *FTEM* pêkhêneka frêzî ye, lewma jî dikare cih biguhere bo vê pozîsyonê. Ji ber vê, ji bo cihguherîna *FTEMa* temamker, çêkirina pozîsyoneka nû ya wekî di (44)an da, k-binyada risteyê xera nake.

Wekî hatibû dîtin di kurmancî û zazakî da îzafê jî dikare *FTEMekê* wek temamker werbigire. Wergirtina *FTEMekê* ya ji aliyê îzafeyê ve (li gel hin sedemên din) kiriye ku hin zimannas (bnr. Samvelian, 2008, rr. 345-347; Gündoğdu û yd., 2024) bêjin îzafê *REWŞ*-barkerek nine. Lewra eger *REWŞ* taybetmendîyeka *FDI*yan be û

eger *FTEM* ne *FDI* bin, nexwe ji ber ku îzafeyê *FTEM*ê werdigirin, îzafeyê divê ne *REWŞ*-barker be.

(48) *ez tişt [Fî ê [FTEM ku tu dibêjî]] qebûl nakim*

Di (48)an da îzafeya *êyê*, *FTEMa ku tu dibêjîyê* wek temamker distîne, lê berevajî nimûneya (44)an, di (48)an da *FTEM* cih naguhere, li gel vê binyad rêzimanî ye. Eger îzafeyê *REWŞ*-barker e û eger nabe ku *FTEM* *REWŞê* werbigire, nexwe çima di (48)an da *FTEM* cih naguhere?

Ji bo vê em dikarin bêjin dema *FTEM*ê wek temamkera lêkerê *pêk tê*, lêker *ROLê* li wê bar dike, ji ber vê jî ew divê *REWŞê* jî werbigire. Ji ber ku *FTEM* kategorîyeka *REWŞ*-wergir nîne, ew bi awayekî mecbûrî cih diguhere. Lê dema ew li pozîsyona temamkerî ya îzafeyê *pêk tê*, ji ber ku îzafeyê *ROL*-barker nîne (lewra îzafeyê ji aliyê semantîk ve vala ye), di nimûneyên wekî (48)an da, *ROL* li *FTEMê* nayê barkirin.

Îzafeyê bixwe *ROL*-barker nebe jî, dema *Fî* wek temamkera lêkernavek *pêk bê*, temamkera îzafeyê dikare *ROLê* werbigire. Bo nimûne di *FNya xwendin-a pirtûkan* da, *xwendin* lêkernavek e, lewma jî *ROLê* li *pirtûkanê* bar dike, *REWŞê* jî îzafeyê li *pirtûkanê* bar dike. Nexwe em dikarin bifikirin ku lêkernavek dikare *ROLê* li *FTEM*ê jî bar bike. Eger ev *pêk bê*, ev *FTEM* jî divê wekî *FTEMên* temamker ên lêkeran cih biguherin, lê Stowell (1981, r. 203) dibêje lêkernav nikarin *ROLê* li rîsteya temamker a demdar bar bikin. Ev ji bo me tê wateyê ku di kurmancî û zazakî da, lêkernav nabe ku *FTEM*ê werbigirin. Bo nimûne nabe ku lêkernava *xwendinê* (zz. *wendene*) bi rêya îzafeyê *FTEM*ê werbigire. Lewma avahîyeka wekî **xwendin-a FTEMê* (zz. **wenden-a FTEM*) nerêzimanî ye. *Xwendin*, dema wek lêker tê bikaranîn, *FDI*yê binkategorîze dike, lewma jî dibe ku asayî be binyada **xwendin-a FTEMê* nerêzimanî be, lê lêkerên ku dikarin *FTEM*ê jî wek alternatîf binkategorîze bikin, dema dibin lêkernav, nikarin *FTEM*ê werbigirin. Yek ji van lêkeran, *dîtin* (zz. *dîyene*) e. Dema wek lêkernav bê bikaranîn, ev lêker dikare *FDI*yê wek modîfîyeker werbigire. Bo nimûne *Dîtin-a pirtûkê zehmet bû*. Lê li gel ku *dîtin* dikare di forma lêkerî da *FTEM*ê wek temamker werbigire (wekî *Dîlanê dît [FTEM ku zarok pirtûkê dixwînin]*), dema wek lêkernav tê bikaranîn nikare *FTEM*ê werbigire. Bo nimûne **Dîtin-a [FTEM (ku) zarok pirtûkê dixwînin] zehmet bû* (zz. **dîyen-a [FTEM (ke) qeçekî kitabî wanênê] zehmet bû*). Navdêrên resen, wekî di nimûneya (48)an da xuya dike, dikarin *FTEMan* werbigirin, lê navdêrên resen jî *ROLê* bar nakin. Ev jî nîşan dide ku

*FTEM*ên li pozîsyona temamkerî ya îzafeyê cih digirin, bi serê xwe ROLê wernagirin, ji ber vê, REWŞ li wan nayê barkirin. Ji ber ku REWŞê wernagirin jî wekî *FTEM*ên temamker ên lêkeran, ne hewce ye cih biguherin. Me di (48)an da *FÎya* ku *FTEM* temamkera wê ye, li pozîsyona temamkerî ya navdêra *tiştê* bi cih kir. Lê Elî (2017, r. 212) ji bo kurmancî dibêje frêza navdêrî ti frêzan wek temamker wernagire. Ew ji bo nimûneyên wekî *kurê şivanî, zarokê ku min jê digot...*ê dibêje *şivan û ku min jê digot* mimkin e ji binyadê bên xistin, ji ber vê jî ew ne temamker in, belkî diyarker in. Eger em vê qebûl bikin, em divê bêjin di (48)an da *FÎya ê ku tu dibêjîyê* wek zêdekek kar dike. Zêdek, li r-binyadê li sîstemê tên zêdekirin. Ev jî tê wê wateyê ku ev *FÎ*, li k-binyadê nehatîye hilberîn. Eger ew li k-binyadê nehatibe hilberîn, *FTEMa ku tu dibêjîyê* li r-binyadê ROL barkirî nine, lewma ne hewce ye ew REWŞê werbigire. Ji ber vê jî ne hewce ye cih biguhere. Wek encam temamkerên (an jî eger em boçûna Elîyê qebûl bikin, *FÎyên* (û temamkerên van *FÎyan*) piştî navdêrên resen) navdêrên resen li r-binyadê ROL lêbarkirî ninin. Dibe ku li asta forma mantiqî wek beşeka *FDIyê* ji alîyê wateyî ve tên şirovekirin.

Ji alîyê din ve, *FD* divê ji vî alîyî ve ji *FTEMan* bên veqetandin. Wekî *FTEMan*, *FD* jî REWŞ-wergir ninin, lê wekî Stowell (1981, r. 167) jî amaje pê dike, *FD* dema li pozîsyona temamkerî xuya dikin ji alîyê ROLê ve ji risteyên demdar vediqetin. Bo nimûne wekî em li jor dibînin *FTEM* ROL-wergir in, lê *FD* ROL-wergir ninin. Wekî me berê dîtibû, merca *xuyanîtiyê* diyar dikir ku ji bo ku *FDIyek* ROLekê werbigire, divê xuya be (ji alîyê fonolojîk ve pêk hatibe) û ji bo ku xuya be jî REWŞ divê li vê *FDIyê* hatibe barkirin. Bi gotineka din REWŞa ku li *FDIyê* tê barkirin wê dide xuyakirin. Bi vî awayî lêker, ROLê bi tenê li *FDIyên* ku xuya dikin, bar dike. Em dikarin *xuyanîtiyê* ji bo *FTEMan* jî bifikirin.

Ji ber ku *FTEM* (ne temamkerên îzafeyan) xwedî ROL in, ew divê REWŞê jî werbirin, lê *FD* xwedî ROL ninin, lewma REWŞ jî li wan nayê barkirin. Ji ber vê jî, ne hewce ye ew cih biguherin. Ji bo xuyakirina *FDyan* a li pozîsyona temamkerî Stowell (1981, r. 167) dibêje dibe ku sedem lêbarkirina ROLê ya tîkelî be. Wekî me dîtibû ROLa ku li temamkerên *FDyan* tên barkirin ji alîyê tîkelîya *D(açek)+lêkerê* dihat diyarkirin. Anku *D* bixwe beşeka ROL-barker e, lewma jî nabe ku li hêmaneka ku ROLê bar dike, ROL bê barkirin, lê em nikarin heman tiştî ji bo *TEMê* bêjin. Dîsa di *FDyan* da REWŞ ne li *FDyê*, li temamkera wê tê barkirin.

Komeka lêkeran a din ku REWŞê bar dike, ji wan cure lêkeran pêk tê ku dikarin *FDyek* an jî *FTEMekê* wek alternatîf binkategorîze bikin. Yek ji van lêkeran *zanîn* (zz. *zanayene*) e. Di van cure lêkeran da, dema temamker wek *FD* pêk tê jixwe *D*, REWŞê li beşdara risteyê (anku temamkera xwe) bar dike. Dema temamker wek *FTEM* pêk tê, wekî di nimûneya jorîn da ew cih diguhere. Ji bo dîtina vê jî em dikarin *çi-frêzê* bi kar bînin:

(49) *Tu bi çi dizanî? / zz. Tî bi çiçî zanê?*


Bersiva (49)an dibe ku *Ez bi vê mijarê dizanim* (zz. *Ez bi na babete zana*) be, lê nabe ku *Ez dizanim bixwînîm* (zz. *Ez zana biwana*) be. Lê em li pirsê jêrîn binihêrin:

(50) *Tu çi dizanî? / zz. Tî çiçî zanê?*

Berevajî (49)an, bersiva pirsê (50)î nabe ku *Ez bi mijarê dizanim* (zz. *Ez bi babete zana*) be, lê dibe ku *Ez dizanim bixwînîm* (zz. *Ez zana biwana*) be. Nexwe diyar dibe ku lêkera *zanînê* REWŞê bar dike, lewra (50) di kurmancî û zazakî da binyadeka rêzimanî ye. Ji ber ku ew dikare REWŞê bar bike, dema temamkera wê wek *FTEM* pêk tê, ew cih diguhere.


Koma lêkeran a dawîn a ku REWŞê bar dike, ji lêkerên sê-ROLî pêk tê. Li jêr ji bo lêkera *danê* nimûne hatiye nîşandan. Wekî me gotibû argumenta piştî lêkerê, *FDyek* e. Lewma jî li jêr *FDIya hevala xweyê* (zz. *embaza xo*) ya temamkera vê *FDyê*, ji daçekê sere REWŞê werdigire.

(51)



4.1.3.2. Lêkerên ku REWŞê Bar Nakin

Di binbeşa pêşîn da me dît ku gelek komên lêkerên têper REWŞê bar dîkin. Di kurmancî û zazakî da tekane koma lêkerên têper a ku REWŞê bar nake, ew kom e ku lêkerên wê bi tenê *FDyekê* binkategorîze dîkin. Lewra lêkerek li pozîsyoneka ku li k-binyadê ji alîyê *FDyekê* ve hatîye dagirtin, REWŞê bar nake (Stowell, 1981, r. 186). Yek ji van lêkeran *nihêrîn* (zz. *ewnîyayene*) e. Di van lêkeran da, wekî berê jî hat gotin, li temankera daçekê, daçek REWŞa DAÇEKÎ bar dike. Lêbarkirina REWŞê ya daçekê bi nimûneya lêkera *nihêrînê* li jêr hatîye nîşandan:



Me di beşên pêşîn da binyada *Li pirtûkê tê nihêrînê* wek rêzimanî nîşan dabû. Lê Haig (2002, r. 20) ji bo kurmancî dibêje di forma tebatî da bi tenê berkarên rasterast dikarin li serê risteyê bi cih bibin. Eger em vê gotina Haigî qebûl bikin, em divê binyada *Li pirtûkê tê nihêrînê* wek nerêzimanî kod bikin. Di prosesa çêkirina xebatê da dema me ji hin kurmancîzaran dixwest bila forma tebatî ya risteya *Ez li pirtûkê dinihêrimê* çêkin, gelek ji wan wek *Li pirtûkê tê nihêrîn* çêdikir. Kêm kesan di çêkirina tebatî ya *Ez li pirtûkê dinihêrimê* da zehmetî kişandin, lê bi tenê kesekî ji wan got forma *Li pirtûkê tê nihêrîn* piçek xerîb xuya ye, dîsa jî ti kesî ev binyad neqebûlbar nedît. Yek dikare vê rewşê bi bandora tirkî ve têkildar bike. Lewra di tirkî da berginda *Li pirtûkê tê nihêrînê, kitaba bakılıyor* e ku bi awayê *kitaba (li pirtûkê) + bakılıyor (tê niherîn)* pêk tê. Ji aliyê din ve, eger em vê binyadê wek nerêzimanî qebûl bikin, em dikarin sedema nerêzimanîyê bi REWŞê ve rave bikin. Stowell (1981, r. 143) bi hin cure nimûneyên ji îngilîzî nîşan dide ku dema *FD* li pozîsyona lêbarkirina REWŞê cih digire, ew di îngilîzî da dibe sedema nerêzimanîyê. Di *Li pirtûkê tê nihêrînê* da *FD* ya *li pirtûkê* li pozîsyona nîşankerî ya *DEMê* xuya ye, anku pozîsyona bikerê. Li jêr pozîsyona *FDI* ya *pirtûkê* ya di (53a)yê da û pozîsyona *FD* ya *li pirtûkê* ya di (53b)yê da wek heman pozîsyon xuya ne. Li asta r-binyadên risteyên tebatî, pozîsyona bikerî pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê ye. Ev REWŞ di (53a)yê da li ser *pirtûkê* bi gireya *Ûê* hatiye nîşandan.

(53) a. *[FDI Pirtûk]-Θ tê xwendin*

b. *?[FD li pirtûkê] tê nihêrîn*

Eger (53b) nerêzimanî ye, em dikarin bêjin ji ber ku ew li pozîsyoneka REWŞê bi cih bûye nerêzimanî dibe. Lê di kurmancî da *FD* dikarin li pozîsyonên lêbarkirina REWŞê bi cih bibin. Bo nimûne me nîşan da ku lêkera *zanînê* wek temamker hem *FD* hem jî *FTEMekê* binkategorîze dike û dema *FTEMekê* binkategorîze dike, *FTEM* jî bo ku REWŞê wernegire, cih diguhere. Nexwe diyar dibe ku pozîsyona temamkerî ya *zanînê* pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê ye, lê li gel vê, li wê pozîsyonê mimkin e *FDyek* jî bi cih bibe. Dîsa *FD* dikarin li pozîsyona temamkerî ya îzafeyê jî cih bigirin û li gel ku ev pozîsyon jî pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê ye, li wê pozîsyonê nabin sedema nerêzimanîyê.

(54) *pirtûk [Fî a [FD li malê]]*


Eger em (53b)yê nerêzimanî qebûl bikin û sedema wê bi REWŞê ve têkildar bikin, em divê bêjin (54) jî nerêzimanî ye, lê (54) di kurmancî da rêzimanî ye. Sedemeka zimannasîyî ya ku (53b)yê nerêzimanî dike li ber çavên me nakeve. Lê eger em wê wek rêzimanî qebûl bikin, em divê diyar bikin ji ber kîjan sedeman rêzimanî ye.



Ji bo vê em dê serî li têkilîya ROL û REWŞê bidin. Wekî me gotibû li gor merca xuyanîtîyê, ji bo ku ROL li hêmanekê bê barkirin, REWŞê divê li wê bê barkirin, ji bo ku REWŞ li wê bê barkirin jî ROL divê li wê bê barkirin. Dîsa me dîtibû ku daçek bixwe ROL-barker in û me gotibû di *FDyê* da hêmana ku ROLê wergidire, ne hemû *FD*, temamkera wê ye. Ji alîyê din ve daçek bixwe REWŞ-barker in. Stowell (1981, r. 146) wek prensîpek diyar dike ku REWŞ li kategorîyeka ku REWŞê bar dike, nayê barkirin. Dema em van hemû nihêrînan li gel hev binirxînin, dibe ku em hin sedemên zimannasîyî bi dest bixin ku em bikaribin rêzimanîya (53b)yê bi van sedeman ve têkildar bikin. Pêşî, ji ber ku ROL li *FDyê* nayê barkirin, ne hewce ye REWŞê jî li wê bê barkirin. Dîsa ji ber ku sereya wê bixwe (anku daçek) REWŞ-barker e, nabe ku REWŞ li wê bê barkirin. Ji ber ku *FD* kategorîyeka REWŞ-wergir nine, li pozîsyona lêbarkirina REWŞê bicihbûna wê, nabe sedema nerêzimanîyê.

Komên lêkeran ên din, ku nikarin REWŞê bar bikin, bi rêzê lêkerên têneper, lêkerên tebatî û lêkerên neakûzatîv in. Ji bo van lêkeran em dikarin li vê giştîsazîya Chomskyî (1988, r. 113) binihêrin:

(55) Hêmaneka lêkerî, eger tenê bi tenê ROLê li bikera xwe bar bike, dikare REWŞê li *FDIyeka* ku bi re ve dibe, bar bike.


Ji ber ku lêbarkirina REWŞê li r-binyadê, ROL li k-binyadê tê barkirin, *FDIya* birêvebirî ya ku di (55)an da tê behskirin, ku lêker dê REWŞê li wê bar bike, divê li r-binyadê jî aliyê lêkerê ve bê birêvebirin. Di lêkerên têneper da lêker, li k-binyadê, ROLê li bikera xwe bar dike, lê ev *FDIya* bikerî li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Ji ber vê, li holê *FDIyeka* ku lêker bi rê ve bibe namîne. Di lêkerên tebatî û neakûzatîv da jixwe *FDIyeka* bikerî ku lêker bikaribe ROLê li wê bar bike, tune ye. Lewra ev lêker bi tenê argumentekê li pozîsyona temamkerî binkategorîze dikin ku pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* (ku pozîsyona bikerê ye) li k-binyadê vala ye. Ji bo her yek ji van koma lêkeran li jêr nimûneyek hatîye nîşandan. Wek prensîpek cihguherîn di gavên herî piçûk da pêk tê. Anku hêmana cihguherî her carê cih diguhere bo cihê venişînê yê herî nêzîk (bnr. Haegeman, 1994, r. 403). Di nimûneya (57)an a tebatî da, yekemîn cihê venişînê pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* ye. Ji ber vê, ew divê pêşî cih biguhere bo vê pozîsyonê, piştî cih biguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*. Lê nîşandana vê cihguherîna du gavî di vê nimûneyê da kargînî nine. Ji ber vê heta ku ne kargînî bin, cihguherîna gavgavî dê neyê nîşandan.





Di nimûneyên jorîn da li şopa *FDI*yên cihguherî REWŞ nayê barkirin. Lewra li şopa *FDI*yan REWŞ nayê barkirin (Stowell, 1981, r. 281). Sedem jî ew e ku jixwe *FDI* bixwe REWŞ-wergir in. Wekî me di *FTEM*ên tamamker da dît, REWŞ, li şopên hêmanên ku ROLê werdigirin, lê nikarin REWŞê werbigirin, tê barkirin. Ev ji bo merca xuyanîtiyê bê bi cih hewce ye.

Di kurmancî û zazakî da, forma tebatî ya lêkerên ku *FTEM*ekê binkategorîze dikin jî çêdibe. Bo nimûne em li k-binyada risteya *Hat gotin ku kes li wir nemayeyê* (zz. *Ame vatene ke kes ewca de nêmando*) binihêrin.




Me got di lêkerên tebatî da REWŞa BERKARÎ tê mêtin û temamkera wan li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona bikerî ya risteyê. Eger em di (59)an da bêjin ji ber ku *FTEMa ku kes li wir nemayeyê* (zz. *ke kes ewca de nêmando*) temamker e û ew jî divê wekî *FDIyên* temamker di avahîya tebatî da cih biguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê*, wê demê kêşe derdikeve: Dema ew cih biguhere bo pozîsyona bikerî, REWŞ dê li wê bê barkirin ku wekî me dîtibû *FTEM* jixwe ji bo ku REWŞê wernegire, cih diguhere.

Me li jor, ji bo risteya îngilîzî ya *it is widely believed that John is intelligent* ('Bi piranî tê bawerkirin ku John zîrek e') got di vê risteyê da, li gel ku *FTEMa that John is intelligent* ('ku John zîrek e') li pozîsyona temamkerî ya lêkerê bi cih bûye, lê ji ber ku lêkera tebatî ya (*is believed*, 'tê bawerkirin') REWŞa xwe ya BERKARÎ ji dest daye, ne hewce ye *FTEM* cih biguhere. Ji aliyê din ve wekî di nimûneyê da jî tê

dîtin, îngilîzî di van binyadan da li pozîsyona bikerî *pûçbêjeya* (expletive pronoun)⁵⁶ *itê* bi cih dike ku pêdivîya *PDByê* dabîn dibe.

Berevajî îngilîzî, di kurmancî û zazakî da *pûçbêjeyên* wekî *it, there* ku bikaribin wek biker kar bikin tune ne, lê pozîsyona bikerî divê bi awayekî dagirtî be. Ji ber ku di formên tebatî da temamker cih diguherin bo pozîsyona bikerî, ev *FTEM* divê cih biguhere bo pozîsyona bikerî. Lê pozîsyona bikerî ya *FDEMê* pozîsyoneka lêbarkirina *REWŞê* ye, lewma jî nabe ku *FTEM* cih biguhere bo vê pozîsyonê. Ji aliyê din ve ji ber ku di kurmancî û zazakî da *pûçbêje* tune ne, *FTEMa* temamker a lêkerên tebatî nikare rasterast cih biguhere bo pozîsyona piştî lêkerê. Ev wek nakokî xuya be jî ji bo çareserîyê rêyek heye: Em dikarin qebûl bikin *FTEM* pêşî cih diguhere bo pozîsyona bikerî, ji wir jî cih diguhere bo pozîsyona piştî lêkerê. Bi vî awayî hem pozîsyona bikerî dê ji aliyê şopa *FTEMê* ve bê dagirtin ku dê vala nemîne, lewma jî hewcedarîya *PDByê* dê dabîn bibe, *REWŞ* dê li şopa wê barkirin, hem jî *FTEM* dê xwe ji lêbarkirina *REWŞê* rizgar bike. Ev cihguherîna du gavî li jêr hatîye nîşandan. Me li jor *FTEMa* cihguherî li pozîsyona xwişkî ya *FLyê* bi cih kiribû, lê di binyada jêrîn da *FTEMa* cihguherî li pozîsyona xwişkî ya *FDEMê* hatîye bicihkirin. *FTEM* divê li jor şopên xwe bi cih bibe. Ev ji ber têkiliya *FTEM* û şopên wê pêk tê ku em dê li jêr rave bikin.

⁵⁶ *Pûçbêje* ew cure bêje ne ku xwedî referansekê (referent) ninin, ji aliyê wateyî ve tiştekî li risteyê zêde nakin û bi tenê ji bo dagirtina pozîsyona bikerî tîbî bikaranîn (Haegeman & Guéron, 1999, r. 42). *Pûçbêje* wek biker kar bikin jî xwedî *ROLê* ninin (bnr. Chomsky, 1988, r. 114). Di îngilîzî da *it* û *there* ji van cure bêjeyan in. Di risteyekê da hebûna bikereka bêtî *ROL* ji ber pêdivîyên *PDByê* der tê. Dema bikereka xwedî *ROL* di risteyê da tune be, li şûna bikerê *pûçbêje* tîbî bikaranîn. Di hin cure risteyan da *pûçbêje* bi awayekî mecbûrî tîbî bikaranîn (wekî di risteya *it is widely believed that John is intelligent* da), eger ev neyên bikaranîn binyad dê bêtî biker bimîne û dê nerêzimanî be.



Lê em divê diyar bikin ka ev cihguherîn li gor *B*Gyê guncav e yan na. Lewra hêman ji aliyê cihguherînê ve bi temamî ne azad in. Di *B*Gyê da teorîya ku sînorên cihguherînê diyar dike teorîya Sînorkêş e. Bi diyarkirina Chomskyî (1982, r. 6) ve ev teorî, bi merceka bi navê *merca jêrîtîyê* (subjacency condition) ve cihguherînê bi sînor dike. Bi merca jêrîtîyê pêşî li cihguherînên dirêj tê girtin. Ji bo cihguherînê wek sînor *movikên sînorkêş* (bounding nodes) tên diyarkirin (Cook & Newson, 2007, r. 139). Di îngilîzî da movikên sînorkêş, *FDI* û *FDEM* in⁵⁷. Cihguherîn, nikare di ser ji yekê zêdetir movikên sînorkêş ra derbas bibe (Haegeman, 1994, r. 402). Dema em li cihguherîna di (60)î da dinihêrin, ne cihguherîna gava yekem (ji pozîsyona s^1 ê bo pozîsyona s^2 yan) ne jî ya gava duyem (ji pozîsyona s^2 yan bo pozîsyona xwişkî ya

⁵⁷ Di zimanên cuda da movikên sînorkêş dibe ku cuda bin. Bo nimûne di îtalî da *FDI* û *FTEM* wek movikên sînorkêş hatine qebûlkirin (bnr. Haegeman, 1994, rr. 410-413). Em li ser movikên sînorkêş ên kurmancî û yên zazakî ranawestin.

FDEMa bingehîn) merca jêrîtîyê bin pê nake. Lewra di van gavan da her carê bi tenê movikeka mezintirîn derdan hatîye derbaskirin. Lewma jî cihguherîneka serkeftî pêk tê. Lê ji bo em bikaribin diyar bikin ka ew bi temamî cihguherîneka serkeftî ye yan na, em divê li hin mercên din jî binihêrin.

Yek ji van mercan girêdana şopan e. Ji bo ku em bikaribin bêjin cihguherîna di (60)î da pêk hatîye, serkeftî ye, em divê diyar bikin gelo şopên *FTEMê* tên girêdan an na. Me zincîr bi awayê $\langle FX_i, \varsigma_i \rangle$ ê, du endamî nîşan dabû. Lê zincîr dibe ku bi tenê ji yek endamê (bnr. Haegeman, 1994, r. 191) yan jî ji duduyan zêdetir endaman pêk bê. Zincîra di (60)î da sê endamî ye û bi awayê $\langle ku\ kes\ li\ wir\ nemaye_i, \varsigma_i^2, \varsigma_i^1 \rangle$ tê nîşandan. Di vê zincîrê da ς^2 divê ς^1 ê, *FTEMa* *ku kes li wir nemayeyê* jî ς^2 yan girê bide. Lewra yek ji taybetmendîyên zincîrê ew e ku endameka zincîrê bi awayekî lokal/xwecihî endama paşîn girê dide (Haegeman, 1994, r. 348). Di dardîagramê da ji ber ku ev her sê hêman hevîndeks in, merca yekem a girêdanê bi cih tînin. Merca duyem jî p-fermanberî bû. Anku hêmana dê girêbide, divê li hêmana ku dê bê girêdan p-fermanberîyê bike. Di dardîagrama (60)î da ς^2 li ς^1 ê, *FTEM* jî li ς^2 yan p-fermanberîyê dike. Ji ber vê, di (60)î da girêdana şopan bi awayekî serkeftî pêk tê. Wek encam cihguherîna di (60)î da hem mercên cihguherînê hem jî yên girêdanê dabîn dike.

Li vê derê, em divê derbarê zincîra $\langle ku\ kes\ li\ wir\ nemaye_i, \varsigma_i^2, \varsigma_i^1 \rangle$ ê da çend tiştan diyar bikin. Me gotibû di zincîrekê da hêmana cihguherî wek sereya (head) zincîrê, şop jî wek pêyê (foot) zincîrê kar dike. Chomsky (2015, r. 41) wek *merca zincirê* (*chain condition*) dibêje her zincîrek divê bi pozîsyoneka REWŞê dest pê bike û bi pozîsyoneka ROLê bi dawî bibe. Ji ber vê ye ku Chomsky dibêje, piştî ku hêmanekê cih guherî bo pozîsyoneka REWŞê bi şûn da, êdî ew nikare zêdetir cih biguhere, lewra hemû merc hatine dabînkirin. Ev ji bo kurmancî û zazakî di cihguherîna *FDI*yan ya di avahîya tebatî da rast e. Lewra *FDI* ji pozîsyona temamkerî ya lêkerên tebatî cih diguherin bo pozîsyona nîşankerî a *FDEMê* û li wir REWŞê werdigirin, ku bi vî awayî zincira ku pêk tê ji sereya xwedî REWŞê û ji pêyê xwedî ROLê pêk tê. Lê di zincîra me ya nimûne ($\langle ku\ kes\ li\ wir\ nemaye_i, \varsigma_i^2, \varsigma_i^1 \rangle$) da sereya wê *FTEM*, pêya zincîrê jî ς^1 e. Sereya zincirî *merca zincirê* ya Chomskyî bin pê dike. Ji alîyê din ve piştî ku *FTEM* cih diguhere bo pozîsyoneka REWŞê (ς^2) ew dîsa cih diguhere ku ev jî ne li gor diyarkirina Chomskyî ye ku dibêje piştî hêmanek cih diguhere bo pozîsyona REWŞê ew nikare êdî cih biguhere. Di kurmancî û zazakî da *FTEM* jixwe ji bo ku REWŞê

wernegirin cih diguherin. Lewma ji bo binyadên wekî (60)î cihguherîna *FTEMê* ji pozîsyona *REWŞê*, mecbûrî ye, lewra *FTEM* divê *REWŞê* wernegire. Nexwe em dikarin bêjin merca zincîrê ya Chomskyî, hemû zincîrên ku di kurmancî û zazakî da pêk tên, rave nake. Li şûna wê em dikarin ji bo kurmancî û zazakî bêjin di her zincîrê da hebûna pozîsyoneka *REWŞê* û ya *ROLê* mercên bes in. Di vê zincîrê da pêyê zincîrê bi awayekî sirûştî pozîsyoneka *ROLê* ye, lê pozîsyona sereyê ne hewce ye her carê pozîsyoneka *REWŞê* be.

Ji bo cihguherîneka serkeftî, şop divê ne bi tenê bîrê girêdan, di *BGyê* da tê qebûlîkirin ku şop divê bîrê birêvebirin jî. Lê birêvebirina şopan ne wek hêmanên din e. Birêvebirina şopan bi du awayan çêdibe: *ROL-birêvebirin* (theta-government) û *pêşane-birêvebirin* (antecedent-government)⁵⁸. Ev birêvebirina taybet a şopan wek *birêvebirina dirist* (proper government) tê binavkirin. Chomsky (1997, r. 17) birêvebirina dirist weha rave dike:

(61) *Ayek, Byekê bi awayekî dirist bi rê ve dibe eger tenê bi tenê A, Byê ROL-bi rê ve bibe yan jî Byê pêşane-bi rê ve bibe.*

Ev her du cure birêvebirin di Haegemanê (1994, r. 442) da weha hatine pênasekirin:

(62) a. *Ayek, Byekê ROL – bi rê ve dibe, eger tenê bi tenê A, Byê bi rê ve bibe û ROLê li Byê bar bike.*

b. *Ayek, Byekê pêşane – bi rê ve dibe, eger tenê bi tenê A, Byê bi rê ve bibe û A li gel Byê hevîndeks be.*

Pêwîstîya birêvebirina şopan a di çarçoveya birêvebirina dirist da, bi *Prensîpa Kategorîya Vala* (Empty Category Principle) (*PKV*) ve tê dabînkirin. Di navê vê prensîpê da *Kategorîya Vala* cih bigire jî Chomsky (2015, r. 129) dibêje *PKV* bi tenê

⁵⁸ Di risteyekê da, *FDIyeka* ku wateya xwe dide *FDIyeka* din *pêşane* (antecedent) ye (Carnie, 2013, r. 150) Bo nimûne di *Dîlanê xwe dîtê* da cihê wateya *xweyê* wateya xwe jî *FDIya Dîlanê* werdigire. Ji ber vê *Dîlan* jî bo *xweyê* pêşane ye. Ji bo ku pêşane bikaribe wateya xwe bide hêmanekê ew divê hevîndeks bin (wekî *Dîlanê_i xwe_i dît*) û pêşane divê hêmana din girê bide. Di girêdanê da hêmana pêşane *girêdar* (binder) e, hêmana ku tê girêdan jî *girêdayî* (bindee) ye (bnr. Carnie, 2013, r. 153). Pêşanetî di heman demê da amaje bi bicîhbûna li pozîsyoneka li pêş hêmana girêdayî dike, lê di nimûneya me da *FTEMa* cihguherî li pêş şîyê cih nagire, li gel vê em *FTEMê* wek pêşane qebûl dikin, lewra em pêşanetîyê ne li gor *pêşekîya* (precedence) *berwarî* (horizontal), li gor pozîsyona hîyerarşik a stûnî dinirxînin. *FTEMa* di nimûneya me da jî alîyê hîyerarşik ve li jor şîyê cih digire.

li ser şopan kar dike, li ser kategorîyên vala yê din ên wekî *CIH*, *cih* û *v(ala)yê* kar nake. Chomsky (1988, r. 250) vê prensîpê weha diyar dike:

(63) *Prensîpa Katgorîya Vala*

Şop divê bi awayekî dirist bîn birêvebirin.

Di çarçoveya nû da, em dikarin birêvebirinê ji nû ve bi awayê jêrîn diyar bikin:

(64) *Birêvebirin*

Ayek, *Byekê* bi rê ve dibe eger tenê bi tenê;

a. *A* rêvebirek be;

b. *A* li *Byê* p-fermanberîyê bike;

c. Di navbera *A* û *Byê* da asteng tune bin;

d. mînimālîtî (minimality) bê parastin

Rêvebir sere yan jî *FX*ên hevîndeks in (Haegeman, 1994, r. 442)

Em dikarin bi kurtasî bêjin têgeha mînimālîtîyê amaje bi rêvebira herî nêzîk a hêmana ku dê bê birêvebirin, dike ku weha tê pênasekirin:

(65) *mînimālîtî*

Ayek, *Byekê* bi rê ve dibe eger tenê bi tenê movikeka *Zyê* ya weha tune be;

a. *Z* rêvebireka potansîyel e ji bo *Byê*;

b. *Z* li *Byê* p-fermanberîyê dike;

c. *Z* li *Ayê* p-fermanberîyê nake (Haegeman, 1994, r. 442)

Di (60)î da, ζ^1 ji alîyê lêkera tebatî ya *tê gotinê* ve tê ROL-birêvebirin. Lewra lêker ζ^1 ê bi rê ve dibe û ROLê li wê bar dike. ζ^2 li pozîsyona nîşankerî ya *FDEMê* bi cih bûye û ji alîyê *DEMê* ve tê birêvebirin. Lê birêvebirina *DEMê* ya li ser vê şopê, ji bo ku rêvebirina dirist pêk bê, têrê nake. Wekî di Haegemanê (1994, r. 442) da hatîye diyarkirin ji bo hêmanekê, *rêvebira dirist* (proper governor) ew e ku ya wê ROL-bi rê ve dibe yan jî pêşane-bi rê ve dibe. *DEM*, ROLê li vê şopê bar nake. Ji alîyê din ve *DEM* ne frêzî ye, lewma jî wek rêvebir merca *FX*a hevîndeks a di (64)an da bi cih nayîne. Rêvebireka din a potansîyel sereya *TEMa* bingeîn e, lê ew jî ne frêzî ye û ROLê li ζ^2 yê bar nake. Dîsa *TEMa* bingeîn li *FTEMa* cihguherî p-fermanerîyê dike

ku ev merca (65c)yê bin pê dike. *FTEMa* cihguherî, *ROLê* li $\text{ş}^2\text{yê}$ bar nake, lê ew frêzî ye û li gel şopê hevîndeke e. Lewma wek sereya potansîyel, ew dikare $\text{ş}^2\text{yê}$ pêşane-bi rê ve bibe, lê ji bo vê, em divê qebûl bikin *FDEMa* ku xwişka *FTEMa ku kes li wir nemayeyê* ye, li ber birêvebirinê nabe asteng. Dema em vê qebûl bikin, *FTEMa ku kes li wir nemayeyê* bi awayekî serkeftî $\text{ş}^2\text{yê}$ pêşane-bi rê ve dibe. Bi vî awayî di (60)î da her du şop jî wekî *PKV* pêwîst dike, bi awayekî dirist tîn birêvebirin. Wek encam diyar dibe ku şopên li pozîsyona temamkerî tîn *ROL*-birêvebirin ên li pozîsyona bikerî tîn pêşane-birêvebirin.

4.1.3.3. REWŞ di Pêveberên Kompleks ên Kurmancî û yê Zazakî da


Wekî lêkeran em dê *PKyan* jî ji aliyê hêza wan a lêbarkirina *REWŞê* ve bikin du kom: *PKyên ku REWŞê bar dikin* û *PKyên ku REWŞê bar nakin*. Pîvera me dîsa heman e: *PKyên ku FDIyeka* berkarî yan jî *FTEMekê* binktagorîze dikin, *REWŞê* bar dikin, yê mayîn *REWŞê* bar nakin. Binyada frêzî ya *PKyan* ya ku me pêşkêş kiribû, em dê li vir jî bi kar bînin. Ji bo vê binbeşê jî em dê bi kurtasî çarçoveyeka teorîk diyar bikin. Dîsa me di binbeşa pêşîn da diyar kir ku hêmana ku *REWŞê* li temamkera xwe bar dike, lêker e. Lê wekî em dizanin *PK* binyadên pir-sereyî (multi-headed) ne. Lewma em divê diyar bikin ka di *PKyan* da ji lêbarkirina *REWŞê* kîjan hêmana/ên *PKyê* berpirsyar e/in.

4.1.3.4. Çarçoveya Teorîk

Wekî di mijarên din ên derbarê *PKyan* da, li ser lêbarkirina *REWŞê* ya di *PKyan* da jî nelihevîyek heye. Wekî me dîtibû Bakerî (1988), *PK* bi proseseka bi navê *beşdarbûnê* ve analîz dikirin. Li gor vê, di *PKyên N+LSyî* da sereya *FNya* temamker a lêkerê cih diguhere, beşdarî lêkerê dibe. Li gor Bakerî (bnr. 1988, rr. 105-129) di *PKyên N+LSyî* da, li gel ku *N* ji aliyê fonolojîk ve bi awayekî aşkere pêk tê jî ne hewce ye ew *REWŞê* werbigire. Lê wekî me bi nimûneyan nîşan dabû ji ber hin sedeman *beşdarbûna* Bakerî ji bo binyada argumentî û binyada frêzî ya her cure *PKya* kurmancî raveker nine. *REWŞ* jî tîkildar e bi binyada argumentî û ya frêzî, lewma boçûna Bakerî ji aliyê *REWŞê* ve jî ji bo hemû *PKyên* kurmancî û zazakî raveker nine.

Me behsa boçûna *Transfera Argumentan* a Grimshaw û Mesterî kiribû. Mohammad û Karimi (1992) vê boçûnê, li ser *PKyên* farisî disepînin û derbarê *REWŞê* da jî hin angaştan pêşkêş dikin. Mohammad û Karimi (1992, rr. 205-206, 209), *Nya*

(ew wek *FN* diyar dikan) *PKyê* jî wek berkar qebûl dikan û dibêjin di *PKyên* farisî da du pozîsyonên berkarî hene. Lê cudahî ev e ku *Nya PKyan*, hêmaneka ne-diyar (non-specific) e, li pozîsyona xwişkî ya *LSyê* cih digire û li vê *Nyê*, di çarçoveya birêvebirinê da ji aliyê *LSyê* ve Rewşa binyadî (structural Case) tê barkirin. *FNya* berkarî ya *PKyê* hêmaneka diyar (specific) e, xwedî *ROL* e û ew li pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* cih digire û ji aliyê sereya bi navê *AGROYê* (rêkeftina berkarî (*RB*)) ve di çarçoveya birêvebirinê da Rewşa hundirîn (inherent Case) li wê tê barkirin. Binyada giştî ya van *PKyan* Mohammad û Karimi (1992, r. 206) weha nîşan didin:



Li heman derê Mohammad û Karimi dibêjin tiştê krîtîk ê di vê cudahîyê da ew e ku li gel ku *FNya* diyar xwedî *ROLê* ye, *FNya* ne-diyar xwedî *ROLê* nine. Lewma jî ew, wergirtina *REWŞên* hundirîn û binyadî ya van *FNyan* bi *ROLê* ve têkildar dikan: *FNya* xwedî *ROLê* *REWŞa* hundirîn, ya ne xwedî *ROLê*, *REWŞa* binyadî werdigire. Me jî diyar kiribû ku *REWŞa* hundirîn têkildar e bi *ROLê* ve, *REWŞa* binyadî jî têkildar e bi pozîsyona sîntaktîk a *FDIyê* ve. Di kurmancî û zazakî da dema *PK* wek temamker *FDIyekê* binkategorîze dikan, ev *FDI*, wekî *FDIya* temamker a di lêkerên têper da tevdigere. Lewma jî li gor pozîsyona wê ya sîntaktîk *REWŞa* wê jî diguhere. Bo nimûne em li *PKya av danê* (zz. *awe dayene*) binihêrin.

(67)

a. *Dîlan* [_{FDI} *kulîlk*]-ê av dide / zz. *Dîlane* [_{FDI} *vile*]-*TWNG* awe dana

b. [_{FDI} *Kulîlk*]-*Θ* tê avdan / zz. [_{FDI} *Vile*]-*Θ* yena awedayene

Di (67a)yê da, *kulîlk* (zz. *vile*) xwedî REWŞa TEWANGê, lê di (67b)yê da, xwedî REWŞa XWERÛ ye. Eger em ji alîyê sîntaktîk ve bêjin, di (67a)yê da REWŞa *kulîlkê* BERKARÎ, di (67b)yê da BIKERÎ ye. Me ev guherîn bi pozîsyona wê ya sîntaktîk ve têkildar kiribû ku ev taybetmendîyeka REWŞa binyadî ye. Lewma boçûna Mohammad û Karimiyê, nikare ji bo xebata me rave bike çima dema *kulîlk* cih diguhere REWŞa wê diguhere. Lewra me diyar kiribû ku REWŞên hundirîn bi *FDI*yan ve zeliqandî ne û ew cih biguherin jî REWŞa wan naguhere.

Di hin xebatan da hin cure *PKyên* kurmançî ji alîyê REWŞê ve hatine analîzkirin. Bo nimûne Îboyê (2008, r. 117) hin *PKyên* kurmançî (ne di bin navê pêveberên kompleks be da jî) ji alîyê REWŞê ve analîz kirine. Li gor analîzên wê, di *PKyan* da hêmanên ji xeynî *LSyê* temamkerên *LSyê* ne. Dîsa li gor wê, hêmana navdêrî ya *PKyan* wek berkar kar dike. Em li nimûneyeka wê binihêrin:

(68) *Me dest bi kongreyê kir*

Îbo dibêje di risteya (68)an da *dest* berkara *kirinê* ye, REWŞa wê ABSOLUTÎV (di xebata me da XWERÛ) ye û ev REWŞ ji alîyê rêkeftina berkarî ve li wê tê barkirin⁵⁹. *FDIya kongreyê* di REWŞa ERGATÎV (TEWANG) da ye û vê REWŞê ji pêşdaçeka *biyê* werdigire. Dîsa li gor wê, *FDIya dest* û *FDya bi kongreyê* temamkerên lêkera *kirinê* ne, ku ji bo temamkirina wateya lêkerê hewce ne. Lê em dibêjin *dest* xwedî REWŞekê nine, lewra ROL li wê nehatîye barkirin. Dîsa em *dest* û *bi kongreyê* bi têgihîştina Îboyê ji bo wateya karê lêkerê pêk bê wek temamker nabînin. Li gor analîzên me *dest* û pêşdaçeka *biyê* jixwe çêkerên wateya *PKyê* ne, ku li vir bandora *kongreyê* tune ye. Ew bi tenê zêdekek e ku li asta r-binyadê li sîstemê tê zêdekirin.

Ji yên Îboyê cuda bin jî Gündoğdu (2015, r. 291) jî qebûl dike ku *Nya* hin *PKyan* REWŞê werdigire. Gündoğdu dibêje ji ber ku berginda lêkerên sivik ên *PKyên* ne-ergatîv her carê lêkerekê giran a têper e (wekî *do/make* ('kirin'), *give* ('dan')) lewma jî *PKyên* ne-ergatîv jî têper in û ji ber vê jî ew divê xwedî berkarekê bin. Her çiqas

⁵⁹ Di heman derê da Îbo diyar dike ku di demên ne-borî da *dest* xwedî gireya tewangê ye (wekî *Em dê dest-î (dest) bi kongreyê bikin*), lê gelek caran ev gire (-î) nayê gotin.

hêmana navdêrî ya *PKyên* ne-ergatîv wek argumenteka sîntaktîk kar neke jî, hêj têkildar e bi rewşa rêzimanî ya sîntaktîk ve. *LSyên PKyên* ne-ergatîv ên kurmancî, ji ber ku têper in, xwedî rewşa AKÛZATÎV in ku ev rewşa rêzimanî divê bê kontrolkirin (check). Dema di sîstemê da berkareka rasterast tune be wê demê ji bo ku dariştineka serkeftî pêk bê, wek çareya dawîn, hêmana navdêrî (*N*) vê rewşê kontrol dike.

Ev angaştê Gündoğduyê, ji bo risteyên wekî *Dîlanê sond xwarê*, *Dîlanê ji hevala xwe hez kirê* raveker e. Lewra ev riste di dema borî da hatine çêkirin û di kurmancî da, di demên borî da REWŞa berkarê bi awayekî morfolojîk xuya nake. Lê eger dema risteyê ne-borî be, wê demê modela Gündoğduyê nikare raveker be. Lewra di kurmancî da rewşa AKÛZATÎV bi tenê di demên borî da bi awayekî aşkere pêk nayê (bo nimûne di risteya *Dîlan pirtûk-ê dixwîneyê* da -êya li ser pirtûkê vê REWŞê nîşan dide). Nexwe li gor vê modelê, di risteyên nimûne da, di demên ne-borî da jî rewşa AKÛZATÎV a *LSyê* divê bê kontrolkirin, lê wê demê binyadên wekî **Dîlan sond-ê dixwe*, **Dîlan ji hevala xwe hez-ê dikeyê* dê pêk bên ku nerêzimanî ne. Her çiqas Gündoğdu dibêje *Nyên PKyên* ne-ergatîv di bingeha xwe da berkarên rasteqîn nînin û lewma jî rewşa AKÛZATÎV a aşkere wernagirin jî bi qasî me dît sedemên zimannasîyî yê wê angaştê, di xebatên wê da nehatine zelalkirin. Ev wek qek pêşqebûlek hatîye pêşkêşkirin. Ji aliyê din ve, me dîtibû ku forma lêkerên tebatî li ferhengê çêdibe û di encama tebatîkirinê da lêker hêza xwe ya lêbarkirina REWŞa BERKARÎ wînda dîkin. Me qebûl kiribû ku *PK* jî di ferhengê da pêk tînin, lewma em qebûl dîkin, hin *LSyên* têper nikarin REWŞê bar bikin, lewra vê hêza xwe di prosesa çêbûna *PKyê* da ji dest didin. Bo nimûne di *PKyên* bê temamker da *LS* vê hêza xwe ji dest dide, lewma di *PKyên* wekî *sond xwarinê* da, REWŞ li *sondê* nayê barkirin. Li gel vê, eger *ROL* li *sondê* bihata barkirin, ji bo wergirtina REWŞê, wê viyabû bi awayekî mecbûrî cih biguherta bo pozîsyoneka wergirtina REWŞê, lê ji ber ku ew *ROLê* wernagire, hewce nake cih biguhere bo pozîsyoneka din.

Dema em li nîqaşên jorîn dinîhêrin, diyar dibe ku li gor Mohammad û Karimiyê REWŞa di *PKyan* da ji aliyê rêkeftina berkarî (*RB*) yan jî *LSyê* ve, li gor Îboyê ji aliyê rêkeftina berkarî ve, li gor Gündoğduyê jî ji aliyê *LSyê* ve tê diyarkirin. Haig (2002) di xebata xwe da li ser rewşa rêzimanî nasekine, lê Haig (2002, r. 45) ji bo *PKyên* kurmancî yê *N+LSyî* yê ku ew wan wek beşdarbûyî disenifîne (wekî *derman kirin*, *maç kirin*) dibêje tekane rewş-barker *LS* ye. Em jî li gel wê ne ku di *PKyan* da hêmana

berpirsyar a ji lêbarkirina REWŞa temamkerê, *LS* ye. Lewra di lêkerên giran ên REWŞ-barker da, lêker REWŞê li temamkerê bar dikin, dema ew wek *LSyek* kar dikin, hin ji wan vê taybetmendîya xwe didomînin.

Teorîya REWŞê bi navgîneka bi navê *filtreya REWŞê* (CASE filter) ve pêwist dike ku her *FDI*ya ku bi awayekî aşkere pêk hatîye divê REWŞê werbigire. Chomskyî (1988, r. 49) vê filtreyê weha diyar dike:

(69) **FDI*, eger [ev] *FDI* xwedî naveroreka fonetîk be û xwedî REWŞê nebe

(69), bi awayekî kurtasî dibêje eger *FDI*yeka di binyadeka zimanî da, bi awayekî fonetîkî pêk hatibe û eger REWŞ li wê nehatibe barkirin, wê demê ew *FDI* ji aliyê sîstemê ve nayê nasîn, lewma binyad wek nerêzimanî tê kodkirin. Bi saya vê filtreyê dê binyadên ku REWŞ li *FDI*yên wan nehatine barkirin, neyên hilberîn. Heke filtreyeka bi vî rengî tune be, rêziman dikare binyadeka wekî ya jêrîn hilberîne:

(70) **Dîlan pirtûk-Ø xwend*

Di (70)î da li *Dîlanê* REWŞ nehatîye barkirin. Ji ber ku di binyada (70)î da hêmaneka ku REWŞ lê nehatîye barkirin heye, ew wek nerêzimanî hatîye kodkirin. Esas em dikarin bêjin di binyadekê da hebûna *FDI*yeka bêtî REWŞ, ji aliyê rêzimanê ve "tune" tê hesibandin. Lewma jî binyada (70)î û ya **pirtûk xwend* (ne wek *FLyekê*, lê wek *risteyekê*) ji ber heman sedemê nerêzimanî ne. Anku li gel ku di (70)î da *FDI*ya *Dîlanê* heye, lê ji ber ku REWŞ li wê nehatîye barkirin wekî ku ew tune be, binyad wek "bê biker" tê şirovekirin.


Dema em mijara *PKyên* wekî *sond* xwarinê bi tenê li gor filtreya REWŞê binirxînin, em divê nimûneyên wekî *Dîlan sond dixweyê* wek nerêzimanî qebûl bikin. Lewra di vê nimûneyê da *sond*, li gel ku *FDI*yek e û bi awayekî fonetîkî pêkhatîye, bêtî REWŞ e. Lê wekî me dîtibû di çarçoveya merca xuyanîtiyê da REWŞ têkildar e bi *ROLê* jî ku li gor vê mercê, ji bo *FDI*yek bikaribe REWŞê werbigire, *ROL* divê li wê hatibe barkirin, ji bo *ROLê* werbigire jî REWŞ divê li wê hatibe barkirin. Ji ber ku di *PKyên* wekî *sond xwarinê* da *sond* bêtî *ROL* e, lewma ne hewce ye REWŞ jî li wê bê barkirin. Ji ber vê, di vê xebatê da em qebûl dikin ku di *PKyên N+LSyî* (yan jî *PKyên* ku yek ji pêkhênên wan *Nyek* e) da, dema *PK* xwedî temamkerekê nebe, ku temamker wek *FDI*, *FD* an jî *FTEMekê* pêk tê, *Nya PKyê* wek berkar kar dike û di

demên borî da li gel lêkerê rêkeftî dibe, lê REWŞ li Nyê nayê barkirin. Ji ber vê jî Nyên bêREWŞ ên PKyan li gel ku bi awayekî fonetîkî pêk tên, nakevin ber filtreyê REWŞê.


4.1.3.5. Pêveberên Kompleks ên ku REWŞê Bar Dikin

PKyên ku REWŞê bar dikin ew cure PK ne ku yan wek temamker *FDI*yek an jî *FTEMekê* binkategorîze dikin. Dema temamker *FDI* be, ev *FDI* divê li r-binyadê cih neguhêre. Bi vî awayî bi tenê hin cure PKyên ku me wek PKyên têper senifandibûn REWŞê bar dikin. Li jêr bi rêzê em dê li van PKyan binihêrin û ji bo her cureyê nimûneyekê nîşan bidin.

Yek ji koma PKyan a ku REWŞê bar dike, me wek PKyên bi temamkera *FDI*yî diyar kiribûn. Ji ber ku me nimûneyên wan berê nîşan dabûn em dê li vir cardin wan bi cih nekin. Lêbarkirina REWŞê ya van cure PKyan bi nimûneya PKya *av danê* (zz. *awe dayene*) li jêr hatîye nîşandan.





Hin cure PKyên *N+LSyî* yên ku dikarin *FTEMekê* binkategorîze bikin jî REWŞê bar dikin. Bo nimûne *fêm/fehm kirin* (zz. *fehm kerdene*), *hêvî kirin* (zz. *hêvî kerdene*), *bawer kirin* (zz. *bawer kerdene*) ji van PKyan in. Li jêr ji bo PKya *bawer kirinê* nimûne hatîye nîşandan. Wekî berê jî hatibû dîtin, REWŞ li şopa *FTEMan* tê barkirin.







Koma duyem a ku REWŞê bar dike, *PKyên têper ên R+LSyî* ne. Li jêr ji bo *nexweş kirinê* (zz. *nêweş kerdene*) nimûne hatîye nîşandan.




221











Koma çarem a *PKyan* ku REWŞê bar dike, ji *PKyên* têper ên *P+LSyî* pêk tê. Li jêr ji bo *ve-kirinê* (zz. *a-kerdene*) nimûne hatiye nîşandan.




4.1.3.6. Pêveberên Kompleks ên ku REWŞê Bar Nakin

Ji bilî *PKyên* têper ên ku *FDIyekê* yan jî *FTEMekê* binkategorîze dikin, ên mayîn têper bin jî REWŞê bar nakin. Di kurmancî û zazakî da hin komên ji *PKyên* têper, *PKyên* neakûzatîv û *PKyên* tebatî REWŞê bar nakin. *PKyên* têper ên ku REWŞê bar nakin, ji ber wê ye ku *LSya* wan, hêza xwe ya lêbarkirina REWŞê di çêbûna prosesa *PKyê* da winda dike. Li jêr, em dê ji bo her koma *PKyên* ku REWŞê bar nakin, nimûneyekê nîşan bidin.


Pêşî em dê li *PKyên N+LSyî* yên têper yên ku REWŞê bar nakin binihêrin. Yekem koma *PKyên N+LSyî* yên ku REWŞê bar nakin, hin *PKyên* bi temamkera xwedîtîyê ne. Li jêr, ji bo *PKya bêrî kirinê* (zz. *bêrî kerdene*) nimûne hatîye bicihkirin. Di vê nimûneyê da temamker bi awayekî cuda li pozîsyona temamkerî ya *FNyê* nehatîye nîşankirin. Ew her du li bin şaxa *FDIyê* hatine bicihkirin.




PKyên bê temamker jî REWŞê bar nakin. Li jêr, ji bo *PKya sond xwarinê* (zz. *sond werdene*) nimûne hatîye nîşandan.




Koma sêyem a PKyên *N+LSyî* ya ku REWŞê bar nake hin PKyên bi temamkera daçekî digire nav xwe. Li jêr ji bo *hez kirinê* (zz. *hes kerdene*) nimûne hatîye nişandan.



Koma çarem a *PKyên* têper a ku *REWŞê* bar nake ji *PKyên N+D+LSyî* pêk tê. Li jêr, ji bo *dest pê kirinê* nimûne hatiye nîşandan. Di nimûneya jêrîn da *FDIya karê xwe* (zz. *karê xo*) ne temamker, zêdek e.



PKyên neakûzatîv jî wekî lêkerên neakûzatîv tev digerin. Temamkera wan a ROL-barkirî li r-binyadê ji ber hewcedarîyên *PDByê* û ji bo ku *REWŞê* werbigire cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *DEMê* û li wir ji *DEMê* *REWŞa BIKERÎ* werdigire. Lewma jî *PKyên* neakûzatîv *REWŞ-barker* ninin. Me *PKyên* neakûzatîv li gor hêmana ne-lêkerî wek *PKyên R+LSyî* (wekî *nexweş ketin* (zz. *nêweş kewtene*)), *PKyên D+LSyî* (wekî *bi rê ketin* (zz. *ra raye kewtene*), *lê ketin* (zz. *pi ro kewtene*)) û *PKyên P+LSyî* (wekî *ra-ketin* (zz. *ra-kewtene*)) dabeş kiribûn. Di hemû cure *PKyên* neakûzatîv da temamker wek *FDIyek* pêk tê. Ji ber ku hemû cure *PKyên* neakûzatîv wek hev tevdigiren, em dê bi tenê ji bo yekê ji wan nimûneyê nîşan bidin. Li jêr ji bo *PKya nexweş ketinê* nimûne hatiye nîşandan.



Koma dawîn a *PKyên* ku *REWŞê* bar nake, *PKyên* tebatî ne. Di *PKyên* tebatî da dema temamkera *PKyê FDIyek* be, ji bo *REWŞê* werbigire (û ji ber hewcedariyên *PDByê*), wekî di lêkerên tebatî da pek tê, ew cih diguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *DEM''ê*.


(87) a. *Dilanê kulîlk av da-n / zz. Dîlane vile-(yî) awe da-(y)î*

b. *Kulîlk_i [$\S_i$ hat-in avdan] / Vile-(y)_i [$\S_i$ ame-(y)_i awedayene]*

(87b), forma tebatî ya (87a)yê ye. Di (87b)yê da *kulîlk* (zz. *vile*) li pozîsyona temamkerî ya *PKya av danê* (zz. *awe dayene*) tê hilberîn û *ROL* li wê tê barkirin. Li asta r-binyadê, wekî di (87b)yê da xuya dike, ew cih diguhere bo pozîsyona bikerî ya risteyê û li wir *REWŞa BIKERÎ* distîne.

Ji alîyê din ve wekî me dîtibû bi tenê lêkerên têper dikarin forma tebatî pêk bînin, lê heman tişt ji bo *PKyan* ne rast e. Lewra hin cure *PKyên* têper jî nikarin forma tebatî pêk bînin. Sedema vê têkildar e bi *ROLê* ve. Her lêkera têper herî kêr xwedî du heb *ROLan* e, lê wekî me dîtibû hin *PK* bi tenê xwedî *ROLe* ne ku ev *ROL* jî ya bikerê ye. Dîsa me dîtibû tebatîkirin *ROLa* bikerê dimêje. Ji ber vê, *PKyên* bi tenê xwedî *ROLa* bikerê ne, nabe ku bîn tebatîkirin. Bo nimûne *PKyên* bê temamker ên wekî *sond xwarin* (zz. *sond werdene*), *şerm kirin* (zz. *şerm kerdene*) ji van cure *PKyan* in. Wekî


dardîagrama jêrîn jî nîşan dide, di van cure *PKyan* da nabe ku *Nya PKyan* cih biguhere bo pozîsyona bikerî.



Di (88)an da ji alîyê teknîkî ve heta pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* li ber cihguherîna *sondê* astengek tune ye. Lewra ev pozîsyon, pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê nine. Lê pozîsyona nîşankerî ya *DEMê*, pozîsyoneka lêbarkirina REWŞê ye. Ji bo ku *sond* bikaribe REWŞê werbigire, ROL divê li wê hatibe barkirin. Wekî me dîtibû *Nya PKyan* ROLê wernagire, lewma jî nikare REWŞê werbigire. Ji alîyê din ve wekî heta niha me dît, cihguherîna *FDIyekê* ya bo pozîsyona bikerî, ji ber du sedeman pêk tê: yek ji ber hewcedarîyên *PDByê*, ku hebûna bikerekê pêwîst dike, ya duyem hêmana ku xwedî ROL e ji bo ku REWŞê werbigire cih diguhere bo pozîsyona bikerî. Lewma dema yek ji van sedeman tune be, cihguherîna *FDIyekê* nayê destpêkirin. Ji ber vê, esas di (88)an da, *sond* cih naguhere bo pozîsyona nîşankerî ya *FLyê* jî. Lewra hewcedarîyeka bi vî rengî tune ye. Wek encam *sond* li pozîsyona xwe dimîne. Ji ber vê jî formên wekî **Sond hat xwarinê* (zz. **Sond ame werdene*) pêk nayên.

Wekî me berê dîtibû, li gor Haigî, di *PKyên* bi temamkera xwedîtîyê da (wekî *qal kirin*, *bêrî kirin*, *pesn dan*), *Nya PKyê* li gel temamkera xwe di risteya tebatî da wek biker kar dike (wekî *qal-a me nehatîye kirin*), lê Gündoğdu (2015, rr. 290)

binyadên bi vî rengî nerêzimanî qebûl dike. Bo nimûne li gor wê binyada *pesn-a wî hat dan* nerêzimanî ye. Di vê mijarê em jî li gel Haigî ne û bi ya me ev cure binyad rêzimanî ne. Em vê mijarê bi ROLê têkildar dikin. Ji bo vê em li nimûneya jêrîn binihêrin.



Wekî *LSya sond xwarinê*, *LSya PKya qal kirinê* jî REWŞê bar nake. Ji vî alîyî ve di navbera wan da cudahî tune ye. Lê berevajî *sond xwarinê*, *qal kirin* xwedî temamkerekê ye. Ev temamker li pozîsyona temamkerî ya *Nya qalê* pêk tê û ROL li wê tê barkirin. Her du bi hev ra *FDIyekê* pek tînin. Di forma tebatî da hêmana ku cih diguhere bo pozîsyona bikerî, tevahîya vê *FDIyê* ye. Di navbera *sond xwarin* û *qal kirinê* da tekane cudahî ew e ku li gel *qalê* hêmaneka xwedî ROL jî cih diguhere. Ji ber vê, em dikarin bêjin ji bo ku tebatîya *PKyan* çêbe, herî kêma hêmaneka ROL barkirî divê li pozîsyona bikerî bi cih bibe. Ji ber ku ev ji bo *sond xwarinê* pêkan nine, tebatîya wê jî pêk nayê, lê ji bo *PKya qal kirinê* ev pêkan e.

ENCAM

Rêzimana Gerdûnî, qebûl dike ku di bingehe da, an ku li asta kûr, hemû ziman yek in. Lewra li gor *RGyê* sîstema ku zimanan dabîn dike, zikmakî ye û di mêjîyê her mirovî da bi awayekî genetîkî heye. Cudahîyên ku di navbera zimanan da tên dîtin, li asta rûser in. Boçûna *RGyê* ji alîyê Chomskyî ve cara pêşîn di salên 1950î da hatîye pêşkêşkirin. "Rêzimana Gerdûnî" navê giştî yê boçûnê be jî, di qonaxên cuda da ev boçûn di bin navên taybet da hatîye formulîzekirin. Her yek ji van formulasyonan wek teorî jî tê nasîn.

Yek ji van teorîyan jî *Teorîya Birêvebirin û Girêdanê* ye. Ev teorî teorîyeka moduler e û ji hin binteorîyan pêk tê. Du heb ji van teorîyan, teorîya ROLê û teorîya REWŞê ne. Navenda vê xebatê angaşt û pêşbînîyên van her du binteorîyan pêk anî. Di vê xebatê da me lêkerên (û pêveberên kompleks) du zaravayên kurdî, kurmancî û zazakî, ji alîyê teorîya ROLê û teorîya REWŞê ve vekolandin.

Teorîya ROLê, li ser têkilîyên taybetmendîyên semantîk û sîntaktîk ên yekeyên ferhengî kar dike. Eger em ji bo lêkeran bêjin, di risteyê da her lêker hin taybetmendîyên semantîk li argumentên xwe bar dike. Her yek ji van taybetmendîyên semantîk wek ROL tê zanîn. Lêker li argumentên xwe ROLên wekî KARA, MIJAR, KARLÊBÛYÎ, HEDEF û yd. bar dikin. Hejmara ROLan diyar e û wek lîsteyek di zimanan da heye. Lewma lêkerên cuda dikarin heman ROLan bar bikin. Bo nimûne hem lêkera *xwendinê* hem jî ya *kenînê* li argumenta xwe ya bikerî ROLa KARAYê bar dikin.

Em dikarin argumentan bikin du kom: Argumenta bikerî û argumenta temamkerî (yan jî berkarî). Cureya kategorîya argumenta bikerî ji bo lêkeran (yên tebatî ne tê da ku ji bo kêma lêkeran wek *FD* jî pêk tê) diyar e ku *FDIyek* e. Hejmar û cureya kategorîya argumenta/ên temamkerî li gor cureya lêkeran guherbar e. Hin lêker bi tenê *FDIyekê*, hinek ji wan bi tenê *FDyekê*, hin ji wan *FTEMekê*, hin ji wan jî dikarin du heb ji van kategorîyên temamkeran wek alternatîf binkategorîze bikin.

Me lêker li gor hejmara ROLên ku bar dikin di bin sê komên sereke da senifandin: *Lêkerên yek-ROLî*, *lêkerên du-ROLî* û *lêkerên sê-ROLî*.

Me lêkerên yek-ROLî di bin sê binkoman da analîz kirin: *Lêkerên teneper*, *lêkerên tebatî* û *lêkerên neakûzativ*. Lêkerên teneper bi tenê xwedî argumenta bikerî

ne û li vê argumentê ROLa KARAYê bar dikin. Lêkerên tebatî argumenta berkarî binkategorîze dikin û li vê argumentê ROLeka ji bilî KARAYê, ROLeka din (wekî MIJAR, KARLÊBÛYÎ) bar dikin. Lêkerên neakûzatîv jî wekî lêkerên tebatî ROLê li argumenta berkarî bar dikin, lewma ew jî ROLa KARAYê bar nakin. Lêkerên tebatî cuda jî lêkerên neakûzatîv di ferhenga kurmancî û zazakî da cih nagirin. Ji aliyê binyada ROLê û analîzên li gor ROLê ve di navbera lêkerên yek-ROLê yên kurmancî û zazakî da cudahî nehatin tesbîtkirin. Lê ev nayê wê wateyê ku di her du zaravayan da hemû lêkerên bergindên hevûdin di bin heman komê da cih digirin. Hin lêkerên kurmancî, di zazakî da berginda wan *PK*yek e. Bo nimûne lêkera *meşînê* ya kurmancî me wek lêkerekê yek-ROLê ya teneper senifand, lê di zazakî da berginda wê *PK*ya *rayîr ra şîyene*yê ye (di kurmancî da jî berginda *meşînê* wek PK, *bi rê ve çûn*, heye). Lewma me *rayîr ra şîyene*ya zazakî di bin koma lêkerên yek-ROLê da bi cih nekir. Ev rewş ne gelek berbelav e û bi tenê di çend lêker û *PK*yan da hat çavdêrîkirin.

Lêkerên du-ROLê, li gor cureya kategorîk a temamkera ku binkategorîze dikin hatin vekolandin. Hin ji van lêkeran bi tenê cureyeka temamkerî binkategorîze dikin, hinek jî wan jî du kategorîyan wek alternatîf binkategorîze dikin. Bo nimûne hin lêker bi tenê *FD*Iyekê (wekî *xwendinê* (zz. *wendene*)), hinek bi tenê *FD*yekê (wekî *nihêrinê* (zz. *ewnîyayene*)), hinek bi tenê *FTEM*ekê (wekî *wêrinê* (zz. *wetardene*)), hinek *FD*I yan jî *FTEM*ekê (wekî *dîtinê* (zz. *dîyene*)) û hinek jî *FD* yan jî *FTEM*ekê (wekî *zanînê* (zz. *zanayene*)) binkategorîze dikin. Di van cure lêkeran da, di navbera kurmancî û zazakî da cudahîyek nehat tesbîtkirin. Li gel vê, li gel ku hem di kurmancî hem jî di zazakî da lêkerên ku *FD*yekê binkategorîze kêmtir in, di zazakî da ev kêmtir hatin tesbîtkirin.

Di lêkerên sê-ROLê da, me argumenta HEDEFî wek *FD* qebûl kir. Lê di rêzimana nerîtî ya kurmancî da ew bi giştî wek *FD*I tê qebûlkirin. Sedema qebûlkirina argumenta HEDEFî wek *FD*, me têkildar bi çend tiştan ve rave kir. Yek ji wan ew e ku di hin devokên kurmancî û zazakî da argumenta HEDEFî ya piştî lêkeran, wek *FD* bi cih dibe. Ya duyem me nîşan da ku ROLa HEDEFî bi saya daçekan li argumentan tê barkirin. Ji bo ku beşdara piştî lêkerê ROLa HEDEFê werbigire, ew divê di nav *FD*yekê da cih bigire. Sedema sêyem jî REWŞa wê ye. Me diyar kir ku lêker bi tenê yek REWŞa binyadî bar dikin ku ew jî REWŞa BERKARÎ ye. Di lêkerên sê-ROLê da lêker, REWŞa BERKARÎ li argumenta berkara rasterast bar dike. Eger lêker REWŞê

li argumenta piştî lêkerê bar neke, REWŞa wê divê hundirîn be. Me angaşt kir ku lêker, di kurmançî û zazakî da, REWŞa hundirîn bar nakin. Me qebûl kir ku daçek REWŞên hundirîn bar dikin. Lewma me diyar kir ku sereya ku REWŞê li hêmana HEDEFî bar dike, daçekek e. Vê jî kir ku em bêjin *FDIya* ku piştî lêkerê xuya dike di rastîyê da di nav *FDyekê* da (her çiqas ev *FD* her carê bi awayekî aşkere pêk neyê jî) wek *temamkera Dyê* pêk tê.

Me cureyên *PKyên* kurmançî û yên zazakî di bin du komên sereke da senfandin: *PKyên têper* û *PKyên neakûzatîv*. *PKyên têper* me li gor hêmana wan a ne-lêkerî wek *PKyên N(avdêrî)+LSyî*, *PKyên R(engdêrî)+LSyî* (wekî *nexweş kirin* (zz. *nêweş kerdene*)), *PKyên D(açekî)+LSyî* (wekî *bi cih anîn* (zz. *bi ca ardene*), *bi pêş xistin* (zz. *a ver berdene*), *ser av kirin* (zz. *ser awe kerdene*), *lê kirin* (zz. *pi ra kerdene*)), *PKyên P(irtikî)+LSyî* (wekî *ve-kirin* (zz. *a-kerdene*)) û *PKyên N(avdêrî)+D(açekî)+LSyî* (wekî *dest pê kirin* (zz. *dest pê kerdene*)) dabeş kirin. Me *PKyên N+LSyî* jî li gor hebûn-tunebûn an jî cureya kategorîya *temamkera* wan kirin çar kom: *PKyên bi tamamkera FDIyî* (wekî *derman kirin* (zz. *derman kerdene*)), *PKyên bi tamamkera xwedîtîyê* (wekî *bêrî kirin* (zz. *bêrî kerdene*)), *PKyên bê tamamker* (wekî *sond xwarin* (zz. *sond werdene*)) û *PKyên bi tamamkera daçekî* (wekî *hez kirin* (zz. *hes kerdene*)). *PKyên neakûzatîv* jî me li gor hêmana ne-lêkerî wek *R+LSyî* (wekî *nexweş ketin* (zz. *nêweş kerdene*)), *D+LSyî* (wekî *bi rê ketin* (zz. *ra raye kewtene*), *lê ketin* (zz. *pi ro kewtene*) û *P+LSyî* (wekî *ve-bûn* (zz. *a-bîyayene*)) kirin sê kom.

Me *PK* ji alîyê *ROLê* ve, ne li gor hejmara *ROLên* ku bar dikin, vekolandin. Me ew li gor cureya pêkhênên wan ên ne-lêkerî vekolandin. Hin cure *PK* bi tenê dikarin yek cure argumentê binkategorîze bikin. Bo nimûne her cure *PKya* di koma *PKyên neakûzatîv* da, bi tenê argumenteka *FDIyî* binkategorîze dike, lê hin ji *PKyên bi tamamkera FDIyî*, hem dikarin *FDIyekê* hem jî *FTEMekê* binkategorîze bikin. Bo nimûne *PKya fêh/fehm kirinê* (zz. *fehm kerdene*) hem dikare *FDI* hem jî *FTEMekê* binkategorîze bike. Dîsa hin ji *PKyên bi tamamkera xwedîtîyê* jî, li gel *temamkerek* *xwedîtîyê* dikarin *FTEMekê* jî wek alternatîf binkategorîze bikin. Ji ber vê, senifandina me ya wekî *PKyên bi tamamkera FDIyî* yan jî *PKyên bi tamamkera xwedîtîyê* *PKyên* ku di bin van koman da cih digirin û kategorîyên din binkategorîze dikin, li derve dihêlin. Ev jî bo xebatê kêşeyek nine, lewra eger analîz li gor cureya *temamkerên* wan bê kirin, ji bo van cure *PKyan* komeka cuda jî em dikarin diyar bikin.

Me PKyên tebatî jî ji alîyê ROLê ve analîz kirin. Li gel ku forma tebatî ya her lêkera têper çêdibe, di PKyan da rewş cuda ye. Bo nimûne PKyên bê temamker (wekî *sond xwarin*) ji ber ku xwedî temamkerekê ninin, forma wan a tebatî jî nabe ku bê çêkirin. Me PKyên bê temamker wek PKyên têper senifandin. Lewma ev dibe ku wek nakokîyek xuya bike; anku PKyek hem têper e hem jî nikare bê tebatîkirin. Ev cudahiya di navbera lêkeran û PKyan da, têkildar e bi prosesa çêbûna PKyan ve. Lêker di ferhengê da tên parastin, lê me qebûl kir ku PK li gel ku di ferhengê da çêdibin, di ferhengê da nayên parastin. Ji ber vê, têperîya wan wekî lêkerên têper nine. Têperîya wan ji têperîya LSya wan bermayî ye. Bi saya vê bermayîyê, di demên borî da ergatîvî pêk tê. Me ergatîvî bi têperîyê ve têkildar kir. Ji ber vê jî me PKyên bê temamker, ji ber ku ergatîvîyê didin destpêkirin, wek PKyên têper senifandin.

Di xebatê da hat dîtin ku PKyên kurmancî û yên zazakî ji alîyê binyada ROLê ve yek in, lê li r-binyadê, hin FDyên temamker ên PKyên zazakî cih diguherin bo piştî lêkerê (wekî *Dîlan resim bi dîwarî ya kerd* (k-binyad) → *Dîlan resim kerd bi dîwarî ya* (r-binyad)) (krm. *Dîlanê sûret bi dîwarî ve kir*). Ev cure cihguherîn mecbûrî ne xuya ne, lewra hin FDyên ku piştî lêkerê bi cih dibin, di hin devokên zazakî da berîya lêkerê jî xuya dikin.

Teorîya REWŞê, rewşên rêzimanî dixê nav BGyê. Teorî, pêkhatina morfolojîk a rewşê li ber çavan bigire jî, rewşan di çarçoveya sîntaktîk da vedikole. Lewma ji bo teorîyê pêkhatina rewşekê ya bi morfemeka diyar an jî bêyî morfemekê, ne zêde giring e. Teorîya REWŞê ji alîyê kodkirinê ve rewşên rêzimanî dike du kom: *REWŞa razber* û *rewşa morfolojîk*. REWŞa razber mimkin e hem bi hin morfemên diyar hem bi hin formên morfolojîk ên taybet hem jî bêyî nîşaneka morfolojîk a taybet bê nîşankirin. Lê rewşa morfolojîk wekî jî navê wê jî diyar e, her carê bi awayekî morfolojîk tê kodkirin. Me qebûl kir ku ji alîyê kodkirina morfolojîk ve li asta risteyî di kurmancî û zazakî da du cure rewşên rêzimanî hene: rewşa XWERÛ û rewşa TEWANGê. Lê di kurmancî û zazakî da, heman rewşa rêzimanî mimkin e hem bi awayekî morfolojîk hem jî bêyî kodkirineka morfolojîk pêk bê. Lewma di xebatê da me angaşt kir ku di kurmancî û zazakî da hemû rewş razber in û lewma jî rewşên morfolojîk di kurmancî û zazakî da tune ne.

Teorîya REWŞê, REWŞa ku têkilîya wê bi ROLê heye wek REWŞa hundirîn, REWŞa ku têkilîya wê bi ROLê tune ye û li hin pozîsyonên diyar tê barkirin wek

REWŞa binyadî ji hev vediqetîne. Di vê xebatê da ji bo kurmancî û zazakî me yek REWŞa hundirîn, sê heb jî REWŞên binyadî diyar kirin. REWŞa ku daçek bar dike REWŞa hundirîn, REWŞa ku *DEM* li bikerê, lêker li berkarê û îzafê li temamkera xwe bar dike, REWŞa binyadî ye. Binavkirina REWŞan a wekî XWERÛ û TEWANG amaje bi kodkirineka morfolojîk dike. Lê me REWŞ ji aliyê sîntaktîk ve vekolandin. Ji bo ku amaje bi nîşankirina morfolojîk neke, me REWŞa bikerê, wek REWŞa BIKERÎ, REWŞa berkara rasterast wek REWŞa BERKARÎ, REWŞa temamkera daçekê wek REWŞa DAÇEKÎ û REWŞa temamkera îzafeyê wek REWŞa ÎZAFEYÎ bi nav kir.

Wekî li jor hat gotin, her lêkerek a ku dikare REWŞê bar bike, dikare bi tenê yek REWŞa binyadî bar bike ku ew jî REWŞa BERKARÎ ye. Ji ber vê di xebatê da lêker û *PK* ji aliyê hêza wan a lêbarkirina REWŞê ve hatin vekolandin. Di PKyan da me qebûl kir ku REWŞ-barker *LS* ye.

Ji lêker û PKyên têper ên ku li pozîsyona temamkerî *FDI* (ya ku li r-binyadê cih naguhere) yan jî *FTEMekê* binkategorîze dikin (wekî *xwendin* (zz. *wendene*) *dîtin* (zz. *dîyene*), *zanîn* (zz. *zanayene*), *derman kirin* (zz. *derman kerdene*), *bawer kirin* (zz. *bawer kerdene*)), REWŞ-barker in. Tekane koma lêkerên têper ku REWŞê bar nake, lêkerên wê bi tenê *FDyekê* (wekî *nihêrîn* (zz. *ewnîyayene*)) binkategorîze dikin. Dîsa ji ber ku lêkerên teneper, xwedî berkareka rasterast ninin, nikarin REWŞê bar bikin. Lêker û PKyên tebatî û yên neakûzatîv li k-binyadê li pozîsyona temamkerî xwedî berkareka rasterast bin jî ji ber ku ev berkar ji bo ku riste bêtî biker nemîne, li r-binyadê cih diguhere bo pozîsyona bikerî ya risteyê, lêkerên (û *PK*) tebatî û lêkerên neakûzatîv, ji wan koma lêkeran in ku nikarin REWŞê bar bikin. Berkara wan li pozîsyona xwe ya cihguherî ji *DEMa* sere, REWŞê werdigire. Ji bo PKyên ku yek ji pêkhênên wan *N* ye, me angaşt kir ku di wan PKyan da, ji ber ku *ROL* li *Nyê* nayê barkirin, REWŞ jî li wê nayê barkirin.

Yek ji encamên vê xebatê, ku dibe ku nîqaşî be, ew e ku me angaşt kir ku ji PKyên *D+LSyî* yên ku *Dya* wan di kurmancî da ji *jê*, *lê*, *pê*, *tê*, di zazakî da jî ji *ci*, *pi*, *tiyê* pêk tê *Dya* wan bi tenê ji daçekekê pêk tê. Bo nimûne di kurmancî da ji bo PKya *jê kirinê* me got forma wê ya bingehîn bi awayê *ji kirin*, ji bo zazakî jî forma *ci kerdene*yê ('jê kirin') *c kerdene* ye. Di kurmancî da pêkhêna daçekî ya *jê*, *lê*, *pê*, *tê*yê diyar e. Ji bo *jêyê ji* (wekî *ji+wi/wê* → *jê*), ji bo *lêyê li* (wekî *li+wi/wê* → *lê*), ji bo

pêyê bi (wekî *bi+wi/wê* → *pê*), ji bo *têyê jî di* (wekî *di+wi/wê* → *tê*) ye. Ji bo zazakî me ji bo *piyê* pêkhêna daçek wek *bi* qebûl kir, lê ji bo *ci û tiyê* me cureya daçekê tesbît nekir. Ji ber vê me li şûna wan, bi rêzê tîpên wan ên pêşîn wek temsîla van daçekan bi kar anî. Lewma me ji bo *ciyê c*, ji bo *tiyê jî t* qebûl kir.

Sedemên vê qebûlkirinê me bi ROL û REWŞê ve têkildar kirin. Lewra eger em formên *Dyên PKyan* di kurmancî da wek *jê, lê, pê, tê*, di zazakî da jî wek *ci, pi, tiyê* qebûl bikin, hin kêşe derdikevin. Bo nimûne me *PKya lê ketinê* wek *PKyeka* neakûzatîv qebûl kir. *PKyên* neakûzatîv bi tenê yek ROLê bar dikin. Eger em di forma vekirî ya *lê ketinê* da (bo nimûne *li darê ket*), *FDIya* ku piştî *liyê* xuya dike wek hêmaneka mecbûrî qebûl bikin, em divê bêjin *lê ketin* du ROLî ye. Di vê rewşê da, em divê bêjin *lê ketin PKyeka* têper e, lê bi awayekî zelal ew *PKyeka* têper nine. Ji ber vê, me *FDIya* piştî daçekê wek zêdek qebûl kir. Dema ew wek zêdek bê qebûlkirin, *PK* bivê nevê bi awayê *li kirinê* dimîne. Lê li asta bilêvkirinê, dema ku li pêş daçekê *FDIyeka* vekirî xuya nake, ji ber ku kurmancî rê nade daçek bi serê xwe bimîne, forma *lêyê pêk tê* ku *ê* amaje bi hebûnê diyar nake. Heman tişt ji bo zazakî jî hat çavdêrîkirin.

Di xebatê da dibe ku ji aliyê senifandina hin lêker an jî *PKyan* ve hin şaşitî hebin, lê bi ya me ev kêşeyeka mezin û giring nine. Tiştê giringtir, diyarkirina binyada ROLî ya lêker û *PKyan* û nirxandina wan e ji aliyê REWŞê ve. Lewma eger lêker an jî *PKyek* di bin komeka şaş da hatibe bicihkirin, em dikarin koma wê biguherînin. Eger em nikaribin leker an jî *PKyekê* di ti komeka di xebatê da bi cih bikin, ev dê kêmasîya vê xebatê be, eger em bikaribin bi cih bikin, wê demê ew bi tenê şaşitîyeka senifandinê ye.

Her rêzimaneka zimanekî ya ku di çarçoveya boçûna *RGyê* da tê amadekirin, "rêzimana hilberîner" a wî zimanî ye. Bi vê têgehiştinê, vê xebatê beşeka rêzimana hilberîner a kurmancîya standard û ya zazakîya standard pêşkêş kir. Encamên ku ji vê xebatê derketin, dibe ku li gel hin binyadên zimanî yên di devokên cuda da lihevkerî ne xuya bin. Ev, ne nakokîyek e. Di *BGyê* da rêzimanîtîya binyadeka zimanî, heta ku ew prensîpên rêzimanê bin pê neke, derbasader. Lewma meriv dikare behsa rêzimana hilberîner a her devokekê jî bike ku esas her yek ji kurmancîya standard û zazakîya standard jî dawîya dawîn devokek e.

Dibe ku hin angaşt û raveyên zimannasîyî yên ku di vê xebatê da hatin pêşkêşkirin bên rexnekirin. Lê ev rexne divê di çarçoveya sînorên xebatê da bên kirin. Bo nimûne me bi angaştên *BGyê* rave kir ku forma tebatî ya pêveberên kompleks ên wekî *sond xwarin* (zz. *sond werdene*), *derew kirinê* (zz. *zûr(i) kerdene*) pêk nayên (bo nimûne **Derew hat kirin / zz. *Zûr(i) ame-(y(i)) kerdene*). Lê dibe ku hin kes van formên wek rêzimanî qebûl bikin. Di vê rewşê da divê di çarçoveya *BGyê* da bê nîşandan ku çima forma wan a tebatî pêk tê. Lewra di vê xebatê da sînorên nêzîkahîya me ya ji bo zimanî, *BGyê* pêk anî. Eger sedemên rêzimanîtiya van formên tebatî di çarçoveya *BGyê* da bên diyarkirin dê diyar be raveyên ku me ji bo nerêzimanîtiya wan pêşkêş kirine, ne di cih da ne. Heke ji bo rêzimanîtiya forma tebatî raveyên hevgirtî di çarçoveya *BGyê* da neyên diyarkirin û ev form hêj wek rêzimanî bên qebûlkirin (eger bê tesbîtîkirin ku ev form ne bi bandora hin zimanên din pêk hatine û herî kêr ji aliyê kurmancîzar an jî zazakîzarên hin herêman ve wek rêzimanî tên qebûlkirin), wê demê divê em bêjin berevajî angaştên *BGyê*, *BG* ji hin alîyan ve ji bo hemû zimanan raveker nine.

ÇAVKANÎ

- Abi, A. (2018). *Di Kurmanciya Jorîn û Kurmanciya Nawerast de Qertafên Lêkeran* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Zanîngeha Wan Yüzüncü Yılê Enstîtûya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Abney, S. P. (1987). *The English Noun Phrase in its sentential aspect*. MIT.
- Açar, Z. (2014). Di Kurmancî de Qertafên ku Ravekê bi Hevalnavan ve Diwesfinin. *Kovara Nûpelda*, 15, rr. 9-14.
- Açar, Z. (2024). Morfema “-e”yê di Peyvrêziya Kurmancî de: Bi Nimûneyên ji Camieya Rîsale û Hîkayetan. Di nav A. Timurtaş, Y. Aykaç, & S. Çakar (Ed.), *Melaela Mehmûdê Bazidî û Mîrasî Wîyê* da (rr. 277-289). Peywend.
- Akgül, H. (2024). *Fraz di Kurmancî de* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Zanîngeha Bîngolê Enstîtûya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî.
- Amberber, M., Baker, B., & Harvey, M. (Ed.). (2010). *Complex Predicates Cross-linguistic Perspectives on Event Structure*. Cambridge University Press.
- Arı Özdemir, T. (2020). *Yönetim Bağlama Kuramı Temelinde Çağdaş Türk Lehçelerinde Hal Eki Yükleme Kuramı* [Teza Doktorayê ya Neçapbûyî]. T.C. Manisa Celal Bayar Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı Türk Dili Programı.
- Arslan, İ. (2016). Zaza Dilinde Ergatif Sistemin Tarihi Gelişimi. *Munzur Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 4(8), rr. 63-87.
- Arslan, İ. (2018). The valency and semantic roles in Zaza Language. Di nav D. Köse (Ed.), *Innovative Approaches in Philologyyê* da (rr. 7-25). Gece Kitaplığı.
- Arslan, İ. (2021). Ditransitive Constructions in Zaza Language. *Akademik İncelemeler Dergisi*, 16(2), rr. 83-98.
- Arslan, İ. (2022). Ezafe (Genitive) in Zaza Language. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 10(1), rr. 405-416.
- Aslan, Ş. (2018). *Lêkolînek li Ser Rêzimana Kurdî (Kurmancî)*. Weşanên Na.
- Aslanoğulları, M. (2017). Zazaca ve Kurmanca İsimlerde Çoğulluk. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 3(6), rr. 67-80.

- Atlamaz, Ü. (2012). *Ergative as Accusative Case: Evidence From Adıyaman Kurmanji* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Boğaziçi University.
- Bailey, D. (2018). *A grammar of Gawraǵū Gūrānī* [Teza Doktorayê ya Neçapbûyî]. Philosophischen Fakultät der Georg-August-Universität Göttingen.
- Baker, B., & Harvey, M. (2010). Complex predicate formation. Di nav M. Amberber, B. Baker, & M. Harvey (Ed.), *Complex Predicates Cross-linguistic Perspectives on Event Structure*ê da (rr. 13-47). Cambridge University Press.
- Baker, M. (1997). Thematic Roles and Syntactic Structure. Di nav L. Haegeman (Ed.), *Elements of Grammar Handbook in Generative Syntax*ê da (rr. 73-137). Kluwer Academic Publishers.
- Baker, M. C. (1988). *Incorporation: A theory of grammatical function changing*. University of Chicago Press.
- Baker, M., Johnson, K., & Roberts, I. (1989). Passive Arguments Raised. *Linguistic Inquiry*, 20(2), rr. 219-251.
- Bakır, A. (2020). *Rêzimana Kurmancî*. Weşanên Ar.
- Baluken, Y. (2019). *Hetê Gramerî ra Fekê Çewlîgî* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Unîversîteya Artuklu ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê ke Tirkîya de Cîwîyenê Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Baran, B. (2018). *Rêzimana Kurmancî*. Weşanên Wardozê.
- Başaran, M. (2019). *Sêwregî de Eşîrê Kirmancan (Dimilîyan) û Kirmanckîya (dimilkîya) Înan* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Unîversîteya Artuklu ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê ke Tirkîya de Cîwîyenê Qismê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Bedirxan, C. A. (2010). *Bingehên Gramêra Kurdmancî*. Avesta.
- Bedirxan, C. A., & Lescot, R. (2018). *Kürtçe Gramer*. Avesta.
- Bilbil, M. (2017). Peyvrêzî di Frazên Navdêrî de (Devoka Mêrdînê). *Kanîzar*, 13, rr. 19-52.
- Bingöl, İ. (2016). Berawirdkirina Kurmancî û Zazakî ji Aliyê Felsefeya Zimên ve. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 1(1), rr. 57-70.

- Bingöl, İ. (2017). Cihnav di Zazakiya Gimgimê de. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 2(2), rr. 89-107.
- Bingöl, İ. (2020). Halo Ante Zazakî û Kurmanckî de. *The Journal of Mesopotamian Studies, Special Issue on Zazakî and Zazas*, rr. 64-73.
- Bingöl, İ. (2023). Avanîya Navîn di Rêzimanên Kurmancî û Zazakî de. Di nav A. Kırkan & Y. Cengiz (Ed.), *Dilbilim ve Karşılaştırmalı Dilbilim-Dilbilimê da* (rr. 37-43).
- Black, C. A. (1999). A step-by-step introduction to the Government and Binding theory of syntax. *SIL-Mexico Branch and University of North Dakota*.
- Blake, B. J. (2004). *Case, Second edition*. Cambridge university press.
- Butt, M. (2010). The light verb jungle: Still hacking away. Di nav M. Amberber, B. Baker, & M. Harvey (Ed.), *Complex Predicates Cross-linguistic Perspectives on Event Structureê da* (rr. 48-78). Cambridge University Press.
- Butt, M. (2019). Complex Predicates and Multidimensionality in Grammar. *Linguistic Issues in Language Technology*, 17(4).
- Bülbül, M. (2016). Risteyên Peywendiyê û Peyvrêzîya Wan (Devoka Mêrdînê). *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2(4), rr. 22-45.
- Bülbül, M. (2019). Risteyên Alozi di Kurmancî da. *Humanities Journal of University of Zakho*, 7(2), rr. 263-273.
- Bynon, T. (2017). Binyada Ergatîvîteyê di Kurdî de (R. Geyik, Wer.). *Nûbihar Akademi*, 7, rr. 95-113.
- Canpolat, M. (2006). *Zazaca-Türkçe Sözlük*.
- Carnie, A. (2013). *Syntax A Generative Introduction Third Edition*. Wiley-Blackwell.
- Chomsky, N. (1957). *Syntactic Structures*. The Hague.
- Chomsky, N. (1965). *Aspects Of The Theory Of Syntax*. The MIT Press.
- Chomsky, N. (1976). *Studies On Semantics In Generative Grammar (Third Printing)*. Mouton.
- Chomsky, N. (1980). *Rules and Representations*. Columbia University Press.

- Chomsky, N. (1982). *Some Concepts and Consequences of the Theory of Government and Binding*. The MIT Press.
- Chomsky, N. (1986). *Knowledge of language: Its Nature, Origin, and Use*. Praeger.
- Chomsky, N. (1988). *Lectures on Government and Binding The Pisa Lectures*. Foris Publications.
- Chomsky, N. (1997). *Barriers. Linguistic Inquiry Monograph Thirteen*. The MIT Press.
- Chomsky, N. (2001). *Dil ve Zihin* (A. Kocaman, Wer.). Ayraç Yayınevi.
- Chomsky, N. (2002). *Dil ve Sorumluluk* (H. Özasya, Wer.). Ekin Yayınları.
- Chomsky, N. (2010). *Doğa ve Dil Üzerine* (A. Belletti & L. Rizzi, Ed.; A. B. Karadağ, Wer.). Sözcükler Yayınları.
- Chomsky, N. (2013). *Bilgi ve Özgürlük Sorunları* (T. Doğan, Wer.). bgst Yayınları.
- Chomsky, N. (2014). *Dilin Mimarisi* (İ. K. Bayırlı, Wer.). Boğaziçi Üniversitesi Yayınları.
- Chomsky, N. (2015). *The Minimalist Program* (20th Anniversary Edition). The MIT Press.
- Chomsky, N. (2019). *Bilgi Sorunları ve Dil Managua Dersleri* (K. Veysel, Wer.). bgst Yayınları.
- Chomsky, N. (2021). *Demokrasi ve Eğitim* (C. P. Otero, Ed.; E. Abadoğlu, B. Karadağ, Z. Kutluata, N. Ersoy, A. K. Saysel, & A. Sönmez, Wer.). bgst Yayınları.
- Chomsky, N. (2025). *Dil ve Zihin İncelemelerinde Yeni Ufuklar* (F. B. Aydar, Wer.). Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- Cook, V. J., & Newson, M. (2007). *Chomsky's Universal Grammar: An Introduction* (Third Edition). Blackwell Publishing.
- Crystal, D. (2008). *A Dictionary of Linguistics and Phonetics Sixth Edition*. Blackwell Publishing.
- Csirmaz, A., & Ceplová, M. (bêdîrok). *Other Options without Optionality*. (neweşandî). Massachusetts Institute of Technology.

- Çelik Dinçer, A. (2021). *Belirleyici Öbeği Varsayımı Açısından Zazacada İzafe Yapıları: Sözdizimsel Bir Çözümleme* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dilbilim Anabilim Dalı.
- Dabir-Moghaddam, M. (1997). Compound verbs in Persian. *Studies in the Linguistic Sciences*, 27(2), rr. 25-59.
- Demîr, P. (2015). *Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê Karî Ser Yew Cigêrayîş* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Unîversîteya Çewlîg Esntîtuya Ziwanê ke Cuyenî Şaxê Zanistî Bingeî yê Edebiyat û Ziwanê Zazakî.
- Ebûzeîd, S. C. (2019). *Cihgîhorîna Kerestan di Ristê da (Govera Behdînî)*. Zakho Centre.
- Elî, V. Î. (2017). Tewawker di Girêyên Lêksîkî da. *Govarî Zanko bo Zaniste Mirovayetîyekan*, 21(5), rr. 209-219.
- Elî, V. Î. (2021). Rolên Watayî yê Argumentên Karî (Di Govera Behdînî da). *Govara Zankoya Dihok (Zanistên Mirovayetî û Komelnasî)*, 24(2), rr. 78-93.
- Farqînî, Z. (2019). *Lêker û Rastnivîsa Wan (Ji Alîyê Binyatî ve)*. Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Folli, R., Harley, H., & Karimi, S. (2004). Determinants of event type in Persian complex predicates. *Lingua*, 1095, rr. 1-37.
- Goldberg, A. E. (1996). Words by Default: Optimizing Constraints and the Persian Complex Predicate. Di nav *Proceedings of the Twenty-Second Annual Meeting of the Berkeley Linguistics Society: General Session and Parasession on The Role of Learnability in Grammatical Theory* da (rr. 132-146).
- Grimshaw, J. (1991). *Argument Structure*. The MIT Press.
- Grimshaw, J., & Mester, A. (1988). Light Verbs and θ -Marking. *Linguistic Inquiry*, 19(2), rr. 205-232.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2005). *Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)*. Weşanxaneyê Vateyî.
- Grûba Xebate ya Vateyî. (2016). *Ferhengê Kirmanckî (Zazakî)-Tirkî Kirmancca (Zazaca)-Türkçe Sözlük (Çapa pancine ya hîrakerdîye)*. Weşanxaneyê Vateyî.

- Gültekin, S. (2019). *Hevokên Temamker ên Berkari yê Kurmancî yê Devoka Torê* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Zanîngeha Mardîn Artuklûyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Çand û Zimanê Kurdî.
- Gündoğdu, S. (2011). *The Phrase Structure of Two Dialects of Kurmanji Kurdish: Standard Dialect And Muş Dialect* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Boğaziçi University.
- Gündoğdu, S. (2015). Noun-Verb Complex Predicates in Kurmanji Kurdish A syntactic account. *Proceedings of ConSOLE XXIII*, rr. 279-301.
- Gündoğdu, S. (2018). *Argument-Adjunct Distinction in Kurmanji Kurdish* [Teza Doktorayê ya Neçapbûyî]. Boğaziçi University.
- Gündoğdu, S. (2022). Case in Kurdish. Di nav Y. Matras, G. Haig, & E. Öpengin (Ed.), *Structural and Typological Variation in the Dialects of Kurdish* da (rr. 111-180). Palgrave Macmillan.
- Gündoğdu, S. (2023). Ezafe in Northern Kurdish. *Toronto Working Papers in Linguistics*, 45.
- Gündoğdu, S., & Bulan, A. (2023). Ezafe in Zazaki. *Toronto Working Papers in Linguistics*, 45.
- Gündoğdu, S., Kahnemuyipour, A., & den Dikken, M. (2024). Ezafe in The Context of CPs: Evidence from three Iranian languages. *Journal of Iranian Linguistics*, 1(1), rr. 118-141.
- Gündoğdu, S., Kahnemuyipour, A., & Peters, A. (2020). Revisiting “Double” Ezafe In Southern Zazaki. Di nav *Proceedings of the 2020 annual conference of the Canadian Linguistic Association* da.
- Gündüz, D. (2013). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Kirmancca/Zazaca Dil Dersleri*. Vate Yayınevi.
- Haegeman, L. (1994). *Introduction to Government and Binding Theory* (Second Edition). Blackwell Publishers.
- Haegeman, L., & Guéron, J. (1999). *English Grammar a generative perspective*. Blackwell Publishers.

- Haig, G. (1998). On the interaction of morphological and syntactic ergativity: Lessons from Kurdish. *Lingua*, 105, rr. 149-173.
- Haig, G. (2002). Noun-plus-verb complex predicates in Kurmanji Kurdish: Arguments sharing, argument incorporation, or what? *Sprachtypologie und Universalienforschung: STUF*, rr. 15-48.
- Haig, G. (2004). *Alignment in Kurdish: A diachronic perspective*. Unpublished Habilitationsschrift: Philosophische Fakultät der Christian-Albrechts-Universität zu Kiel.
- Haig, G. (2011). Linker, relativizer, nominalizer, tense-particle On the Ezafe in West Iranian. Di nav F. H. Yap, K. Grunow-Hårsta, & J. Wrona (Ed.), *Nominalization in Asian languages: Diachronic and typological perspectives*ê da (rr. 363-390). John Benjamins Publishing Company.
- Haig, G., & Öpengin, E. (2014). Introduction to Special Issue Kurdish: A critical research overview. *Kurdish Studies*, 2(2), rr. 99-122.
- Haig, G., & Öpengin, E. (2018). Kurmanji Kurdish in Turkey: Structure, varieties, and status. Di nav C. Bulut (Ed.), *Linguistic minorities in Turkey and Turkic-speaking minorities of the periphery*ê da. Harrassowitz Verlag.
- Horrocks, G. (2013). *Generative Grammar*. Routledge Taylor & Francis Group.
- Îbo, V. Î. E. (2008). *Dox di Zimanê Kurdî da (Govera Behdînî)* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Zankoya Dihokê.
- Încekan, A. (2014). *Ez Kurdî Hîn Dibim Geçişli Fiiller ve Ergativ Teori-Fiil Dökümü-Alıştırmalar*. Nûbihar.
- Kaçan, M. E. (2018). *Zazakî de Kategorîzekerdişê Edatan û Metnanê Zazakî ra Nimûneyî*. Unîversîteya Artûklûyî ya Mêrdînî Enstîtûyê Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Kaplan, Ö. (2018). *Avanîya Lêkeran di Kurmancî de* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Zanîngeha Wanê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.

- Karaca, F. (2021). Rewşên Rêzimanî yê Kurdîya Kurmancî. Di nav A. Kirkan & M. Yonat (Ed.), *Rêzegotarên Zimannasîya Kurdî Destpêk û Têgehên Serekeyê* da (rr. 91-111). Peywend.
- Karacan, H., & Kaya, B. (2015). Zazaki ile Kurmanci Lehçelerinin Fonetik Yönünden Karşılaştırılması. *International Journal of Kurdish Studies*, 1(2), rr. 102-115.
- Karimi-Doostan, G. (2005). Light verbs and structural case. *Lingua*, 115, rr. 1737-1756.
- Keskin, M. (2012). Orta ve Eski İrani Dillerin Zazacaya Tuttuğu Işık. Di nav M. Varol (Ed.), *II. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumuyê* da (rr. 232-252).
- Khalid, H. S. (2020). Kurdish Language, Its Family and Dialects. *Kuriname*, 2, rr. 133-146.
- Kırkan, A. (2018). *Bîyîşa Pêxemberî ya Osman Esad Efendî û Destpêkê Edebîyatê Klasîk yê Kirmanckî*. Weşanxaneyê Vateyî.
- Kırkan, A. (2021a). Zazakî de Edatî. *Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî*, 4, rr. 206-226.
- Kırkan, A. (2021b). Zazakî de Ergatîvîte. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 9(2), rr. 303-312.
- Kırkan, A. (2021c). *Zazakî de Kar*. Peywend.
- Koutsoudas, A. (1966). *Writing Transformational Grammars: An introduction*. McGraw-Hill Book Company.
- Kratzer, A. (1996). Severing the external argument from its verb. Di nav J. Rooryck & L. Zaring (Ed.), *Phrase structure and the lexiconê* da (C. 33, rr. 109-137). Springer Science, Business Media.
- Larson, R. K. (1988). On the Double Object Construction. *Linguistic Inquiry*, 19(3), rr. 335-391.
- Larson, R., & Samiian, V. (2020). The Ezafe construction revisited. Di nav R. K. Larson, S. Moradi, & V. Samiian (Ed.), *Advances in Iranian linguisticsê* da (rr. 173-236). John Benjamins Publishing Company.

- Larson, R., & Yamakido, H. (2008). Ezafe and the deep position of nominal modifiers. Di nav L. McNally & C. Kennedy (Ed.), *Adjectives and Adverbs Syntax, Semantics, and Discourse*ê da (rr. 43-70). Oxford University Press.
- Lezgîn, R. (2015). Kûrtçe'de akuzatif – ergatif özellik. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 1(2), rr. 82-95.
- MacKenzie, D. N. (1961). *Kurdish Dialect Studies* (C. 1). Oxford University Press.
- MacKenzie, D. N. (1966). *The Dialect of Awroman (Hawrāmān-ī Luhōn) Grammatical sketch, texts and vocabulary*. Det Kongelige Danske Videnskabernes Selskab.
- Malmîsanij, M. (2021). The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues It Faces. Di nav H. Bozarslan, C. Gunes, & V. Yadirgi (Ed.), *The Cambridge History of The Kurds*ê da (rr. 663-684). Cambridge University Press.
- Megerdooimian, K. (2001). Event Structure and Complex Predicates in Persian. *The Canadian Journal of Linguistics / La revue canadienne de linguistique*, 46(1-2), rr. 97-125.
- Mithun, M. (1984). The evolution of noun incorporation. *Language*, 60, rr. 847-894.
- Mohammad, J., & Karimi, S. (1992). Light verbs are taking over: Complex verbs in Persian. Di nav *Proceedings of WECOL*ê da (C. 5, rr. 195-212).
- Mohanan, T. (1994). *Argument Structure in Hindi*. CSLI Publications.
- Montaut, A. (2016). Noun-Verb Complex Predicates in Hindi and the Rise of Non-Canonical Subjects. Di nav L. Nash & P. Samvelian (Ed.), *Approaches to Complex Predicates*ê da (rr. 142-174). Brill.
- Nash, L., & Samvelian, P. (Ed.). (2016). *Approaches to Complex Predicates*. Brill.
- Ocek, N. (2019). *Waneyên Rêzimana Kurmancî Çapa 2'yem*. Sîtav.
- Paul, L. (2009). Zazaki. Di nav G. Windfuhr (Ed.), *The Iranian Languages*ê da (rr. 545-586). Routledge Taylor & Francis Group.

- Paul, P. (2016). Malayalam Ceyy-Support and Its Relation to Event and Argument Structure. Di nav L. Nash & P. Samvelian (Ed.), *Approaches to Complex Predicates*ê da (rr. 175-211). Brill.
- Radford, A. (1988). *Transformational Grammar A First Course*. Cambridge University Press.
- Samvelian, P. (2007). A (phrasal) affix analysis of the Persian Ezafe. *Journal of Linguistics*, 43(3), rr. 605-645.
- Samvelian, P. (2008). The Ezafe as a head-marking inflectional affix: Evidence from Persian and Kurmanji Kurdish. Di nav S. Karimi, V. Samiian, & D. Stilo (Ed.), *Aspects of Iranian Linguistics*ê da (rr. 339-361). Cambridge Scholars Publishing.
- Sigurðsson, H. Á. (2003). Case: Abstract vs. Morphological. Di nav E. Brandner & H. Zinsmeister (Ed.), *New Perspectives on Case Theory*ê da (rr. 223-268). CSLI Publications.
- Stowell, T. A. (1981). *Origins of Phrase Structure* [Teza Doktorayê ya Neçapbûyî]. Massachusetts Institute of Technology.
- Subaşı, E. (2023). *Avaniya Tebatî di Zaravayên Kurdî de* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Makezanista Ziman û Çanda Kurdî.
- Şanlı, E. (2017). *Têvernayîşê Kurmanckî û Zazakî: Nimûneyê Licê û Hezanî* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Unîversîteya Artukluyê ya Mêrdînê Enstîtuya Ziwananê Ganîyan ê Tirkîya Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Tan, S. (2015). *Rêzimana Kurmancî*. Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Tayfun (Malmîsanîj), M., & Mosa, A. X. (2017). Berawirdkirina Pêşgir, Paşgir û Navbergiran dinavbera Kırmanckî (Zazakîyê) û Kurmancî yê da. *Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)*, 5(2), rr. 508-526.
- Thackston, W. M. (2006). *Kurmanji Kurdish—A Reference Grammar with Selected Readings*. Renas Media.
- Todd, T. L. (2008). *A Grammar of Dimili Also Known as Zaza*. Electronic publication.

- Uzun, N. E. (2000). *Anaçizgileriyle Evrensel Dilbilgisi ve Türkçe*. Multilingual.
- Vaidya, A., Rambow, O., & Palmer, M. (2019). Syntactic composition and selectional preferences in Hindi Light Verb Constructions. *Linguistic Issues in Language Technology*, 17(1).
- Veroj, S. (2014). *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe, Fonetîk û Morfolojî (Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî: Dîyalekt, Alfabe, Fonetîk û Morfolojî)*. Weşanên AVA.
- Werner, B. (2012). Morphological Sketch of Southern Zazaki spoken in the area of Çermik, Çüngüş, Siverek. *SIL International*.
- Yeşilkaya, M. (2019). *Hetê Cinsîyetê Gramatîkî ra Pêveronayîşê Kirdkî (Zazakî) û Kurmanckî* [Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî]. Unîversîteya Artukluyî ya Mêrdînî Enstîtuya Ziwananê Ganîyan yê Tirkîya Şaxê Mayzanistê Ziwan û Kulturê Kurdan.
- Yıldız, P. (2023). *Dimilîyê Modanî û Fekê Înan* [Teza Doktorayê ya Neçapbûyî]. Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Yıldız, P. (2025). Morphological Characteristics of the Lice Dialect in the Zazaki. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 13(1), rr. 92-130.
- Yildiz, P. (2021). Muqayesekerdişê Zemîran Varyasyonanê Kurdî de. Di nav A. Kirkan & M. Yonat (Ed.), *Rêzegotarên Zimannasîya Kurdî Destpêk û Têgehên Serekeyê* da (rr. 321-339). Peywend.
- Yonat, M. (2020a). Bikaranîna Îzafeyê di Devokên Kurdîya Kurmancî de (Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojava). *Kurdiname*, 3, rr. 52-75.
- Yonat, M. (2020b). Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Zayenda Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojavayê). *Mukaddime*, 11(2), rr. 410-445.
- Yonat, M. (2021). Têgehên Bingehîn yên Sentaksê. Di nav A. Kirkan & M. Yonat (Ed.), *Rêzegotarên Zimannasîya Kurdî Destpêk û Têgehên Serekeyê* da (rr. 331-348). Peywend.

Yonat, M., & Aslanoğlu, O. (2023). Analîzek li ser Avaniya Ergatîfê - Devokên Kurmancî yê Başûrê Rojhilat, Bakûr û Başûrê Rojava. *Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî*, 8, rr. 13-40.

PÊVEK

PÊVEK 1: Ferhengoka Kurmancî-Îngilîzî ya Têgehên di Xebatê da

A' - pozîsyon	A'-position
A-bar pozîsyon	A-bar position
ABSOLUTÎV	ABSOLUTIVE
adetî	regular
AKÛZATÎV	ACCUSATIVE
AMRAZ	INSTRUMENT
amûra wergirtina zimanî	language acquisition device
anaforîk	anaphoric
A-pozîsyon	A-position
argumenta kêmbûna handerê	poverly-of-the-stimulus
argument	
argumenta tîpolojîk	typological argument
argumenta îlawe	additional argument
asteng	barrier
aşkere	explicit/overt
avahî	construction
avahîya hokarî	causative construction
avahîya îzafeyê	ezafe construction
avahiya xwedîtiyê	possessive construction
avahîyên datîv	dative constructions
azmûngerîya zimanî	linguistic experience
BANG/BANGKIRIN	VOCATIVE
bazinedaçek	circumposition
behre	ability

bendik	string
bêrewş	caseless
berkara binyadî	structural object
BERKARÎ	OBJECTIVE
berwarî	horizontal
bêsînor	infinitely
bêsînoriya ciyawaz	discrete infinity
beşdar	participant
beşdarbûn	incorporation
beşdarbûna navdêrê	noun incorporation
beşdarbûna sîntaktîk	syntactic incorporation
bingeh	base
binpêkhên	subconstituent
binyada argumentî	argument structure
binyada darî	tree structure
binyada frêzî	phrase structure
binyada kûr	deep structure
binyada nerêzimanî	ungrammatical structure
binyada ROLî	ROLE structure
binyada rûser	surface structure
binyadparêz	structure preserving
birêvebirî	governee
birevebirin	government
birêvebirina dirist	proper government
CIH	LOCATION
CIH	PRO

CIHa mezin	big PRO
ciha berkarî	object pro
ciha bikerî	subject pro
ciha piçûk	little pro
cihê venişînê	landing site
cihnavî	pronominal
çarçoveya binkategorîzasyonê	subcategorization frame
çendîker	quantifier
çi-bêje	wh-word
çi-frêz	wh-phrase
daçekên mitleq	absolute prepositions
daneyên zimanî	linguistic data
dawîn	terminal
delîla neyînî	negative evidence
Dem	tense
demdar	finite
deran	output
derdan	projection
derdana navîn	intermediate projection
derdanên ferhengî	lexical projections
derdanên kargînî	functional projections
destpêker	trigger
diyar	certain/specific
diyarker	determiner
diyartî	definiteness
du-cihî	two-place

du-şaxîî	binary branching
d-ziman	e-language
ergatîv	ergative
fakulteya zimanî	language faculty
ferheng	lexicon
fîltreya REWŞê	CASE filter
fonemîk	phonemic
fonoloji	phonology
fonolojîk	phonological
forma fonetîk	phonetic form
forma mantiqî	logical form
frêz	phrase
frêza daçekî	prepositional phrase
frêza dîyatezî	voice phrase
frêza lêkerî	verb phrase
frêza navdêrî	noun phrase
frêza rengdêrî	adjective phrase
gerdûnîyên Zimanî	universals of Language
girêdan	binding
girêdar	binder
girêdayî	bindee
giştîsazî	generalized
hander	stimulus
HEDEF	GOAL
HEVALTÎ	COMITATIVE
hevîndeks	coindex

hilberîn	generate
hîlbijartina kategorîk	categorial selection
hîlbijartina semantîk	semantic selection
Hîpoteza Biker di nav FLYê da	subject-in-VP hypothesis
Hîpoteza Transfera Argumentan	Argument Transfer Hypothesis
hundirîsazîkirin	internalization
h-ziman	i-language
îndeks	index
îzafeya girêdar	linking ezafe
îzafeya nîşander/anaforîk	demonstrative/anaphoric ezafe
îzafeya xwedîtîyê	genitive ezafe
jimar	count
KARA	AGENT
karatî	agentivity
karayî	agentive
KARLÊBÛYÎ	PATIENT
kategorîk	categorial
kategorîya ferhengî	lexical category
kategorîyên kargînî	functional categories
k-binyad	d-structure
Kêş	Inflection
ketan	input
k-hîlbijartin	c-selection
kiryar	operation
kombînasyon	combination
kontrolkirin	check

lêkera giran	heavy verb
lêkera sivik	light verb
lêkera tematîk	thematic verb
lêkerçêker	verbalizer
lêkerên kompleks	complex verbs
lêkerên lêkdayî	compound verbs
mecbûrî	obligatory
merca jêrîtîyê	subjacency condition
merca zincirê	chain condition
mercên rêzimanîtîyê	conditions on grammaticality
mêtin	absorb
mezinbûna zimanî	growth of language
mezintirîn derdan	maximal projection
mezintirîn fermanberî	maximal-command
m-fermanberî	m-command
MIJAR	THEME
mînîmalîtî	minimality
Mînîmalîzm	Minimalism
mitleq	absolute
modal	modal
modîfîyeker	modifier
modîfîyekirin	modification
morfem	morpheme
morfema girêdanê	linking morpheme
morfefonemîk	morphophonemic
morfolojî	morphology

movik	node
movika dayik	mother node
movika xwişk	sister node
movikên sînorkêş	bounding nodes
navenavendî	endocentric
navrehî	denominal
neakûzatîv	unaccusative
ne-beşdarbûyî	non-incorporating
nedemdar	infinite
ne-diyar	non-specific
ne-ergatîv	unergative
ne-lêkerî	non-verbal
nepenî	covert
ne-refereyî	non-referential
nerêzimanî	ungrammatical
nîşander	demonstrative
nîşanker	specifier
nîşankerên frêzê	phrase markers
nomînatîv/akûzatîv	nominative/accusative
NOMÎNATÎV	NOMINATIVE
organê zimanî	language organ
parametre	parameter
parçe	component
parçeyê fonolojîk	phonological component
parçeyê semantîk	semantic component
parçeyê sîntaktîk	syntactic component

paşdaçek	postposition
paşgir	suffix
paş-modîfîyeker	post-modifier
pê	foot
pêkhên	constituent
pêkhêna rasterast	immediate constituent
pêkhên-fermanberî	constituent-commanding
performans	performance
pêşane	antecedent
pêşane-birêvebirin	antecedent-government
pêşdaçek	preposition
pêşdaçekên lêkdayî	compound prepositions
pêşekî	precedence
pêvdanik	label
pêveber	predicate
pêvebera kompleks	complex predicate
pêveberî	predicational
pêwendîker	relativizer
p-fermanberî	c-command
p-fermanberîya asîmetrîk	asymmetric c-command
p-fermanberîya sîmetrîk	symmetric c-command
pir-sereyî	multi-headed
pirsyarî	interrogation
pirtik	particle
pîvera ROLê	ROLE criterion
PKyên beşdarbûyî	incorporating CPs

PKyên bi tamamkera daçekî	adpositional complement CPs
PKyên bi tamamkera xwedîtîyê	possessor complement CPs
PKyên ne-beşdarbûyî	non-incorporating CPs
PKyên têrbûyî	saturated CPs
pozîsyona argumentî	argument position
pozîsyona ne-argumentî	non-argument-position
prensîp	principle
Prensîpa Binyadparêz	Structural Preservation Principle
Prensîpa Derdanê ya Berfirehkirî	Extended Projection Principle
Prensîpa Derdanê	Projection Principle
Prensîpa Kategorîya Vala	Empty Category Principle
pûçbêje	expletive pronoun
qada birêvebirinê	governing domain
raborîya cihguherînê	history of movement
ragihandinî	declarative
Rawe	mood
r-binyad	s-structure
RÊ	PATH
referans	referent
rehî	simple
rêkeftin	agreement
rêvebir	governor
rêvebira dirist	proper governor
rewş	case/state
REWŞ	Case/CASE
Rewşa binyadî	structural Case

REWŞa hundirîn	inherent Case
REWŞa razber	abstract Case
rewşa sabît	steady state
REWŞ-barker	CASE assigner
rewşa destpêkê	initial state
rewşa morfolojîk	morphological case
rewş-lawaz	case-poor
REWŞ-wergir	CASE assignee
rêzebend	sequences
rêzik	rule
rêzikên binyada frêzî	phrase structure rules
rêzikên ferhengî	lexical rules
rêzikên kategorîk	categorical rules
rêzikên venivîsînê	rewrite rules
rezimana aşkere	explicit grammar
Rêzimana Gerdûnî	Universal Grammar
rêzimana hilberîner	generative grammar
rêzimana taybet	particular grammar
Rêzimana Veguherîner	Transformational Grammar
Rêzimana Veguherîner-Hilberîner	Transformational-Generative
Grammar	
rêzimanî	grammatical
rêzimanîtî	grammaticality
risteya hundirîn	embedded clause
risteya pêwendîyê	relative clause
risteya binîn	underlying sentence

ROL	ROLE
ROL-barker	ROLE assigner
ROL-birêvebirin	theta-government
ROL-pozîsyona potansîyel	potential Θ -position
ROL-wergir	ROLE assignee
R-pozîsyon	ROLE-position/ θ -position
rûser	surface
sabît	fixed
SEDEMKAR	CAUSER
semantîk	semantic
serdestî	dominance
serdestîya rasterast	immediate dominating
sere	head
sere-çep	head-left
sere-paş	head-last
sere-pêş	head-first
sere-rast	head-right
s-hilbijartin	s-selection
sîntaks	syntax
sîntaktîk	syntactic
stîlîstîk	stylistic
stûnî	vertical
şayesa binyadî	structural description
şiroveker	interpretive
şîyane	competence
şop	trace

têkelî	compositional
têkilîyên argumentên bingehîn	the basic argument relations
têkilîyên tematîk	thematic relations
temamker	complement/complementizer
temsîl	representation
Teorîya Birêvebirin û Girêdanê Theory	Government and Binding
Teorîya Birêvebirinê	Government Theory
Teorîya Girêdanê	Binding Theory
Teorîya Kontrolê	Control Theory
Teorîya Prensîp û Parametreyan Theory	Principles and Parameters
Teorîya REWŞê	Case Theory
Teorîya ROLê	Role Theory
Teorîya Sînorkêş	Bounding Theory
Teorîya Standard a Berfirehkirî ya Nûkirî Theory	Revised Extended Standard
Teorîya Standard a Berfirehkirî	Extended Standard Theory
Teorîya Standard	Standard Theory
Teorîya X-barê	X-Bar Theory
teşedan	formative
teşedana rêzimanî	grammatical formative
teşeyî	formal
teta ROL	theta role
Teta Teorî	Theta Theory
teta-grîd	theta-grid

TEWANG**there-avahî****topîk****Transfêra Argumentan****valens****Veanalîza L'yê****veguherîn****veguherîna rêzimanî****X bar****X cot bar****xuyang****xuyanîtî****xwedî****XWEDÎTÎ****xwedubareker****XWERÛ****xwestekî****yek-cihî****yekeya ferhengî****yekkirin****yeksan****yeksankirin****zanyarî****zêdek****zikmakî****zimanê derveyîn****OBLIQUE**

there-construction

topic

Argument Transfer

valency

V' Reanalysis

transformation

grammatical transformation

X bar

X double bar

aspect

visibility

possessor

GENITIVE

recursive

DIRECT

optional

one-place

lexical item

merge

mapped

mapping

knowledge

adjunct

innate

externalized language

zimanê hundirîn	internalized language
zimanê mirovî	human language
zimanên bikerê dixin	pro-drop languages
zincîr	chain
α-cihguherîn	move- α
Θ-ROL	Θ -role
θ-Teorî	θ -Theory